

Zanist

Abdusamet Yîgît

 **WEŞANÊN SORAN**

Zanist
WEŞANÊN SORAN

Sebat 2017

Çille-Sebat-Adar
21 Sebat 2018
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpîrsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han

email: han-grafik@hotmail.de
<https://www.facebook.com/kovaraxwenas>

Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bûlowstr. 56-57 10783 Berlîn

ISBN 978-3-945656-50-2

Pêşgotin

Ev li lêkolîna min a bi navê Zanistê wê, weke lêkolîneka hûr û kûr bê. Min bi serekeyî wê, xwest ku mijarên wê, bi serekeyî wan werênima li ser ziman. Min bixwe jî di dema nivîsandina vê babetên wê de min, gelek mijarên wê, hê jî di wan de bi kûrehî ez herim. Lê min mijar û babetên wê bi sînor girtin. Bêgûman mijare 'zanistê' wê weke mijareke kûr û pirr zêde wê, dirêj bê. Mirov ku wê, bi hûrûkûr û hûrgilên wê re wê, bikê ku wê werênê li ser ziman wê, mirov dikarê pirr zêde di wê de kûr herê bi pirr zêde wê, werênê li ser ziman. Di serdema me de wê, weke serdemeka zanistî jî wê, were bi navkirin.

Ev serdem wê, di wê de wê zanist wê, pêşketî bê. Di mijarên zanistî de ên weke fîzîkê, bîolojiyê, teknolojiyê, stêrzaniyê û hwd wê, bi gelek mijarên din re wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Î ro, di nava jîyanê de wê, bahse 'serwerîya zanistê li jîyanê' wê were kirin. Bêgûman zanist wê, weke ku wê pêşîyên kurdan hûrîyan jî wê, bi navbikin wê, bi 'zanyarî' wê rewşa têgîna ku ew hatî hanîn li ser ziman wê, werênina li ser ziman. Wekî din jî wê, zanîna wê, bi gotina 'zanîn'ê wê werênina li ser ziman. Em î ro, wê, dizanin ku wê hûrîyan gotina 'zanyarîyê' û ya 'zanîne' wê di vê wateyê de wê, bikarbênin. Di roja me de û ankû di kurdîya roja me de wê, beremberê wê, gotina 'zanistê' wê bê bikarhanîn. Me jî me lêkolîna xwe ya zanyarî bi hemû mijarên wê re wê, weke çerçoveyek zanyarî wê, di bin navê gotina zanistê de me, hanî li ser ziman.

Di rewşa gotina zanistê de wê, weke aliyekî giring jî wê, karibê mirov wê, werênê li ser ziman. Gelek mijarên wê, ên ku me di dewama pirtûkê de me hanîna li ser ziman mirov, dikarê wan piştre jî bikê mijarên lêkolîne û wan di vê çerçoveyê de wan, bi lêkolîn bikê û wan werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de me, armanc kir ku bi vê lêkolîna bi navê zanistî re di rewşa zanyarîya kurdistanî de em çerçoveyek zanistî bi wê re dênina li holê. Lê em dizanin ku ew mijar jî pirr kûr û xwediyê dîrokek pirr demdirêj a. Em bi wê re divê ku bibêjin ku em ne di wê îdîayê dena ku em bibêjin ku emê hemû dîroka wê, bi hûr û hûr wê werênina li ser ziman. Lê me destpêka wê bi vê rengê kir. Ev jî wê weke aliyekî giring bê.

Her wusa di vê çerçoveyê em vê yekê di çerçoveya rêbaza pirtûkê û zimanê wê de bibêjim ku min, bi pirranî gotinên demên bûhûrî ên zimanê kurdî ku wê di dema, gûtî, qasî, hûrî, mîtannî, medî û serdemên piştre ên weke serdemên kekoyîdî, eyerîdî, şadadî merwanî, eyûbîyan û hwd me kir ku di wê çerçoveyê de wê, werênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî me, dît wê, bi çerçoveya gotinên têgihîştîni û zanîni ên zanyarî wê, çerçoveyek zanistî wê tekûz wê karibê were danîn li holê. Di aslê xwe de me, bi wê re di encama wê de wê kifşkir û dît ku em dikarin dîrokek zanistî bi zanyarî bi dîroka kurdistanê re wê, bi nivîsênin û wê werênina li ser ziman. Ev temen wê, hebê. Me li ser wê temenê me hanî li ser ziman. Têgînên hemdem ên weke yên fîzîkî û mekanîkî wê di serdemên destpêka serdemên navîn de wê, bi zanyerên kurd ên weke filosof mekanîkvanê îsmailê Cizîrî, filosof û stêrzanê kurd Fexredîne Xelatî(*) û hwd re wê,

*Fexredîne Xelatî wê filosof û astronomvanekê kurd ku ew jî herêma xelatê a bajarê bedlisê ê bakûrê kurdistanê bê. Wê di dema xwe de ev filosofê kurd wê rasaxxaneyekê jî wê ava bikê û wê bi wê lêkolînen xwe wê bidomênê.

were pêşxistin. Kesên weke filosof û kîmyagerên kurd ên weke Birehimê Xelatî jî wê, temenê têgîna bîlojîyê û kîmyayê wê di çerçoveya têgînên hemdem de wê biavêjê. Di vê çerçoveyê de wê, destpêka zanista kurd a hemdem wê, bi destpêka serdemên navîn re wê, xwediyê pêvajoyeka xwe ya pêşketî a hemdem bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî di dewama wê de wê, werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, çerçoveyek zanistî wê, were pêşxistin. Li vir, di aslê xwe de ez vê yekê wê, werênima li ser ziman. Dema ku min lêkolîn filosofê kurd ên îsmailê Cîzîrî min lêkolîn dikirin min bi wê re wê, ew kifşkirin ku wî di çerçoveya rêgez û destûrên fizîkî û mekanî de wê, çerçoveyekê têgînî û teorîkî a giştî bi gelemperî wê karibê dênê li holê. Fexredînê Xelatê, me zêde nîşanake nedît ku ew çawa ji wan lêkolînên wî sûd werdigirê. Lê me ew kifşkir ku wê, weke ku wê ji hizrên Filosofê kurd îsmailê cîzîrê ên têgîna mekanîkî û têgînên kîmyagerîyê ên filosofê kurd fexredînê Xelatê wê sûdwergirê. Di vê çerçoveyê de me jî di wê herîkîna lêkolînê me dema ku wê, cihê wê were me di vê çerçoveyê de di çerçoveya wê bandûra li ser wî de bi vê rengê bahse wê kir û ew hanî li ser ziman.

Di dewama wê de me, ew jî ew kifşkir ku wê, di vê çerçoveyê de wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, çawa wê, weke aliyekî giring wê, hebê wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Di dewama wê de wê, ev jî wê, weke aliyekî giring wê, were dîtîn û kifşkirin.

Di lêkolînê de me li pênc beşan beşkir û me di wê çerçoveyê de ew hanî li ser ziman. Beşa pêşî wê di çerçoveya serdemên berî şariştaniyê û bi pêşketina civakî ên weke bi têgînên anamîst, totemîst û mitolojîkî ku ew pêşketina me hanî li ser ziman. Beşa duyemîn wê, bi awayekî çerçoveya gotina zanistê bi felsefeya wê re wê, çawa wê hebê wê, li ser wê bisekinê û wê di wê çerçoveyê de me, di bin navê gotina 'felsefeya zanistê' de ew lêkolînkir û ew hanî li ser ziman. Di dewama wê de jî wê, bi felsefîkî wê, rê û rêbaz û şewayê zanistî me di wê de hinekî bi kûrehî û direjehî li ser sekinî. Ber vê yekê di li vir di 'pêşgotinê' de emê zêde li ser rêbazê ne sekin in. Di dewama wê de wê, beşa sêyem wê bi têgîna zanist û teknolojîyê û felsefeya wê ya bi zanistî ku ew pêşdikevê wê, li ser wê were sekin in. Di vê beşê de me bi zêdeyî lêkolînên filosofê kurd Îsmailê Cîzîrî î(*) me kir bingeh û li ser wê hîmê wê re me temenê wê, bi têgîna mekanî, destûr û rêgezên wê re di çerçoveya aqilê fizîkî de me hanî li ser ziman. Di dewama wê de wê, weke beşa çarem wê dîroka pêşketina stêrzanîyê wê, were hildan li dest. Di vê beşê de jî wê, lêkolînên filosofên kurd ên weke Fexredînê Xelatî û hwd wê, werina kirin weke bingeh û li ser wê re wê, were hanîn li ser ziman. Di dewama têgîna stêrzanîyê de wê, bi aqilê fizîkî û destûrên wê re wê hizirkirina bi zanyarî wê bidomê û wê di beşa pirtûkê a pêncem de wê, bi navê zanista fizîkê û têgîna teknîkê re wê, hanîna li ser ziman wê bidomê. Di vê çerçoveyê de wê, ev beş wê weke beşeka ku wê di çerçoveya destûrên fizîkî de wê, were hizirkirin û wê, bê hanîn li ser ziman bê.

Di dewama wê de wê, bêgûman wê, di navê zanyariyê wê, lêkolîn û xabatê min ên ku wê weke dewama wê bin wê, piştê jî wê, bibin. Lê li vir bi serê xwe wê, ev xabate min wê bi lêkolîn min ên di wê de re wê, weke temen û bingeh bê ji wan lêkolînên min re. Wê, her wusa wê, weke çerçoveyekê jî bê. Ber vê yekê, wê ev xabat di warê xwe de wê,

*Ismailê Cîzîrî bi navê 'ebûlizê cîzîrî jî tê bi navkirin. Li ser teknîkê hizirîya û gelek pirtûk li ser teknîka sibernetîkê li şûn xwe hiştîya. Li dora sedsale 11' min ew dijî. Pirtûkên wî yên li ser kifşkirinên teknîk û teknolojîyê wê ji zanist û filosofên piştî wî re wê bina minaq û peyxam. Perwerdeya xwe di dibistan û ankû medreseyên kurdî ên li dora cîzîra bota tawakir. Hizrên wî li ser fizîkê jî bûna peyxam ji kesên zane ên piştî wî re.

weke lêkolîneka giring ku min ew hildayî li dest bê. Di çerçoveya nivîsandina xabatê de wê, dîroka lêkolîn xabatkirina li ser wê û mijarên wê, heta salên 1998'an wê herê. Di vê demê de wê, ez di zindanê de bûm. Gelek mijar ku min dikarî ez li wir werênima li ser ziman, ber ku wê, min nikarîba ku ez wan derxim derve min tenê di mejiyê xwe de hiştin. Hinek mijarên ku min li wir nivîsandina jî wê, di demên hêrîşên leşker û polîsên tirk ên li me de wê, di wê de wê werina şawitandin, destserkirin û piştî windakirin. Ber ku min ne xwest ku wê zêde wusa bibê, piştî ku ez derketim dervê êdî min xabatên xwe hin bi hin ên ku ez di wan de serwaxtbûm min, bi dest rijandina li ser rûpel kirin. Di dewama wê de wê, piştî wê, çendî ku wê, lêkolînen min ên din jî wê bibin min, di ber hevdû de wê, nivîsandina wan domand. Pêşî her pênc bergên pirtûka Feqiyê teyran min nivîsandin. Di aslê xwe de wê, ev pirtûka min a feqiyê teyran wê bii her pênc bergên wê re wê, ji min re wê, di warê kûrbûna min a bi têngîna zanyariya vê xabatê de wê, weke temenekî giring bê. Piştî di dema wê de pirtûka çîrokên keçelok' min nivîsand. Ew jî heta nûha sê bergên wê hatina wêşandin. Lê wê dewama wê jî wê hebê.

Di vê çerçoveyê de di çerçoveyê de ku ez, dihildina li dest wê, ev pirtûka zanyariyê wê, weke aliyekî ku wê, asta wan jî di xwe de wê, bi têngî wê werênê li ser ziman bê. Her nivîs û xabata min nivîsand wê, hinekî din wê min di wê de wê kûr bikê. Wê zêdetirî wê serwaxtîyê wê bi xwe re wê werênê. Ber vê yek, gelek mijarên di vê xabatê de min dema ku wê xabatên xwe yê din wan di nivîsand de min bi zanebûnî di hişt li şûn wan. Ber ku wê, di encama wê de wê çî serwaxtbûn wê bûba bi min re min, di xwest ku ez bi wê binivîsênim, bo ku hê baştir derkeve li holê. Di vê çerçoveyê de wê xabate zanistê wê, weke xabateka kevn a ku min gelek salên xwe danê de bê. Ez hêvî dikim ku ez di wê de gihiştîbim armanca xwe. Bi wê re ez, hêvî dikim ku wê karibê temenek ji aliyê xwe ve ev xabat bide çêkirin.

Abdusamet Yigit

Weke destpêka bi aqil zanîn û ankû afsûn

Ku mirov rewşa afsûnê di hilde li dest, mirov dikarê bi dîroka aqil û ankû hîskirina mirov re heta serdemên destpêkê bi wê re herê. Afsûn, wê hertimî wê weke mijar û rewşeka ku wê mejiyê mirov wê bi xwe re wê mijul bike bê. Wê di serdemên berê de wê têngîna afsûnê wê xwe bide nîşandin. Lê di serdemên ku wê afsûn xwe di wê de wê bide nîşandin jî wê weke serdemna ku wê di wan de wê hizirkirin wê pêşketibê bê. Mirov, dikarê rewşa afsûnê wê aqilê pêşî jî wê hilde li dest. Gotina 'afsûnê' gotinek ji kurdî ya û wê di wê de wê wateya 'ya ku wê bibê', 'ya ku wê were serî', 'pîfkirin', 'nezer' û hwd wê bi xwe re wê bi wateyî wê werênê li ser ziman. Di têngîna afsûnê de wê, di nava kurdan de wê, gelek têngîn bi wateyî wê werênina li ser ziman. Di çerçoveyek têngînîya baweriyê de wê, li wê werê nerîn. Li gorî kurdên berê, hatina tişteki xirab û ankû baş li serê mirovan, wê bi wê ve girêdayî wê werênina li ser ziman. Bi teybetî civakên weke civake kurd, ku ew xwediyê mejûyeka pirr kevn in, wê di nava wan de wê, di çerçoveyek baweriyî de wê afsûn wê hebê. Di nava kurdan de wê, heta roja me jî wê tiştên ku wê mirov ji bandûra afsûnê xilas bikin, weke *nivîşt*, 'çavê ku ew li ser devê dêrî tê dalaqandin, zîyeretkirina goristanên mirovên xwe yên ku ew bo wan pîroz in û hwd wê hebin. Gotina *nivîşt*'ê, wê di kurdî de wê temenê li ser hîmê gotina *nivîsê* û ankû nivîsandinê bê. Gotinên weke ku wê piştî rewşa ku wê yekî nehaqî li yekî kir û piştê yê ku ew nehaqî kir û ku tişteki xirab hat serê wî, ku wê yê ku ew nehaqî li wî hatîya kirin ku wê bêjê, ew ji ber wê nehaqîya ku wî hanî serê min li wî bû û ankû 'ew, ji ber ku wî ew nehaqî li min dikir re hat serê wî' û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke gotinna ku wê bi bawerî wê werina gotin bin. Yan jî yê ku ew nehaqî li wî hatîya kirin, wê bêjê ku 'ew ji ber gûnehê min hat serê wî.' Di vê çerçoveyê de wê rewşa van gotinan, wê di vê çerçoveyê de wê weke têngîneka afsûnî a li ser haqî û ankû mafiyê re wê were hanîn li ser ziman bê. Ev rewş û rewşên weke vê, bi me dide fahmkirin ku em têngîna 'başî' û ya 'nebaşiyê' wê baş hildina li dest û wê fahm bikin. Wê bergê bikin, bo ku ew ji tiştên xirab werina azad kirin. Wê weke ku mirov di nava kurdên berê de dibîne, wê bergên, ji xirabiyê xwe parastinê, di rêwîtyên dirêj de bo sîtarê, di malê de bo aramiyê, bo çêkirin û ankû xirakirina nava jin û mêran û hwd, wê bi bawerî wê rewşna têngîniyê bi bawerî ku wê bi aqilê afsûnê wê werênina hanîn li ser ziman bin.

Di nava civakên kurdan ên berê de û heta ku wê di nava civake kurd di roja me de jî wê, dager û ankû sembolên ku wê bo çêkirina afsûnê û ankû bo *xirakirina afsûnê* wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê heta ku wê Zerdeşt bixwe jî wê di beşa avestayê a '*videvet*'ê de wê bahse derxistina gîyanên gîyan ji laş wê bike. Wê bi wê re wê bahse rewşa weke nexweşiyên ku wê di encama ketina gîyanên xirab a di laş de bibin, wê bikin.

Di nava kurdên berê de wê, bi teybetî wê were bawerkirin ku wê hemû nexweşî û hwd, wê di encama ketina gîyanên nebaş di laş de wê bibê. Têngîna ji hevdû cudakirin û şirovekirina başî û nebaşî ji hevdû de wê, di vê çerçoveyê de wê şirove bi temen wê li ser herdû aliyên re wê werênina pêşxistin.

Em dema ku bahse serdemên berê ên civakê bikin, em divê ku di vê çerçoveyê de wê werênina li ser ziman ku wê gelek rewşên teybet ên ku em dikarin bi çerçoveya têgîna afsûnê re wê werênina li ser ziman re emê wê bibînin. Di vê çerçoveyê de wê dema ku mirov çîrok, şîrove, nivîsar, bineter û heta pirtûkên serdemên berê ên ji aliyê zaneyên civakê ve ku ew hatina nivîsandin ku mirov li wan dinerê, wê bi rengê û şêwayekê wê bahse bandûrbûna bi afsûnê wê bikin. Wê bahse başî û nebaşîya ku wê weke encama wê, ew wê pêşbikeve wê bikin. Di vê çerçoveyê de wê di nava kurdan de wê ji demên civake kurd ên kevn û heta roja me jî wê, bahse 'nezerê' wê bê kirin. Yanî bi gotineka din kurd bahse 'çavlêxistinê' dikin. Têgîna çavlêxistinê, ew a ku mirov, pîr zêde li ser tiştêkî hazînî, wê dilê mirov di wê de wê bimênê, Wê piştre wê dilê mirov ew bimênê. Wê piştre wê çavê mirov wê lê keve. Gotinên weke 'çavberdanê' jî ew hena. Ew jî dişa wê li er gotina hazinibûnê re bê. Dema ku mirov pîr li tiştêkî hizirî û hanî, ev weke çavberdana li wê tiştê dihê şîrovekirin. Bi wê re jî wê ew werê hanîn li ser ziman. Çavlêdan û çavberdan, wê di vê çerçoveyê de wê, weke nîşanayeka ne başîyekê jî wê were hanîn li ser ziman. Heta roja me jî wê, di nava kurdan de wê bo xwe ji nezerê parastinê wê 'xêran' wê bikin û ankû wê bidin. Em î ro wê bi awayekî baş dizanin ku wê kurdên berê ên serdema mîtannî û medîyî û yên berî wan jî wê, çendî ku wê ji yazdanên xwe yên baş re wê boraqan û ankû korbanan wê bidin wê bi heman rengê wê ji yazdanên xweyên xirab re jî wê bi heman rengî wê boraqan û ankû korbanan wê bidin bo ku ew xwe ji xirabiyên ku wê ew karibin bînin li serê wan, ew xwe ji wan xilas bikin. Di çerçoveyê de wê dema ku ew boraq û ankû korban dihê dayîn, wê armançeka wê ya bi hêvîkirinê wê hebê. Zindî û ankû gîyanên ku ew weke 'bi afsûn' dihatin pênasekirin û ser ziman, wê weke gîyan û ankû zindiyana ku wan dikarî her tiştî bikin bin. Ew xwediyê hêzeka ser wan û xwezaya wan re bûn. Wê tiştên ku ew bi wan bawer dikin ku ew afsûnê xira dikin, wê bi devê derîyan û ankû hundûrê malan ve dalaqênin. Mînaq, di nava kurdan de wê bahse 'xate nebî sûleyman' wê were kirin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê bi têgîn û gotina 'xate nebî sûleyman' re wê bahse şêwayekî parastinê a ji afsûnê wê were kirin. Di vê çerçoveyê de wê, bahse wê kirin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê bahse 'cîn', 'spêlê', 'pîrabok', 'cazûvan', 'şevreşk', 'adû', û hwd wê bikin. Ev wê weke rewş û ankû kesna bi afsûn bin. Wê karibin xirabiyê jî wê bi mirovan bikin. Bi gotineka din, ew 'gîyanên xirab' jî na. Di vê çerçoveyê de wê ew werina hanîna li ser ziman. Wê bahse wan wê werê kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di serdemên berê de wê kurd, wê ji her nexweşîyekê re wê weke li çareya 'xirakirina afsûnê' wê lê bigerihin. Ber ku ew weke *rewşek afsûnî* û ankû ketina gîyanên xirab di laş de wê, di wê çerçoveyê de wê li wê binerîyan û wê bihanîyan li ser ziman.

Em dema ku wê têgîna afsûnê wê dihildina li dest, li vir, em di serî de wê yekê jî wê werênina li ser ziman ku em kifş dikin ku wê ji aliyê têgîna bawerîyê û hwd ve wê rewş wê werê hildan li dest. Di çerçoveya têgînek bawerîyê de wê xwediyê wateyê bê. Di rewşa afsûnê de wê dema ku mirov wê hilde li dest li ser têgîna bawerîyê re mirov, divê ku mirov têgîna derûnîyê jî li rex wê, bi şîroveya wê re wê werênê li ser ziman. Li vir, tiştê ku mirov wê ne rehet bê, û ankû di xwe de ne rehet û bi aramî bê, wê di vê çerçoveyê de wê weke sedema wê, di têgînek afsûnî de wê biheta lêgerîn.

Di nava kurdan de ku bahse afsûnê dihê kirin, wê bi teybetî wê zimanekî wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê gelek gotinên ku wê di vê çerçoveyê de wê werênina li ser ziman wê hebin. Wê wateyên nû ên bi wê wateya afsûnê ku wê li gotinan hatibina kirin wê hebin. Dîroka weke ya çê *'kirina afsûnê'* wê, di nava kurdan wê pîrr kevn herê. Mînaq, dema di nava du mirovan de ku pîrsgirêkek hebê, wê ew weke rewşek bi bandûrkirinên afsûnî wê werê hanîn li ser ziman. Dema ku nava du mirovan ku ew xirabûya çêbikin, wê ew jî wê di vê çerçoveyê de wê were kirin. Di nava civakê de wê têgîna *'girêdanê' a bi afsûnî'* wê pîrr kevn bê. Mînaq, *'girêdan jin û mêrekî li hevdû', 'girêdana du rewşan li hevdû',* û hwd wê bi têgîna afsûnî wê hebê. Bi wê re jî wê, dema ku mirov, hertimî di jîyane xwe de xelatîyan û şaşîyan dikê, wê ev jî wê weke rewşeka ku wê, bi bandûra afsûnê û ankû wê weke ku wê di nava civakê de wê were gotin 'qey hinekan, afsûn li wan çêkirîya ku ew xirabî werina serê wan' û hwd, wê bi vê rengê wê werênina hanîn li ser ziman.

Li ser rewşa têgîna afsûnê re em wê jî di nava kurdan de wê, dibînin ku wê her reng, tişt û hwd, wê warina bi watekirin. Mînaq, rengên weke kesk, sor û zer, wê ew jî ew di demên berê de di nava civakên kurda de ew hatina bi watekirin bi wê rengê. Heta ku wê mûyên pov û ankû pora serê mirov, cilên mirov ên ku mirov li xwe dike û hwd wê afsûn li wan wê were çêkirin. Di demên berê de ev dihat kirin. Mînaq, dema ku mêrekî hês keçîkekê dikir, yan heya keçîkê jê nebû û yan jî keçîkê ew ne dixwest, wê çûba dem afsûnkarekî wê bigota ku *'wê li min girêda.'* Afsûnkar jî wê bigota, *'here, yan mûyekî ji kezîya wê ji min re werênê û yan jî tişteki(tiştekî ku ew hê bikardihênê) wê, weke cil û hwd ji min re bîne'* dakû ez karibim wê afsûna girêdanê çê bikim. Wê mirov çûba û bi rêyekê û rêbazekê wê xwe bigihanda mûyekî ji kezîya keçîkê û yan jî tişteki wê, dakû wê afsûnê li wê bidê çêkirin.

Bi rengê din jî wê bahse *'gotinên bi afsûn'* wê bê kirin. Wê dema ku ew gotin li zerikek av, û ankû li tişteki hat xwandin ku ew hat avêtin û ankû rijandin li ser malekê, li deve deriyê malê û hwd de wê ew bi afsûn bûba. Di nava civake kurd de wê, di vê çerçoveyê de wê, weke baweriyekê, wê werê hanîn li ser ziman ku mirov, hê tişteke ne hatî serê mirov û weke ku ew tişteke were li ser ku mirov di serê xwe de hizir bike û wê werênê li ser ziman, wê bi wê re wê were bawerkirin ku ew tiştê ku ew hatî hizirkirin û piştî ku ew hatiya hanîn li ser ziman, wê were li serê mirov. Di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê bê gotin ku *'mîrov, divê ku mirov gotinên ku wê bina sedema hatina tiştên xirab li serê mirov divê ku wan bikarneyênê.* Mînaq, dem bi dem mirov, tiştên pîrr xirab hatina serê wan ku ew mazin bûna. Piştê li ser wê re weke gotinna di vê çerçoveyê de ew bi bawerî, wê were hanîn li ser ziman ku ew hinek *'bêîdua' lê kirina.* Yanî, weke ku wê di nava xalkê de wê were ser ziman, ku *'gotinên ne xêrê hatina bikarhanîn.'* Di vê çerçoveyê de wê bi çî armancê wê ew ava ku ew gotinên biafsûn li wê dihat xwandin, wê biheta bikarhanîn, wê ew bi wê re wê biheta bikarhanîn. Wê bi wê re jî wê, êdî wê ew rewşa ku wan dixwest wê bikiran ew bûba. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, mînaq di nava kurdan de wê weke nivîştan, ku wê gotinên biafsûn wê lê biheta nivîsandin wê tişt wê bihetan amedekirin û wê mirovan ew bi xwe ve bikira û ew li ser xwe barbikira bi armanca ku ew ji her rewşên xirab, qaza û belayan, kirina şaşîyan û xelatîyan xilas bikira.

Bi rengê din ê vegotinî, mirov dikarê afsûnê weke rewşa aqil, a pêşî ku wê ji nava aqilê mirov, wê li ser xwestek, têgîn, mêylên me û hwd re wê xwe bide dîyarkirin.

Weke hîskirina xwestekê û bi wê re ya kirinê wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa afsûnê de wê di destpêkê de wê rewşa aqil, wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa wê rewşa aqil ku mirov wê çawa wê bihizirê, wê hilde li dest di mejî de bi aqil, wê di wê şewayê de wê, xwe bide nîşandin. Afsûn, di aslê xwe de wê ji aliyekî ve wê, rewşeka afrînerîya aqilê me jî bê. Mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman.

Di rewşa aqil de mirov, dema ku wê bihizirê wê çî û çawa wê bike, wê ew wê weke tégînekê wê di mejiyê mirov de wê bicih bibê. Bi wê re wê di mejî de wê ew were dîtin û ku wê mejî, wê bi aqilkirinê wê bixwezê ku wê tiştê ku ew hizirkirî, ew bi hizirkirina wê re ew di bin sehêta wê de bê. Afsûn, wê hinekî jî wê di vê çerçoveyê de wê tégîna sehêta wê di xwe de wê bihawênê. Mirov, dikarê di çerçoveya tégîna sehêta de wê li ser wê re wê bihizirê ku mirov dema ku ew hizirkirin bi tiştê re ew kir, wê ew tişt, wê di rewşeka hizirkirina me de wê, weke ku mirov çawa ew hizirkir ku ew wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di rewş û renekî afrîner de wê xwe bide dîyarkirin. Mirov, dikarê vê jî bi wê re wê werênê li ser ziman ku afsûn, wê wê di mejî û aqilê me de wê weke kirdeyek vêsarî wê hertimî wê li ser hizirkirina li tiştê re wê hebê.

Dema ku mirov dihizirê li tiştê û mirov dike ku wê fahm bike û wê werênê li ser ziman ku wê, tégîna tiştê wê xwe weke tégînek aqilî a bingihîni wê bide dîyarkirin. Ti tişt, wê di rewşa tégîna afsûnê de wê bi bûjenîya xwe ya fizîkalskî wê ew di jîyanê de wê weke ku ew hem hebê û hem jî nebê. Wê di vê çerçoveyê de wê bê hizirîn. Sînorê hebûn û nebûnê jî wê aqil û hizirkirina me û hişkirina me re wê hebê.

Li gorî tégîna afsûnê ku mirov tiştêk hizirkir ew êdî wê hebê. Yan jî ew dikarê hebê. Tiştê ku mirov ew hizir kir, wê ew bibê. Weke ku çawa ku wê di rewşa ol û bawerîyan de wê bi gotina 'bibe!' re wê werê hanîn li ser ziman ku mirov hizirî û got û bahse tiştêkî kir û ku ew hebê, wê ew jî wê ji nebûnê wê bibê. Di çerçoveya mantiqê xwe de em dihizirin ku wê tişt, wê ji nebûnê wê nebê. Wê ji hebûnê wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di tégîna afsûnê de wê, ji nebûnê wê karibê biafirê. Wê hertişt, wê li gotin û hanîna navê wê yê li ser ziman wê binerê. Wê di vê çerçoveyê de wê rewşa wê, xwe bide dîyarkirin û wê werênê hanîn li ser ziman.

Di rewşa tégîna afsûnê de mirov, ku wê dihizirê, her wusa, wê di vê çerçoveyê de li ser rengên hizirkirinê ên weke felsefeyê û hwd re ku mirov wê bi mantiqê wê red dike, wê di vê çerçoveyê de wê tégîna afsûnê wê di xwe de wê xwediyê mantiqê xwe yê bixwe afirandinê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê tégîna afsûnê wê, weke tégîneka ku wê li ser rewşa karigerî, kêrhatîbûna aqilê me û rewşên wê yên ku ew hatina hizirkirin û hwd re wê xwe bide dîyarkirin û nîşandin.

Di rewşa hizirkirinê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa aqil, wê weke rewşek teybet a ku ew dikarê bêî tevger, kirin û xûyê ku ew dikarê bike ku tişt hebê û ankû bê afirandin û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê wateyek wê ya tégîni wê hebê. Wê her tişt li gotinek me ya hizirkirî wê binerê. Mirov, dema ku li tiştêkî dihizirê, mirov wê çawa dihizirê? Mirov, dema ku wê li wê bihizirê, rewşa hizirkirina me û ya wê hebûnê, wê di wê çerçoveyê de wê ji hevdu cuda wê xwediyê gelek rewşên di zikhevdu de ku ew bi hiş werina hizirkirin bin. Li vir, wê hertişt, wê girêdayî hişê me bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa afsûnê, wê weke rewşek aqilî a ku ew bêî destûr û zagonên fizîkê dihizirê bê.

Li vir ku em bahse destûr û zagonên fizîkê bikin, wê biaqil re wê ev bi wê re wê xwe bide dîyarkirin û nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyêde divê ku mirov vê yekê jî wê di vê çerçoveyê de di dewama wê de wê werênê li ser ziman ku wê bi wan destûr û zagonên fizîkî ku ew di aslê xwe de ew bi rewşa fizîkê re ew hena, aqil wan jî xwe re weke têtîna ku ew karibê bihiş bike û ew bi wan bijî. Di rewşa têtîna destûrî û zagonî a fizîkî de wê rewşên fizîkî û ankû tiştên fizîkî wê weke hebûneka ku ew mirov dikarê wê wergerênê jî tiştê li tiştê. Mirov dikarê wê bihalênê tûna bike û ankû wê biafirênê. Her wusa, wê awayê bidê wê. Rewşa dayîna awayê li wê, wê di aslê xwe de wê di vê çerçoveyê de wê weke têtînek aqilî bê.

Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di bin rewşa têtîna afsûnê de wê rengêkî hizirkirina me mirovan wê hebê. Mirov dikarê wê yekê di serî de wê werênê li ser ziman.

Di rewşa têtîna afsûnê de aqil, weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman destûr û zagonên rewşa fizîkî ku ew bi xwe re ew dijî, wan bi aqil, ku ew karibê bike, wê di vê çerçoveyê de wê bi rewşa têtîna afsûnê de wê weke rewşek têtîna wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, rewşa aqilê me, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê rewşa aqilî bê. Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa têtîna afsûnê, wê weke têtîneka ku mirov wê di nava aqilê xwe de wê her roj û di jîyane xwe ya roja de wê dijî.

Li vir, divê ku vê yekê ez wê werênima li ser ziman ku wê rewşa aqil, wê di nava xwe de wê xwediyê rewşek afirandinê bê. Aqil, li ser destûr û zagonên rewşa fizîkî re wê jî rewşekê afirandina rewşek û hwd wê werênê li holê. Bi wê re jî wê bi wê re wê rewşa afirandinê wê li gorî aqil û rêgezên mantiqê wê werênê li holê. Ev rewş, wê weke rewşna ku mirov wê dihizirê bê. Di wê hizirkirinê de wê weke rewşên fizîkî ên di temen û hîmê wê hizirkirinê de wê fêr û ezmûnên me mejûyî û dîrokî wê hebin.

Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têtîna afsûnê jî wê di aslê xwe de wê xwediyê têtîneka bi destûr û zagonên rewşa fizîkî re bê. Lê li vir, di rewşa nêzîkatî, derkkirin, fahmkirin û rengê fahmkirinê de wê jî hevdû cûdabûn wê bibê. Di mantiqê aqilê mantiqî de ku mirov bibêjê tiştêkî ku ew bi hebûna xwe re ew heya ku em wê bihizirin ku ew nîn a û bibêjin 'winda be!' wê ew winda nebê. Ber ku ew heya. Lê em dikarin wê weke ku ew windabûyî wê bihizirin. Ev rewş, wê weke rewşek têtîna hizirkirinî bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têtîna a afsûnî, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewş û têtîneka hişmendî a ku ew destûr û zagonên rewşa fizîkî dike weke destûr û zagonên aqil û bi wê re wan dike ku wan bikarbênê û wan bide xabitandin. Di rewşa fahmkirina wê de wê, li vir, wê rengê fahmkirinê wê li ser aqil re bê.

Di aslê xwe de wê afsûn, wê weke dilperîya afirandina aqilî jî wê di xwe de wê bihawênê. Afsûn, weke rewşek têtîna a ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê biaqilî wê hilde li dest û wê fahmbike bê.

Di vê rewşê de mirov, dema ku wê rewşa têtîna afsûnê wê dike ku wê fahm bike û wê hilde li dest wê, di serî de wê rewşa hiş û ankû hişkirinê wê xwe weke rewşek teybet a di hîmê wê de wê xwe bide dîyarkirin. Hiş û afsûn, wê hevdû biafirênin. Wê bi hevdû re wê ew hebin. Wê di vê çerçoveyê de wê afrîneriya aqil bi hiş re wê bi têtîna afsûnê re wê xwe bide dîyarkirin. Hiş, weke rewşek teqez a ku ew "heya" wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşa têtîna afsûnê de wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di

vê çerçoveyê de mirov bi vir ve girêdayî li ser rewşa têtîna destûr û zagonên rewşên fizîkî re ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke ku her tişt tenê di aqil de û weke aqil ew hebê. Bi gotineka din ku mirov, aqil dênê pêşîya rewşa fizîkê weke rewşek afrîner ku ew rewşa fizîkê dikarê wê biafirênê, wê were dîtin û were li ser ziman. Di rewşa têtîna afirandinê de wê, weke ku mirov bi têtîna afsûnê re wê kifş bike, wê bê bawerîkirin ku wê aqil hêz û kûdreta wê ya kirin, çêkirin, derxistina li holê a hertiştî û kifşkirinê û hwd wê hebê. Di vê çerçoveyê de em di serî de li ser têtîna afsûnê re têtîna kifşkar a bi aqil re wê li vir wê kifş bikin û wê werênina li ser ziman. Ev jî wê weke aliyekî girîng ê ku mirov wê li vir di serî de wê fahm bike û wê, di dewama wê de wê bike ku wê bi berdewamî weke rastîya fahmkirina aqil a bi têtîna afsûnê re wê hilde li dest.

Di rewşa fahmkirina têtîna afsûnê de wê têtîna hiş wêbi aqil re wê di çerçoveyek kifşkar de wê xwe bide dîyarkirin. Di roja me de wê bigotinî wê were gotin ku 'mirov, bi qil dikarê her tiştî bike. Di aslê xwe de wê, ev têtîna wê weke têtîneka ku mirov di temenê têtîna afsûnê de jî wê hilde li dest bê. Di rewşa têtîna afsûnê de wê hiş bi aqil, wê weke ku wê xwediyê her tiştî bê. Wê karibê her tiştî biafîsênê. Wê karibê, xwe bigihênê her rastî û rastteqînîyê. Wê ti tişt, ji wê re wê weke nepenî wê nemênê. Têtîna afsûnê, di vê çerçoveyê de wê weke têtînekê bê.

Di nava çîrok û çîvanokên kurd de wê, weke qarakter û keseyetekê wê hertimî wê bahse cinan û ankû hinek pîrabokên bi afsûn ku ew 'sihrê' çê dikin wê bê kirin. Ew dema ku wê çê dikin, wê di mejiyê mirovê ku ew li wan dihizirê de wê ew têtîna wê hebê ku ku 'ew, di karê hertiştî bike' wê hebê. Ev têtîna 'ew, dikarê her tiştî bikê', wê bo yên bi afsûn wê were gotin. Yanî, wê her tişt wê bo wan kirina wê, wê bi derfet bê. Di vê çerçoveyê de wê werina hanîna li ser ziman. Di rewşa têtîna afsûnê de wê di vê çerçoveyê de wê bahse wan bê kirin. Di rewşa kes û ankû yên ku ew bi afsûn in de wê bi du awayan wê were hizirkirin. Awayê pêşî, ew a ku wê yên baş hebin ku ew hertiştê baş dikin bin. Û wê yê ne baş wê hebin ku ew hertimî nebaşiyê û neqanciyê bi herkesekî dikin. Di jîyanê de wê ew weke rastîya wan bê. Di vê çerçoveyê de wê dema ku bahse wan dihê kirin jî wê, ew rewşa têtîna başî û nebaşiyê, w jî herdu aliyên ve jî wê weke qarakterê yên bi afsûn wê werênina hanîna li ser ziman. Lê çendî ku yê nebaş ku ew hertişt jî jê re bi derfeta ku ew bike, wê bi heman rengî wê wusa di wê çerçoveyê de wê karibê ya baş jî ew bike. Yanî ew jî bi derfet a. Mirov, wê bi heman rengî li aliyê din jî wê bihizirin. Lê di nava wan de wê li şûn wan, wê du qarakterên din jî wê hebin, ew jî wê, yê başî wê hertimî wê ya baş bike, ber ku ew sedema jîyane wê ya. Bi heman rengî wê bo aliyê din ê ne baş jî wê rewş wê wusa bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têtîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê bi hiş, wê weke têtîneka gerdûnî bê. Wê di rewşa wê de wê sînorê wê nebê. Wê ti tişt li pêşiyê wê weke sînor nebê, ji mirov û kêmesiyê mirov û pê de. Di vê çerçoveyê de wê were hanîna li ser ziman.

Di rewşa têtîna afsûnê de wê hiş, wê weke rewşeka hîmî wê, li ser ezmûnên rewşên fizîkî re wê xwediyê rewşa hanîna li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov, dema ku bahse hiş dike, wê her wusa, wê, weke her tişt wê weke hiş bê, wê di vê çerçoveyê de wê ew hebê. Wê rewşa ku mejî wê dihizirê, wê ew hebê. Lê dema ku ew nehizirî wê ew nebê. Di vê çerçoveyê de wê di rewşa mejî û hizirkirinê de wê, têtîna afsûnê wê bi wê re wê weke renekî hizirkirinê û hwd wê were dîtin.

Di rewşa tégîna afsûnê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di rewşa aqilê mirov de wê, li vir, wê ev rewş, wê xwe bide dîyarkirin. Rewşên weke tirs, şahî, xweşî, nexweşî, hêsta serkevtinê û ya sernekevtinê û hwd, wê çend ji wan rengê hizirkirinê ên ku wê tégîna afsûnê wê wan jî wê sûd bigirê û wê xwe bide dîyarkirin bê. Di serdemên berê de wê dema ku mirov li rewşên civakên berî dîrokî û civakê, şariştanîyê ku mirov li wan dihizirê, wê di vê çerçoveyê de wê rewşek wê xwe bide dîyarkirin. Afsûn, wê di rewşa nezanîya mirov de ku ew çîroska aqil pêketîya, wê bi wê êdî wê çawa wê fahmkirin wê bibê û wê were hildan li dest, wê li wê were hizirkirin bê. Li ser ya nayê zanîn re pêşxistina tégîna xwûdê jî wê, ji aliyekî ve wê temenê li ser rewşa nayê zanîn ve wê ji ser xwe avêtina tîrsê û hwd de wê, kêrî mirov wê were. Ji xwe mirov wê di vê çerçoveyê de wê, van tégîna wê ji wan sûdbigirê û wê fêdêyê wê ji wan bibînê. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ya ku ew nayê zanîn, wê tenê wê weke aliyekî jîyanî bê. Mirov, bi hişê xwe hê wê nizanê. Kengî ku mirov bi hişê xwe ew zanî, wê hingî wê bi ser wê ve wê were. Di vê çerçoveyê de wê, rewşê wê weke xwe ku ew heya wê bibînê. Weke xwe dîtina rewşê, di aslê xwe de wê temenê pêşketina mantiqê û hwd jî bê. Tégîna mantiqê, wê çerçoveya hebûna fîzîkî a ku ew li jîyanê heya wê ji wê sûdbigirê û wê çerçoveya xwe tégînî û hwd wê biafirênê. Ankû mirov dikarê bêjê ku wê rengê hizirkirina xwe wê di jîyanê de wê weke li jîyanê û hwd wê biafirênê.

Di rewşa tégîhiştina tégîna afsûnê de wê mirov, wê dîroka xwe ya aqil a hiş, wê hemû di berçav de wê derbas bike. Ankû, wê dîroka tégîna afsûnê, wê weke dîroka mejûya mejiyê me, wê pêvajoyên pêşketina hiş wê hemûyan wê bi xwe re wê di rengê ku ew hatîya û pêşketîya de wê ji wê sûd bigirê û wê ew wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê tégîna afsûnê, wê di çerçoveya hişmendîya me de wê, weke tégîneka ku wê mirov çawa wê ew wê hêza afirandinê ku wê di xwe de wê bibînê bê. Bi gotineka din, mirov dikarê werênê li ser ziman û bibêjê afsûnkarî wê di aslê xwe de wê hişmendîya zelal bê. Wê di vê çerçoveyê de wê rastîyek bi hizirkirinê re bê. Di rewşa hişmendîyê û pêşketina wê de wê ew pêvajoyên wê yên destpêkê, minaq pêvajoyên şariştanî ên destpêkê de wê rewşa aqil, wê di çerçoveyek bêsinor de wê were pêşxistin. Wê sinorê aqil nebê. Di aslê xwe de ku mirov, ji aliyê tégîna afsûnkarîyê ve dinerê, wê tégînen felsefîkî ên weke yên mantiqê (*) û hwd, wê weke tégîna sînardar bin. Tégîna hişmendîya afsûnê, wê ew sinorê wê nebê. Wê her tişt wê ji wê re wê bi derfet bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê tégîna afsûnkarîyê, wê weke tégîneka di vê çerçoveyê de ku mirov wê sinorê wê jî wê bi sinorê hişmendîya xwe re wê hilde li dest. Di nava cihane afsûnê de mirov, bi mejiyê xwe dikarê heta kû bihizirê û heta kûderê di aqil, hiş û zanîna xwe xwe de herê? Di aslê xwe de wê di vê çerçoveyê de wê ev wê weke rastîyekê bê ku mirov wê hilde li dest bê. Li vir, dema ku mirov di çerçoveya tégîna afsûnîyê de ku mirov li tégîna sinorê dihizirê, wê di vê çerçoveyê de wê, tégîna afsûnê wê bi hemleyên ku ew li ser hiş re

 (*)Mantiq wê weke tégîneka felsefîkî bê. Wê weke tégîna felsefeya aqil meşandinê û ankû 'muhakamekirinê jî bê. Rêzgezên wê yên giring weke nebûna rewşa sêyem re wê, xwe werênê li ser ziman. Hebûna fîzîkî û darêjkî a ku ew heya wê weke çerçoveya wê ya heyînî a tégînî bê. Mantiq dervî tégînen afrsûnî û mîtolojîkî wê weke tégîneka felsefîkî bê. Her tişt a ku ew bi çerçova û darêjk bê, li ser wê rewşa wê ya heyî re mirov dikarê weke heyîna wê ya mantiqî jî wê bihasibênê û bînen ser ziman.

dike re wê hertimî wê sînorê ew heya, wê derbas bikê. Di serdemên navîn de wê gelek jin, wê bi hênceta ku 'ew, pîrabok in' wê werina girtin û wê werina şawitandin. Di aslê xwe de ew jinên ku ew bi sînorê hişmendîya xwe ku ew derketina dervî sînorê hiş ê weke bi mantiqê û hwd re ku ew hatîya danîn li pêş bê. Di vê çerçoveyê de wan mirovan, wê cezayê derketina dervî wê sînorê bi zanîna xwe re wê bi can û gîyane re wê bidin.

Di aslê xwe de wê ev rewşa têgîna 'pîrabok'an wê weke têgîneka pîrr kevn bê. Wê di serdemên berê de ku wê hê aqil zêde pêşketîya û di pêvajoya destpêka pêşketina xwe de wê, mirovên ku wê gotinan wê bînina li ser ziman û wê bi mirovan wê bidina kirin wê derkevin. Ew jî wê weke mirovna pêşeng bûn. Ew mirovên pêşeng, wê di wê demê de wê tişta ku wê ji wan biheta xwestin wê ew ba ku ew karibin bersivê bidina her tişta ku wê derkeve li pêşîya wan. Wê di vê çerçoveyê de wê bawerîyek wê di serî de wê li hiş û mejîyê wan, wê heba. Mirovên afsûnkar ên serdemên destpêkê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bin. Ew di vê çerçoveyê de wê bîn hanîn li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têgîna afsûnkarîyê, wê di aslê xwe de wê di reng û çermê mirovên zane de wê xwe bide dîyarkirin. Mirovên zane ku ew bi aqilê xwe derdikeve dervî sînorê ku ew heya û ya ku mirov wê hizir nekê û nayê hiş mirov ku ew dihê hişê afsûnkar, wê ji aliyekî ve wê ev rewş, wê mirovê li dorê wê bi demê re wê bide tirsandin jî. Wê hertimî wê bê pirsîn ku ew wê zanîne ji kû digirê? Ev pirs, wê bersiva wê, wê di aslê xwe de wê temenê wê de wê sedemek tirsê jî wê ji aliyekî ve wê hebê. Dema ku ew pirs hat pirsîn û pê de wê mirov, wê êdî wê tirs, wê li ser zanebûnê re wê bidest ketina dil de wê bibê. Tirs li ser zanebûnê re ku ew dikeve di dil de, mirov dikarê wê ji sê aliyan ve wê werênê li ser ziman. Aliyê pêşî wê ew bê ku mirov wê nizanibê ku ew berê wê bi kûve ya û bi kûve diçê. Yê ku berê wan dide wir, ew tenê wê dizanê. Ew jî, nizanin ku wê çi derkeve pêşîya wan. Ev tirsê pêşî ya. Tirsê duyem wê ew bê ku mirov ji encamên ku wê derkevina li pêşîyê ku ew ji wan re ne amede ya û ankû ne xwediyê zanîna ku wê piştre wê çi bibê, êdî wê di rewşa ku ew di wê de dijî wê weke ku ew di wê de ew bitaqînê wê lê were. Wê nexwezê ku ew ji wê derê derkeve. Dema ku rewşên nû, têgînên nû, ku ew derdikevina ber mirov, wê ew tirsê di wê rewşê de wê bidiyê de. Wê ber ku ew yên nû, wê rewşa ahenge wî ya ku wî ji xwe re di mejîyê xwe de ew çêkirîya, wê ew xira bibê. Di roja me de ev rewş weke ku ew di nava kurdan de ew dihat hanîn li ser ziman wê bi 'mîrovê kevnêşop' û 'mîrovê ne kevnêşop' re wê biheta hanîn li ser ziman.

Weke rewşa sêyem jî mirov dikarê bahse wê bike, divê ku mirov bahse hebûna tiştan ku ew di mejî de wê tenê weke aqilekî ku mirov wê dikarê li gorî ku wê dixwezê bi reng û awa bike, wê werênê li ser ziman. Di aslê xwe de mirov, dema ku rewşa têgîna tiştê wê dihilde li dest, li vir, ya ku mirov wê kifş dike jî wê, ew bê ku mirov wê çawa bihizirê ku wê ew bê, bi wê rengê, weke têgîneka ku wê, bi şewayekî ezmûnî bê. Mirov dikarê têgîna afsûnê di vê çerçoveyê de wê weke têgînek afrîner û bi gotina roja me, wê weke têgînek şoreşger jî wê werênê li ser ziman, li ser aqil û afrînerîya aqil re.

Di aslê xwe de wê li vir, hiş, wê çawa wê bikeve pêvajoya kifşkirina jîyanê û dîtîne de mirov wê, di reşa afsûnê de wê bi awayekî vekirî dibîne. Li vir, di aslê xwe de hiş û exwestek, wê bi hevdu re wê di çerçoveya têgîna afsûnê re wê bi hevdu re wê kifşkarîyeka wan ya li jîyanê wê hebê. Tişta ku ew heya, wê hêst û ajoya xwedibûnê wê bi mirov re wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê ew hêst wê, di nava rengê afsûnê de wê

xwe werênê li ser ziman. Weke hêza rengdêr û bi tevger wê xwest, weke çalakvanê hişê bê. Ew wê, di dîyarkirin û nîşandinê de wê, weke ermanca bi hiş re bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de hiş û xwestek, wê weke rewşna bi hevdû re ên afrîner bin.

Di rewşa têgîna aqilîyê de wê aqil, di destpêka pêvajoyên animismê û totemîsmê de wê, ev rewş, wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, li vir, rewşa rengê hizirkirina van deman, wê ji aliyekî ve wê, weke renekî hizirkirinê ê bi rewşa hiş re bê. Wê di wê çerçoveyê de wê, xwediyê renekî bê. Ev reng jî wê, di xwe de wê xwediyê têgîn afirandina tiştên xwe yên bi hiş re bê. Li vir, afirandina hişmendî, wê hertimî wê li vir wê di temen de wê weyn û rolek dîyarker wê bileyizê.

Aqil, dema ku ew di nava xwe de ew bidest hizirkirinê dike, wê di xwe de wê bi şêwayekî ku 'wê, her tişt kirina wê bi derfet bê' wê li wê bihizirê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê reng û wateyekê bê. Mînaq, avahîyekê û ankû latekî pîrr mazin ku mirovek wê nikaribê ti carî wê rakê û ankû ji cih bi labitênê, wê mirov wê dihizirkirina xwe de wê li wê bihizirê ku ew weke ew dikarê wê hilde, bi labitênê û ji cih rakê. Di vê çerçoveyê de wê di renekî de wê bidest hizirkirinê wê bike. Ev rengê hizirkirinê, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê di hizirkirinê de wê bi derfet bê. Xosletên rengê hizirkirinê û ankû yên hûrgilîyên wê yên navxweyî wê, di xwe de wê weke xwe wê hebin. Lê dema ku rewş hat rewşa rewşên fizîkî û destûrên fizîkî, wê hingî wê rewşek din a li jîyanê a bi hebûnê re wê bikeve dewrê de. Destûrên destûrî, wê di nava hiş de wê, weke destûrên hiş û ankû aqil wê xwe bidina dîyarkirin. Mejî û ankû aqil, wê wan destûran di nava xwe de wê bi şêwayekê bi rengê hizirkirina xwe re wê weke ku wê wan kifş bike. Wê li ser wan re wê bihizirê. Her wusa, li vir, rewşa ceribandina bi rewşên fizîkî, wê reng û têgîna destûrên fizîkî wê di çerçoveyek hebûnî de wê bide rûnandin. Mînaq, çawa dibê ku mirov bi aqil dihizirê ku mirov dikar hezar kiloyî bi carekê û bê ku ew xwe biwastênê ji ardê rakê? Lê çima wê, di ceribandîna de wê, nikaribê bike? Li vir, destûrên kişînaardê wê weke ku wê serdest bin. Lê di aslê xwe de wê bi destpêka hizirkirinê re wê aqil bi rengê hizirkirina xwe re wê, weke ku em di farqê de bin û ne di farqê de bin, wê ew di xwe de wê weke kirdeyekê wê ew wê kifş bike. Li vir, ya ku wê êdî wê bimênê ku ew were bihişkirin. Aqil, wê bi destûrên xwe re wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek têgînî a fizîkî bê.

Di rewşa têgînî a fizîkî de mirov, wê tiştê ku wê dibînê, wê weke xwe wê kifş bike. Her wusa, di serdemên anamîsmê û totemîsmê de mirov li hêkel û peykelên ku wan çêkirina, ku mirov li wan dinerê, mirov ya ku wê kifş dike, wê hewl bê dayîn ku ew weke hevdû were çêkirin. Yanî, ya ku ew heya ku ew bi aqil dihê çêkirin ku ew jî weke wê bê. Di çêkkirina hêkelê jinekê, mêrekî, sawalakê û hwd de wê, ew rewş wê bi wê rengê û de wê xwe bide dîyarkirin de. Li vir, Aqilê afsûnî, wê ew bê ku wê aqil di çerçoveya destûrên rewşa fizîkî û aqil bi hevdû re ku ew bi xwe re wan xwe li wan serdest bike û wan bike temenê şîroveya xwe de bê. Wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê renekî têgînî bê.

Em di serdemên piştî serdemên anamîsmê û totemîsmê de wê rastî serdemên aqilî ên demên mîtolojîkî (*) wê werê. Di aslê xwe de wê, ev dem, wê di şêwayekê de wê rengê

(*)Mitoloji wê weke hem navê demeka aqil a berî demên felsefeyê bê û hem jî wê, weke navê renekê hizirkirinê ê ku ew bi xiyalî û çirokî hatî û pêşketî bê. Serdemên şariştaniyê ên berî demên felsefeyê wê weke demên bi aqilê mitolojîkî jî pêşdikevin jî bin.

têgîna afsûnê wê bi şêwayekî aqilî wê xwe bide nişandin. Her wusa, wê aqil wê bi têgîna afsûnê re wê bi xwe re wê ew wê denezênê ku ew dikarê her tiştî bike û bafirênê. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê.

Mirov, weke ku çawa wê di xiyalkirina xwe de wê bihizirê û xiyal bike û wê di wê hizirkirina bi xiyalî de wê her tişt di kirin û pêkhatinê û ankû pêkhanînê de wê biderfet bê, wê di vê çerçoveyê de wê têgîna afsûnê wê xwediyê renegekî bê. Mirov, dema ku di xewnê de dirazihê, wê di xwe de wê xwe di rewşek ku ew dikarê her tiştî bike de wê biderfet wê bibinê. Wê di wê rewşê de bê ku ew dikarê bi ser hertiştî ve were wê xwe bide nişandin. Ev rewş hemû wê renegekî têgînî ê afsûniyê wê bi xwe re wê bidina diyarkirin.

Di rewşa fahmkirina têgîna afsûniyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, mereq, xwestek, mêyl û hwd, wê di çerçoveya têgîna afsûnê de wê xwediyê rengna kifşkar bin. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna afsûnê wê li ser van xosletan re wê berê wê hertimî li ya ku mirov, ew ne kirîya û ne ceribandîya lê ku mirov di farq û hişê wê de ya, ya ku mirov li wê ne serwaxta û ew ji aliyê me ve nayê zanîn û ku mirov dixwezê ku wê bizanibê û lê serxwaxt bibê û hwd, wê li wê bê.

Têgîna afsûnê, wê bi demê re wê, weke renegekî hizirkirinê nerîna li jîyanê, wê xwe bide serdestkirin û diyarkirin. Wê di serî de wê ev têgîn, wê weke têgîneka ku ew encama hişê aqilê me ya, wê di çerçoveya wê hişê aqilê me de wê bixwezê ku ew her tiştê wê biderfetî wê bike. Têgîna aqil, hinekî jî wê dema ku ew jîyan kifş dike bi xosletên wê re li ser tişt û hebûnan re wê, ew jî wê kifş bike ku wê gelek tişt wê ji hêza mirov a kirinê wê derbas bibin. Minaq, mirovek, nikarê bifirê lê ew firinê tefkîr dike. Ew nikarê li ser avê re bimeşê, lê ew li ser avê re meşinê tefkîr dikê. Ew nikarê giranîyeka mazin weke latekî mazin ji cih rakê, wê tefkîr bike ku ew karibê wê rakê. Wê li cihekî bê û wê bixwezê ku ew li deverek din bê. Di wê dema ku ew dixwezê ku ew li wê devera din bê. Wê wusa hizir bike ku ew bêî ku ew qaramên xwe bide berxwe û rabê ser xwe û herê û dema ku ew bêjê ku 'ez li wê devera din im' ku ew li wir xwe bibinê. Di aslê xwe de em li vir, vê jî li ser vê têgînê re wê kifş dikin ku wê têgîna gotina a bi hişmendî ku aqilê mirov wan weke kirdeyna bûjenîkî di xwe de şenber dike, wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve wê temene renegekî bi vê rengê hizirkirinê jî wê ji aliyê xwe ve wê bafirênin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka bi hişmendî wê xwe bide diyarkirin bê. Her wusa, wê ji aliyekî ve jî wê hertimî wê bi ya ku ew ji hêza kirinê derbas dibê, wê mêyl û berê wê bi wê ve bê. Wê li ser wê re wê bihizirê. Her wusa, ya ku mirov wê nikarê bike, wê çawa wê ew were kirin û mirov çawa wê karibê wê bike, wê li ser wê re wê bihizirê. Bi gotineka din, wê hertimî wê têgîna afsûnê, wê weke têgîneka ku wê berê wê li ya ku ew nayê zanîn bê. Wê ew hewl bide ku wê fahm bike û şirove bike. Yanî jî wê, salix bike. Di vê çerçoveyê de wê, weke têgîneka çalak, bi tevger û kirinî bê.

Têgîna afsûnê, wê di aslê xwe de wê, di temenê hemû têgînên bi bawerîyî ên ku wê piştre wê pêşbikevin de jî bê. Her çend ku piştî ku wê olên yek-xwûdayî wê pêşbikevin û wê biazilê felsefeyê û hwd, wê xwe bişoyin û ji nû ve wê bafirênin û rakin li ser pîyan jî lê wê, wê di çerçoveya têgîna wê ya hîmî de wê ew hebê. Ew têgîna afsûnî a ji nebûnê afirandinê, wê her wusa wê weke têgîneka ku wê di vê çerçoveyê de wê di temenê olan de jî bê. Lê em li vir, vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têgîna

afsûnê, wê weke têgîneka ku wê çawa xwe bigihênê rastiyê, wê di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê di legerînê de bê. Wê li têgînekê wê nealiqê. Wê xwe bi yekê re wê bi sînor nekê. Wê di rastîya xwe de wê, hertimî wê weke rastîyeka ku ew hem gûmanê jî û hem ne gûmankirinê û hwd di çerçoveya hin rewşna de wê di temenê xwe de wê ji wan sûd bigirê bê. Di rewşên weke gûman kirinê de wê di çerçoveya rengê ku ew hertimî ji hizrên nû ve vekirî bê. Wê li ser kifşkirinê nû ve bê. Li ser yên ne bi gûmankirinê re jî wê di çerçoveya têgînên bawerkinê û hwd, wê xwe bide dîyarkirin.

Rewşa têgînên olî ku mirov li wan dihizirê, her wusa divê ku mirov vê yekê wê, bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê têgîna afsûnê wê di şêwayekî de wê di wê de wê werênê li ser ziman. Şîrove, tefsîr û tefkîrkirinên ku ew dihên kirin, wê bi şêwayekê ew di wan de wê hebê. Minaq, têgîna xwûdê, mirov li berçav bigirê. Wê li ser wê re wê were hanîn li ser ziman ku "ew dibêjê bibe! û tişt jî wê bibê." Di vê çerçoveyê de wê ev têgîn, wê weke têgîneka ku wê ji wê têgîna afsûnê wê were derhanîn bê. Di rewşa têgîna afsûnê de wê dema ku mirov dihizirê û dixwezê ku ew tiştta ku mirov dixwezê ku ew bibê, wê ew bê xwestin ku ew bibê û wê ew jî wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê regekî hizirkirinê wê hebê. Pêvajoyên serdemên anamismê û totemismê (*), di wan de wê hinek têgîn wê di mejî de wê biafirin. Wê bi wê re wê mirov wê li xwezayê binerê, li hewirdorê binerê û li her tiştta ku ew bi hebûna xwe re ew heya wê li wê binerê wê ew hebê. Wê di derbarê wê de wê bê xwedîyê têgînê. Lê ew çawa bûya û ji kûve hafîya û çawa bûya û ber çî bûya û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pirsan wê li wan bikê. Wê di vê çerçoveyê de ew pirsên ku mirov wan di mejiyê xwe de wan dike, wê li bersiva wan bigerihê. Pirs, wê weke têgîneka lêpîrsîner bê. Wê dema ku ew di mejî de bû, wê bersiva wê, weke temen û sedema lêgerînê bê. Di vê çerçoveyê de wê ew xwe bide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têgîna afsûnê wê di vê çerçoveyê de wê weke regekî têgînî ku wê destûrênên rewşeka fizikî û ya hiş wê bi hevdû re wê di regekî wê bi wan re wê baqil bihizirê, baqil wê biafirênê û wê baqil wê bibînê.

Bêgûman, rewşa salixkirina tiştê bi hebûna wê re di nava aqil de wê, di vê çerçoveyê de wê aliyekî wê yê rêgezî ê giring ku mirov wê li berçav bigirê wê hebê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werênê li ser ziman ku wê, çawa wê were lêgerîn û wê were lêpîrsîn, wê di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring bê. Em li vir, divê ku wê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di çerçoveya têgîna aqil de wê ev rewş wê xwedîyê rewşek giring a ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê bihizirê bê.

Di nava rûpelên dîrokê de wê, rewşa têgînîyê a bi aqil, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek giring bê. Di nava rewşa têgînê de wê, her wusa, wê weke rewşeka ku ew ne hatî bihişkirin, wê têgîna kişînaardê û hikmê û ne bihikimkirina wê, wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, bi şêwayekê, bi têgînî wê weke ku mirov wê derkeve dervî wê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werênê li ser ziman.

Afsûn, di aslê xwe de wê di vê çerçoveyê de wê, di nava xwe de wê weke têgîneka

(*)Anamism û totemism wê weke demên ku ew nûka di wan de aqil pêşdikeve û mirov bi baweriyên bi xwezayê re diji bê. Wê di wan deman de wê, wê tiştta ku ew li jîyanê dibin û mirov wateyê nadê wan wê bina sedema bandûra li ser mirov. Wê mirov wê li sedemên wan wê bigerihê. Minaq baran barinê wê bi heman rengê wê pêşwazî bikê. Her rewşên xwezayê wê, di wê demê de wê temenê bandûra li mirov bin. Wê di wê demê de wê bi wê bawerîya wê bûyîna xwezayî jîyankirin wê, weke rewşa pêşketina totem û anamismî bê.

aqilî wê bi destûr, zagon û rêgezên aqil re wê di rewşeka ku ew di farqê de bê û ankû ne di farqê de bê, wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê di serî de wê werênê li ser ziman. Di rewşa têgîna afsûnê de wê aqil, wê weke qada jîyanê, kirin, tevger û danîşandina xûyan û hwd bê. Wê qada hemû kirin û tevgerê û her wusa hemû tiştê bê. Di vê çerçoveyê de wê her tişt, wê weke di çerçoveyeka ew bi aqilê me hebê. Ev di aslê xwe de wê aliyekî têgîna afsûnê bê. Aliyê din jî wê li ser têgîna sehêt(kontrol)kirinê re bê. Şêwayê sehête, mirov dikarê wê jî bi vê rengê wê werênê li ser ziman ku wê, mirov bi aqilê xwe wê bide kifşkirin. Her wusa, wê li ser hişa aqilê tiştê û ankû hişê hişmendîya tiştê re wê di rengê kifşkirinê de afirandina hişê re wê xwe werênê li ser ziman. Ew tişt ku ew bi hebûna wê re wê ew weke mijare dîtin, afirandin û heyîn û nebûnê bê, wê ew jî wê weke têgînekê wê hebê. Lê ew tişt, çendî ku ew bi aqil hebê jî wê, di wê de wê bi destûr, zagon û rêgezên rewşa fizikî û ya aqilî wê bi hevdû re wê di çerçoveya wê têgîna hebûnê de wê hebê. Her wusa rewşa aqil, wê di derbarê wê de jî wê weke hişekî wê zanîna wê wê di ast û rengê duyem de wê bi afirê. Û ankû wê bê pêşxistin. Ew jî wê, weke zanîna zanînê, aqile aqilê, hişmendîya hişê û hwd bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di nava hişê duyem de wê hebûna tiştê weke aqilekî wê bi destûra xwe ya heyînê re wê ew hebê. Yanî bi gotineka din, wê li vir, di nava rewşa aqil û hiş de wê, weke rewşeka çûnûhatinê a bi zanînê bê. Aqil û hiş, weke ku em li vir wê bikardihênin, wê weke du gotinên ku em di wan wateyên cuda ên li ser hevdû û ankû jî hevdû de wan dihênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê weke du têgînekên wê ew werina hanîn li ser ziman.

Di rewşa fahmkirina tiştê de wê, li vir wê tişt wê weke hebûna wê, wê ew were dîtin, salixkirin û naskirin bi xoslet û teybetiyên wê re. Lê li vir, wê weke dîmenekî duyem ê wê rewşa tiştê bi hebûnê, wê dema ku mirov destlê dide ew weke tiştêkê hişk, nerm, cemîdî, germ û hwd wê hebê. Lê em li vir, di çerçoveya aqil û jî aliyê ve de wê, lê dinerin û wê dikin ku wê fahm bikin û wê werênina hanîn li ser zima.

Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê jî wê werênê li ser ziman ku wê, ev rewş wê çawa wê were hanîn li ser ziman? Wê ew, wê weke rewşek ku em wê çendî ku wê bi destûr, zagon û rêgezên rewşa fizikî wê weke wê dibîni jî wê di çerçoveya destûr, zagon û rêgezên aqil û hiş de wê nêzîkatîyê bi heman rengê wê li wê dikin. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku em, vê yekê bi wê re wê pêşxistin li ser destûr, zagon û rêgezên aqil re ku wê ew tişt di pêvajoya xwe ku ew bijî û wînda bibê û ankû jî holê herê, wê bi awayekî di çerçoveya hişmendîya aqilê xwe û ankû yê wê re wê kifş dikin. Yanî, li vir, vîneka aqilî em wê didina nîşandin li ser wê rewşê re. Em li vir, divê ku wê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têgîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ku wê di rewşa nerîn, dîtin û fahmkirina bi aqil de wê, ew hebê. Li vir, di vê çerçoveyê de tişt çawa bûya? Ew jî wê weke aliyekî din ê giring bê ku mirov wê hilde li dest. Em li vir, vê têgînê bi rewşa afsûnê re wê werênina li ser ziman ku mirov, dema ku hizirî ku tiştêk heya, wê ew hebê? Li gorî têgîna bi hizirkirina aqil a afsûnê wê bersiva wê rewşê wê herê bê. Lê li vir, ew tişt, weke tiştêkî hebûnê a dervî me û aqilê me heya. Di vê çerçoveyê de em, vê yekê nûha dizanin.

Li vir, divê ku mirov wê jî wê bi têgîna tiştê re wê hilde li dest ku wê têgîna tiştê, wê weke têgîneka ku wê pîr zêde botîkirin. Di vê çerçoveyê de wê têgîna tiştê wê bi hebûna wê ya ku ew dihê dîtin re wê bi tişt, weke aliyê hebûna wê ya bi rewşa fizikî û ya aliyê wê yê bi rewşa wê ya hişmendîya wê re wê hebê. Herdû alî jî wê bi destûr,

zagon û rêgezên xwe re wê xwediyê xoslet û teybetiyên nêzikatiyê ên ji hevdû cuda bin. Em dema ku tişteke wê bi rewşa wê ya fizîkî re li ser destûr, zagon û rêgezên wê re wê kifş dikin. Ji aliyê din ve jî wê ji aliyê rewşa wê ya hişmendî ve wê li ser wê dîtbarîya rewşa tiştê re wê bi destûr, zagon û rêgezên wê yê hişmendî re wê kifş dikin. Di çerçoveyek mantiqî de wê li rewşa fizîkî wê di çerçoveya destûr, zagon û rêgezên wê yê fizîkî de wê bi têgînî wê nêzikatî wê were lê kirin. Lê di çerçoveya têgîna hişmendî a afsûnî de ber ku ew weke têgîneka ku ew dervî aqil û hişê me nayê dîtin, wê êdî wê di vê çerçoveya wê têgînîya hişî û ankû aqilî de wê nêzikatî wê li wê were lê kirin.

Di rewşa fahmkirinê de wê, li vir wê fahmkirinê re wê weke rewşeka ku ew *ji xwe re dibê* wê rewşa têgîna afsûnê a hişmendî wê were ser ziman. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têgîna fahmkirinê wê weke rewşek affîner a hebûnî jî bê. Di rewşa çîrok, vegotin û çîvanokên kurdan de wê, minaq weke ku mirov di çîrokên keçelok, şahmaran û hwd de mirov, dibînê ku wê afsûnkirin wê pirr zêde wê li pêş bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di şêwayekî de wê bi mantiqî wê her tişt di kirin, pêşxistin û afirandina wê de wê, bi derfet bê. Wê sînor ji ti tiştî re wê nebê. Keçelok, di çîrokên xwe de wê di mejiyê her kurdî de wê ew wê têgînê wê bide afirandin ku ew, bi afsûn tevdiqerihê. Ew li kûderê xwe dihizirê û ankû ew dixwezê ku ew xwe bibînê, wê xwe li wir wê bibînê. Di vê çerçoveyê de wê rewşek têgînî wê hebê. Her tişt, wê bi hizirkirinê re wê bi derfet bê. Ya ku wê bi sînor bê, wê ne hizirkirin bê. Wê rengê hizirkirinan bê. Ankû weke ku em di roja me de wê dikarin wê werênina li ser ziman wê têgînên birdozîkî û hwd bê. Têgîna afsûnê, wê xwediyê rewş û rengê têgînî ê jîyanî bê. Di jîyanê de wê her tişt wê hebê û wê bigûharê. Wê demekê wê hebê û wê demek piştre wê weke ku ew nebê. Di vê rewşa van bûyîn û rewşên tiştî ên hebûnî û fizîkî de wê ev rewş wê xwe di jîyanê de wê bide dîyarkirin. Rengê hizirkirina bi afsûnî, wê hinekî jî wê, van rewşên jîyanî wê li berçav bigirê û wan çawa ku wê weke xwe li wan bihizirê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rengê hizirkirinê bê. Têgîna afsûnê, wê rewşa jîyanê, wê weke têgîna rengê xwestekê wê ku ew di hîm de wê li rengê jîyanê bihizirê. Her wusa, çerçoveyek têgînî a weke ya dil, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bi wê re wê werênê li ser ziman.

Di nava civake de têgîna afsûnê û bandûra wê

Em ku î ro jî li nava civake kurd dinerin, em nişanakên bandûr û pêşketina afsûnê û mejûya wê dibînin. Afsûn, wê weke rewşek têgînî a ku wê, di çerçoveya têgîna sedemê û encamê de jî wê xwediyê wê rengê pêşketin û hanîna wê ya li ser ziman. Minaq, di rewşa vegotina gelek nexweşîyan û hwd de wê, sedem wê weke b bandûrbûna ji afsûnê, û ankû weke ku wê di nava xalkê de wê were gotin li kurdistanê ku 'wê, bi afsûnê hatibê girêdan.' Di vê çerçoveyê de wê di rewşek vegotinî de wê werênina hanîn li ser ziman.

Bêgûman, bi mejûya civakê û dîroka mirovatiyê re mirov, dikarê rewşa pêşveçûnên bi dîroka afsûnê re wê heta serdemên destpêkê ên mirovatiyê bibin. Hê di demên destpêkê ên civakê de ku wê li hêtên şikeftan wê ew rûrêsmên ku ew bi xîzkirinê ew hatina çêkirin ên weke yê sawalan û hwd, wê di vê çerçoveyê de jî wê hin bi hin wê temenê têgîna bi bawerî ên ku wê pêşbikevin bin. Her wusa, wê piştre ev rewş, wê bi têgînên weke anamismê û totemismê re wê hebûn xwe wê bi pêşketinî wê bide

domandin. Rewşa bi pêşketina anamismê û totemismê re wê, ev rewş, wê weke rewşna bi bandûr ên bi bawerîyî jî wê pêşbikevin bin.

Her wusa, em vê yek, di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê piştire di serdemên mîtolojîkî û hwd de wê, ev rewş û rengê têngîniya afsûnî û hwd, wê asta xwe ya herî bilind a bi pêşketina xwe re wê bijî. Serdemên mîtolojiyê, wê di vê çerçoveyê de wê weke serdemna ku mirov wan dikarê bi teybetî wê di vê çerçoveyê de lê bikolê û fahm bike bê. Di aslê xwe de wê serdema mîtolojiyê, wê weke serdemek ku wê têngînen afsûnî, wê çawa bi aqil û bi rengê aqil di jîyanê de wê pêşbikevin û serdest bibin û bibina rengê pergali, sazûmanî û hwd ê civakî jî mirov, wê di vê çerçoveyê wê bi awayekî vekirî û baş wê bibîne.

Serdemên mîtolojîkî, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rengê pêşketinî bin. Di nava civakê de wê civak û endamên civakê, wê ew bi wê têngîne re wê xwe bidina jîyankirin. Her wusa afsûn, wê hinekî jî wê ji pêwîstîya xwestina fahmkirinê wê pêşbikeve. D aslê xwe de wê, di temenê wê de wê ev hebê. Her wusa, wê di temenê wê de wê nepenîya bi nezani jî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê ya ku ew nayê zanîn û mirov nikari wê, şiroveyek baş a bi vegotinî jî wê re werênê û ankû asta mirov a zanîne têrê nakê ku mirov wê fahm bike, wê di vê çerçoveyê de wê rengê hizirkirinê ê biafsûnê re wê bi têngîni wê bikeve dewrê de. Di nava jîyane civakê de wê têngîna afsûnê, wê zêdetirî wê pêşbikeve. Ber ku wê têngîna afsûnê, wê di serî de wê weke têngîneka civakî û civatî bê. Her wusa, wê hemû temen, hîm û bingeh, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastiyekê bê ku mirov wê hilde li dest bê.

Di rewşa fahmkirina wê de wê, di rastiyê de wê rewşa civakê, wê were dîtîn. Weke aqilekî civakî têngîna afsûnê, wê di nava jîyane civakê de wê bike ku ew ji wê re wê, vegotinê weke çareserîyê ji wê re ew werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov di serî de wê werênê li ser ziman. Têngîna afsûnê, wê weke têngîneka civakî, wê di vê çerçoveyê de wê, di serî de wê di temenê pêşketina wê de wê, pirsgirêkên civakî û hewldana lêgerîna li çareserîyê bo wan, wê di wê de wê hebê. Dema ku mirov di rewşa nexweşiyekê de minaq wê, werênê li ser ziman, ya ku mirov wê li vir wê bibîne wê ew bê ku wê hewl bide ku wê nexweşiyê baş bike. Di serdemên berê de mirov, biqasî ku wê ji pêşveçûnên nava civake kurd wê fahm bike, wê berê, wê boraq û ankû korban wê bidan. Wê di berdêla wê de jî wê, ji pirsgirêka xwe ya weke nexweşiyê û ankû tiştêkî din re wê çareserî wê bixwestan. Her wusa wê çî weke pirsgirêkê wê rûdaba? Ew ji wan re wê li çareserîyê wê bigerîyan. Minaq, mijare parastinê jî wê yek ji wan pirsgirêka wan. Ji hêrîşên ku wê li jîyane mirovan bibin ku ew ji aliyê mirovan ve bê û ankû ji aliyê zindiyekî din ve bê û hwd, wê çawa wê pêşîya wê hêrîşê wê were girtin, wê di wê çerçoveyê de wê bi têngîna afsûnê re wê were hizirkirin. Mirovê ku ew xwediyê wê têngîna afsûnê û ankû kirina wê ya, wê xwe weke mirovê bi 'bihêz' û 'bi qûdret' wê bidîta. Wê di nava civakê de jî wê, pîr zêde wê hûrmet wê biheta dayîn ji wan re. Heta ku wê, ti kesekî li hemberî wan gotin negotiba û serî ne rakiriba. Biqasî ku wan, mirovên ku wê rêz û hûmetê bidina wan, wê wilqas jî wê ji wan bitirsîyan. Yê ku ew rêz û hûrmet didan wan jî wê, di aliyekî mejiyê xwe de wê, tirsek wê bi wan re jî wê heba.

Em vê yekê jî di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê rewşa afsûnê, wê weke rewşeka ku mirov wê weke pêvajoyek pêşketina aqil û ankû rengê têngîni ê

hişmendî wê hilde li dest bê. Di vê çerçoveyê de wê di nava wê aqilê de wê, mirovan wê ji pirsgirêkên xwe re wê çareserî wê biditan.

Li kurdistanê û ankû mesopotamiya, wê têgîna afsûnkarîyê wê bi gelek şewayên wê re wê, were bi rêxistinkirin. Her wusa, stêrzanî, falvanî û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bi gelek lingên wê yên din re wê pêşbikeve. Di serdemên berê ên civake kurd de wê weke ku mirov di dema mîtannî û medîya û berê wê de jî de wê bibînê, wê mirovên rêmildar û ankû ên şêwirmend ku wan dikarî şîroveyan ji pirsgirêkên xalkê re wan bihanîya ba, wê heba. Minaq, wê hertimî wê dema ku mirovekî xewnek dît, wê ew mirov wê çûba û wê xewna wan wê ji wan re wê bihanîya li ser ziman. Wê wan jî wê li xewna wî û ankû wê mirovê bihisanda û wê piştê wê, *'peyame wê di wê xewnê de'* ku ew çî ya, wê bihanîyan li ser ziman. Li gorî kurdên berê, wê xewn, wê weke rêyeka ku mirov wê karibê xwe bigihênê ahangîyê di derbar baxt û pêvajoyê de. Mirov, wê di demên pêş de wê çî were serê mirov wê, nişanakên wê, di xewnê de wê hebin. Wan wusa tefsîr dikir.

Bi wê re jî wê rewşa xewnê, wê weke rewşek teybet a zanînî wê hildaban li dest. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşa xewnê wê di çerçoveya fahmkirina wê de wê, zanîneka mazin wê bihata pêşxistin. Di xewnê de mirov çî û çawa dîtîya, wê ew biheta bi wate kirin û şîrovekirin. Bi wê re wê, li ser wê re wê peyame di xewnê de wê biheta derxistin li holê. Têgîna peyame xewnê, wê di vê çerçoveyê de wê bi sedsalan wê civakê, wê ji navaroja wê ve wê bide dîyarkirin. Keyê medî Qiyakser(*), wê li ser xewnekê, wê ku ew dibînê û ew diçê ji rêmildaran re ew dihênê li ser ziman û rêmildar jî ew şîrove dikin û dibêjin ku wê, kûrekî keça wî çê bibê û ew ku wê dawîyê li desthilatdarîya tûxmê wî werênê, li ser wê, wê biryar kuştina kûrê keça xwe ya ku ew hê ne hatî dûnyayê wê bide.

Bi wê re jî wê, di vê çerçoveyê de wê rewşa rêmildarîyê, wê weke rewşeka ku ew hertimî wê bi karên bi vî rengî ên weke şîrovekirina xewnan û xwandina ji xatên dest û laşê mirov, pêşaroja mirov ba. Wan, di vê çerçoveyê de wê xatên laşê mirov jî wê weke her tiştê ku ew di jîyanê de ew heya, wê bi wate bikiran. Wê di jîyanê de her tiştê ku ew heya ku ew zindî bê û nezindî bê, wê ew were bi wate kirin. Wê dema ku ew hat bi dîtîna di xewnê de wê, hingî ew tişt jî wê, ji wê wateya wê xewnê weke *'peyame'* wê, wê biheta derxistin. Têgîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê bi awayekî sazûmanî di çerçoveya jîyane mirov û civakê de wê pêşketina wê bibê. Têgîna afsûnê, em dikarin vê jî bi wê re di dewama mijarê de wê werênina li ser ziman ku wê, di rewşekê de wê rengê jîyane mirov wê bi awa û reng bikira. Wê her wusa, wê tiştên di jîyanê de wê ew bi watekirin û botîkirina wan re wê, ew bihetan têgihîştin.

Î ro ku em li nava civake kurd dinerin, em wê hê jî dibinin ku wê bawerîyek wê bi rewşa giyanên xirab û yên baş, weke demên berê wê hebê. Di vê çerçoveyê de şevreşk, pîrabok, adû û hwd, wê weke rengna têgînî ên giyanî ku ew wê karibin tiştên xirab ew bi mirov bikin bin. Di vê çerçoveyê de wê çawa wê mirov, wê xwe ji wan biparasta, wê

(*Keyê medî qiyakser wê, dema wî li dora 580 û wan berî zayina îsa bê. Wê piştî wî kurê wî *'astîyaq'* wê li ser taxtê med wê rûnihê. Serdema Qiyakser wê weke serdemeka zêrin ku wê di wê de wê serdestî û aramî wê li welêt wê serdest bê. Wê hemû welêt kurdan wê di bin serokatîya xwe wê bide berhevkin. Bi kîrînen xwe yên weke şerê wî yê di dema wî de ku wê li keviya çemê *'heyls' ê'* wê bi lidia re wê bibê wê were ser ziman. Piştî wê şerê wê bi çûna heyvê li pêşîya rojê wê hizirbikin ku yazdanên wan li wan hatina xazabê û wê di nava xwe de wê, aşîtyê wê çêbiikin. Weke nişnaka wê jî wê keyê lidia wê keça xwe Aryanis wê bide kurê key Astîyaq. Wê ev weke nişnaka aşîrîya wan ya navxweyî a dayimî wê were dîtîna û ser ziman.

serî li çêkirin û pêşxistina afsûnê û *darêjkên afsûnî* wê bida. Bi devê derîyê xwe ve ku wê çavek li ser ba, kevirê nezerê wê çê bikin û wê qalabênin. Wê dema ku ew nexweş ketin ku ew weke nexweşîyê gîyanî û ankû rûhî bin û an jî kû nexweşîyê fîzyolojîkî bin, wê herin û wê serî afsûnê bixin. Heta roja me, dema ku wê mirovek nexweş bikeve û bo ku ew baş bibê, kirina bergan bo başbûnê û hwd, wê aliyekî wê yê bi vê rengê jî wê hebê. Di aslê xwe de wê, ji aliyê nexweşîyê ve wê ew berg û ankû têgînên afsûnî ku ew dihatin pêşxistin, wê bandûrek wan heba. Ber ku wê bawerî wê di temenê wê de wê derûnî jî wê ji aliyekî ve wê hebê û wê derûnî wê rastarast wê bandûra wê li fîzyolojîya mirov a fîzîkî û zêhnî û hwd wê hebê. Li vir, têkiliyek, di vê çerçoveyê de mirov dikarê li ser wê rewşa bawerkirinê re wê hilde li dest wê li vir wê hebê.

Têgîna afsûnê, wê di temenê wê de wê bawerîya ku wê hemû mirov ku ew mirin wê gîyanên wan wê bijîn û mirov ku wê rêya wê bibînê, wê karibê têkiliyê bi wan re wê dênê û wê bi wan re wê karibê biaxîfê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê têgîna afsûnê wê, xwediyê têgînekê bê.

Di rewşa mirov ku ew çawa tevdiqerihê û gava xwe diavêjê û hwd de wê mirov, wê ew hemû kirinên wî, wê karibin werina kirin weke kirinna afsûnî û ankû ku wê wateya afsûnê ku ew li wan were kirin bê. Bi heman rengî, her tiştê ku ew ne zindîya jî wê, bi heman rengî wê bîafsûnê wê karibê were bi wate kirin. Mînaq, di çerçoveya têgîna gardaniyan û ankû 'tîlsim' an de wê, were dîtin ku wê were bawerkirin ku wê her tişt wê di wê de wê hêzek ku ew ji aliyê mirov ve nayê zanîn a serxwezeyî wê di wê de wê hebê. Bandûra têgîna gardaniyan, wê weke bandûreka ku wê di çerçoveya têgîna afsûnî de wê xwediyê giringîyek afsûnî a mazin bê.

Em ku li nava civake dinerin, em wê dibînin ku wê di rewşên bawerkirinê de wê têgînên afsûnî wê werina hanîn li ser ziman. Bi wê re wê, her rewşên ku ew dihên hanîn li ser ziman, wê di çerçoveyekê de wê weke rewşên ku wê, ew jîyane mirovan didina kifşkirin bin. Heta roja me jî em, di nava civake kurd de wê, dibînin ku wê hinek mirov wê karên wan rast neçin, wê hinek mirovna din wê werina ber wan û wê ji wan re bêjin ku 'win hatina afsûnkirin, Win çî jî bikin û kîjan karê jî bikin, wê karê wan rast neçê. Heta ku win neçin û afsûnê xiraneke, wê karên we rast neçin.' Ev gotin, wê di vê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman ku wê, mirov, hatîya bi afsûn kirin. Di vê çerçoveyê de ew afsûna ku ew li ser wan hatîya çêkirin û weke ku di nava civakê de wê bi wê re wê werê gotin ku 'baxtê we hatîya girêdan', wê heta ku ew afsûn newê xirakirin, wê ew weke ku wê karê wan rast nemeşê. Di vê çerçoveyê de mirov vê jî di dewama mijarê de wê werênê li ser ziman ku wê, mirov wê bi vê derûnîyê û bawerîyê wê tevbigerihê. Wê ew bixwe jî wê bawer bike ku ew baxtî wê hatîya kirin û ew hat ku ew kifşnekê ku kê ew afsûn li ser wî çêkiriya ku ew karên bi rê ve neçin û ew wê xiraneke, wê karên wî bi rêve neçin. Di vê çerçoveyê de wê bi bawerîyekê wê werina hanîn li ser ziman. Ev gotin û ankû têgîna 'girêdana baxtê' wê weke rewşeka ku wê bi afsûnê wê mudahaleyî baxtê mirov wê were kirin bê, wê were hanîn li ser ziman. Yanî, weke ku tê gotin ku 'baxt hatîya nivîsandin ji deme ku mirov bûya ve. Ti tişt nikarê mudahaleyê wê bike. Lê tenê afsûn dikarê mudahaleyî wê bike. Bo vê yekê jî wê, afsûnê wê weke rewşa herî 'xaterek' wê werênina li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê jî wê werênê li ser ziman ku ew têgîna girêdana baxtê, wê, di vê çerçoveyê de wê weke gotineka ku wê di demên bûhûrî ên berê de wê, pîrr zêde wê di nava civake kurd de wê bê bikarhanîn û hanîn li ser ziman bê. Heta ku gelek keçikên

ku ew gihiştina dema zawacê ku ew 'di malê de dimênin' wê ji wan re wê were gotin ku 'win, baxtê we hatîya girtin. Bo ku win, qismetê we vebêbi, divê ku win wê afsûna ku ew li ser we hatî çêkirin, win wê xira bikin.' Bi vê rengê wê bahse wê bê kirin. Afsûn, weke rêya mudahaleya li baxt dihê dîtin. Di vê çerçoveyê de yê xwedî afsûn, ew xwediyê wê hêzê ya ku ew 'her tiştî wê bike' bê. Di vê çerçoveyê de ew dihê hanîn li ser ziman. Di rewşa fahmkirina rastîya afsûnê de wê, bi vê rengê wê gelek minaqên ku em dikarin wan werênina li ser ziman wê hebin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, di nava jîyane civakê de jî wê, çawa wê xwe ji çêkirin û girêdanên afsûnî wê xilas bikin, wê li rêyên wê bigerihin. Di vê çerçoveyê de wê, di nava civakê de wê, sazûmanek têgînî a bawerîyî wê were avakirin. Li ser têgîna afsûnê re mirov dikarê bahse têgîna afsûnzaniyê jî bike. Têgîna afsûnzaniyê, wê weke ku em dikarin wê werênina li ser ziman, wê hemû rewşên afsûnî bi têgîna wan ya civakî û pêşveçûnên civakî dîrok û felsefeya wê re ku ew wê dihilde li dest bê. Li vir, em gotina afsûnzaniyê bo fahmkirina rengê têgîna afsûnê pêş dixin. Bi wê re jî, giring dibînim ku ez xatekê di nava afsûnzaniyê û olzaniyê de dênim. Her wusa, li vir, her çendî ku wê hertimî wê li ser heman hîmê û temenê bin û wê biheman rengê û awayê wê pêşketinekê wê werênina li ser ziman jî lê wê têgîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka kevneşopîkî a di çerçoveya bawerîyên civakî û hwd de wê xwediyê wateyê bê.

Li ser reng û cûreyên afsûnê ên ku ew dihên pêşxistin re mirov ku wê werênê li ser ziman, wê dîroka civakê wê bi hemû aliyên wê ve wê were li ser ziman. Her wusa, wê di gelek rewşan de wê afsûn wê were pêşxistin. Afsûn, weke têgîneka ku ew çawa dikarê were dîrkirin ji mirov. Di serî de wê di nava afsûnê de wê serî li zanînê wê were xistin. Mirovên zane, wê weke mirovên ku ew dikarin rastîya wê werênina li ser ziman. Di gelek rewşên afsûnî de weke ku em di nava civake kurd de dibînin û ew dihênina li ser ziman ku '*mirov, rastîya afsûnê a ku ew hatî pêşxistin ku ew zanî, wê bêhikim bibê.*' Di vê rengê de wê, têkiliya rewşa zanînê ya afsûnê wê were danîn. Di vê çerçoveyê de wê, di nava civakê de wê giringî dayîna li fêrbûnê di wan warên afsûnî de wê bi demê re wê zêdetirî wê pêşbikeve.

Em li vir, hinekî jî têkiliya xewn, fal û afsûnê a bi hevdû re wê hildina li dest. Ev jî wê weke mijarna ku wê bi teybetî wê çendî ku wê her yekê wê bi serê xwe wê xwediyê rewş wateyna bin, wê bi hevdû ve girêdayî wê di ahengekê de wê xwediyê wateyê bin.

Di rewşa fahmkirina afsûnê de wê ev tişt wê pîr giring bê ku em wê li vir wê hildina li dest. Her wusa wê çawa wê tişt wê li wê were hizirîn. Di vê çerçoveyê de wê, tişt, wê jî rengê ku ew heya, wê bi rengekî din jî wê were hizirkirin. Bi gotineka din, wê darêjk, wê hişmendîya wê rewşa adilandinê bê.

Mirov ku ew di razihê wê xewnê bibînê. Xewn, di aslê xwe de wê darêjkek teybet a ku mirov wê hilde li dest bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têgîna xewnê, wê di çerçoveya wê rewşa wê ya darêjkî de wê hebe. Mejî, wê di xwe de wê ew wê rewşê wê bide afirandin. Lê nepenîya xewnê wê hertimî wê bale mirovan û hişê mirovan wê hilde li ser xwe. Mirov, wê bixwezê ku ew rastîya xewnê wê fahm bike. Xewn bûyîna wê, wê hertimî wê bi hêzên serxwezayî ve wê were girêdan. Wê weke nişanaka tiştên ku wê di demên jîyane mirov ên pêşde ku wê were serê mirov wê were hildan li dest û wê were şirovekirin.

Têgîna xewnê, wê ji gelek aliyên ve wê di nava civake kurd de wê, li ser wê were hizirkirin. Di serdemên berê de wê, were dîtin ku wê 'rêmildar'ên ku ew karê wan

şîrovekirina xewnan bê, wê derkevina li holê. Ew, wê bi zanîna xwe re wê, xewnê wê şîrove bikin. Wê rastîya wê û 'peyame wê', wê bikin ku wê fahm bikin û werênina li ser ziman. Mîrov, ber çi xewnê dibînê? Wê ev pîrs, wê weke pîrseka ku wê hertimî wê were pîrsîn bê. Di vê çerçoveyê de nepenîya dîtîna xewnê, wê hertimî wê xwe biparêzê. Heta roja me jî, wê ew nepenîya wê, wê bi tememî, ne hatibê fahmkirin. Wê gelek aliyên wê yên ku ew hê ne hatîna fahmkirin wê hebin. Xewn, wê hertimî wê weke xewnekê wê bi mirov re wê bimênê.

Dîtîna xewnê, wê di çerçoveya têgîna weke 'ber çi ew xewn hatîya dîtîna û ankû ber çi bi wê awayê, şeklê û rengê ew xewn hatîya dîtîna, wê li ser wê were hizirkirin. Ya ku wê, serî wê li ser wê were hizirkirin. Her tiştêk wê sedemek wê hebê. Ti tişt wê ne belesebeb bê. Di vê çerçoveyê de wê li wê were hizirkirin. Xewn, wê weke têgînek, rastîyek ku mirov jîyankirî û hwd û bi wê re ku hizirek û ankû hişek ku ew nûqûtbê li dil, wê li ser wê re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Ew nûqûtbîna li dil, wê ew weke rewşeka ku wê di nava xalkê de wê li ser wê were hizirkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê xewn, wê ew were hildan li dest. Rewşa xewnê, peyame ku ew jî wê hat girtin, wê weke peyamek ku ew di xwe de dihênê li ser ziman ku 'wê yan wê tiştêk wê bibê û yan jî tiştêk ku ew bûya wê li ser wê re wê tiştêk bibê.' Têgîna wê tiştêk wê bibê' wê, weke felsefeya wê peyame wê xewnê a ku wê jî wê were girtin bê. Dema ku em bahse rewşa fahmkirina têgîna 'tiştê ku wê bibê' wê bibê bikin û wê fahm bikin, wê wê li vir, di keviya mejiyê me de wê tiştêkî din jî wê xwe wê bide diyarkirin. Têgîna 'tiştê ku wê bibê!', wê weke têgîneka ku wê bike ku ew jî pêşarojê agahiyê bide bê. Yan jî wê, di wê de wê agahiyek wê jî pêşarojê wê di wê de wê hebê bê. Dema ku ew tiştê ku ew wê bibê' ku ew hat fahmkirin wê ew agahî wê were girtin û wê bê têgihîştin ku wê çi bibê di demên mirov ên pêş de. Wê di vê çerçoveyê de wê li ser wê re wê were hizirkirin. Peyame ku wê çi bibê, wê weke peyamek ku wê agahiyê wê bide me bê. Di nava kurdan de wê bi gotina 'peyamnêr' û ankû 'pêxember' wê were hanîn li ser ziman. Ev herdu gotin jî wê jî kurdî bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna ku wê çi bibê di pêşarojê de wê, di vê çerçoveyê de wê di temenê wê peyamê de bê. Têgîna lêgerînê jî wê ew bê ku wê çawa mirov di derbarê pêşarojê û ankû rewşên ku wê biqawimin de wê karibê bibê xwediye agahiyê. Bi wê mirov, wê hertimî wê heya xwe bide li ser wê. Bo vê yekê, wê biqasî bike ku wê jî peyamên xewnê ew wê agahiyê jî pêşarojê bigrê, wê bi heman rengê wê jî vekirina falan û hwd jî wê, bike ku ew wê agahiyê wê bidest bixê. Rewşa *vekirina falê* wê, weke rewşeka ku wê bi hezaran salan wê li kurdistanê û ankû mesopotamiya wê hebê. Heta ku wê ev rewş, wê weke rewşek têgînî wê di nava baweriyên wan de jî bê.

Di rewşa gihiştina rastîya wê peyame pêşarojê de wê xewn û ankû fal, wê weke rêyna wê werina bikarhanîn. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, sazûmanek têgînî jî wê di çerçoveya wê de wê werê pêşxistin. Ev sazûmana têgînî, wê ew bê ku wê mirovên zane, wê çawa wê jî xewnê wê peyamê bigirin û bidina ragihandin û wê çawa bi vekirina falê wê xwe bigihênina rastîyekê. Wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşekê bê.

Di rewşa fahmkirina rastîya xewnê û falê de wê di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya gihiştina peyame pêşarojê bê. Wê bi wê re wê xewn û fal, wê weke rewşna teybet bin, ku wê ew werina hildan li dest bin.

Minaq, di vekirina falan de wê gelek rê û rêbaz wê hebin. Di nava kurdan de wê, 'rijandina gûleyê', xwandina xatên dest, vekirina fala kahwê, bi dîtina stêran re vekirina falê, vekirina falê bi bên û ankû tarişên li hevdu gijilî û rengê gijilîna wan, fale avê, fale kaban(hastûyên anîşkê ên sawalan) û hwd, wê bê vekirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî bibêjê ku wê hê gelek rê û rêbazên vekirina falê wê hebin. Di rewşa vekirina falê de wê du rengên wê hebin. Rengê pêşî ê hesan a ku weke ku em di nava kurdan de wê dibînin, wê çawa wê bikin ku wê peyamê ji pêşarojê bigirin û wê fahm bikin bê. Rengê din jî wê weke 'vekirina falê li kesna' bê. Ev rengê vekirina falê li kesna, wê weke regekî ku mirov, falekê vekê ku ew bi wê bixwezê ku tiştekî xirab û ankû baş were serê yekî, wê bi wê armancê wê were vekirin. Di vê çerçoveyê de ev dihê vekirin.

Rewşa falvekirinê wê weke rewşek teybet a ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest bê. Falvekirin, ji aliyekî din ve jî wê gelek nîşanakên wê bi xewnan wê werina şîrovekirin û ankû piştrast kirin di nava kurdan de. Minaq, bi armancekê ku falek hat vekirin û di roja din û ankû çend roj piştî vekirina falê ku xewnek li ser heman rewşê hat dîtîn, wê di vê çerçoveyê de wê ji rengê xewnê wê were şîrovekirin ku ew nîşanaka baş a û ankû nebaş a. Wê di vê çerçoveyê de wê ew ere hanîn li ser ziman. Têkiliya xewnê û falê, wê bi gelek aliyên din ve jî wê di nava kurdan de wê were dênin. Lê bi wê re jî wê ev aliyê ku me hanî li ser ziman, wê weke aliyekî wê pîr zêde wê were biharhanîn bê.

Weke din, wê gelek rewşên din ên wek e'hipnotîze' kirinê û hwd jî wê werina pêşxistin. Minaq, dema ku yek birînek di laşê wî de wê hebê. Wê li ser birîna wî, wê gotinên 'pîroz' û ankû weke 'gotinên biasûn' wê bixwandan û wê pifkiran li devera birinê. Bi wê re jî wê li bendê ban ku ew êş sekînî û hedînî ba. Ev, afsûna sekinandina êşê bû. Bi wê re afsûn başkirin û tewirandina birinê jî hebû. Di gelek rewşan de wê mirovên ku ew di kirina hîpnozê de bizane û pêşketîbûn wê heban. Ew jî wê, di vê çerçoveyê de wê ew wê pêşbixistan. Bi wê re mirov dikarê vê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di çerçoveya rewşa hîpnozê de wê rewşên weke rewşa(afsûna) hedinandina 'zarokên har ku ew werina haşkirin', 'afsûna dana hêrişkirinê a sawalan li ser mirovan', 'afsûna parastina mirovan ji hêrişan', 'afsûna baran barandin', 'afsûna xwe gihandina tiştên û ankû kesna ku ew winda na', 'afsûna jiyane baş', 'afsûna kirina baş', 'afsûna ji jîyan û kirina nebaş parastinê', 'afsûna xwandin û zanebûnê', 'afsûna xewn dîtinê' û hwd, wê bi vê rengê wê li gorî her rewşê ku wê aqilê mirov wê kifş bike û wê bikeve farqe wê de wê, afsûna wê bi rewşa wê re wê were pêşxistin.

Rê û rêbazên ku ew weke yên afsûnê wê werina bikarhanîn, wê piştê wê weke qalibê, rê û rêbazên pêşveçûnên aqilî ên ku wê piştê wê werina pêşxistin jî bin. Minaq, wê di serdema serdest de wê, rengên jîyanî ên weke yên mudahaleyên li laş, zêhn û hwd wê werina pêşxistin. Têgînên weke 'yoga (*)' û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê werina

 (*)Yoga weke rewş û têgîneka medîtasyonî ya. Wê li asya dîr wê pêşkeve û derkeve li pêş. Li mesopotamiya jî wê bi Zerdestîyan û hwd re wê, pêşketî bê. Wê yoga wê, weke rêbaza hisandinê û bi wê re rehetbûn û bi wê re gihiştina aramîya di xwe de bê. Ev wê weke rêbazeka başkirina mirov ji derd û kulan jî wê di demên berê de wê, di nava kurdan de wê were bikarhanîn. Bi windabûna serdestîya xat yazdaniyê û serdestîya olên semewî re wê, ew jî wê, weke ku wê ji berçav wê li herêma wê windabê. Lê wê weke rêbazeka xwe dihandina reastqînîyê jî bê. Di xwe ponjîm û bi wê re gihiştina rastiye wê, weke rêbazê wê ye bi navê medîtasyonî bê.

pêşxistin. 'Rêankarnasyon(*)' û hwd, wê werina pêşxistin. Temenê têgîna reankarnasyonê wê, wê têgîna ji hevdû cuda hizirkirina gîyan û laş bê. Her wusa, dervî laş ku wê bê hizirkirin ku wê gîyan wê karibê bijî, wê weke têgîneka ku mirov wê dikarê di vê çerçoveya mijara xwe wê bibîrbixe û wê werênê li ser ziman bê. Hebûna gîyanê û jîyane wê ya piştî mirina laş û ankû derketina wê ya ji laş, wê di aslê xwe de wê rengê hizirkirina têgîna afsûnî a ku ew her tiştî bi aqil dihizirê ku ew heya, wê di vê çerçoveyê de wê têgîna bi hişmendî bê.

Gîyan wê têgîna wê, wê weke rewşek teybet wê werê hildan li dest. Di vegotinên nava civake kurd ên serdemên berê de jî û di yên piştre jî wê, di çîrok, vegotin û çîvanokên wan de wê, têgîna acînîtiyê wê weke têgînek gîyanî wê werê hanîn li ser ziman. Acînî, li gorî bawerîya kurdan ku wan di nava xwe de ew dihanî li ser ziman ku 'ew, weke gîyan dihê dinyê.' Di vê çerçoveyê de ew dihanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wan dihanî li ser ziman ku mirov çawa were dinyê, wê wusa jîyane xwe wê bide jîyankirin. Ku mirov bi gîyanê, were dinyê wê bi gîyanî weke acîniyan wê jîyane xwe wê dirêj bide domandin. Ku mirov bi laşê xwe yê fizîkî ew were dinyê wê wusa wê jîyane xwe wê bide domandin, heta ku ew laşê wî bimirê.

Di rewşa têgîna gîyanê de wê ji hevdû cuda, wê werina hanîn li ser ziman. Mînaq, vegotinên nava civakên kurd ên berî zayinê û piştî zayinê jî wê di wan de wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewş û wateyekê bê. Di vagotinan de wê, ew têgîna gîyanî û ya laşî ku ew pîr zêde hatîya bi têgihîştinkirin wê, li gorî wê ew dihê hanîn li ser ziman.

Di nava çîrokên kurdan de ku mirov wan dike ku wan bixwênê, mirov wê di serî de wê pîr zêde wê rastî, jîyanek bi afsûn wê werê. Mînaq, çîrokên civake kurd, ên weke çîrokên keçelok, şahmaran, rûstemê zal û hwd, weke wan hemû çîrok û vegotin û çîvanokên wan wê xwediyê rewşek vegotinî a bi afsûnî bin. Di nava çîrokan û di wê cihane wan çîrokên wan de wê, her tişt, wê were hizirîn. Wê sînor ji hizirkirin û bi xoslet kirinê re wê nebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di derbarê têgîna afsûnê de wê, çîrok û çîvanokên wan yên civakî, wê têgîneka baş di derbarê asfûnê û hebûn û pêşketina wê de wê bidina me. Çîrok û vegotinên xwe yên civakî ku ew piştre di jîyanê de bûyîna û hatina serê mirov jî wê, dema ku ew wan dihênina li ser ziman, wê gotinên cihane afsûnî wê tevî gotinên xwe bikin û wê bi wê re wê werênina li ser ziman.

Di rewşa fahmkirina vegotinên weke serborîyan ên piştre de wê, dîsa wê di vê çerçoveya vegotinê de wê, di vegotinên hemdem de jî wê gotinên afsûnî û ên cihane afsûnê wê werina bikarhanîn. Di vê çerçoveyê û rengê de wê, rewşa vegotinan ên nava civakê wê werina dîtin.

Vegotin, çîrok û çîvanok, fal û vegotinên ji falê ku ew dihên hanîn li ser ziman, wê di çerçoveyê de wê bên hanîn li ser ziman. Fal, weke çerçoveyekê wê hilma xwe ya têgînî û têgihîştinî wê ji jîyanê wê bigirê. Her wusa, vegotinên ku wê ji falê wê werina kirin, wê di çerçoveya hebûna jîyanê de wê xwediyê ahengekê bin. Fal, wê di dewama serborîya jîyane mirov de wê li ser wê pêdeçûyîna serborîyê re wê di derbarê encamê de wê hizrê wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de ew serborî çawa destpêkiriya û

 (*)Rêankasnasyon wê weke têggiheka ku wê li herêmên asya mazin wê pêşkevin û wê bawerbikê ku mirov dema ku mirov wê ne mirin bê. Wê tenê wê, weke gîyan ji laş rizgar dikê wê werênê li ser ziman. Wê bi gîyane nemir wê bawerbikê. Wê bi wê re wê, xwediyê bawerîyekê bê.

bûya, çawa pêdeçûya û domîya ya, di kîjan pêvajo û merheleyan de ew derbas bûya û hwd, wê ev hemû wê di mejiyê mirov de wê hebin. Lê yê ku ew fal divekê, ew dibê ku van bizanibê û dibê ku ew wan nizanibê, lê wê gotina xwe wê bibêjê. Wê di derbarê encamê de wê hizra xwe wê bibêjê. Di aslê xwe de wê şîrove falê, wê hinekî jî wê weke şîroveyeke di çerçoveya têgîna sedem û encamê de bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser aqil re wê werênê hanîn li ser ziman. Lê li vir rewşa falê, wê weke ya têgîna mantiqê ku wê kurd di nava xwe de wê werênina li ser ziman ku 'mîrov, heta ku wê bi çavê serê xwe nebînê wê ew nebê' wê, ev weke rêgezêk bûhûrîner wê nebê. Wê rewşa têgîna falê wê bi şîroveya xwe re wê xwediyê çerçoveya xwe ya ku ew ji mejî ew hatî afirandin bê. Bi gotineka din, wê xwediyê rewşên xwe yên heyîn, hebûn û bingehiyên jîyanî bê. Wê, bi gotineka din, wê ji ber xwe wê li ser rewş, şert û mercên jîyanê re wê werênê li ser ziman.

Di olan de afsûn ..

Dîroka olan, dema ku mirov wê dihilde li dest, her wusa mirov wê bi wê re wê bibînê ku wê çawa di wê de wê hebûna afsûnê wê weke bandûrekê wê hebê. Afsûn û ol, wê di çerçoveya bawerî û hwd de wê xwediyê rengekî heyînî bin. Mejiyê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa hizirkirina rengê wê de wê, bi wê rengê wê xwediyê awayekê bê. Mejiyê mirov, dîroka pêşketina wê, wê li ser dîroka hizirkirinê re wê xwe bide nîşandin. Her wusa, dema ku em bahse hizirkirinê dikin, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê di rewşa baweriyê de wê gihîştineka temenî wê hebê.

Ol, dîroka wê, dema ku mirov wê dikê ku wê hilde li dest, wê di çerçoveya bawerkirinê de mirov wê heta ser dema destpêka civakê jî mirov wê herê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê jî wê werênina li ser ziman ku wê, aqilê mirov, piştî ku ew pêşket û pê de wê, mirov, wê bidest qaydkirinê bike. Di dema jîyane mirovê şikeftê de wê, di hêtên şikeftan de wê wêneyên ku ew hatina xîzkirin li hêtan wê hebin. Mirovan, bi mejiyê xwe wan, sawal çawa dîtina, bi hinek xatna ew hanîna xîzkirin û li ser ziman.

Ol û dîroka olan, wê di vê çerçoveyê de wê bi destpêka wan serdeman re wê destpê bi pêşketina xwe bikê. Ol, dema ku ew pêş dikevin, wê li ser esasê tiştê ku ew hatî dîtî û wê ew qanixbûyîna mirov ya bi dîtina mirov re wê, xwediyê rewşekê bê. Rewşa dîtina mirov a tiştê a bi mejiyê mirov re wê xwediyê rewşekê bê. Mirov, di destpêka dîtina xwe ya bi mejiyê xwe re de wê, mirov bi aqil wê bidest dîtî bike. Wê hewirdora xwe wê bibînê. Bi wê re wê, bi rengê dîtina xwe re wê hewirdora wê salix bike di mejiyê xwe de. Mejiyê mirov, wê xwezaya mirov wê kifş bike.

Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têgîna baweriyê, wê li ser dîtî û qanixbûnê re wê xwe bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek heyînî bê. Di nava rewşa jîyane xwezayê de wê mirov, wê di rewşa xwe de wê, xwediyê rewşa dîtina bi xwe a bi aqil re bê. Mirov, wê hebûna li berçavê xwe wê bibînê. Wê li ser wê re wê bihizirê. Lê bi demê re wê dema ku wê bidest pirs pirsînê bike û pê de wê, êdî wê rewşa olan, wê di mejiyê mirovan de wê bi girîngîya wê re wê, xwe bide dîyarkirin.

Di rewşa dîtî û hebûna rewşa de wê, piştî pirs pirsîna li ser wan re wê, hewl bide ku wê fahm bike ku ew çawa dibin. Minaq, dema ku wê baran bibarê, wê mirov, wê ji xwe

bipirsê ku ew çawa dibê. Wê li ser sedema wê bihizirê. Ev rewşa hizirkirina li ser dema wê û ber çî bûyîna wê, wê weke reneki hizirkirinê ê têngîni ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman bê.

Dîroka olê, dema ku mirov wê dihizirê, her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa hebûna tiştên li jîyanê, destpêk û rewşa jîyane wê, wê li ser wan wê bê hizirîn. Pêvajoya pêşketina hizirkirinê ku wê bidest afirandina bi xwe re wê bike, wê piştî serdemên mirovê şikeftê bin. Wê pêvajoyên pêşketina aqil wê rastî destpêka serdemên pêşketina pêvajoyên civakîyê wê werê.

Mirov, wê bi aqilê xwe wê rewşa xwezayê wê li wê bihizirê. Wê hertişt, wê di wê çerçoveyê de wê çawa wê biafirê, wê di olan de wê were hanîn li ser ziman. Dîtina bi aqil, wê êdî wê pêvajoyên wê, pêşbikevin. Wê bi wê re wê, bi rewşa aqil re wê têngîna olê, wê li ser rewş, heyîn, hebûn û rewşa sedema wan ya hebûnî wê bihizirê. Têngîna hizirkirina li sedemê wê weke têngîneka ku wê bi wê êdî wê werê hanîn li ser ziman ku wê tişt ew çawa bûya û ber çî bûya û hwd. Xosletên tiştê ên ku ew bi wê tê salixkirin ku ew kêrî çî tê, wê di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya salixkirina wê de wê bi têngîni wê çerçoveya wê rengê hizirkirinê wê werênina li ser ziman. Em dema ku di pêvajoyên piştê ên civakîyê ku ew pêşketina ku mirov wan li wê dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, hewldana fahmkirinê wê çerçoveya fahmkirina olê wê biafirênê. Em dema ku li pêvajoyên mîtolojîyê ên demên şariştanîyê ên ji serdema sûmerîyan û hwd, li wan dihizirin, em dibînin ku wê hebûna mirov, bûyîna dunyê, sedema wê û hwd, wê hewl bê dayîn ku ew werina fahmkirin.

Oî, wê çerçoveya hizirkî wê di vê çerçoveyê de wê bi wê re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Wê li ser têngîna hebûnê, sedem û rastîya hebûnê re wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku mirov vê yekê jî wê fahm bike ku wê bi rengên hanîna li ser ziman re wê, hertiştê ku mirov wê bi aqilê dibînê, têdigihê û fahm dike, wê di vê çerçoveyê de wê bike ku wê werênê li ser ziman

Em dema ku wê navaroka olan li wê dinerin, em wê jî dibînin ku wê dibînin ku wê mirov, wê li ser tiştên ku ew zirerê didina mirov û yên ku ew zirerê nadina mirov, wê li ser wan re wê bihizirê. Wê çawa wê xwe ji tiştên ku ew zirerê didina mirov û jîyane mirov, wê li wan bihizirin. Wê çawa xwe ji wan biparêzên, wê li wan bihizirin. Mînaq, wê bo ku ew zirerê nedina wan, wê boraq û ankû korbanan wê pêşbixin. Her wusa, têngîna korbanan, wê di nava hemû rengên bawerîyan de wê hebê. Ne tenê, wê di nava olên kevn ên destpêkê de wê ev hebê. Her wusa wê di pêvajoyên olî ên piştê jî de wê ev hebê. Di berdêla ku wê zirerên mazin wê newina jîyane wan, wê wan boraqan wê bikin. Têngîna boraqê, wê weke ku em dibînin wê di temenê wê de wê têngîni û rewşa heyîn û ankû gîyaneka ku ew nayê zanîn û ew hertimî vêşarî ya, wê di temenê wê de wê hebê. Mînaq, em î ro ku li kîjan olan û pêvajoyan olan dinerin, em bi şewayekê wê dayîna boraqan wê dibînin.

Di rewşa olan û dayîna boraqan de wê, nîşanaka hebûna têngîna afsûniyê jî wê hebê. Her wusa, ev kevneşopîya dayîna boraqan, wê weke kevneşopîyeka ku wê di destpêkê de wê bi kevneşopîya pêşketina olên afsûnî re ku wê pêşbikeve bê. Piştê jî wê, di nava olên ku ew bi aqil û ankû felsefeyê pêş dikevin jî wê, ev kevneşopî, wê xwe bide domandin.

Kevneşopîya olên dema afsûnê ku wê afsûn di wan de wê serdest bê, wê di vê çerçoveyê de wê bi sazûmanaka boraqkirinê wê, di wan de wê pêşbikeve. Sazûmana boraqkirinê wê, ev kevneşopî, wê weke rewşeka ku wê di temenê têgîna afsûnê de jî bê. Minaq, dema ku wê, afsûnek wê were pêşxistin, wê tiştek wê were dayîn û ankû wê were boraq kirin. Yan jî, dema ku wê tiştek ji afsûnbûnê wê biparêzên, wê bi heman rengî wê ew bê dayîn.

Di nava rengên bawerîyên berê ên civake kurd de minaq, wê têgîna 'dara bereketê' û ankû 'qanc bihizira dakû her tişt qanc bibê' û hwd, wê hebê. Wê li gorî wê, wê darek wê were kifşkirin û wê bi wê re wê bi hizrekê û ankû xwestekê ku ew were li cih, wê bi wê re ta û ankû tarîşan wê girêbidin. Dema ku ew wê girêdanê dikin, wê bi bawerîyekê wê bikin. Wê li ser wê re wê, ew ya di dilê xwe de wê hêvî biki ku ew were hanîn li cih. Her tişt, di baxt de nivîsî ya. Li gorî têgîna afsûnê ku em, weke ku wê ji têgîna afsûnê fahm dikin ku wê ya ku ew bû, wê ew weke baxtê bê. Di vê çerçoveyê de wê têgîneka baxtê, wê bi vê rengî wê werê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ev têgîn, wê piştê wê têgînên li ser baxtê ên weke 'baxt ji destpêkê ve ew hatîya kifşkirin' wê, nîqaş wê werina pêşxistin.

Baxt ku ew ji pêşî ve ew hatibê kifşkirin, wê demê, wê ya ku em piştê bixwezî ku ew di baxtê de hebê û nebê jî wê, hatina wê ya li cih, wê bi hebûna wê ya di baxt de bê. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna baxtê, wê întîbaya ku ew tişt ku ew bûya wê ew weke ya baxt bê. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna 'ji destpêka ve kifşkirina baxtê' wê, weke têgîna ku wê di vê çerçoveyê de wê bikeve bernîqaşê de. Ji xwe têgîna afsûnê, weke têgîneka ku ew weke rêya yekane ku wê mirov, karibê bi wê mudahaleyê li baxtê mirov bike, wê bê hanîn li ser ziman. Têgîna baxtê wê weke têgîneka ku wê, ew di çerçoveya têgîna baxtê de wê bikeve berlêpîrsînê de jî bê. Bo vê yekê ya ku wê, di serdemên piştê ên olî, wê hebûna afsûnê wê weke ku wê 'qadaxa' bikin. Lê tevî wê jî wê ol wê, xwe rengê têgîna afsûnê û bi rengê wê hanîna li ser ziman, wê xwe rizgar nekin. Ber ku wê, têgîna afsûnê a ku ew ji nebûnê hebûnê afirandinê wê ol, wê li ser wê re wê xwediye regekî xwe yê hanîna li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rastîya wan ya bi hevdu re wan werênê li ser ziman. Têgîna afsûnê, wê di serdemên şariştaniyê de wê zêdetirî wê pêşbikevê. Em dema ku wan serdemên destpêkê ên şariştaniyê li wan dinerin, em vê yekê jî wê kifş dikin ku wê her tişt wê bi afsûnê re wê werê hanîn li ser ziman. Di hemû têgînên weke bawerîyê ên kevn de wê rê û rêbazên afsûnî, wê weke rê û rêbazên ku wê bi wan xwe bigihênina çareserîyan bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike. Minaqên vê jî wê weke li japoniya 'kevneşopîya **sîntoîsmê**(*)', ya li îndîya hîndoîsmê(*), li kurdistanê û ankû li mesopotamiya û hwd wê kevneşopîya êzdayîyê û piştê ya zerdeştîyê û hwd wê hebê. Kevneşopîya zerdeştîyê, wê berî wê jî wê li kurdistanê û ankû li mesopotamiya wê hebê.

Li kurdistanê, wê di serdemên nû de wê weke ku em bi zerdeştîyê re wê dibînin ku

(*Sintoîsmê wê bawerîyeka kevn a japonî bê. Wê weke bawerîya japonî a herî kevn jî wê, mirov dikarê wê, werênê li ser zimam. Wê ev bawerî wê sê pêvajoyan de wê were lêkolîn kirin. Pêvajoya pêşî a mitolojîkî bê. Ya duyem a bûdîsmê bê. Ya sêyem jî wê ji bûdîsmê qatîna wê bê. Wê hizreka wê ya fermî a bawerîyê wê nebê. Wê bi bawerîyeka xwezayî wê hebê û wê bijî bê. Di rengê mitolojîya sûmeran a afirandinê de wê, xwediye şewayekê vegotîni a bi jîyanê, xwezayê û çêbûna hebûnê re bê.

(*Hîndoîsmê wê, bawerîyek hindîstanî a pîrr kevn bê. Wê xwediye şewayekê vegotîni ê mitolojîkî ê pirrxûdayî bê.

wê afsûn, wê pirr zêde wê pêşbikeve. Di dema zerdeşt de wê rêmildar û ankû 'mecûsî' ku ew karê wan ew a ku ew bi afsûnê ve alaquadar dibin, wê hebin. Gotina 'magî', wê di kurdîya roja me de jî wê wate 'me dîtî' wê bide me. Weke navê afsûnê jî di wê demê de wê gotina "magî" yê wê ji zerdeştîyan wê bimênê li dema me û wê weke navê afsûnê û ankû kirina afsûnê wê hebê. Serdema zerdeştîyê ên berî zayinê li dora sedsale 6' min û hwd, wê bi lêkolîna xwe re wê di derbarê serdemên berî xwe de jî wê têgînekê wê bidina me. Di roja me de wê, dema ku mirov bahse têgîna afsûnê bike, wê rewşa têgîna bawerîyê û ankû ol wê di cih de wê were bîra mirov. Lê di aslê xwe de em, dikarin, afsûnê wê weke pêvajoyek têgînî ew berî hebûna pêşketina têgîna olê bixwe jî wê derkeve li holê bê. Di destpêka pêşketina aqil de wê, dema ku wê mirov di nava xwezayê de wê bihizir bibê, wê her wusa, rewşên xwezayê û nexwezayî ên ku ew niikarê wateyê bide wan, wê bi rengekî wê bixwezê ku ew ji wan vegotînekê û ankû şîroveyekê ji wan re ew werênê. Afsûn, wê di demek bi vî rengî de wê weke şîroveyek li van rewşan wê pêşbikeve. Di destpêkê de wê, tenê wê weke têgînekê wê xwe bide hanîn li ser ziman. Her wusa, di destpêka pêşketina mirov de wê, mirov di nava xwezayê de wê bijî û wê gelek rewşên ku ew hêza nikaribê bigihênê wan wê derkevina li pêşîya wan. Di destpêkê de wê, di nava têgîna ya serxwezayî û ya neserxwezayî de wê, weke hevdûbûnekê wê hebê. Wê hertişt wê di nava hevdû de wê weke hevdû di rewş û têgînekê de wê were hildan li dest. Lê piştî ku aqilê mirov pêşket û pê de wê, di wê ew têkilî wê hin bi hin wê xira bibê. Mirov, wê bibînê û fahm bike ku ew xwezaye ku ew di nav de dijî ew çendî mazin û bêserûbin a. Di nava wê de ew, weke xalekê û ankû nûqtayekê bê. Di destpêka têgîna xwezayî û ya serxwezayî de wê, her wusa, wê her rewş wê, di wê çerçoveya weke hevdû de wê were hildan li dest. Di aslê xwe de wê, ya ku wê ew weke hevîyê xira bike û wê di çerçoveya têgînek serdest û serwer a serxwezayî de wê xwe bide nişandin wê têgîna 'xwûdê' bê. Wê ew weke têgîneka ku wê derkeve li ser wê bê.

Di nava têgîna olê û ya afsûnê de wê, dema ku mirov hewl dide ku wan ji hevdû cuda wan fahm bike, ya ku mirov wê di serî de wê bibînê wê ew bê ku wê pêşî weke pêvajoyek têgînî wê afsûn wê hebê. Piştî jî wê ew afsûn w, pêşbikeve. Afsûn, wê hinekî jî wê bi pêvajoyên pêşketinê re wê ew hewl bide ku ew bibê hêza serwer. Mirovê ku ew serî li afsûnê dixê, wê bi armanca ku ew mirovên li dora xwe û ankû hewirdora xwe û xwezaye ku ew di nav dijî, ew bi têgînek serxwezayî ku ew wê bike bin sehêta xwe bê. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna hêzê û sehêtkirinê wê piştî wê weke armanca wê (afsûnê) wê pêşbikeve. Ya ku wê temenê wê bê ku wê di pêvajoyên wê yên piştî de wê temenê pêşketina pêvajoyê têgîna olê û 'xwûdê' û hwd wê biafirênê wê ev bê. Piştî ku têgîna olê afirî û pêşket jî wê, êdî wê her tiştê û pêvajoyê wê ji xwe wê bide destpêkirin. Minaq, weke ku em rewşa olên semewî de wê dibînin ku wê bi vegotina 'adam û hawa' re wê hertiştî wê bi rengekî di çerçoveya têgîna xwe de wê bi xwezaye wê re wê bike ku ew şîrove bike û bi wê şîroveyê re bi destpêkîya bi xwe re wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, têgînên olî wê xwe weke têgînên serwer wê werênina li ser ziman. Di rewşa fahmkirina têgîna xwûdê de wê, ew bi wê rengê werê hanîn li ser ziman ku ew 'weke hêzek ku ew hêze wî têrî hemû tiştî dike, ew dikarê her tiştî bibînê û ew her tiştî diafirênê' bê. Di vê çerçoveyê de wê ew were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê li benda hevîyê ji wî bê kirin. Minaq, di roja me de mirov, wê weke ku ew di wê rewşê de bê ku ew hêza wî nagihijê ku ew gîyanê sehê

bike û ankû ew karibê xwe ji xirabî û hêrîşên wê yên li ser jîyane xwe ew xwe xilas bikê. Wê di vê çerçoveyê de wê kî hêza wî hebê ku ew karibê pêşîya hêzên fizîkî weke mirovan û yên ne fizîkî weke gîyanan pêşîya wan bigirê û mirovan ji hêrîşên wan xilas bike? Wê bersiva wê, di gotina 'xwûdê' de wê were bicihkirin û lêgerîn.

Di rewşa têgîna afsûnê de wê, di pêvajoyên wê yên pêşketinê de wê têgîna pêşxistina *sîmya* 'yê wê derkeve li pêş. Mirov dikarê weke 'kîmya'ya roja me jî wê hilde li dest. Di rewşa sîmyayê de wê darêjkên afsûnî wê di jîyanê de wê werina çêkirin. Wê weke ku çawa ku wê dema ku mirov nexweş dikeve, wê çawa ew baş bibê, mirovên ku wê di nava xwezayê de wê bigihijina zanîna şînahiyên xwezayî û wê zanibin ku wê çi ji wê nexweşiyê re wê ji wan şînahîyan wê baş bê, wê ew wê bînin û wê yan wê bikina şekil û awayna de û yan jî wê tiştina bikina nav de û wê bidina mirovan. Ev jî wê weke darêjkên afsûnî' wê werina bi navkirin. Têgîna ku wê bi darêjkên afsûnî re wê alaquadar bibê, wê *sîmya* bê. Sîmya, wê di vê çerçoveya pêşxistina darêjkên afsûnî, ji wan şînahiyên xwezayî û hwd, weke tevlihevkerinên li hevdû re wê, bi demê re wê pîr bizane û pêşbikeve. Ji kirin nava hevdû a tiştan, derxistina tiştina din, wê sîmya bê. Di dîroka şariştanîyên mesopotamîya û ankû kurdistanê de wê sîmya, wê bi hezaran salan wê pêvajoyên wê pêşketinê wê bi zanîne re wê werina pêşxistin. Wê di temenê pêşketina sîmyayê de wê zanîneka tişt û ankû şînahiyên xwezayê wê hebê. Ev rewşa sûdgirtina ji şînahiyên xwezayê, wê taqabûlî têgîna 'tendûristîya artarnatîf(*)' a roja ku ew bahse wê dihê kirin û ew dihê pêşxistin, wê bikê. Wê bi çerçoveya têgînî re wê ev têgîna tendûristîya artarnatîf' wê were pêşxistin. Temenê wê yê teorîkî wê bi têgîna darêjka afsûnî re wê di çerçoveya tevlihevkerinên ku ew bi armanekê dihên kirin re wê xwe bide nişandin. Pêvajoyên wê yên bi zanîne re wê bi devkî û hwd, wê ji mirovan wê bûhûrîna li mirovan wê bibê. Armancên wê çêkirina gûharandinê di jîyane mirov de, başkirin û ankû şifakirina nexweşîyan û afirandina rewşên nû bi tevlihevkerinên nû re ku ew kêrî başkirin, çêkirina tiştan û hwd were. Hebûna dermanekê, wê weke ku wê sîmya wê pêşbixê, wê di wê de wê gelek cûreyên şînahî û tiştên ku ew hatina tevlikirin dibê ku ew hebin. Di encamê de wê, ne ew hemû tiştên ku ew hatina tevlikirin, wê ya ku ew hafî û derketî li holê weke encama wê tevlihevdûkirinê wê, weke afirandinake sîmyayî bê. Sîmya, wê bi zêdeyî wê di nava heyînen xwezayî de wê, temenê wê li ser fahmkirina hebûna xwezayê bê. Bi wê re wê, bi hewldana fahmkirina her cûre geya û û ankû şînahî ku ew bi kêrî çi tê û ji çi re dikarê weke derman dikarê were bikarhanîn, wê li ser wê bihizirê û wê xwediyê têgîn û zanîna wê ya bi xwezayê re bê. Piştî wê re ku wê di dewama sîmyayê de wê pêşbikeve wê kîmya wê, li ser ceribandîne bi amûrên hemdem re wê armanca gihiştina encamê û ankû afirandin û derxistina li holê a tiştêkî, rewşekê û ankû encamêkê bê. Di roja me de, wê hemû dermanên ku ew hena, ku ew di nava

(*Tendûristîya aertarnatîf wê, weke şewayekê tendûrîstî ku wê di demên berê de wê, ji tiştên xwezayî ku wê, dermanên başkirinê wê biheta pêşxistin bû. Ev di roja me de jî wê, weke aliyekê ku wê, di çerçoveya rêbaz û metodên xwezayî de başkirinê pêşbixê bê. Yoga, meditasyon wê weke şewayna rehebilitêyê êmn di wê çerçoveyê de jî bin.

(*Sîmya wê, rengêkê pêşxistina rewşan weke bi xwezayê re bê. Di roja me de wê, kîmya hebê û wê sîmya wê, weke kîmyaya demên berê jî bê. Di demên berê de wê, bo derxistinê cînan ji laş weke ku wê kurd wê di nava xwe de wê bikin çêkirina 'nîvîştan' û her wusa rewşên bi wê rengê jî mirov dikarê di wê çerçoveyê de werênê li ser zîman. Wekî din bo başkirinê wê hevî ji şînahiyên xwezayî û bi wê re ji wan çêkirina weke ku wê di roja me de wê were navkirin 'îksîran' wê weke aliyekê sîmyayî jî bê. Sîmya wê hem têgîna xwezayî û hem jî ya afsûnî wê bihevdû re wê, di wê çerçoveyê de wê bi xwe re wê pêşbixê û wê bi wan wê ji wan sûdwergirê.

tendûristê de ew dihên bikarhanîn wê, bi kîmyewî wê bèn pêşxistin. Bi wê re wê bi fahmkirina hebûna tişt û hebûna tiştê û rastîya wê re wê, bi tevlfhevkirina wan re wê bixwezê ku ew bigihijê encamê. Mînaq weke ku wê bi lêkolînên li ser atomê ku wê bèn kirin re wê çawa ji wê sûderegirtin, wê bi leyistina navaroka wê û ankû bi hevdû têkilîdanîna beşên wê yên ku ew bihevdû re ne di têkilîyê de na, wê bixwezê ku ew encamna din ji wê bidest bixê. Kîmya, di temenê ceribandîne de gelek beşên wê pêşketina. Hemûyan jî wê, bi lêkolînî bikin ku fahm bikin. Mînaq, atom ji melokulan pêk tê. Têkiliya nava melokulên wê Notron, Proton û Elektron(*) û hwd, çawa ya, çawa têkiliyê bi hevdû re didênin. Çawa bi hevdû re di ahangekê de na û hwd, ku wê hê gelek aliyên din jî di nav de hena û ku em dikarin wan li vir rêz bikin, hemûyan hewl didin ku li gorî rastîya wan fahm bike û encamên nû derxina li holê. Kîmya, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek nû ya ku wê di dewama sîmyayê de wê pêşbikeve bê. Sîmya, wê dayiktiyê ji gelek zanînen din ên di dewama wê de ku wê pêşbikevin jî wê ji wan re wê bike. Her wusa, sîmya jî wê fêrbûn, ezmûn û ceribandin wê di wê de wê weke ku wê di kîmyaya roja me de wê hebê, wê di wê de jî wê hebê. Sîmya li ser rewşa fahmkirin û pêşxistinê re bi xwezayê re dijî.

Di dewama wê de me divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê filosof û zaneyên civakî ên kurd, wê hertimî mijare sîmyayê û piştre ya kîmyayê wê hildina li rojava xwe. Ev rewş, wê berî zayîna îsa wê bi rêmildar û ankû mecûsiyên kurd re bê. Ew her yekê wê weke zaneyekî bê. Piştre jî wê zaneyên kurd ên weke bavê henifê dînwerî(di sedsale 8' min de jîya), bavê tahirê ûryanî(di sedsale 10' min û 11' min de ew jîya), Birehimê xelatî(di sedsale 12' min de li xelate bakûrê kurdistanê jîya) ku ew weke filosof û kîmyagerekî mazin ê kurd jî dihê nasîn wê hebê, wê weke van wê gelek zane û filosofên kurd wê têgîna sîmyayê û piştre ya kîmyayê jî wê hildina li rojava xwe û wê pirtûkan wê li ser wê binivîsênin. Wê rêbazên başkirinê û şifadayîne wê li ser wê re wê di dewama sîmya û kîmyayê re wê werênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ku mirov dîroka civake kurd a aqil lêkolîn dikê, mirov rastî rewşek pirr zêde mazin a bi hanîna li ser ziman a sîmya û kîmyayê mirov dibînê.

Her wusa, di vê çerçoveyê de wê di pêvajoyên piştre ên sîmyayê de wê zanyariya darêjkên afsûnî wê di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya mejî û ankû aqil afsûnê de wê were pêşxistin. Ev jî wê weke aqilekî ku ew di çerçoveya hebûna xwe de ku ew, li çareserîyan di nava jîyanê de ew li wan digerihe bê.

Sîmya, wê weke rewşa ceribandîna li ser aqilê afsûnê re bê. Wê di vê çerçoveyê de wê bihizirê. Wê bixwezê ku ew bi tevlikirinên li hevdû re ew darêjka baş a ku ew encamê li ser nexweşîya ku ew bo wê hatîya çêkirin, ew bidest bixê bê. Mînaq, di nava kurdan de mirov, dema ku ew, di demên berê de ku ew serî diêşîya û hwd, wê şorbeya niskan û hwd wê çêkiriban. Dema ku mirov bi şewbê diket, wê bihemana rengî wê şorba wê çê bikiran û wê cûreyên geya wê tevli bikiran bo başkirinê. Di aslê xwe de em di çerçoveya têgîna sîmyayê de ku em bihizirin, em dikarin vê weke darêjkekê wê ya ji wê re jî wê hildina li dest. Di roja me de wê kîmya, wê derkeve li holê. Ew wê rewşa wan wê wan lêkolîn bike û wê fahm bike ku wê çî baş bê bo wê rewşê. Ev wê weke erkek û berpirsiyariyek lêkolînîya ceribandîna kîmyayê bê. *Ji sîmyayê û heta kîmyayê*, wê

(*)Elektron, proton û notron wê, sê elementên serek ên ku ew hebûna atomê bi xwe re ew diafênin bin.

pêvajoya ku wê derva bibê û pêşveçûnên ku wê bibin, wê zanyariyê û ankû zanistê wê bi xwe re wê bi demê re wê pêşbixin. Têgîn, felsefe û zanîna zane û filosofên kurd ên weke bavê henîfê dînwerî, şemseddîne şehrezorî, tahirê ûyanî û hwd, wê di vê warê de wê têgîneka baş wê bidina me.

Ku em di rewşa têgîna matinqî a felsefeyê de dîsa li mijarê bihizirin, wê têgîna falzanîyê(*) a demê ku ew wê di çerçoveya rengekî aqilê afsûnê wê di çerçoveya wê de wê pêşbikeve. Wê li ser hemû rewşên fizîkî û ne fizîkî wê bi aqil li wan bihizirê. Wê hebûna tiştê û fizîkê, tevger û hwd, wê li wan bihizirê. Wê wateyê wê bide wan. Her wusa, wê falzanî wê her cismê ku ew li azmana dibînê wê şrove bike û wê têkiliyeka wan bi rewşa qarakterê mirov re wê dênê. Di vê çerçoveyê de wê, piştê wê di dewama falzanîyê de wê stêrzanî wê pêşbikeve. Di aslê xwe de mirov, weke ku çawa dikarê sîmyayê weke destpêka kîmyayê wê werênê li ser ziman, bi heman rengî mirov dikarê falzanîyê jî weke destpêka stêrzanîyê wê werênê li ser ziman.

Aqil, wê bi demê re wê pêşbikeve. Wê darazîya xwe wê li ser rewşên dîtbar, ceribandî û aqil meşandinê re wê pêşbixê. Wê di temenê daraza aqilî de wê ev hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ya ku mirov wê dibînê, mirov dikarê wê bidarêzênê û şrove bike. Her wusa bi wê re wê weke rastîyê wê fahm bike. Têgîna afsûnê wê, di vê çerçoveyê de wê hertiştê wê bi serilêxistina li hêzên serxwezayê re wê bike ku ew wan fahm bike û wan werênê li ser ziman. Pêvajoya têgîna afsûnê a serî li hêzên serxwezayê xistinê wê pêvajoya afsûnê a ku ew di dema pêvajoyên aqil de ku ew pêş dikeve bê. Pêvajoya têgîna afsûnê a destpêkê, di aslê xwe de wê bi xwe bixwe wê hewl bide ku ew wê rewşê bêî ku ew serî li hêzek serxwezayî bixê û ankû hebûna hêzek serxwezayî derxê li pêş, wê ew wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê pêvajoya têgîna afsûnê a ku ew serî li hêzek serxwezayî dixê, wê weke pêvajoya têgîna afsûnê a ku wê piştî têgînên olî wê pêşketibin bê. Wê di vê çerçoveyê de wê serî li wan têgînên pêşketî ên olî wê bê xistin û wê bi rengên şroveyên wan re wê bê xwestin ku ew pêvajoyên afsûnê ew werina hanîn li ser ziman. Di aslê xwe de em, di vê çerçoveyê de wê rengê şroveya pêvajoya têgîna afsûnê ên piştê ku wê serî li hêzek serxwezayî wê bixê, weke serwerîya têgîna olî a li wê jî wê şrove bike û wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê rastîya wê, wê were li ser ziman.

Têgîna afsûnê wê, piştê wê weke têgîneka ku wê biaqil wê were şrovekirin û wê di nava olan de jî wê werê hanîn li ser ziman. Minaq, ku em navaroka pirtûkên pîroz ku em li wan dinerin, em di rengê şrove û hanîna wan ya li ser ziman de wê, rastîyê bi wan re wê kifşê dikin. Di vê çerçoveyê de rastîya pirtûkên pîroz û rengê têgîna afsûnê ku ew di wan de bicîhbûya, em divê ku wê jî di dewama têgîna mîtolojiyê û rengê afsûnê ê ku ew di wê de heya re wê li ser bisekinin û bi fahmkirina wê re wê werênina li ser ziman.

Em dibînin ku wê rewşa têgîna olî a ku ew pêşket û pê de wê ol, wê weke têgîneka hizrî û têgîhiştîna a serdest û serwer wê pêşbikeve. Aqil, wê ji vê demê û pê de wê di nava hewldana fahmkirina xwezayê de bê. Her wusa, pêvajoya têgîna olî a destpêkê wê di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê weke pêvajoyeka kifşkirina dunyê, hebûn û xwezayê bi aqil bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser aqil û pêşketina aqil re wê weyn û rolek diyarker û hêja wê bileyizê. Pêvajoyên olî ku em wan hildina li dest, di çerçoveya olzanîya têgîna olê de wê, piştî wê, bi pêvajoyên şariştanîyê re ku wê pêvajoyên

(*)Falvekirin wê, weke rastiyeka demên berê bê. Berê dihat bawerkirin ku mirov çî di xewnê de dît wê, weke peyamenê jî mirov bê. Wê xewn weke rêyna têkilî danîné ên bi jîyanê re wê werina dîtîn.

zihniyetî wê bijî, wê hingî wê êdî wê weke ku ew ji rewşa fahmkirina xweza û hewirdorê wê derbasî pêvajoya fêrkirina mirov a li gorî xwe bibê. Ev pêvajo jî wê, weke pêvajoyeka ku wê dema ku ol, dikin ku aligirên xwe biafirênin re wê hebûna xwe bide domandin. Di vê pêvajoyê de wê desthilatdarî wê pêşbikevin. Wê ew desthilatdarî jî wê olê, weke rewşek têgînî a bîrdozî wê ji xwe re wê bikina bingeh û wê li ser wê re wê hebûna xwe wê bidina jîyandin û domandin.

Di rewşa fahmkirina têgîna olê de wê, dîroka wê ya bi olzanîya wê re wê di vê çerçoveyê de wê li ser aqilzanîya wê re wê pîrr watedar bê ku em wê fahm bikin. Di pêvajoyên şariştanîyê ên ku wê di wan de wê nivîs wê were kifşkirin û pêşbikeve de wê, pirtûkên pîroz wê derkevina li holê. *Pirtûkên pîroz*(*), wê di aslê xwe de wê weke rastîya têgîna aqilê mirov ê olî ê nivîsandî bê.

Rewşa aqilê nivîsandî, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşa rêgezên jîyanî ên ku mirov li gorî wan bijî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê çerçoveya wê ya bawerîkî wê biafirênê. Pêvajoyên ol û olzanîya olê, wê li kurdistanê wê ji demên şariştanîyê ên sûmerîyan ve wê xwe bide dîyarkirin û domandin. Her wusa, pêvajoya êzdayîyê em ku wê di çerçoveya têgîna pirtûkên pîroz de wê hildina li dest, em dikarin, wê di du rengan de wê hildina li dest, Pêvajoya pêşî a êzdayîyê ku ew hê ne hatiya rijandin li nivîsandinê bê. Pêvajoya duyem jî wê ya rijandina wê ya li nivîsandinê bê. Di vê çerçoveyê de em ji rengê têgîna felsefeya olzanîya êzdayîyê fahm dikin ku wê çerçoveyek dunyayî a bi çerçoveyî wê biafirênê. Teybetîya ola êzdayî û rengê felsefeya olzanîya(*) wê, ew a ku ew bi têgîna xwe ya felsefîkî re wê 'heta serdemên ku wê berî wan jîyan destpê bike' wê, şiroveyek afirandinê wê werê hanîn li ser ziman. Têgîna afirandinê, wê weke têgîneka destpêkê bê. Her wusa, bandûra rewşa jîyane destpêkê a seretayî wê di wê rengê têgîna afirandinê de wê hebê. Her wusa, şiroveyên ku wê piştê wê li ser wê re wê bên kirin, wê çawa wê mirov bê dewetkirin li nava têgîneka bi aqil û ankû jîyaneka biaqil, wê bi wê re wê xwe bide nîşandin. Ev rewş jî wê weke rewşeka teybet a ku mirov wê di çerçoveya têgîna afirandinê de wê hilde li dest bê. Di nava ola êzdayî de wê, pêvajoyên wê yên destpêkê, weke ku mirov wê bi wê re wê kifş bike, wê nîşanekên jîyane mirovê destpêkê ê berî dema şariştanîyê wê di xwe de wê bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de wê, li ser wê re wê hertimî wê ji aliyekî ve wê bi mejiyê xwe re wê ev têgîn wê bi xwezayê û têgîna xwezayê re wê bihizirê. Têgînên olî ên destpêkî wê hertimî wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşekê bin. Mînaq, em dema ku li rengê têgîna mîtolojiya afirandinê a sîntoîsmê, hîndoîsmê û hwd dinerê, ew jî wê di wê çerçoveya kevnerîya xwe de wê xwediyê rewşek bi vê rengê bin. Ev têgînên olî wê, ji serdemên civakî ên berî serdemên şariştanîyê û pêvajoyên wê yên pêsketinê wê di nava xwe de wê rengên jîyanî wê bihawênin û wê li ser wê re wê xwediyê rengên vegotînî, çîrok û çîvanokan bin. Di vê çerçoveyê de wê ev rengên olî ên weke *êzdayîyê li*

(*Pirtûkên pîroz wê, weke pirtûkên ku ew bi 'wahiy' hatina daxistin ji mirovan re bi rêya pêxemberan. Mînaq hersê olên semewê weke cihûtiyê mesihîyê û islam wê, bi rêzê wê xwediyê tewrat, incil û kuranê bin weke 'pirtûkên pîroz' ên xwe bin.

(*Olzanê wê, weke têgîneka olî a bi felsefîkî ku ew olê bi aqil dikê ku wê fahmbikê û werênê ser ziman bê. Wê weke 'zanîna olê' jî wê mirov dikarê şirovebikê. Wê olzanî wê olê bi rê û rêgez, rêzik û pivanên wê re wê, hilde li dest û wê bîrê ser ziman. Di roja me de wê olzanî û ankû bi navê wê yê din 'teoloji' wê, weke têgîneka felsefeya olê wê were ser ziman. Wê di roja me de wê fekulteyên olzanîyê wê werina pêşxistin bo ku ew hem di wê çerçoveya wê ol û bawerîya wê deew, hem kesan perwerde bikê û hem jî fahmkirina wê olê bide dîyarkirin li berçavên mirovan û bi wan bide fahmkirin.

kurdistanê û ankû mesopotamiya, sîntoîsmê li japonya, hîndoîsmê li îndiya û ankû hindistanê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê xwediye regekî tégînê ên ku em wan bi wê werênina li ser ziman bin.

Têkilîya van rengên olî ên bi civakên seretayî ên berî demên şariştaniyê re wê di nava wan de wê hertimî wê temenê nelevkirinên bi jîyane şariştaniyê re bin. Yan jî wê, di demên pêvajoyên jîyane şariştaniyê de wê, di nava jîyane civakê de wê li gorî pêşketina wê ya bi jîyane civakî a şariştaniyê wê, şiroveyên wê li rex wan şiroveyên wan ên kevn wê werina pêşxistin. Wê bi wê re wê bi awayekî wê êdî wê hebûna xwe wê bidina domandin.

Li kurdistanê û ankû mesopotamiya, rewşa êzdayîyê, di vê çerçoveyê de wê ji gelek aliyan ve wê mhtacê fahmkirinek rast a bi jîyane civakê a demên berî şariştaniyê û ya piştî şariştaniyê re bê. Mînaq, di demên piştî pêşketina jîyane şariştaniyê de wê dem bi dem wê li dûv hevdu wê li ser xate êzdayîyê re wê li dûv tégîna melekê tawis, wê tégînên weke ên mîtratîyê, zerdeştîyê, manîfîyê, adîyatîyê (pêvajoya şêx Adî) û hwd wê pêşbikevin. Ev pêvajo, wê weke pêvajoyên ku ew di nava jîyane civakê a li gorî pêvajoyên jîyane şariştaniyê a civakî wê xwediye regekê pêşketinî bin. Her wusa, wê di rengên vegotinên tégînên bawerîyê ên berê de wê wê regekî xwezayê wê bi hemû zindiyên di nava wê de wê hebê. Di nava xate bawerîya êzdayîyê de vegotinên weke yên bi şahmaran, *tayrêsimûrg*(*) û hwd wê hebin. Di vegotina tayrê simûrg de wê tayrik, sawal û ajalên di xwezayê de ku ew dijîn, wê karibin bi dev, lêv û ziman bibin û xwe werênina li ser ziman. Ev rengê vegotinê wê piştre wê di şewayekî de wê di temenê destpêka olên semewî ên piştre ku wê bibin re wê bi destana nûh re wê bi vegotiya kiştîya wî ku wê ew ku wê bo ku ew tûxmê hemû zindiya biparêzê, w jî her cûreyê zindiyê cohtek wê bi hevdu re wê herina hundûrê kiştîya wî û wê xilas bibin û wê piştre wê hebûna jîyane xwe wê bidina domandin.

D aslê xwe ev vegotin, wê weke vegotineka xwezayî a ku wê bê xwestin ku wê destpêka wê xate olê ew bi wê re ew were dayîn destpêkirin bê. Li vir, tégîna xwezayî wê, weke tégîneka hîmî a ku ew were parastin wê were hildan li dest. Ev tégîna xwezayî, di aslê xwe de ku mirov serî li ser wê di wastênê, mirov wê di çerçoveyek xwezayî de wê bigihijê fahmkirinekê. Di temenê van rengên vegotin û tégînan hemûyan de jî wê pêşveçûnên xate êzdayîyê ên demdirêj ku ew di mejiyê mirovan de bicîhbûna wê hebin.

Di van vegotinan de wê, tégîna serxwezayî a ku ew serî li wê dihê dayîn wê hebê. Lê bi wê re mirov wê jî dibînin ku wê di destpêkê de wê di nava wê tégîna serxwezayî a bi navê 'xwûdê' ku wê serî li wê were xistin û ya xwezayê û parastina wê de wê, weke ku wê ahengekê ku wê li wê were lêgerîn jî wê hebê.

Tégînên olî ên dema şariştaniyê wê temenê pêşxistina tégîneka hîyaraşîkî bin. Di vê çerçoveyê de wê xwediye regekî vegotinî ê hanîna li ser ziman. Lê em li yên berî wê dinerin, wê her wusa wê cûdahî wê hebê. Mînaq, di serdemên berê ên tégîna bawerîya êzdayîyê de wê, ew tégîna hîyaraşîyê wê nebê. Bandûra vê tégîna bawerîyê a bêhîyaraşîkî wê, wê li herêmên din ên Asya jî wê xwe bide diyarkirin. Piştî pêşketina olên semewî re wê, pirsgirêka tégîna hîyaraşîkê wê xwe bi ya nehîyaraşîkiyê re wê

(*)Teyrê simurg wê, navê teyrekê mitolojîkê di tégîna mitolojîkî, olî û bawerî a kurdistanî de. Lê wê ev bawerî wê, weke bawerîyeka giştî wê, di nava kurdan wê pêşkeve. Feqiyê teyran, tê gotin ku wî jîyane xwe bo xwe gihandina teyêrê simurg bûhîrandiya. Ketiya pey ditina teyêrê simurg de.

bênê beremberî hevdû. Heta dema serdest jî wê, ev rewş wê xwe bide dîyarkirin. Di aslê xwe de wê, zerdeşt wê vê rastîyê wê bibînê û wê bixwezê ku ew ahengekê di nava ya hîyarrarşikî û ya nehîyarrarşikî de ew bide çêkirin. Têgînên weke yên bûdîsmê ku wê hîm û temenê xwe wê ji Mîtraîsmê û Zerdeştîyê wê hildin, wê di wan de wê têngîneka hîyarrarşikî a hatî bi sînorkirin wê hebê. Minaq, têngîna 'pêxemberîyê' ku wê bi hîyarrarşikî wê di nava wan de wê bi şewayekî cûda ji ya ku wê bi olên semewî re wê pêşbikeve wê xwe werênê li ser ziman. Vegotinên olî ên ku wê werina li ser ziman, wê di hundûrê çerçoveya wan de wê rewşa hewldana ghiştîna 'çareserîyê' wê hebê. Her wusa ev rewş, wê li ser nexweşîyekê re weke ku wê bi sîmyayê re, weke li ser rewş û bûyarekê re wê çawa wê navber wê were dîtî û bi rêyên aşîtîyana wê çareserî û hwd wê were dîtî, wê di wê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê. Di rewşa ghiştîna fahmkirinê de wê di vê çerçoveyê de bê. Li vir, divê ku mirov di d dewama mijarê de wateya darêjkên afsûnî çî ya, hinekî jî wê fahm bike. Wê ev di vê çerçoveyê de wê bi fahmkirina me re wê me, bigihênê têngîştînekê di derbarê têngîna afsûnê a demên berê re.

Wateya darêjkên afsûnî, wê li ser rewşên jîyanî ên ku ew rû didin re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Darêjkên afsûnî, wê di mantiq û têngîna 'çareserîyekê' de wê xwe bide hanîn li ser ziman. Ev rengê têngîna 'çareserîyê' ku em wê bikin ku wê fahm bikin, em bi wê re wê fahm dikin wê dibînin ku wê rastîya wê, di çerçoveya saw(tez) û ankû û dij-saw(antî-tez) 'ê de wê, xwediyê rewşekê bê. Têngîna darêjkên afsûnî, wê di vê çerçoveyê de bê. Mirov, dikarê darêjkên afsûnî di du rewş û rengan de wan, hilde li dest û werênê li ser ziman. Rengê pêşî wê li ser rengên weke 'nivîştan' re bê. Di nava nivîştan de wê, gotinên 'afsûnî' û ankû 'gotinên pîroz mirov bi wan bawerîya xwe dihênê wê werina nivîsandin û wê ew werina bawerkirin li ser mirov. Nivîşt, di vê çerçoveyê de wê, rewşa ku ew heya ku ew weke 'rewşa xirab' dihê pênasekirin, wê çawa ew were bûhûrandin û derbaskirin, wê weke ya vajî wê çî ya, wê ew li wê were hizirîn û wê ew bi wê re wê bê hizirkirin ku ew pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê bi aqilê mirov re wê, rewşa wê hebê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa rewşa ku ew were başkirin, wê li ser wê, êdî wê were hizirkirin. Minaq, rewşa têngîna afsûnê, wê di vê çerçoveyê de wê, weke rastîya wê çî ya û wê çawa wê ew were bûhûrandin û ankû wê çawa wê xwe ji wan rewşên afsûnî ku wê weke rewşên xirab ku wê werina serê mirov wê bê paraastin, wê di vê çerçoveyê de wê ev têngî bi têngîna nivîştan re wê di temenê wê de bê.

Nivîşt, gotineka ku wê di kurdî de wê pîrr kevn bê. Koka wê di kurdî de wê li ser gotina gotina *nivîsandinê*, *nivandinê* û *jinûvedinê* bê. Di vê çerçoveyê de wê, ya ku ew hatî nivîsandin, wê bi wê re wê were ser ziman. Lê di aslê xwe de li rex têngîna nivîsandinê, mirov dikarê di çerçoveya ku wê nivîşt li ser rûnihê têngîna gotina 'nivîstinê' ku ew di kurdî de tê *wateya hadinandin*, *razandin* û *lihiştinê* jî bi wê re werênê li ser zima. Nivîşt jî wê, di aslê xwe de wê, weke binetereka nivîskî a ku ew hatî pêşxistin bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê weke rewşek nivîskî a bi wê ji wê rewşa afsûnî parastinê wê di xwe de wê bi wateyî wê bihawênê. Têngîna nivîsandinê, wê piştî pêvajoya jîyane civakê a şariştanî û pê de wê, wê ji pêvajoyek wê û pê de wê pêşbikeve. Ji wê pêvajoya wê û pê de wê nivîsandin, wê weke temenekî jîyanê bê. Wê weke rêya

çareserîyan bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, weke rewş û rastîyeka xêvî a di jîyanê de bê.

Têgîna nivîstê, wê weke têgîneka teybet bê. Têgîna nivîstê, wê weke têgîneka ku ew di çerçoveya têgîna minaq bi xwe re bawerkirina 'tilsim'an û hwd jî wê rengê wê yê din ê bi nivîskî bê. Tilsim, wê weke keviyek, amûrek, tiştêk û hwd, ku ew bi hebûnî heya, wê di wê çerçoveyê de bê. Minaq, di nava kurdan de wê, bê bawerkirin ku wê hesin, wê acînî, nikaribin di wê re derbas bibin û wê devera ku ew hesin li wê hebê, wê nêzî wê nebin. Di vê çerçoveyê de wê bawerîyek wê di nava wan de wê hebê. Bi wê re wê, gelek rengên bi vî rengî wê hebin. Di nava kurdan de wê, piştê wê, hesin, wê dem bi dem wê bi xwe re wê bê barkirin bo parastinê. Nivîst, di nava kurdan de wê di aslê xwe de wê di rengê de wê xwediyê awayekê bi wê rengê ê bawerkinê bê. Wê gotinên ku ew di nivîstê de ew dihên nivîsandin ku ew weke 'gotinên afsûnî' û ankû 'gotinên pîroz' in, wê ew gotin, wê karekî parastinê ê ku ew nahêlin ku wê gîyanên xirab nêzî wan bibin û wê wan ji xirabiyên wan biparêzên. Di vê çerçoveyê de wê bi têgînekê wê ew werina hanîn li ser ziman. Têgîna bawerkirina tilsiman weke nivîstan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê. Bi wê re wê, ji çî wê were parastin, wê di nivîstê de wê were hanîn li ser ziman. Yan jî wê çî were parastin, wê ew were hanîn li ser ziman. Li rex wê jî wê gotinên afsûnî û ankû pîroz wê werina nivîsandin. Nivîst, rengê li hevdû pêçandina wê jî wê hertimî wê giringî wê dabanê de. Wê hertimî wê weke 'sê-koşeyî' wê çê bikiran. Wateyek wê çêkirina nivîstê wê weke bi sêkoşeyî, wê heba. Di vê çerçoveyê de wê ew nivîst, wê piştî ku ew hat çêkirin, wê mirovên ku ew bo wan hatîya çêkirin, wê ew bar bikira bi xwe re. Bi teybetî û giştî wê du rengên çêkirina nivîstan wê heba. Rengê pêşî, wê li gorî kes û rewşa ku ew bo wê dihê çêkirin bê. Di vê çerçoveyê de wê, ew nivîst ku ew bo kê û çî rewşê ew hat çêkirin, wê bi heta bawerkirin ku ew tenê wê li ser wan bi kes û rewşan wê bi bandûr bûba. Wekî din jî wê, hinekî din nikarîba ji wê fêde bidîta û ankû wê nikarîba wê bi xwe re bawer bikira. Rengên din ê nivîstê ê duyem jî wê bi awayekî giştî wê bii heta çêkirin. Ev rengê wê jî wê, bi teybetî wê ji kesekî re wê biheta çêkirin û wê bikêrî hemû rewşên ku wê biheta serî wê biheta. Yanî wê, bi gotineka din, wê ew mirov, wê ji hemû rewşên xirab ên ku wê biheta serê mirov, wê li hemberî wan wê weke rewşek parastinê, wê hebûna wê xwe dîyar bikira.

Di vê çerçoveyê de wê ew darêjkên afsûnî wê di wê de wê bihetan ser ziman. Yan jî wê, di wê nivîstê de wê bi gotinên afsûnî wê rewşek bi 'çerçoveyî' wê bi heta çêkirin ku ew mirov di hundûrê wê çerçoveyê de ew cihgirtiba û wê ti tiştên xirab weke gîyan û tiştên xirab ku wê nikarîba ji wê çerçoveyê derbas bûba. Hêza afsûnî a wê nivîstê ku ew bi wê di hat bawerkirin, wê karîba ya baş û ya nebaş ji hevdû bivaqatanda. Bo vê yekê, wê ew ne li dijî yên baş û rewşên baş ba. Wê tenê li dijî yên nebaş û rewşên nebaş bûba. Di vê çerçoveyê de wê, ew mirov jî wê di awayekî ewla de wê jîyane xwe wê bide domandin.

Çerçoveya têgîna darêjkî a afsûnî a ku ew bi nivîstê re ew dihat hanîn li ser ziman, wê weke têgîneka ku em wê di vê çerçoveyê de wê weke *darêjkek afsûnî a ku ew hatî pêşxistin* jî wê dikarin wê werênina li ser ziman.

Bi wê re jî wê rengê din ê pêşxistina darêjkên afsûnî wê hebe. Ew jî wê li ser tişt û rewşên ku ew hatiban kiriban nava hevdû de. Minaq, wê hinek mirovên ku ew weke afsûnkar bûn, wê ji xwezayê wê zanîban ku wê çî şinahî wê kêrî çî biheta. Wê ew

şinahî, wê li cem xwe bigirtan. Minaq ku mirov nexweş ket, wê wan zanîba ku wê çî ji wê nexweşiyê re wê başa. Wê wan ew şinahî, wê hanîba berhevkirin û wê kiriba nava hevdû de wê bidan wî mirovî ku wî ew bixwara. Bi wê re jî ku ew baş bûba. Ev rengê weke ku ew li ser zanîna şinahîyan û nebetên xwezayî re ew dihat pêşxistin, wê weke têgîneka sîmyayî a ku wê ew hatiba pêşxistin ba. Di vê çerçoveyê de wê kî derdê wan heba, wê serî li wan afsûnkaran bixistan ku wan ji wan re derman çê bikira. Ev rewşa weke çareseriyê jî ya bi başkirinê û ankû 'şifakirinê' wê bi gotina 'derman're wê di nava kurdan de wê were hanîn li ser ziman. Gotina *dermanê*, wê koka wê li ser wateya 'derd' û 'manê(dîtina çareseriyê ji derd' re) re bê. Di vê çerçoveyê de wê ew were hanîn li ser ziman.

Li vir, ev rengên weke darêjkên afsûnî wê bo parastîya aheng û aramiya jîyane mirov, wê bihetan pêşxistin. Wê bi wê hizir û hêncetê wê bihetan pêşxistin. Li vir, li ser têgîna 'başî û nebaşiyê' re wê ew ji hevdû vaqatandin wê were kirin. Ya ne baş, ku ew di laş de weke birînekê, nexweşiyekê, rast ne dîtî û ne axiftin û ne tevgerînê bê. Dema ku ew rewş di laş de ew hebin û mirov nikaribê di jîyanê de bibê xwediyê ahengekê, hingî ew nebaşî tevî mirov bûya û di laşê mirov de ew bicih bûya. Bo vê yekê, di vê çerçoveyê de wê di serdemên berê de wê weke rewşa derxistina gîyanên nebaş û hwd ji laş wê werina pêşxistin. Ev wê weke bi têgîna 'paqij'kirinê û hwd wê werina pêşxistin. Mirov, kengî ku ew bîaqil bû, rast tevgerîya û bi mantiqî gavên xwe avêt û hwd, ew hingî baş û bi tendûrûst a. Di vê çerçoveyê de wê, ya rast wê were pêşxistin. Têgînen weke başkirinê ku wê di serdemên berê de wê li ser têkilîya nava gîyan û laş, zêhn û fizîkê, mirov û jîyanê, mirov û mirov û hwd de wê were pêşxistin, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê ermançek bi parastina wê rewşa tendirûst a bi aram a bi keseyet, gîyan û laşê mirov re bin. Rewşên weke nexweşiyê ên fizîkî, wê li laş xwe bidina dîyarkirin. Ev rewş jî wê dema ku ew ji ya nebaş ku ew tişteket ket laş û ankû bandûra xwe li laş kir û hwd, wê hingî ew nexweşî wê di laş de wê rû bide. Nexweşiyên gîyanî, wê weke her wusa wê weke rewşên derûnîkî û hwd bin. Ev jî wê, di rewşekî de ku mirov nikaribê ya rast û ya ne rast û ankû ya baş û ya nebaş ji hevdû derxê, di mejiyê mirov de nezelaî û hwd çê bibê, aqilê mirov hertimî tevlihev bê û hwd, wê ew rewş jî wê weke rewşên nexweşîya gîyanî bin. Di vê çerçoveyê de wê ew wê werina hanîn li ser ziman. Ahenge têkilîya nava gîyanê û laş jî wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka ku mirov wê hilde li dest bê. Kengî ew ahenge têkilîya nava gîyan û laş xira dibê, kengî ku ew mudaheleyên nebaş li wê bûn, wê hingî ew nebaşî wê di wê rewşa têkilîya nava gîyan û laş de wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir, rewşa têkilîya laş û gîyanê, û her wusa rewşa têgîna afsûnê, wê ji gelek alîyan ve wê di vê çerçoveyê de wê bi hevdû re wê were hildan li dest. Em di vê ku wê jî li vir di dewama mijarê de wê hildina li dest û hinekî li ser wê jî bisekin in.

Di rewşa têkilîya nava gîyan û laş de wê, ew rewşa afsûnê wê renekî ku wê têkilîyê wê ji gelek alîyan ve wê bide dîyarkirin bê. Hizrên weke encama nîqaşan ku wê berê wê werina hanîn li ser ziman û wê di wan de wê were hanîn li ser ziman ku 'wê, gîyan laş biafirênê bo ku ew di wê de bijî û ankû wê laş bo ku ew heya wê gîyane wê biafirê' û hwd, wê di çerçoveyeka ku wê têkilîya nava gîyan û laş ku wê bi xwe re wê bikina berlêpîrsinê de bin. Rewşa gîyan û laş, wê hertimî wê weke mijareka ku wê rojava aqilê mirov wê bide dîyarkirin bê. Nexweşiyên ku wê bi mirov re wê bibin, nebaşiyên di mejî

de ku wê ew bibin û hwd, wê ew weke encamna laş û ankû gîyanê wê werina hanîn li ser ziman.

Rewşa têgîna gîyanê ku ew piştî ku laş mirov mir û pê de wê çî ji wê were û hwd, wê ev jî wê weke mijareka ku wê li ser wê were sekin in bê. Aqilê mirov, wê li ser wê re wê li mirov wê bihizirê. Di çerçoveya gîyan û laş de mirov, ku li gotina 'mîrov' û ya 'keseyetîyê' bihizirê, weke ku em di roja me de dikin, wê di vê çerçoveyê de wê bi rengêkî dîalîteyî wê weke wê re wê were li ser ziman. Gîyan, wê li gorî ku mirov wê bihizirê wê her hebê. Her wusa, hizra 'nemirîtîyê' jî wê di aqilê xwe de wê weke encamekê vê bê. Mîrovê ku ew di hîzirê ku wê gîyan nemir bê, wê ji aliyekî mejîyê xwe ve wê bihizirê ku wê ew nemir bê. Wê gîyane wî, wê dem bi dem wê di laşan de wê bijî. Wê demekê di laşekî de wê bijî. Ku ew laş mir, wê ji wê derkeve û wê laşekî xwe yê dibîn wê bibînê û wê di wê de wê bijî. Têgîna derketin û ketina gîyan li laş, wê di vê çerçoveyê de wê temenê hizra 'reankarnasyonê' û hwd bê.

Ev rengên hizrî ku em bi serdeme felsefeyê û hwd re wê bitêgînên weke reankarnasyonê û hwd re mirov wê bibînê wê şewayekî bi hevdu re zewicendina aqil û afsûnê jî wê bi xwe re wê bidina nîşandin. Di çerçoveya felsefeyê de hewldana fahmkirina vê rewşê, wê weke destpêka wê têkilîyê bê.

Hizrên mirov ên ku ew di serê mirov de ew diafirin, wê mirov wê çawa wê bi wan re wê jîyane xwe wê bide domandin û wê bi wan wê hewirdor, jîyan û rastteqînîya xwe ya jîyanî wê fahm bikê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê aqil gavên mazin wê bi pêşde wê bi xwe re wê biavêjê. Rewşa têgîna fahmkirina rewşên jîyanî, wê li ser rewş û pêşveçûnên jîyanê re bin. Mînaq, nexweşîyek ku em wê çareserîya wê lêdigerihin, ew wê di laşê mirov de wê xwe bide diyarkirin. Di vê çerçoveyê de têkiliya hizirkirinê a bi jîyanê re wê li ser rewşên wê yên pêşketinê re bê. Ev jî wê bi awayekî wê di destpêkê de wê xwe bi têgîna afsûnê û darêjkên wê yên afsûnî û hwd re wê xwe bide nîşandin. Darêjkên afsûnî, wê weke rêyna çareserîyê bin. Piştî wê, ev rêyên çareserîyê ku wê çawa wê weke ku em bi rengê hizirkirina bi darêjkên afsûnî ên piştî dibînin ku wê bi wan darêjkên afsûnî re wê mirov wê bê xistin binsehêtê de wê, di vê çerçoveyê de wê darêjkên afsûnî wê ermanca wan ya têgînî a ku ew bi gotina çareserîyê re ew dihat hanîn li ser ziman, wê were gûharandin.

Dema ku em bahse *darêjkên afsûnî*(*) dikin em, li vir dikarin gotina 'darêjkê' bi serê xwe wê hildina li dest. Darêjk, wê weke çerçoveyeka ku wê bi wê re wê çareserî wê were pêşxistin bê. Mînaq, wê ji nexweşîyekê re wê derman wê were pêşxistin û hwd. Lê bi heman rengê ew aqilê mirov ku ew dikarê êdî ew derman bi wê aqilê xwe re weke darêjka afsûnî û hwd wê pêşbixê. Wê darêjkên nexweşîkirinê' û ankû 'darêjkên nexweşîyê' jî wê pêşbixê. Rewşa weke ku wê di nava kurdan de wê were hanîn li ser ziman ku wê bê gotin ku 'ew mirov, li ser wî darêjkek afsûnî hat pêşxistin û piştî ew jî hişket, nexweşket û jî jîyanê ket û di dawîya dawî de ew mir' jî wê, vê bi vê rastiya têgîna 'darêjkên nexweşîyê' ên bi ermanca pêşxistina wê re wê, werê hanîn li ser ziman. Bi gotineka din, di hat gotin ku 'ew, hatîya bîafsûnkirin. Kirina jîyane mirovekî bin sehêtê jî, wê weke *nexweşîyekê* bê. Li gorî mantiq û ankû vaca wê, heta ku mirov xwe ji bin wê sehêtê xilas nekê wê ew nexweş bê û wê wûsa li wî wê nêzikatî wê were kirin.

(*)Darêjkên afsûnî wê, navê darêjk û ankû formulên afsûnî ku ew rewşên weke nexweşîyê, girêdan û ankû bandûrê di jîyane mirovên din de çêbikin wê were bikarhanîn bê. Di demên ku wê bawerî bi afsûnê hebê wê ew wê werina bikarhanîn.

Mirovên ku ew bi vîna xwe tevnegerihin ku ew weke mirovna ku ew 'gîyanên nebaş' û ankû 'gîyanên xirab' ku ew ketina laş wan de wê, weke nexweşiyekê wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî wê, bi têngîna derxistina gîyane nebaş' ji laşê wî mirovî re wê, rewşa başkirina wî wê heta kirin.

Têngîna başî û nebaşiyê, wê bi dûalîteya xwe re wê, xwediyê dîrokek û mejûyek pîrr kevn bê. Her wusa, wê di serdemên şariştaniyê ên piştî de wê, têngîna başî û nebaşiyê wê bi aqil wê were pêşxistin. Em li serdemên destpêkê ên afsûnê dinerin, wê di vê çerçoveyê de wê ev rewş wê li ser rewşên ku mirov xwe ji wan dûr digirê, ditirsihê û nikarê li dijî wan rabê re wê xwe bide nîşandin. Têngîna dûalîteya başî û nebaşiyê(*), wê weke têngîneka tekoşînê a başiyê bi aliyê nebaşê di vê çerçoveyê de ku wê xwe bide nîşandin bê. Em vê yekê wê kifş dikin ku wê di serdemên destpêka afsûnê de wê hêzek serdest weke ya bi navê 'xwûdê' û hwd re wê nebê. Wê di vê çerçoveyê wê hîyararşiyek jîyanî a ku ew li wêê gorî wê hatîya dîzaynkirin wê nebê. Di rewşa heyî de wê fahmkirin, têngiştin û gihiştina zanîna wê, wê li pêş bê. Di rewşa fahmkirina têngîna başî û nebaşiyê de wê, di serdemên piştî de wê bi pêşketina wê re wê, di nava ya baş û ya ne baş de wê xatek têngiştinê wê kişandin. Têngînen weke têngînen başî û nebaşiyê, wê têngîna aqilî ên li serdemên aqilê pêşketî ê felsefeyê û hwd bin. Di rewşa têngîna afsûnê de wê darêjkên ku weke darêjkên afsûnî jî wê werina bi navkirin, wê weke çareseriyekê bê. Di vê çerçoveyê de wê werina pêşxistin. Wê li gorî çî têngîne û rengê wê, wê çareserî wê were pêşxistin, ew ne kifş bû. Ya ku wê di destpêkê de wê li wê bihatîya lêgerîn jî wê ne ew bê. Piştî wê, li wê were lêgerîn. Di serdemên pêşketina aqil de wê, were lêgerîn. Wê piştî wê tişt bi başî û nebaşîya xwe re wê were lêpîrsin.

Darêjkên afsûnî ên ku ew weke bi darêjkên weke nivîsandinê ên weke bi çêkirina nivîst û tilsiman re bê û ankû weke pêşxistina rewşên darêjkî ên weke bi dermanan û hwd re bê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê. Di serdemên berê de wê dermankirin, wê weke karê afsûnkaran wê bihata dîtin. Wê ew ji wê berpîrsîyar ban.

Pêşketina pêvajoyên zanîne, wê her wusa wê rewşa aqil û ankû zanîne, wê ji wan rewşên afsûnî ku ew hatina pêşxistin, wê ji wan gavê biavêjê û pêvajoyên xwe yên piştî wê, pêşbixê. Di vê çerçoveyê de di rewşa afsûnê û ankû zanîne de wê, ya ku wê bibê, wê herdû jî di nava hevdu de û wê bi hevdu wê pêşbikevin û wê hebin. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rengê afsûnkarîya serdemên destpêkê wê xwe bi sipêrê çareseriyên xwezayî. Her wusa, mirov vê jî bi wê re wê kifş dike ku wê di serdemên destpêkê de wê, çareseriyên darêjkî ên weke dermankirinê û hwd, wê ji şênî û ankû nebetên xwezayê wê sîd wê were girtin. Wê di temenê wan darêjkên afsûnî ên destpêkê û têngîna wan de wê zanînek xwezayî a teybet wê hebê.

Têngîna afsûnkar, wê di vê rewşê de wê weke'yê ku ew her tiştî dizanê wê were li ser ziman. Di aslê xwe de wê têngîna 'xwûdê' bixwe jî wê hilm û temenê xwe jî wê ji wê têngîne wê bigirê. Di vê çerçoveyê de wê, di pêvajoyên wê yên destpêkê de wê wusa bê. Lê di pêvajoyên piştî ên pêşketina têngîna 'xwûdê' de wê, hertişt wê bi navê xwûdê' wê

(*Dualîteya başî û nebaşiyê wê weke têngîneka 'karma' jî wê, were dîtin û şirovekiim. Têngîna karma a bi rengê ti başiyê bikê wê başî bi serê te were û ku tu nebaşiyê bikê wê nebaşî bi serê te wereê wê, di temenê wê de ev fahmkirina dûalîsmê wê hebê. Bawerîya bi wê karmayê wê, ew bê ku mirov hertimî baş bikê û baş bi hizirê ku tiştên baş hertimî rastî mirov werin bê.

werê hanîn li ser ziman. Piştê jî wê li pişt her hebûn û afrînerîyê û şînbûnê û hwd, wê ew were lêgerîn. Têgîna 'wahîyê' wê, di aslê xwe de wê ji aliyekî ve wê di rengê wê de wê gotina afsûnê bi têgîna wê re wê hebê. Pirsgirêka fahmkirina rastîya ku wê di destpêkê de wê hertimî hêzek wê hebê û ankû wê nebê, wê di çerçoveya hizirkirin, nîqaşkirinê bi teorîkî û hwd, wê heta roja me were. Li ser hebûna olê re wê bê gotin ku 'di destpêka olê de wê bawerîya xwûdê wê hebê.' Li vir, rengê fahmkirinê ê weke bi têgîna gotina pirsgirêkê re wê li vir jî wê xwe bide dîyarkirin ku em vê 'destpêka olê' weke gotinekê wê heta serdemên destpêka demên afsûnê jê wê bibin? Li vir, her çendî ku wê ne zelalî wê di mejîyan de wê di wê de wê hebê jî lê me, wusa dihizirin ku em nikarin wê bibin. Têgîna olê, wê hinekî jî wê bi hişmendî' wê têgînekê wê bi xwe re û di temenê xwe de wê bihawênê. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê re wê têgîneka nerfînî a li jîyanê wê were pêşxistin. Rewşa fahmkirina têgîna olê, wê li gorî hinekan wê, weke hinek rewşên dema têgîna afsûnê ku ew dejenere bûna wê, bi wê re wê pêşbikeve. Li gorî hinekan jî wê, bi dawî li wê demê hatinê re wê pêvajoya destpêka olê wê destpê bike. Li vir, em dema ku li xate pêşketina pêvajoyên serdema afsûnê ên li kurdistanê ên civake kurd û her wusa civakên din ên ji serdema sûmerîyan û bi vir ve weke babilîyan û hwd, ku mirov li wan dînerê, mirov dibînê ku wê ya ku wê bê dîtinê, wê di pêvajoyek peresendinî de wê hebûna xwe di dewama hevdû de wê bide domandin. Têgîna 'peresendinê' li vir, em divê ku weke têgînekê di çerçoveya pêvajoyên serdema afsûnê û piştê yên olê re wê di temen de wê hilde li dest.

Em vê jî wê dibînin ku wê têgînê ku ew têgîna peresendinê red dikin, ew wê hertimî wê pêvajoyên pêşketinê civakî û olî û hwd, wê weke 'dejenerebûnê' wê werina li ser ziman. Ev jî wê, di destpêka fahmkirinê û nêzîkatîyê de wê temenê pirsgirêkên jîyanî ên ku wê xwe bidina li rû bin.

Di rewşên weke dema ku mirov di rewşek xirab de bê, bixwezê ku kare mirov rast herê, tiştên xirab newîna serê mirov, mirov ji qaza û belayan xilas bike û hwd, wê weke hêvîyên ku wê ji xwûdê wê werina kirin bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku serî li xwûdê jî dide, di aslê xwe de weke ku mirov di vê çerçova û rengê serlêdanê de mirov dibînê ku wê têgîna afsûnî weke ku wê serlêbixê bê. Hêzeka ku ew her tişt bo wê bi derfet a, wê di vê çerçoveyê de wê bi têgîna afsûnê re wê bi derfet bê. Di vê çerçoveyê de wê olên ku wê piştê wê werin ku ew afsûnê 'red' jî bikin, wê di vê çerçoveyê de wê bi têgînê afsûnî ên bawerî re wê bijîn.

Weke ku em di pêvajoyên şariştaniyê ên destpêkê de mirov, dibînê wê weke ku di pêvajoyên şariştaniya sûmerîyan û piştê wê were ser ziman ku wê 'xwûdê' wê weke yê ku ew afirandina ard û azman, hebûna şev û rojê û hwd, wê di wê de wê bi vê rengê wê werê li ser ziman. Ev têgîn, wê piştê wê di hemû olên ku wê werina re wê di wan de jî wê bi şewayekî wê were li ser ziman. Olên ku wê piştê wê pêşbikevin, wê li şûna gotina afsûnê wê gotina 'wahîyê' wê pêşbixin. Gotina 'wahîyê(*)' di kurdî de wateya wê 'ya ku ew ji nebûnê rûda', 'ya ku ew hatîya destnîşankirin', 'ya ku ew heya' û hwd, bê. Ji nebûnê hanîna li hebûnê û ankû afirandin, wê tenê weke têgînek ku ew bi aqilê afsûnî re wê were li ser ziman bê.

Em li ser têgîna darêjkê re wê, ji vir û pê de wê bidina domandin. Her wusa ev têgîna darêjkê a bi têgîna afsûnê re ku ew pêş dikevê, wê di wê de wê têgîna çareserîyê wê bi

(*)Wahiy wê, xosletekê olên kurdistanî û mesopotamîkî bê. Wê bi hatina peyamê ji xwûdê wê wate bistênê. Di hersê olên semewî de têgîna daketina pirtûkên pîroz wê, di wê çerçoveyê de wê, xwediyê wateye bê.

xwe re wê werênê hanîn li ser ziman. Minaq, yekî ku ew nexweş a ku ew wê çawa were başkirin, wê li vir, wê bi wê re wê were çare ji wê re dîtin. Weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman. Dema ku mirovek nexweş dikeve, mirovê ku ew dizanin ku wê şînahîyên di xwezayê de ew kêrî çî tî û ankû wê çî wê kêrî wê nexweşîyê were, wê wan bidina li hevdûkirin û wê tevlîhevdû bikin û wê bi wê re wê weke dermanê wê nexweşîyê başkirinê wê çê bikin. Ev, wê ji aliyekî ve wê weke ku ew di wê demê de wê werênina li ser ziman wê bê *darêjkek afsûnî a başkirinê* jî.

Rewşa başkirinê wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka ku wê were pêşxistin bê. Başkirin, wê weke karekî darêjkên afsûnî bê. Ev rengê ku wê ji şîniyên xwezayê wê sûdwere girtin û wê were pêşxistin, wê bê dayîn domandin. Lê rengêkî din jî wê hebe, weke ku em di nava kurdan de ji serdemên berê heta roja me, em wê dibînin jî wê rewşa jî hevdû re hanîna li ser ziman a gotinan, wê weke rewşek afsûnî jî wê were şîrovekirin. Minaq, 'nifir', bêdûa', 'çîrekirin' û hwd, wê çend ji wan rengên ku weke rewşên afsûnî dihatina hanîn li ser ziman bê. Nifir wê, bêdûa bê. Sêf jî wê çîrekirin bê. Di vê çerçoveyê de wê, gotinên weke 'nifir' wê ji hevdû re wê bikiran, minaq gotineka 'hêvî bikim ku tu negihîjê miredê xwe' û hwd, wê weke gotineka nifirî bê. Wê nifirek bê. Piştê jî ku karê wê mirova ku ew nifir bi vê gotinê li wê hatîya kirin ku ew rast neçû û pîrsgirêk derketina li pêşîyê, wê biheta gotin ku '*ne li wê nifir hatibûbûna kirin*'. Di nava civake kurd de wê heta roja me jî wê li ser van rewşan wê bi wan bawer kirin wê hebê. Rewşa hebûna olê bixwe jî wê weke piştgirîyeka ku ew rewşên weke nifir û hwd ku ew mayînda bimênin bê. Rewşa kirina nifiran, weke yekî ku ew nexwezê karê yekî din rast di rêya xwe de herê, wê li ser wê re wê weke bêdûayekê bê. Dema ku mirov ew gotina weke nifirê kir, yê ku ew gotin li wê hatîya kirin jî wê bawer bike ku ew nifir çawa hatîya kirin, wê wusa wê were serî wî.

Ev rewşa weke ya bi tîgîna nifirê re mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê hinekî din kûrtir bikê. Ber ku wê ev, wê nêzikatîyêkê wê bi xwe re wê bide nîşandin. Rewşa nifirê, wê dema ku ew li yekî hat kirin, wê demê ku ew karê wê di rê de û rast neçû û astengî û ankû pîrsgirêk ku ew derketina li pêşîyê, wê di vê çerçoveyê de wê sedem di wê nifirê de wê were lêgerîn. Di vê çerçoveyê de wê bi vê rengê wê gelek rewş wê hebin. Minaq, wê di jîyanê de wê di nava civake kurd de ku ew bûya weke kevneşopîyêkê wê gotin ku *dema ku yekî av li ber çavê yekê vexwart û ankû xwarin li berçav yekê xwar û ew dewet nekir, wê biheta gotin ku 'marê wî, wê êvarî wê were xewna te' ber ku ew li berçavan xwarîya û te ew mirovê ku te li ber wan xwarîya û te nedaya wan û ankû te ew dewetî xwarinê ne kirin*. Bi vê rengê wê bahse wê were kirin. Dema ku yê ku wî meyîzend, ew divê ku ew were dewet kirin li xwarinê. Ankû tişta ku mirov ew xwar, bi wî re parve bike. Yanî tê gotin ku wê marê wî, wê were û bikeve xewna mirov de. 'mantiqê vê gotinê ew a ku mirov li berçavê yekî birçî xwarinê nexwe û yan jî ku mirov xwarina xwe xwar mirov wî jî dewetî wê xwarinê bike û xwarina xwe bi wî re parve bike. Di vê çerçoveyê de ku ew gezek xwarin jî bê û ankû gezek nan jî bê, ew bi vê rengê ew were parve kirin.

Marê zikbirçibûnê, wê bi vê rengê wê weke tîgîneka pîr zêde kevn a bi hezaran salan ku wê di nava kurdan de wê hebê bê. Ev tîgîna marê zikbirçibûnê, wê bi gelek şêwayan wê were gotin. Minaq, wê weke gotineka ji nava xalkê wê bê gotin ku "*mîrov, ku dît ku marek ku ew devê wî di avê de ku ew avê divexwe, mirov wê nikaribê dest lê bide û wê marê bikujê*", heta ku ew devê xwe ji wê derxê. Di nava kurdan de tîgîn û

gotina 'ku mirovek devê wî di avê de mirov, nikaribê dest li wî rakê', wê ji vê gotinê bi şêwayekî wê were derhanîn. Mantiqê vê gotinê jî wê ew bê ku yekî ku devê wî di avê de ew mirov û ankû zindî, wê dest li wê newê rakirin. Ev gotin, bi vê rengê wê bo hemû zindîyan ku ew mirov bê û ne mirov bê, wê bo wan wê were gotin.

Têgîna bi gotinên weke 'nifirê' û hwd re wê ew bê ku ew dema ku ew nifir ji mirov re ew hat kirin, wê bêbaxî û bêşansîyê wê ji mirov re wê werênê. Di vê çerçoveyê de wê têgînek pirr zêde vekirî û pêşketî wê di nava civakê de wê ji gelek aliyên ve wê werê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê çend mînaqan jî werênê li ser ziman.

Mînaqa pêşî, mirov dikarê bi *zaroka sêwî* re wê werênê li ser ziman. Zarok sêwî, weke zarok ku wê dê û ankû bavê û anjî ku ew herdû windakirina û li jîyanê bêdêûbav maya bê. Ev zarok, di nava kurdan de ew dihê bawerkirin ku ew ji aliyê du farîşte(meleyîket)yan ve ew hertimî heta dawîya jîyane wê, wê ew were parastin. Gotinên wê yên ku ew xêrê ji mirovan re dixwezê, dixwezê ku karê mirovan rast herê, ku ew dixwezê ku tiştên baş werê serê mirovan û hwd, li gorî bawerîya di nava xalkê de wê bê bawerkirin ku ew xwestekên wê yên ji dil wê hertimî wê were li cih. Ku mirovekî ku ew kî jî bê ku ew nehaqîyekê li wê bike, wê ew di jîyane xwe de wê rastî tiştêkî pirr xirab wê were. Wê karê wî rast neçê. Wê ew di male xwe de wê aramiyê nebînê. Di vê çerçoveyê de ew dihê hanîn li ser ziman.

Bi wê re jî wê çawa nêzikî zarokê wê were kirin, wê hertimî wê mirov li wê bi başî bihizirê. Wê hertimî wan zarokên bi vî rengî wê bibîr bike. Wê qanciyê bi wan bike. Wê wan bi tenê nehêlê. Di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê mirovatîya xwe ya ku ew ji dilê tê, wê li wê zarokê wê bide nîşandin. Wê hertimî di jîyane wê de wê ji wê re wê bê alîkar û piştgir. Wê hertimî wê li rex wê xwe bide hîskirin. Wê nehêlê ku ew zarok, xwe xirab hîs bike. Wê nehêlê ku ew di jîyane xwe de ew bikeve rewşek zor de. Ku ew dê bê, wê hertimî xwe weke dayîka wê bibînê. Ku ew bav wê, wê hertimî xwe weke bavê wê bibînê. Ku ew dapîr bê, wê hertimî xwe dapîrê wê bibînê. Ku ew bapîr bê, wê hertimî xwe weke bapîra wê bibînê. Ku ew xwûşk bê, wê hertimî xwe weke xwûşka wê bibînê û nêzî bibê. Ku ew bira bê, wê hertimî ew xwe weke birayê wê bibînê û wê nêzî wê bibê.

Di nava civakê de wê, bi vê rengê wê zarokên bi vî rengî wê gotinên wan yê xêrê jî û yên ne xêrê jî wê werina li cih. Di vê çerçoveyê de wê, di nava xalkê de wê ew were bawerkirin. Li ser wê re wê, hertimî wê mirovên ji nava civakê wê bixwezin û bikin ku ew gotina xêrê a wê zarokê ew ji wê li xwe hildin. Wê di vê çerçoveyê de wê nêzî wê bibin. Zarok, ku ew bibê mijara gotinê, em dikarin di vê çerçoveyê de ji gelek aliyên ve wê werênina li ser ziman. Mînaq, zaroka ku ew di dema hat dunyê ku ew ji dayika xwe re ku ew bibê ku ew bimirê, wê ew weke farîştayekê, wê her hebê. Di vê çerçoveyê de wê bi bawerî bahse wê bikin. Têgîna *farîştatîya zarokên piçûk*, wê di vê çerçoveyê de wê di nava kurdan de wê weke bawerîyeka ku ew di nava kurdên gûtî, qasît, hûrî, mîtanî û medîya de jî wê hebê. Piştê jî wê xwe bide domandin. Zarok, di vê çerçoveyê de wê ew were hanîn li ser ziman. Di nava kurdan de zarok, hertimî ew begûneh dihên dîtin. Ew di vê çerçoveyê de wê bi gotina 'sabî' re wê werina hanîn li ser ziman. Gotina 'sabî', wê di nava kurdan de wê tenê wê bo rewşên bi vê rengê wê werê hanîn li ser ziman.

Minaq duyem jî mirov dikarê ji rewşa zarokên ciwan wê werênê li ser ziman. Di nava kurdan de wê, çiroka pepokê wê hebê. Tê gotin û bawerkirin ku rojekê keçikek ciwan û birakê wê yê piçûk ew hebûn. Wan gelekî hij hevdû dikir. Lê rojekê ku ew bi hevdû re dileyistin, dibêjin u keçik bi henekî birayê bi şûn ve tahfand û birayê wê ket û serê wî li keviyekî ket û mir, Keçik, wilqasî ji dil halîya û êşîya, ji xwûdê û yazdanê mazin xwest ku ew wê bike weke pepokê. Piştê tê gotin ku ew pepok, ew keçik a. Her timî li deverên bilind didênê û deng derdixê û dibêjê *'pepo pu.'* Vegotina li er vê gotina tayrê pepokê a *'pepo pu'* yê jî wê ew a ku ew dihê gotin ku *"pepo pu, kê kuşt, min kuşt"* a. Di vê çerçoveyê de ev gotin, weke vegotinek bi hezaran salan ew heta roja me, hertimî ew di nava kurdan de ew dihê vegotinê. Çiroka pepokê, heya û pîr dirêj di nava xalkê de li kurdistanê bi devkî dihê vegotin.

Di vê çerçoveyê de mirov weke ku wê ji vê rengê vegotinê bawer bike ku wê bê bawerkirin ku mirov ji rengê xwe yê mirovî dikarê bigûharê û bibê cûreyekî din ê zindîyî, weke ku mirov bi keçika ku wê xwest ku ew bibê pepokê ku mirov wê kifş dike. Di vê çerçoveyê têngîneka afsûnî a civakî wê bahse wê were kirin. Di nava civakî de wê zêde mirov wê li hevdû nifiran wê nekê û wê nebêjê ku *'tû bibê ev tişt.'* Yanî, weke ku yek nifirekê li mirovekî bikê û bibêjê *'ez xwezî dikim ku tu bibê pepoka serê çîyan.'* Û yan jî wê bi heman rengî wê navê zindiyekî din wê bikarneyênê wê nifirekê nekê. Ber ku ew berê jî dinava civakê de ew di hat bawerkirin ku wê dema ku mirov bi wê rengê nifir kir, wê ew bibê û wê mirov wê bigûharê û wê bibê ew zindîya ku ew hatîya xwestin ku mirov bibê ew.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ev rengê têngînî ê bi bawerî, wê di nava kurdan de wê pêşketî bê. Bi wê re jî ew têngîna weke ya *'acîniyan'* ku ew di nava çirokên kurdan ew heya û hertimî dihê ser ziman, wê ew weke rewşek ji çirokê zêdetir ku ew heya wê bi wê were bawerkirin. Minaq, acînî, wê hertimî wê weke zindîyna ku ew laşê wan weke yê me mirovan ku ew nîn a û lê ku ew dikarin xwe bikina rengê me mirovan de jî wê hertimî wê hebin. Ew wê temenê wan yê jîyanî wê ji yê me miirovan dirêjtir bê. Bi vê rengê wê were bawerkirin.

Li gorî ku mirov wê bi bawerîya li ser acîyan re wê bibînê ku wê ew were hanîn li ser ziman ku *'acînî'* û mirov, di nava me û wan de wê tenê perdeyek li berçav me mirovan wê hebê ku ew nerîna me ji wê derbas nebê û ku wan nabinê. Lê dihat bawerkirin ku hinek mirov wê hertimî wê ew acîniyan wê bibînin û wê acînî jî wê xwe şanî wan bidin û wê bi hevdû re wê bijîn. Di nava kurdan de ew vegotinên ku ew di wan de dihê gotin ku *"mirov, bi jinek acînî re zewîciya"* û ankû wê bê gotin ku *'mirov, bi kurekî acînî re zewîciya'* û hwd, wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê li ser jinên pîr re wê di nava civake kurd de wê ev weke bawerîyekê wê pîr zêde wê were hanîn li ser ziman ku wê ew hertimî wê acînî wê werina li cem wan û wê bi wan re wê xwe bidina nîşandin û wê ew hevdû bibînin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa hevdû dîtina bi acîniyan re jî wê, weke li ser xwesteka acîniyan ku ew pêktê wê were hanîn li ser ziman. Têngîna acînîtiyê wê di vê çerçoveyê de wê di nava kurdan de wê, weke mirovên ku ew dikarin hertiştî bikin û ku wêli jîyanê wê bi rastî wê hebin, ew dihatina vegotin û ji wan dihat bahs kirin. Di vê çerçoveyê de wê ew bihatina hanîn li ser ziman. Têngîna acînîtiyê, wê weke têngîneka afsûnî a ku ew di jîyanê de ew hatîya rûniştin bê. Ne tenê weke çirokekê ew di hatina vegotin. Zaneyên ku kurd ên weke Ahmedî Xanî ku ew pirtûka xwe ya *'mem û zîne'* dinivîsênê ew wê di destpêka wê de wê bi rewş û vegotina acînîtiyê wê

werêne hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têngîna acîntîyê, wê ji rewşek çîrokî zêdetir wê weke abwerîyek afsûnî û hwd jî wê were hanîn li ser ziman. Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têngîna bawerîya bi afsûnê, wê her wusa wê rewşa têngîna acîntîyê wê pîrr baş wê vebêjê. Rengê wê yê vegotinî ê di nava kurdan de wê bi vê rengê wê kûr bê. Her wusa, xosletên ku wê bi wan re wê were hanîn li ser ziman jî ew weke *'yên her tiştî dizanîn'* jî wê ew wê werênina hanîn li ser ziman. Têngîna acîntîyê ew di vê çerçoveyê de wê weke têngînek jîyanî wê bi vegotinî wê were hanîn li ser ziman.

Li vir, di dewama mijarê mirov dikarê weke minaqe sêyem jî bahse *'marê birçîbûnê'* û rewşên ku ew bi wê re dihên ser ziman bike. Têngîna mar, wê ji berê ve wê di nava xate ola êzdayî de wê weke nirxekê wê were hildan li dest. Di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman. Di nava xalkê de ku wê, weke hin vegotinna ku wê bi mar ve girêdayî wê bi bawerî wê werina li ser ziman jî wê, têngînên weke *marê pêvadanê* wê werênina hanîn li ser ziman. Rewşa têngîna marê birçîbûnê, wê hinekî jî wê li ser wê re wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê bahse wê were kirin û wê bê gotin ku *'mîrov, ku dema ku li hemberî mirovekî nan û ankû xwarin xwar û ew dewetî wê xwarina nekîr ku ew ji wê bixwê, wê marê wî wê di xewne mirov de wê bi mirov ve bide. Wê ew jî wê weke marê birçîbûnê wê were hanîn li ser ziman. Bo vê yekê jî mîrov, bo ku wê neji, her timî ku ew xwarinê bixwê, divê ku ew mirovê li dora xwe dewetî li ser sofreyê xwe bike. Wê hingî wê marê wan bi wî ve nedê.*

Ev wê weke rewşek teybet wê di nava xalkê de wê bi hezaran salan, wê bi çîrokî, vegotinî û hwd, wê bi gelek cûre û rengên wê re wê werê hanîn li ser ziman. Vegotinên ku ew bi vê rengê dihênina li ser ziman, wê weke vegotinna ku wê, di vê çerçoveyê de wê, li gorî wê têngîne bin. Wateya marê birçîbûnê ku mirov dema ku xwarinek û ankû tiştêk xwar û hinek li dora mirov hebin û li mirov binerin û mirov wan dewetî bi xwe re xwarinê nekê, û piştêre ku mirov di xewne xwe de dît ku hinek mar hatina mirov û bi mirov ve didin û ankû mirov nikarê xwe ji wan xilas bike û hwd, wê bi wê rengê wê were hanîn li ser ziman.

Li vir, di nava vê mijara marê birçîbûnê de em dikarin têngîna *'çavraqbûnê'* wê werênina li ser ziman. Di nava hevdu de wê ev mijar wê derbas bibin. Wateya têngîna afsûnî a *çavraqbûnê'* wê ew bê ku mirov, çavberda tiştêkî, bi hazn mirov pîrr zêde li tiştêkî li berçavê mirovan nerî, weke ku mirov xwest ku ew tişt bibê ya mirov bi çavraqî ku mirov li wê nerî û hwd wê, bi van rewşan re wê were hanîn li ser ziman.

Çavraqbûn, wê di vê çerçoveyê de wê weke têngîneka ku wê bi demê re wê di nava civakê de wê pîrr zêde wê were hanîn li ser ziman. Minaq, hinek tiştina xweşik ji xwe re dikirin, yan jî tiştina xweşik ji xwe re çê dikin, yan jî ku wê tiştina pîrr xweşik wê biafirênin û ku ew tiştên wan ku ew bi awayekî bêşansî ku tiştina xirab werina serê wan û ankû karê wan bi wan tiştan re rast neçê û hwd, wê di nava xalkê de wê bê gotin ku *'çavê hinek hatîya li wê'* û ankû wê bêjin ku *'çavê hinekan, hatîya li ser min'* bo vê yekê karê min rast naçê û yan jî ku ew tişt windabû û ankû xirabû û ku cilek bû ku ew li deverekê aliqî û qatîya, wê ev gotin wê were hanîn li ser ziman. Di nava civake kurd de wê, ev rewş wê pîrr zêde wê bi wateyî wê werênina hanîn li ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê rewşa çavraqbûnê û ankû çavberdanê û hwd wê werê hanîn li ser ziman. Di aslê xwe de wê, têngîna çavberdanê, wê weke têngîneka serbixwe jî wê bi têngîna afsûnî re wê were hanîn li

ser ziman. Ev rewş, wê hertimî wê were jîyankirin ku mirov tiştê ji xwe re kirî û ankû çêkir ku mirov, karê mirov bi wê rast neçû û ankû mirov di rewşa wê tiştê de mirov rasti tişt û rewşên nebaş hat, wê hingî wê bê gotin ku ew tişt, hinek çavberdayê de. Bo vê yekê ev encam bi wê re derdikeve li holê. Hinek wê li malê xwarinê çê bikin û wê dema ku ew xwarin hat çêkirin ku hinek di devê dêrî ve bûhûrîn û bêhna wê xwarinê çû wan, wê bi heta gotin ku 'tam û dilê hinek mirovên ku ew xwarin bêhna wê çûya wan ketîyê. Heta ku ew mirov, tahm û ankû têj ji wê xwarinê ne hildin, wê mirov wê fêdêyê ji wê xwarinê nebînin.

Di nava xalkê de wê di vê çerçoveyê de wê ev rewş wê weke rewşek teybet wê biheta hanîn li ser ziman. Rewşa xwarinê, wê di vê çerçoveyê de weke ku me hanî li ser ziman, wê bi gelek reng û awayên din re jî wê biheta hanîn li ser ziman. Ev gotinên weke bi rengê 'çavberdanê', 'dilketinê' û hwd, wê dinava xalkê de wê bi vê rengê çandekê wê bi xwe re wê biafirênin. Li gorî bawerîyê, wê bi heta gotin ku mirov, fahmkir ku tam û dilê hinekan hatîya û ketîya wê xwarinê û ku mirov nedê wan, wê ew dilzaxaliya mirov wê bi xwe re wê bide nîşandin. Mirovên dilzaxal jî wê, di nava xalkê de wê rêz û hûrmet wê ne hatiba dayîn li wan.

Mînaq, di nava civakî de wê bihata bawerkirin ku beşek mirov wê hertimî wê marê wan wê pirr zêde wê dijar ba. Ew jî zarokên sêwî ban. Zarokên sêwî, wê weke zarokên ku ew hertimî dilê wan biheta xweşkirin bûn.

Têgîna çavberdanê, wê weke têgîneka ku wê di vê çerçoveyê de wê, pirr zêde wê di nava xalkê de wê biheta hanîn li ser ziman. Di nava çanda civakî de mirov, ku weke ku ew tenê xwe hizirî, dilzaxalî kir û hwd, wê ew mirov, wê weke mirovê nepak wê li wî biheta nerîn. Ev mirov jî wê, zêde wê rêz û hûrmet wê ji wan re wê ne hatiba dayîn nîşandin. Di rewşa mirovê mirov, dilzaxal de wê li ser wî jî wê gelek li ser wî biheta gotin. Mînaq, di nava xalkê de wê ku ew bûya weke gotineka navdar a xalkê wê di nava civake kurd de wê gotina 'zaxvedar' wê bi wê re wê bi têgînek dijar re wê werê hanîn li ser ziman. Bi wê re wê zaxvedarî, wê di nerîna çav de wê xwe bide nîşandin. Bo vê yekê gotina 'awîrên zaxvedar' wê, weke gotineka ku wê ev têgîna zaxaliyê ku wê biheta xistin temenê wê de wê, ew biheta gotin di nava xalkê de. Wê di nava xalkê de wê mirovê zaxal, wê ew bi nerîn, kirin û xûyên xwe re wê xwe bida li dest. Wusa dihat bawerkirin.

Di vê çerçoveyê de em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê di nava civakê de wê pirr zêde wê li ser xosletên keseyetîyan wê biheta hizirkirin. Têgîneka pirr zêde pêşketî a di derbarê keseyet û xosletên keseyetîyan de wê, xwe bidê afirandin. Mirov, dema ku wê navaroka civakê wê hewl bide ku wê fahm bike, wê di aslê xwe de wê ji aliyekî ve wê ew têgîna ku ew bi xosletên keseyetîyê re ew dihê zanîn, ew wê pêşî wê were dîtîn û zanîn. Rewşên keseyetî, wê pirr zêde wê mirovan wê li ser wan serî biwastanda. Wê kesên ku mirovan ew di jîyane xwe de didîtîn, wê pirr zêde wê awîrên xwe bidan li ser tevger, kirin û xûyên wan ên bi keseyetîya wan re. Wê bi wê re wê bixwestan ku wan fahmbikin û nas bikin. Di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê, wê weke rewşek civakî a pirr zêde wê li pêş ba.

Di nava civakê de wê ev jî wê bi awayekî vekirî wê were dîtîn ku wê keseyetîyên civakî, wê werina dîtîn wê hebin. Mînaq, keseyetîyên ku wê di çerçoveyekê de wê ew werina pejirendin wê hebin. Wê ew keseyet, wê bi xosletên wan re wê di mirovan de wê

li wan bigerîyan. Di çerçoveya van têtînen afsûnî û bawerîya wan de wê mirov çawa tevbigerihê û xwedîyê rengêkî keseyetî ê çawa ba, wê ew li ser wê biheta hizirkirin.

Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê, di dewama wê mijare li ser keseyetîyê re wê werênê li ser ziman ku wê, keseyet wê hertimî wê weke rastîyekê wê li wê were nerîn. Mirov, dema ku bahse keseyetîyê kir, wê hingî wê çawa dûrûst ba, rast ba, baş ba, mêr ba(yanî bi ceger û wêrek ba) û hwd, wê di çerçoveya van xosletan de wê ew li wan biheta hizirkirin. Di rewşa keseyetîyê de wê, dema ku mirov karîba van xosletên weke dûrûstbûn, başbûn, rastbûn, mêrbûn û hwd ku ew bi xwe re da nîşandin, wê hingî wê bahse hebûna keseyetîyekê wê bi wî re wê biheta kirin. Keseyet, wê ast û pîvanekê re wê xwedîyê rewşek têtînî a di nava jîyane civakê de ya li ser van xosletan re ba. Li gorî bawerîyê, wê ev xosletên keseyetî, wê hem bi rakendî jî wê biheta bidest xistin û hem jî wê bi jîyankirinê û fahmkirinê re wê biheta bidest xistin. Li gorî wê jî mirov wê, di jîyane xwe de wê rastî ya baş jî wê were û wê rastî ya xirab jî wê werê. Mirov, wê van herdûyan ji hevdû cuda bike. Wê piştî wê xwe bike rêya baş de. Wê hingî ew bigihijê keseyetîyek baş. Di nava jîyanê de wê, gelek rewş û heyînên ku wê bixwezin ku mirov ji rêya mirov bikin wê hebin. Mirov, wê bikeve farqe wan de. Her wusa, wê bi wê re jî wê mirovan, wê çawa wê xwe ji bandûra xirabîyê û kesên xirab wê azad bikira, wê di demên berê de wê serî li mirovên zanê ên weke afsûnkar û hwd jî wê nivista. Minaq, çêkirina tilsimên afsûnî û barkirina wan bo parastina mirov, çêkirina nivîştan û hwd, wê çend ji wan rewşên bi armanca parastinê ên afsûnî bin.

Di rewşa danîna têtîliya têtîhên weke yên xirabî û ankû nebaşîyê bi aqil û zanîna afsûnê re wê, di vê çerçoveyê de wê temenê şiroveyên li ser wê re ên bivan têtîh û ankû têtînan re bê. Rewşên xirab û ankû nebaş, wê di vê çerçoveyê de wê werina hanîn li ser ziman. Em ji rewşa rengê hanîna li ser ziman a têtîna xirabîyê û ankû nebaşîyê weke ku zerdeşt û hwd dihênê li ser ziman, wê bi rengêkî aqilî û darazî wê têtînen weke baş û ankû nebaşîyê wê li ser rewş û têtînen bi vê rengê re wê werênê li ser ziman.

Bawerî û têtîna afsûnê, wê her wusa wê du gotinên ku mirov li vir wan bi hevdû re di çerçoveya wê de wan hilde li dest bê. Di rewşa fahmkirina têtîna bawerîyê de wê, her wusa wê têtîna afsûnê wê hebê. Bawerî, di vê çerçoveyê de wê têtîneka ku em dikarin wê bi wê re wê werênina li ser ziman bê. Bawerîya bi hêzekê, têtînekê, gîyanekê û ankû tiştêkî weke tilsim û ankû nivîstê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê were li ser ziman.

Di nava rewşa têtîn, gîyan, tişt û her wusa afsûnê de ew têtîliya ku ew dihê danîn, wê di çerçoveya têtîneka afirîner a afsûnî de bê. Bi bawerî, di olan de wê were gotin 'ku xwûdê, çi bixwezê wê ew bibê.' Li vir, li ser têtîna *xwestekê* re wê bi navê xwûdê re wê rewşa afirînê wê were hanîn li ser ziman. Li vir, têtîna *xwestekê*, wê weke ku mirov wê ji xwe re û ankû wê li gorî pêwîstîyana xwe yên jîyanî wê dixwezê bê. Li vir, têtîna *xwestek* û afsûnê, têtîliya di nava wan de wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têtînen din ku me hanîn li ser ziman, wê têtîliyê wan nava hevdû de wê hebê.

Têtîna afsûnê, wê weke têtîneka ku mirov wê wê li ser têtîha bawerîyê re wê weke têtîneka pîroz wê bi aqil pêşbikeve bê. Li vir, em divê ku têtîliya aqil û afsûnê, rastarast bi hevdû re wê dênê. Wê afsûn, wê hinekî wê weke rewşa destpêka bûyîna aqil jî bê di diroka mirovatîyê û pêşketina wê de. Her wusa, rewşên afsûnî ku wê têtîliya wan di çerçoveya xwe de wê hebê, wê piştî bi pêşketina aqil re wê di dewama hevdû de wê bi hemû rewşên ku ew hena û dibin re wê têtîliya wan wê were danîn. Weke ku

mirov wê di pêvajoyên piştre ên afsûnê de wê dibînê jî wê, rewşa têkilîya bûyînan û ankû bûyaran, wê bi rewşên têgînî ên afsûnî re wê were danîn.

Di rewşa afsûnê de wê, rewşek wê ya teybet wê di pêvajoyên wê yên piştre wê li ser derûnîya mirov re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, ya aram û rast, wê ew weke armanc bê ku ew were domandin bê di jîyanê de. Wê ya nearam û nerast jî wê ew weke ya ku ew ji jîyane mirov ew were dîrkinin bê. Minaq, weke ku mirov di pvajoyên piştre de wê di nava civake kurd de wê bê dîtin ku mirovek, yekî din nifirekê bike, wê hertimî wê li ser wê nifirê re wê tirs wê bikevê dil de bo ku ew *'kar û xabatên wî rast herin.'* Kar û xabatên mirov, wê di jîyane mirov de wê, di vê çerçoveyê de wê, li sedema serkevtin û ne serkevtina di wê de jî wê bi têgîneka bawerîyî wê bi bandûra rewşên weke ji **nifir, çavlêdan, dîlxalî** û hwd, wê li wê were lêgerîn. Bo vê yekê wê, vê ev rewşa têgîna afsûnî wê weke têgîneka teybet bê. Têgîna afsûnê, di çerçoveya navaroka wê û têgîna navaroka wê mirov dikarê li duyan beş bike. Aliyê yekem, wê bi afsûna baş û aliyê duyem wê bi afsûna nebaş bê. Di nava kurdan de wê pîrr zêde wê bi wê, wê were bawerkirin. Di vê çerçoveyê de wê ji yazdanên xwe yên baş û nebaş re jî wê boraq û ankû korbanan wê bidin.

Di çerçoveya têgîna baş de wê, bê bawerkirin ku mirov dema ku di rewşek nebaş de bijî û ankû kar û xabatên mirov rast neçin di rêya xwe de wê demê mirov dikarê bawer bike ku wê bandûra afsûnek nebaş wê di jîyane mirov de wê hebê. Yan jî, hinekan *'li ser mirov afsûn çêkirîya bo ku kar û xabatên mirov bi rê ve neçê.* Têgîna bi xwe ve girêdana tilsiman weke nivîştan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê wateyek wê ya teybet wê hebê. Têgîna nebaşîyê, wê weke têgîneka vajî ya baş wê, di jîyane mirov de wê rewşa baş wê hertimî wê xira bike. Wê nebaşîyê wê pêşbixê. Tiştên nebaş ku mirov wan dikê û yan jî ew dihêna serê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê sedemek wan ya afsûnî wê hebê.

Li vir, bo ku mirov ya baş û nebaş ji hevdû vaqatênê wê hewl bê dayîn ku rêyên wê yên kifşkirinê ew werina pêşxistin. Minaq, têgîhên weke ku *'mirov, ku pêşî zanibê, wê çî xirab werê serê mirov û li kûderê wê were serê mirov dikarê pêşîya wê bigirê.'* Bo vê yekê jî wê, weke ku em di nava kurdên berê de wê dibînin ku wê rêmildar û ankû mecûsî wê hebin ku ew hertimî ji xewnê bê, falvekirinê bê û hwd, ew dikin ku ew nîşanakên ku ew wê çî di pêşaroja mirov de wê werê serê mirov ku ew xwe bigihninê de. Di vê çerçoveyê de wê, ew di rewşekê de bin. Fal, wê di vê çerçoveyê de wê were pêşxistin.

Li gorî vê têgîh û têgînê, dihê bawerkirin ku mirov dema ku ew bû û hat dunyê wê, baxtê wî hatibê kifşkirin. Yanî, wê çî bike, wê bê mirovekî çawa, wê baş û ankû nebaş bê û hwd, ew di pêşî de ew hatîya kirin. Ew mirov, dema ku ew hin bi hin mazin dibê, ew li gorî wê baxtê xwe de wê gavên xwe biavêjê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê bigihijê wê rastîyê ku wê mirov baş bê û ankû ne baş bê. Ev wê bi kirin, tevger wî yên jîyanî û xûyên wî re wê xwe bidina nîşandin.

Di vê çerçoveyê de wê li ya baş û nebaş wê were lêgerîn. Wê di vê çerçoveyê de wê hewl bê dayîn ku mirov ya baş bike. Li gorî bawerîya kurdên berê, mirov baş jî bê û ne baş jî bê, wê ew bikirinên xwe re wê karibê wê bide dîyarkirin. Ya pêwîst ji mirov re jî ew a ku mirov xwe bigihênê wê têgîn û têgihîştinê ku mirov karibê bi aqilê xwe ya baş û nebaş ji hevdû cuda bike. Ku mirov tiştekî nebaş ku ew zanî, wê mirov karibê xwe ji wê dîr bide girtin.

Nebaşî, dema ku ew dihê hanîn li ser ziman di nava kurdan de wê, ji du aliyan ve wê were hanîn li ser ziman. Nebaşîya ku ew encama nezanîna mirov a ku ew dihê kirin bê. Li aliyê din jî wê weke aliyê duyem wê nebaşîya ku mirov wê bi zanîni dîke bê. nebaşîya ku mirov wê bizanîni wê dîke, wê ew weke rewşeka qarakterîstîkî a ku ew di rastîya mirov de ya bê. Bi vê rengê wê bê bawerkirin. Mirov, di xwe de ku ew gihîşt wê zanîne û dît ku ya nebaş çî encamê dide derxistin li holê, wê ew li dijî wê bikeve tekoşîne de. Ev wê, di çerçoveya xosletên mirovên baş de wê were gotin.

Li ser têgîna afsûnê û têgihîştina baş û nebaşîyê re wê, di çerçoveyek keseyetî de wê were hanîn li ser ziman. Her wusa, ev afsûn, wê weke têgîneka ku ew mirov, wê dema ku ew gihîşt hemû zanîna dunyê û jîyanê, wê hingî wê karibê wê pêşbixê.

Di rewşa têgîna afsûnê û afsûna wê de wê, weke mijareka giring ku em li vir dewama wê de wê hildina li dest jî wê ew bê ku wê têkîliya gîyan û afsûnê a ku ew bi hevdû re ew dihê danîn bê. Her wusa, gîyane ku ew ji laşê mirov ê fizîkî ê li jîyanê ew derket û pê de wê karibê ew hertiştî bike. Wê karibê, hemû sînoren fizîkî ew derbas bike. Di vê çerçoveyê de wê têgîna afsûnî, ku em wê dibînin ku ew xwe di jîyanê de ew bi aqil dide pêşxistin, wê destûrên têgîni ên dervî fizîkê de bin. Di çerçoveya têgîna afsûnê de ku mirov wê dihizirê, wê ya ku wê bibê, wê weke ku wê destûrên aqilî û hişî ku wê li yê fizîkê wê serdest bin. Wê ew bidina kifşkirin û diyarkirin ku ew çawa wê karibê pêşbikeve û bi reng bibê. Li vir, em divê ku vê jî bi gotinekê wê werênina li ser ziman ku wê farqe di nava têgînen mengîwerî û ya afsûnê de wê, li ser esasê fahmkirina **destûrên fizîkî** re wê xwe bide diyarkirin. Têgînen mengîwerî ku ew destûrên fizîkî ji aliyekî ve wê red dikin û hertiştê wê bi yê aqil wê werênina li ser ziman, wê rastîya têgîna afsûnê ku ew bi aqilê xwe re destûrên fizîkî ew herê dîke, lê ku ew herê dîke ku ew bi destûrên aqilî ku mirov wan dikarê bigûharênê, wê di çerçoveyek têgîni a fahmkirinê de wê ji hevdû vaqatihin. Têgîna afsûnî, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek heyînî a jîyanî ku ew herê dîke û li ser wê re rewşa gûharandinê wê weke ku ew pêşniyar dîke û dihênê li ser ziman. Destûr û zagonên wê, di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya têgîna gûharînê de wê li ser hizên têgînen destûrî ên fizîkî re wê bihizirê. Di rastîya aqilê mirov de wê hertimî wê ew rewşa hizirkirinê wê pêşbikeve. Wê li ser wê re wê hişmendî xwe pêşbixê. Hişmendî, wê weke rewşek aqilî bê. Di jîyanê de wê, bi nerînekê re li jîyanê nerîn, wê pêşbikeve. Her wusa, aqilê mirov, wê bi pêşketina xwe re wê serdestîya xwe wê denezênê. Rewşa bi aqil afirandinê, wê di aslê xwe de wê weme mijareka giring a ku mirov wê dikarê wê hilde li dest bê.

Bi aqilê ku ew ji hinek aliyan ve wê destûrên rewşa fizîkî wê di wê de wê xwe bidê nîşandin re hizirkirin wê, weke xosletê rengê hizirkirina afsûnî wê ji hinek aliyan ve wê bide nîşandin. Minaq, di jîyane de bawerkirina ku wê paşgotin û ankû pistepist û bawerîya li pişt wan ku wê bi wê were bawerkirin ku ew di jîyanê de wê karibin, gûharînê wê di jîyane mirov de wê bidina çêkirin, wê li vir, wê ji aliyekî ve wê di vê rewşê de wê karibê fahmkirina me pêşdetir bibê. Em li vir, divê ku di dewama mijarê de rewşa paşgotin û pistepistan û bawerîya li pişt wan, hinekî wê lê bikolîn û wê fahm bikin. Ev jî wê, aliyekî din ê bi têgîna afsûnî re ku em ne farqê de na ku ew li jîyane mirov serwere wê ew wê bide fahmkirin.

Di nava civakê de wê, hertimî wê li pişt yekê wî axiftin wê weke rewşek nebaş wê were dîtin. Li gorî bawerîya di nava xalkê de wê, bê gotin ku 'mirov, ku ew li pişt yekî li dûv wî axift, wê tişteki xirab wê were serê wî.' Di vê çerçoveyê de ew dihê hanîn li

ser ziman. Lipiştaxiftin, wê weke rewşeka ku wê hertimî wê mirovan weke ku wê ji xewek giran wê bi vaciniqênê bê. Wusa wê mirov wê ji wê bitirsihê. Li pişt axiftin, weke ku kurd di zimanê xwe de dihênina li ser ziman, wê piştî wê(li piştaxiftin) derew wê were. Derew, tişt a ku ew nerast a ku ew li ser yekî û ankû li piştî wê weke ku ew rast bê ku ew were hanîn li ser ziman. Gotina ku wê di kurdî de wê piştî derewê re wê weke gotineka ku ew ji wê girantir wê were hasibandin di nava civake kurd de wê gotina *'bûhtanê'* bê. Gotina *bûhtanê*, wê weke derewek û ankû tişteki ne rast ê pirr giran û ku wê mirov nikaribê encama wê rakê ew dihê hanîn li ser ziman. Dema ku mirov, *bûhtan* li mirovekî kir û ankû weke ku wê bi wateya gotinê re wê were hanîn li ser ziman *tişteki bêasil ku mirov li ser yekî got û jiyane xira kir û male wî viritand*, wê hingê ew were hanîn li ser ziman.

Bûhtan, wê di wateya xwe de wê weke ku ew di nava xalkê de ew dihê hanîn li ser ziman, wê weke derewa giran a ku ew li pişt mirov ew hat gotin û ku bi wê male mirov hat xirakirin, wê bê. Di vê çerçoveyê de wê ew were hanîn li ser ziman. Bawerîya di nava xalkê de ew a ku mirov tişteki nerast û ankû derew ku mirov li ser yekî got, wê weke ku wê çawa ew tişt ne rast û xirab bê, wê tişteki nerast wê were serê yê ku ew gotîya jî bê. Wê encama wê ya ku ew wî mirovî ku wî bi derewê hanîya serê yekî wê bi heman rengê wê were serê wî jî. Di vê çerçoveyê de wê di nava xalkê de wê bahse wê bê kirin.

Têgîna derewê, wê di vê çerçoveyê de wê gelek vegotin û çîrok jî wê di nava xalkê de wê li ser encamên wê yên ku ew rûdana wê werina vegotin. Bi wê re wê, di mejiyan de wê bê xwestin ku ew were bicihkirin ku encamên wê çi û çendî xirab in. Bo vê yekê wê derew, wê weke tişteki ku ew vabalê wê pirr zêde giran wê were hanîn li ser ziman.

Di çerçoveya bawerîyên di nava xalkê de wê di dewama wê de wê, têgîna nezerê wê pirr zêde wê were hanîn li ser ziman. Me li jor hinekî li ser nezerê em sekin in. Lê li vir, di çerçoveya weke minaqekê dayîna wê de mirov dikarê hinekî din jî mirov li ser wê bisekinê. Têgîna nezerê, wê di nava xalkê de wê li ser wê, wê gelek rewşên ku wê wê werina pêşketin wê hebin. Di nava kurdan de wê gelek tişt, rewş û hwd, wê werina pêşxistin bo ku ew xwe ji nezerê xilas bikin. Minaq, daqan wê li laşê xwe çê çê bikin. Li rû, aliyên bêhvilê, pişt dest, li kefmîştadest, li ser singan, li aniyê, li gûzekên li ling û hwd, wê bi wan deveran re wê li gelek deverên din ên laş, wê li wan daq wê werina çêkirin. Çanda daqê, wê weke çandaka kevn a bi hezaran salan bê. Her wusa, wê daq, wê hertimî wê ji tanîyê wê were çêkirin. Wateya wê jî wê ew bê ku wê mirov wê ji nezerê, nezera çavan û hemû cûreyên din ên nezerê û hwd wê xilas bikira. Wekî din jî wê, bi teybetî wê, keçikên ku ew balixbûna û gihiştina dema zewacê, wê wan li laşên xwe wê cih bi cih wê daq, wê çê bikiran. Daq, wê çendî wê weke ku ew xwe bi wê hê xweşiktir bikiran wê çê bikiran jî lê wê, bi wateya xwe ji nezerê parastinê û vebûna xîmetê wan û gihiştina miredê xwe û di jiyane xwe de şabûnê re wê bi wateyî wê bihetan çêkirin. Têgîna nezerê, wê bi tilsiman, wê çêbikiran. Minaq, wê tilsim û ankû nivîşt wê çêbikiran û wê bidevê dêrî ve wê bikiran. Wê tilsim weke nivîşt, wê weke zingilan wê bi sûkra sawalên xwe bikiran ku ew ji nezerê xilas bûban û topikê li wan nexistiba. Wê tilsim wê weke nezerê wê çê bikiran û wê bideverê dêrî ve bikiran ku ew male wan ji nezerê hatiba parastin û nezerê lê ne daba. Bi vê rengê wê gelek rewşên ku wê di çerçoveya rewş û têgîna nezerê de ku wê bihetan pêşxistin wê heban.

Têgîna nezerê, wê di nava xalkê de wê weke têtîneka ku ew pîrr zêde bicihbûya bû. Bo vê yekê, wê li ser wê re wê, gelek minaq û rewşên ku ew bi demê re ew dihatina pêşxistin wê hebin. Her wusa rewşên weke parastina xwe ji nezerê, wê pêşbixistan. Nezer ji çav dibû(?). Bo vê yekê wê, çawa wê ji nezera çav û ankû nezera nerîne wê xwe biparastina, wê li ser wê re wê rêyên parastinê wê pêşbixistan. Di nava kurdan de wê, bi vê yekê, minaq ku zaroyek nû hat dunyê wê xêra wê ya ku ew ji bi wê ji nezerê biheta parastin wê bida. Piştî ku wê zaroyê cilê xwe dagirt, wê xwarina wê daban. Wê di wan beroşên ku wê di wan de xwarina wê ya cilê wê çê bikiran, wê tanîya wê li anî û ankû rûyê zarokê wê bixistan.

Bi wê re jî wê weke rêyeka din a ku ew pîrr zêde dihat bikarhanîn bo xwe parastina ji nezerê, wê 'rijandina guleyê' wê biheta kirin. Ew jî wê dema ku rijandina gûleyê dihat kirin, wê bigotan ku ez, bi vê rijandina gûleyê, nezere çav ji ser te dirakim' û hwd re wê ew rijandina gûleyê wê biheta kirin.

Li ser têtîna nezerê, wê gelek vegotinên din jî wê heban. Minaq, hinek mirov, wê bi kerîyan sawalên wan heban. Wê her demê jî wê sawalên wan wê zêdebûban. Wê malê wan bi wê zêdebûba. Lê demek dihat û wê di wê demê de wê qotik wê biketa nava sawalan û wê hema bêja giştîya sawalan wê telef bûban. Wê li wê re wê biheta gotin ku 'çav li ser wê malê hebûn.' Yan jî wê, bigotan ku wê malê û ankû xwediyê malê, bo ku ew nezera bişikênê û ankû ji ser xwe rakê wî ti bergirên xwe negirtina, ber vê yekê ev feleket hatîya serê wî. Di vê çerçoveyê û rengê de wê, di nava xalkê de wê vepaşgotin û pistepist wê bihetan gotin.

Di nava xalkê de wê bo ku ew malê wan çavlênekeve û nekeve ber nezerê de wê, hertimî wê bêşa malê xwe wê bidan mal û ankû mirovên ku ew rewşa wan nebaş bû. Di vê çerçoveyê de wê, bi wê re wê, xwe ji nezerê wê xilas bikiran.

Têgîna nezerê, wê di nava xalkê de wê di vê çerçoveyê de wê bo pêşîya wê girtinê wê di nava xalkê de wê bo ku ew pêşîya wê biheta girtin, wê hertimî wê nivîşt wê bihetan çêkirin. Nivîşt, wê weke rêya herî giring ku wê bo ku mirov xwe ji nezerê xilas bikira bû. Nivîşt, wê bo xwe ji qaza û belayan xilaskirinê jî wê bihetan çêkirin. Di her rewşê de wê nivîşt wê bihetan çêkirin û wê bihetan dalaqandin. Nivîşt, wê weke rêyeka pîrr zêde giring a xwe ji nerîne nezerê, afsûnê û hwd parastinê bû.

Dema ku wê hertimî wê li ser hevdû wê felaket wê bihetan serê malna, wê bigotan ku ew mal, nezer li ser wê heya. Afsûn li wê hatîya çêkirin. Heta ku ew wê nezerê û afsûnê ji ser xwe xiraneke wê xwe ji wan felaketên ku wê hê werina serê wê, ew wê xwe xilas nekin. Bi rengê wê ahlên malê jî wê, bihetan hişyarkirin û wê wan jî wê, çûban li cem mirovna zane û wê li rêyên xirakirina nezerê û afsûnê wê binerîyan.

Têgîna afsûnê wê weke têtîneka ku wê di nava xalkê de wê di vê çerçoveyê de wê pîrr zêde wê were hanîn li ser ziman bê. Bi teybetî jî wê, di nava civakên weke civake kurd ew xwediyê mejûyeka pîrr kevn in, wê bi wan re wê ev zêdetirî wê hebê. Di rewşa têtîna afsûnê û kevnerîya wê de wê, mejûya wê, wê heta serdemên destpêka civakê ên neolîtîkê û hwd jî wê herê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê dîrokek pîrr zêde kevn a afsûnê û pêşketina wê, wê bi dîroka civakê û pêşketina wê re wê hebê. Bêgûman ku em dîroka wê ya destpêkê em li vir, di dewama mijarê de wê, werênina li ser ziman, em divê ku em heta serdemên destpêka civakê û pêşketina wan ên destpêkê herin. Her wusa di serdemên destpêkê de ku wê, çawa wê li dora hinek pêjnên ku mirov bixwe ew ji wan ditirsîya wê li dora wan kom bibê û wê boraq û ankû korbanan wê bide wan û hwd, wê

bi wê re wê werê hanîn li ser ziman. Têgîna boraqê û ankû korbanê di vê çerçoveyê de mirov dikarê bi mejûya aqilê mirov û pêşketina aqilê mirov re wê, di dewama pêşketina wê têgîna afsûnê de wê werênê li ser ziman. Her wusa rewşa têgîna afsûnê a dayîna boraqan û ankû korbanan bo parastina xwe wê, piştî jî wê di nava olên ku ew pêşdikevin de jî wê xwe bide domandin. Her wusa, wê boraq û ankû korban, wê bi armanca xwe parastinê wê werina dayîn. Di dîrokê de wê, bi teybetî jî wê bi dîroka olan re wê ev xwediyê mejûyeka pirr zêde kevn bê. Di nava têgîna afsûnê de jî wê dema ku wê afsûneka ku ew dihat hizirkirin ku ew li ser malê û hwd ew hatîya çêkirin, bo ku ew were xirakirin, wê weke şart, yê ku ew afsûn xira dikir, wê bigota ji mirovê ku ew li ser wî û ankû male wî afsûn hatîya çêkirin, tê herê vilqas boraqê bidê. Yan jî tê herê van tiştan tê weke boraq û ankû korbanê bide. Di dewama wê de jî wê, tiştên ku wê wî mirovî weke boraq û ankû korban bide wê ji wî re wê biheta rêzkirin. Wî jî wê piştî çûba û ew bida.

Nezer ku ew bahse wê dihatkirin, wê bahse nezerê çavan wê were kirin. Her wusa nezer, weke rewşek mazin û giring lê dihat hizirkirin û nerîn. Di nava civakê de wê biheta gotin ku 'yê ku ew bi awirên xwe nezerê dide, wê bike ku ew yê ku nezer lêket ew totlanî hevdu bibê. Gotina 'ew totlanî hevdu bibê', wê weke gotineka ku wê bi wê re wê hêza nezerê çavê wê bi wê re wê heta hanîn li ser ziman.

Nezer di vê çerçoveyê de wê weke rewşek giring wê hertimî wê herkesekî wê bikira ku ew xwe ji wê biparêzên ba. Herê bi herê wê li herê mên kurdistanê, wê di demên berê de jî û di demên roja me de jî wê li gorî zanîna xwe bergirên xwe wê pêşbixistan. Î ro jî ku em diçîna kîjan herê mên kurdistanê wê di derbarê rewşên nezerê û hwd de wê, weke çareseriyên wan ên ku wan li ser aqil, zanîn û têgînên xwe yê baweriyê re ku wan pêşxistina wê werina dîtîn.

Çavlêxistin, wê weke gotineka afsûnî ku wê di çerçoveya têgîna nezerê de wê di nava civake kurd de wê were gotin bê. Bi vê gotinê re wê, bahse çavlêdanê wê were kirin. Yanî ku mirov, çavberda tiştêkî, yekê û hwd, wê ew weke çavlêxistinê bê. Di encama wê çavlêxistinê de wê, biheta bawerkirin ku wê tiştên nebaş wê werina serê mirov.

Di dewama têgîna nezerê de em dikarin çend gotinan li vir li ser têgîna xewnê re wê werênina li ser ziman. Di aslê xwe de wê di çerçoveya vê têgîna afsûnî de ku ew bi nezerê, çavlêdanê, xewndîtînê, falê û hwd de wê zimanekî têgîhiştî ê ku ew bi gotinan re ew hatîya bi watekirin wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê her gotinên ku em bi ziman re wê werina axiftin, wê li ser rengê bi watekirinê ê weke bîafsûnê û hwd re wê werina biwatekirin. Wê wateyên afsûnî wê li wan wê were kirin.

Ku em hewl bidin vê rewşa biwatekirinê wê fahm bikin, wê rewşa xewndîtînê weke ya nezerê û hwd, wê rewşek giring a ku em bi wê dikarin wê baş fahm bikin bê. Di çerçoveya dîtina xewnê de wê tişt, amûr, hebûn, mirov, zindî û hwd, ku mirov çî ew di xewnê de dît, wê ew werina bi watekirin û şîrovekirin. Li ser wê re wê, hewl bê dayîn ku ew xwe bigihênina wê wateya wê peyame wê xewnê ku ew di wê de heya. Di nava kurdên berê de wê xewn, wê weke rêyeka ku wê bi wê, wê kariban xwe bigihandan têgîna tiştên ku wê pêşarojê wê werina serê wan. Bi wê re wê, xewn, wê weke rewşeka têkilîya fahmkirina reşa baxtê mirov bê. Heta roja me jî wê, mirovên ku ew di şîrovekirina xewnan de ew pirr zêde bizane na, wê hebin. Wê hertimî wê di çerçoveya wê dîtina xewnê de wê, mirovê ku ew xewn dîtîya wê serî li wan mirovên ku ew di wê

şîrovekirina xewnê de bizane na, wê li serî li wan bixistan. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew biheta kirin.

Di rewşa xewnê de wê, şîroveyek jîyanî wê biheta pêşxistin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê şîroveya xewnê ku ew hatina kirin, wê têkilîya wan wê, çawa bi jîyane ku mirov wê dijî re wê were danîn, wê di vê çerçoveyê de wê şîrove wê werina pêşxistin. Xewn, fal, nezer û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa ku wê pirr zêde wê di nava civakê de wê hertimî wê serî li çareserîyên wan biheta dayîn bû. Yanî, wê dema ku mirov, di xewnê de xilobat û ankû xewnek pirr xirab dît, wê biheta ji mirov pirsîn ku wî çi xirab kirîya. Di vê çerçoveyê de wê, ew biheta gotin. Xewn û fal, wê di awayekî wê nêzî hevdu ban. Wê di şewayekê de wê herdû jî wê li ser peyame pêşarojê û xwe gihandina wê, wê ponijîban. Fal, wê weke rewşa dîtî û kifşkirina baxtê mirov ku wê çi were serê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê were şîrovekirin û hanîn li ser ziman. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşa wê, were fahmkirin. Weke ku wê çawa ku wê di çerçoveya têngîna xewnê de wê her tiştê di jîyanê de ku ew zindî bê û ne zindî bê, wê were bi watekirin bi dîtina wê re di xewnê de wê, bi heman rengî, wê di rewşek ne di xewnê de wê li ser têngîna falê re wê di jîyanê de wê, hertişt wê were biwatekirin. Li gorî têngîna falê ku weke ku kurd di nava xwe de ew bawer dikin, wê xatên dest, anî û laşê mirov, wê di derbarê baş û kişandina mirov a êşan de wê xwedîyê agahiyê bin.

Di çerçoveya têngîna afsûnê de ji sîmyayê û heta kîmyayê

Afsûn, wê weke têngîneka ku wê di nava jîyanê de wê ji serdemên detpêka pêşketina civakê ve wê hebê bê. Her wusa, dîroka wê, ku mirov wê hilde li dest, heta serdemên neolîtîkê ên destpêka pêşketina civakê jî mirov dikarê bi wê re herê. Afsûn, hinekî jî wê, di çerçoveya têngîna hêz û rewşên ku ew neyêna zanîn, wê weke bandûra wan jî wê werê hanîn li ser ziman.

Di rewşa afsûnê de wê, wê di serdemên destpêka civakê jî wê, di destpêkê de ku wê aqil û hwd wê bi hiş re wê hê nûka wê pêşbikeve, wê bi wê re wê rewşên ku mirov hewl dide ku wan fahm bike û fahmnekê wê derkevina li pêşîyê. Li ser wan re jî wê di vê çerçoveyê de wê bike ku wan fahm bike. Di destpêkê de wê têngînen weke anamîsmê û totemîsmê û hwd wê pêşbikevin. Ev têngîn, wê weke têngînen ku mirov dikeve bin bandûra wan û bi wan bidest bawerîyê dike ên pêşî bin.

Lê bi wê re jî wê, rewşên weke nexweşîyê jî wê pêşbikevin. Mirov, dema ku ew nizanê nexweşî çi ya, wê li ser wê re wê, weke şikeştînen ku ew di encama bandûrkirinê û ankû bi bandûrbûnê de ku ew bûna wê wan werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê rewşa têngîna nexweşîyê û hwd wê werênê li ser ziman. Di çerçoveya têngînen bawerîyê de wê pêşî, wê tenê rewşa xwezayê û rewşên wê, ew wê hebin. Wê hê hêzek weke 'xwûdê' û navê wî ew ne hatîya kifşkirin.

Di nava xwezayê de wê mirov, wê çawa bijî, ew di vê çerçoveyê de wê dike ku ew gavên xwe biavêjê. Lê her ku ew gave xwe diavêjê jî wê, rewşên ku wê tirsê bikina dilê mirov de wê bi wê re wê biafirin. Mirov dema ku wan rewşan dibînê, wê bi wan re wê, wê bike ku wê ew bijî. Bo vê yekê, wê ew were, wê weke rewşa giştî bin. Rewşên xwezayî, ên weke vadana barqê û ankû beledîyê, barîna baranê, barfîna berfê û hwd, wê weke van wê gelek rewşên ku wê derkevina pêşîya mirov wê bibin. Wê mirov, wê di destpêkê de wê wateyê wê nedê wan. Lê bi wan re wê bike ku ew bijî. Her wusa, wê di

vê çerçoveyê de wê ev rewş û gelek rewşên weke wan, wê di jiyane mirov de wê xwedi bandûr bin. Wekî din jî wê mirov, wê weke ku mirov ji serdemên ku mirov hê ew di şikeftê de dijî wê sawalên mazin ên ku ew wan nêçîr dike û ankû sawalên ku ew di mejiyê wî de cih digirin, wê wan xîz bike.

Ev rewşên weke rewşên sawalî ên ku ew xîz dike, wê weke rewşna ku ew hem bi wan re xwe bi hêz dibîne û hem jî ew weke rewşna ku ew di mejiyê wî de ku ew cihgirtî mana bin.

Di rewşa pêvajoyên piştre ên jiyane mirov de wê ev rewş wê zêdetir bibin. Mirov wê bi wan re wê bike ku ew fahmkirina xwe pêşbixê. Di jiyane mirov de wê ev rewş, wê weke rewşna ku wê wê bandûrê li wê bikin bin. Lê bi demê re wê, rewşên weke rewşên nexweşiyê û hwd, wê di jiyane mirov de wê pêşbikevin û wê zêde bibin. Rewşên weke bijahrbûna ji hin şinahîyana, pêvadana weke mar û ankû tûpişk û hwd, wê rewşna ku wê bibin bin. Lê bi demê re wê mirov wê ew wê çawa wê karibê fahm bike ku wê çî ji wan rewşan re wê baş bê, wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de wê ji xwezayê wê şinahîyên ku ew fahm dike ku ew baş in wê kifş bike. Ev jî wê weke rewşek teybet bê. Bi demê re wê dema ku wê rewşên weke nexweşiyê û hwd ew pêş dikevin, wê mirov, wê rewşa lêgerîna çareserîya wan jî wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa nexweşîyan, wê zêde bibê. Rewşên ku wê weke nexweşîyan wê werina şîrovekirin, wê zêde bibin. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirovên ku ew ji wan rewşên nexweşiyê fahm dikin wê ew derkevin. Ew wê, hin bi hin wê fahm bikin ku wê çî di nava xwezayê de wê baş bê jî wê reş nexweşiyê re. Wê ew rewşa dîtina tiştên baş û hwd, wê di çerçoveya çareserîyê û ankû başkirinê de wê weke rewşek girîng ku wê di çerçoveya têgînî de wê were pêşxistin bê. Di çerçoveya rewşa başkirinê de wê, ev rewşên çareserîyê wê werina pêşxistin. Çî ji çî re wê baş bê, ew dihê kifşkirin. Bi demê re wê ev rewş wê werina pêşxistin û wê ev rewş, wê zêde bibin. Mirovê ku wê ew wan bizanibê, wê weke mirovna afsûnkar wê werina zanîn.

Di rewşa pêşxistina wan çareserîyan de wê, bi demê re wê di wê de wê pêşveçûn wê bibê. Wê gelek tiştên ku ew ji çî re ew baş in, wê bînin kifşkirin. Di vê çerçoveyê de ew nexweşîya ku ew tiştên ku ew weke derman ku ew ji wê re hatî dîtî, wê ew weke çareserîyek sîmyayî wê pêşbikeve. Wê di vê çerçoveyê de ev lêgerînên ku ew dibin û her wusa bi wan re wê xweza wê were fahmkirin û wê şinahîyên wê, wê bi xosletên wan re wê werina zanîn, wê ew piştre wê bê rastiyeka sîmyayê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê bi demê re wê darêjkên sîmyayî ku ew weke darêjkên afsûnî wê werina bi navkirin wê werina pêşxistin. Minaq, mirov ku ew dizanê çî baş a, wê dema ku wê yekî ku ew nexweşî bi wî re heya ku wê serî li wî bixê, wê ew jî wê ji wê nexweşîya wî re wê weke dermanê, wê ew ji wan zanînen xwe yê xwezayê wê pêşbixê û wê bide wî mirovî. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, bi awayekî wê, di aslê xwe de wê li ser rewşên weke nexweşiyê û hwd re ku wê bi rengê dermankirina wan re wê pêşbikeve wê, ew tiştên ku ew ji wê re baş tê bê. Sîmya, wê hinekî jî wê, di vê çerçoveyê de wê rastîya têgihîştina fahmkirina xwezayê bi şinahîyên wê re ku ew ji çî re wê kêr werin û mirov çawa dikarê wan weke derman bikarbênê bê.

Darêjkên weke dermanî ku ew dihên pêşxistin, wê di vê çerçoveyê de wê werina pêşxistin. Mirov, çî dizanê ku ew baş a, wê di vê çerçoveyê de wê ew were kifşkirin. Di vê çerçoveyê de wê rewşên weke nexweşiyên gîyanî û ankû rûhî wê pêşbikevin. Ew jî

wê ji wan re wê hinek dermanên ku wê werina pêşxistin wê hebin. Minaq, mirovekî ku ew hatiya afsûnkirin, mirovê ku ew gîyanên xirab ketina laşê wî û hwd, wê bibin. Ev jî wê çawa wê ji wan re wê çareyek wê were dîtin, wê ew jî wê li çareyên wê êdî wê were lêgerîn.

Mirovê ku ew weke afsûnkar a û ankû wê piştê wê weke sîmyavan jî wê were binavkirin, ew di derbarê xwezayê de ew xwedîyê têgin û zanîne ya. Ji nebat û ankû şinahîyên xwezayê, wê bi xistina nava hevdû de wê derman çê bike. Wê jahrê çê bike. Wê di vê çerçoveyê de wê weke yê ku ew di derbarê xwezayê de ku ew xwedîyê zanîne ya bê. Çi baş a û ne baş a, ew weke ku ew dizanê, wê li wî were nerîn. Wê weke mirovên ku ew hertiştî dizanîn jî wê werina hanîn li ser ziman. Sîmyavan, wê weke mirovna afsûnkar in jî ku wê ew karibin, her tiştê jî wê re çareyê bibînin wê li wan bê nerîn. Wê bi wê re wê her tiştê ku ew heya, wê cewherê wê çî bê û çawa bê, wê ew weke ku ew zanibin wê ew werênina hanîn li ser ziman. Sîmya, di vê çerçoveyê de wê mirovên ku ew weke sîmyavan in, wê weke yên ku ew nepenîyên jîyanî ku ew dizanîn jî wê bihetan zanîn. Wê bi vê rengê wê ji wan wê biheta bahskirin. Sîmyavan, wê bi vê rengê wê bi tevlihevîkirina tiştan ku ew jî xwezayê digirê, wê çî çareyan wê bigerihê. Wê bi wan tevlihevîkirina wê weke ku ew derman ji her nexweşîyê re ku ew dikarê pêşbixê bê.

Di nava rewşa têgîna sîmya û ya afsûnê de wê, xatek pîr zîrev ku ew dem bi dem bi çav nayê dîtin jî wê hebê. Minaq, di rewşa bawerkirina *kevîrê başkirinê ê ji nexweşîyê* û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka sîmyayî bê. Di dewama wê de wê, têgînen weke li deverna hebûna avagerm li ardê ku kurd wê weke 'avagermev' jî dihê bi nav dikin, ketina nava wê de û hinekî di nava wê de mayîn, wê weke temenê jî nexweşîya xwe xilasbûnê jî wê şîrove bikin û wê werênina li ser ziman. Bawerîya wan li van avan heya. Her wusa, hinek cûreyên zîroyan ku ew di nava avê de dijîn, li deverên bîrîn û nexweşîyê dana wan li hevdû, wê bawerkirin ku wê ew êşa laş wê jî wê bikişênin. Di êşa di singê de wê, bawer dikin ku mar were danîn li ser singê wê, êşa singê wê kêmbike û ankû wê ji baş bike. Di vê çerçoveyê de di çerçoveya rewşa fizîkî, aqilî û metafîzîkî de wê têgîneka sîmyayê wê hebê. Hêvîkirina mucîzeyan jî wê, wê hertimî wê li gorî wê wê rast bê. Di nava xalkê de wê ev mirovên ku ew weke hertiştî dizanin, wê rêz û hûrmetek mazin wê ji civakê û nava wê, wê bibînin. Gotinên wan, wê weke gotinên aqilane bin. Wê ew di derbarê hemû rewşên xwezayî, serxwezayî û hwd de wê, weke ku ew hizreka wan ya ku ew werênina li ser ziman wê hebê. Wê têgînen felsefîkî ku wê piştê wê pêşbikevin û werênina hanîn li ser ziman di dewama wê de ên weke kîmyayê, fizîk, metafîzîk, tendûrûstî, stêrzanî, semiotîkî (*'zanîna azmanan'*), nepenîzanî, gîyanzanî û ankû spîrîtûalîsm û hwd, wê ji nava wê wan têgînen sîmyayî wê temenê wan pêşbikeve. Her wusa, heta ku bigihîjê çand, huner û hwd jî wê ji wê hilm û hîm wê bigirin û wê pêşbikevin. Di nava kurdan de wê têgîna *kevîrê nexweşîyê* û hwd wê hebin. Bi gotineka din, *kevîrê* ku ew jî nexweşîyê xilas dîke û baş dikê bê. Ew *kevîrên nexweşîyê* ku ew dema ku yek piştê wî diêşeha, deverna wî diêşeha, wê ji wan re wê bigotan ku *'win, herin û devera xwe ya biêş bidina kevîrê nexweşîyê wê baş bibê. Dermana wê, di wir de ya.* Bi vê rengê wê jî wê biheta bahskirin. Di rewşa têgîna sîmyayê de wê bi destûrên fizîkî ên ku ew tenê bi aqil ku ew dihatina kifşkirin wê, li ser wan re wê meşîneka bi metafîzîkî' wê heba. Piştê wê dema ku wê kîmya pêşbikeve, wê tenê ew farqe wê ji wê hebê ku ew destûrên fizîkî bi rewşa fizîkî re ew wê weke

dîyardeyna wan herê bike û wan werênê li ser ziman bê. Minaq, rewşa têgîna 'kevirê nexweşîyê' û hwd, wê di wê de wê ew nebê. Ev wê weke têgîneka sîmyayî bê. Wê di pêvajoyên piştre ên sîmyayê, wê bi renegekî nivî sîmya û nivî kîmya wê pêşbikeve. Her wusa rewşên weke pêşxistina tevlihevkerinên weke derman û hwd bo başkirinê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşekê bê.

Her wusa dema ku mirov bahse sîmyayê bike, di vê çerçoveyê de wê di serî de pêşveçûnên şariştanî ên ku ew bi wan re pêş dikeve ên mesopotamîkî wê werina berbîra me. Mesopotamîya, wê bi hezaran salan wê bi wê re wê xwedîyê xateke pêşketinê bê. Di nava xwezayê de wê, çawa ji xwezayê wê sîwdwergirin û wê ji wê li gorî xwe wê biafirênin, wê hinekî wê di vê çerçoveyê de wê li mesopotamîya wê pirr zê de wê pêşbikeve. Di nava kifşkirina rengên xwezayê de û ew karhanîna wan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya zanîna sîmyayê de wê xwedîyê wateyekê jî bê. hebûna wan rengan û weke wan rengan pêşxistin û ankû tevlihevdû kirina wan rengan û ji wan çêkirina rengên nû ên cûda û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê pêşbikeve. Sîmya, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ku em dikarin çerçoveya wê pirr zêde berfireh wê werênina li ser ziman. Her wusa ji rewşa fahmkirina gîyanê û laş, xwezayê û rengên wê, nexweşîyan û pêşxistina dermanê wan, nexweşî û dîtina çareya wê ya şifakirinê, fahmkirina ard û azman, fahmkirina dîtina xewnê û falan, fahmkirina bi têgîna afsûnê û pêşxistin wê (*afsûnê*) û parastina ji wê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bi çerçoveyek berfireh wê hebê.

Di pêvajoyên pêşketina têgîna sîmyayê ên piştre de wê, çawa ji nava xwezayê wê bi tevlihev kirinên weke şinahîyan û hwd ku ew bi wê re wê çare wê werina pêşxistin bo şifakirina mirovan ji nexweşîyan û ankû parastina wan ji gîyanên nebaş û rewşên afsûnî û hwd, wê bi awayê nivîştan û hwd ku ew dihên çêkirin wê bibin. Li vir, têgîna fizîkî û ya hişmendî a bi bawerîyê wê re wê bi awayekî wê were tevlihevkerin. Di vê çerçoveyê de wê bi wê re wê bi renegekî wê were hizirkirin. Di rewşên hizirkirinê de wê, di vê çerçoveyê de wê di rewşa fahmkirinê de wê xwedîyê rewşek çerçoveyî a berfireh bê, têgîna sîmyayê. Her wusa, bi demê re wê di çerçoveya parastina ji afsûnan û ankû nexweşîyên afsûnî û hwd ku wê dager bi rege xîzkerinan wê li deverên laş û hwd, wê werina çêkirin bo parastin û başbûnê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike ku wê têgîna bi wateya wan dagerên ku ew ji wan hevî dihê kirin ku ew baş bikin, wê weke têgînekê wê pêşbikeve. Di aslê xwe de wê, ji aliyê derûnî ve wê li ser wê têgîna bawerîyê re wê bandûra wê li laşê mirov wê bibê. Tiştêkî ku mirov bi wê wê re pêş dikevin. Meji jî wê, di wê çerçoveyê de wê di çerçoveya wê hizirkirinê û hwd de wê afirandinê û hwd wê di nava xwe de wê bike û wê li laş wê belav bike. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşeka têkilîya bawerkerinê û ya derûnîyê, ku mirov wê li vir bike mijare lêkolînê, wê di vê çerçoveyê wê hinek encamên wê yên ku ew xwe di vê rewşê de ew bidina dîyarkirin jî wê hebin. Rewşên derûnî, wê hinekî wê, li ser têgînên weke keseyetîyê û hwd re bin. Lê di çerçoveya têgîna hebûna fizîkî a laş de wê rewşên derûnî, wê tene wê weke rewşna hizirna û ankû rewşna hizirî û hwd wê nemênin. Wê ji wê zêdetirî wê encamên wê, li ser rewşên fizîkî ên laş û hwd re wê xwe bidina dîyarkirin. Ev jî wê, di dewama wê de wê rewşeka ji zêhn bi ber fizîkê ve û ankû ji aqil bi ber laş ve wê rewşekê ku mirov wê divê ku wê fahm bike wê bide derxistin li holê.

Di çerçoveya têgîna bûjenî de ku mirov wê bihizirê, wê têgîna sîmyayê, wê xwediyê wê têgînê bê ku wê her tişt ji destpêkekê wê xwediyê destpêkirina xwe bê. Dema ku mirov, bi têgîna sîmyayê re bahse têgîna bûjenê bike, wê destpêka wê ya pêşî ku ew weke bûjena pêşîkî ya, wê ew weke cewherê wê yê tiştî jî wê were hanîn li ser ziman. Têgîna bûjenê, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê. Li ser aqil re mirov, wê çawa bi aqil hebûna bûjenê wê fahm bike? Di serî de mirov, divê ku wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê têgîna bûjenê, wê ji destpêka wê, hizreka ji jîyanê bê. Bi gotineka din, wê weke destpêkekê gîyanî û ankû hişmendî wê were hanîn li ser ziman.

Di çerçoveya têgîna sîmyayê de ku mirov wê dihilde li dest wê ev jî wê, bi wê re wê were dîtîn ku wê her tiştê jî yê ku ew wê dizanê ve wê ew were fahmkirin û zanîn. Bo vê yekê, em vê yekê dibînin ku wê hertimî wê zanînen ku ew wê ji herkesekî re wê nevekirîbin û wê herkesek nika ribê xwe bigihênê wan wê hebin. Ev têgîn jî wê di nava xwe de wê, dîsa du aliyan wê biparêzê. Aliyê ku ew dihê zanîn û yê ku ew nayê zanîn. Her tişt, çendî ku ew hatibê zanîn wê li gorî vê têgînê wê aliyekî ku wê yê ku ew nayê zanîn wê hebê. Ev jî wê, tenê yên ku ew ahlê wê karê na û ew tenê bi wê ve alaquadar dibin, wê ew karibin xwe bigihênina wan. Di vê çerçoveyê de wê her merhele û ankû pêvajoya ku wê bi ast û pîvanî wê hinek karibin xwe bigihêninê û wê zanibin wê hebin. Lê aliyê ku ew ji zanîne re vekirîya wê ew wê were zanîn. Di vê çerçoveyê de mirov wê yekê heta roja me jî wê di nava hin zaneyên kurdan de wê bibîne ku ew wê zanebûna ku wê herkesek karibê fêr bibê û ya ku wê herkesek nika ribê xwe bigihênîyê û fêr bibê, wê werênina li ser ziman. Bi wê re wê, zanîna ku ew ji derve vekirî ya û ya ku ew di hundûrê de ew girtîya wê hebê. Minaq têgîna laş bo laş weke demek bûhûrîner a, wê laş piştê wê jî wê laşê derkeve û wê bijî. Wê ev çawa bibê, wê weke aliyekî nepenî wê hebê. Herkesek, wê nika ribê wê fahm bike. Bo ku mirov, wê fahm bike, têkilîya bi gîyanê re wê weke ku wê pêşwîst bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wê, wê were hanîn li ser ziman.

Hebûna gîyanê, wê hertimî wi çerçoveya têgîna ezoterîkî ve wê weke mijareka ku wê serî li ser wê were wastandin bê. Wê çawa di laş de wê bijî û piştî ku ew gîyan jî laşî derket wê çawa wê bijî, wê xoslet û xûyên cûda wê bi wê re wê pêsbikevî û wê hebûn û ankû nebin, wê ev mijar, wê li ser têgîna gîyan û pênerîya gîyanê re wê pîr zêde wê serê li ser wê were wastandin. Aliyê din ê vê têgînê jî wê di çerçoveya hebûnekê de ku wê pîranîtiya xûy û qarakteran û her wusa bi wê re pêşketin û bilindbûna nirxtiyê a bi pêşketina hebûnê re ku wê were hanîn li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê rewşê û têgînê weke rêya ku mirov wê di wê re bi pêşketina xwe ya di jîyanê de re ku mirov bi wê re dimeşe jî wê werênê li ser ziman a. Di dewama vê têgînê de ku mirov dihizirê, wê bi wê re wê weke ku wê di serdemên berê ên civakî ên li kurdistanê de wê were dîtîn, wê regekî teosofîkî wê xwe bide dîyarkirin. Yanî, bi hevdû re jîyankirina gelek xalkan û cûdahî nekirina nava wan, di çerçoveya ol, bawerî û felsefeyê de dema ku ew li wan dihê hizirkirin wê çawa derketina li ser wan û li pêşîya wan wê bibê ku bi têgînekê pêşzanîni hizirkirin û hewldana bi têgîna xwe re hertimî jî wê bûhûrîne esasgirtinê û bi wê re di dewama wê de ku wê çawa aliyê xwezayê ên ku ew ne hatina kifşkirin ku ew werina kifşkirin û hwd, wê li ser wan bê hizirkirin. Di vê çerçoveyê de ji du aliyan ve hizirkirin derkeve li pêş. Aliyê wê li ser nepenîyê û ankû 'mistismê' re bê. Di çerçoveya têgîna nepenî û ankû mistismê a afsûnî de wê navaroka wê ya weke bi

têgînî ku wê werênê li ser ziman, têgînên weke stêrzanî, falzanî, gîyanzanî, xwûdazanî, taûrjî (ku wek têgîneka têkilîyên nava hêzên serxwezayî lêkolîn dike), têgîna gerdûnê û şîroveya wê, têgîna felsefeyê û hizikirina li wê, dagerîzanî û hwd, wê çend ji wan rengên têgînî ên ku ew di nava navaroka wê de wê weke têgînên ku wê bi vegotinî û hwd wê werina hanîn li ser ziman bin. Her wusa, temenê van têgînan jî wê li ser rewşa têgîna nepenîyê re wê bimeşênê bê. Di vê çerçoveyê de ev gotinên ku ew li ser têgînên hijmarî û hwd ku ew heta roja me jî ew dinava civake kurd de wê bi şewayekê wê ji serdemên berê û heta roja me wê hebûna xwe bide domandin, wê di temenê hijmaran de jî wê li nepenîyekê wê were lêgerîn. Mînaq, hijmara heft(7)an wê ji serdema hûr û mîtannîyan û heta roja me, wê di nava civake kurd de wê pîroz bê û wê li ser wê re wê şîroveyna bi têgînî ên pîroz wê werina pêşxistin. Rewşa têgîna hijmaran, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa fahmkirina wan re wê, weke ku mirov ji rewşa ku wê di nava kurdan de wê were li ser ziman, wê bi awayekî qarakerîstîkî wê were lêpîrsîn. Falên ku ew li ser têgîna hijmaran re ew dihên vekirin, wê têgîna ku em dikarin weke bi têgînên pêşzanîni û ankû pêşdîtîni û hwd re wan fahm bikin wê, werênina li ser ziman. Di rewşa hewldana fahmkirina têkiliya nava xwûdan û mirovan jî wê bi wê re wê werê hanîn li ser ziman. Hijmarên pîroz ên ku ew şansîyê ji mirov re dihênin û hijmarên ku ew ji mirov re bêşansîyê dihênin, wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka hijmarî wê were hanîn li ser ziman.

Dema ku wê li ser gerdûnê û ankû fezeyê wê bihizirin jî wê, di çerçoveyek têgînek hijmarî de jî wê hin vegotin wê hebin. Ev jî wê, çawa wê werina fahmkirin û nêzîkî wê li wan wê were lêkirin û hwd, wê ew jî wê bi awayekî wê dîyar bê. Heta roja me jî wê hijmarên weke sê, heft, bistûyek, sadûyek û hwd wê werê hanîn li ser ziman. Wê hê gelek hijmarên pîroz wê hebin. Li ser falzanîyê û hwd re wê mirov jî wê hijmara xwe ya pîroz wê bizanîya. Li gorî wê jî wê, li ser baxtê wan mirovan re wê şîrove wê bihetan pêşxistin. Mînaq, wê di nava êzdayîyên berê de wê hertimî wê çendî ku wê hijmara sad(100) wê werênina li ser ziman jî wê li şûna wê notûneh(99) wê werê hanîn li ser ziman. Di bawerîya wan de sad(100) tiştên pîroz weke navên yazdanan û hwd hena. Ew di wê bawerîyê de na ku mirov tenê ji wan notûneh(99) an dizanîn. Li gorî bawerîya wan ya ku ew heta roja me di nava kurdan de ew dihê hanîn li ser ziman ku mirov, wê ya hijmara sadî(100) ku wê li dûv ya notûneh(99)ê bizanibê, wê derbasî ast û pîvaneka mazin a zanîni a bi xwe re wê bibê. Kurd, heta roja me jî wê bi wê rengê bawer dikin. Di vê çerçoveyê de notûneh dihênin li ser ziman. Li ser wê di qavizina ya sadûyekê. Hijmara sadûyekê, wê piştî ya notûnehê re wê weke hijmareka destpêkirinê jî bê. Nepenîya di mejîyê kurdan de a di bin hijmare sadî de wê biqasî ya heft'an wê mazin, giring û hertimî wê li ser wê, wê were hizirkirin bê. Di nava kurdan de mirovê ku nepenîya hijmara sadî zanibê, wê ew xwe bigihênê hemû nepenîyên gerdûnî jî.

Em î ro, vê jî dizanin ku wê hizirkirina li ser hijmaran û ji wan derxistina wateyên cûda û ankû li wan kirina wateyê cûda û her wusa bi şewayên cûda bikarhanîn û pêşxistina hijmartina wan, wê di vê çerçoveyê de wê, têgîneka hijmarî wê bi xwe re wê di wan de wê hijmar wê werina bikarhanîn wê hebin. Lê dervî wan herdû aliyên wê, ji aliyê hin têgînên din ên pîroz jî wê bi watekirin û hwd wê were pêşxistin. Di nava civake kurd de heta roja me jî têgînên bi gotinî ên weke "afsûna hijmaran" wê, were hanîn li ser ziman. Wê li ser wê re wê hizrên ji hevdû cuda û cûr bi cûr wê ku ew ji aliyê

nifşên roja me ve ku ew ber ku ew zêde mejûya wê civakê bi wan pêşveçûnên wê re nizanin, wê di fahmkirina wê de wê hertimî wê bikevina zorê de. Yan jî wê, ti wateyê di mejiyê xwe de wê nedinê. Yên ku ew dizanin jî ku ew dihênina li ser ziman û rastî nêzîkatîyek bi vî rengî tîn jî ew, hingî di xwe de dem bi dem pirr zêde ew xemgîn dibin, dilêşî dibin û diêşihin.

Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê, bi demê re wê, teknîk û teknolojiya ku wê pêşî bi amûrên mazin ên mekanîkî wê pêşkeve wê, di nava jîyanê de wê, weke aliyekî temenî ê jîyanî wê pêşketin xwe bide dîyarkirin. Di nava jîyane mirov de wê, teknîk wê weke aliyekî ku mirov li gorî pêwîstîyên xwe yên ku ew bi wê dijî re wê, di jîyanê de wê pêşkeve û wê rengê xwe wê bide dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê, hebê. Teknîk û ankû di dewama wê de ku teknoloji pêşket û pêde wê, di jîyanê de wê, ji temen ve wê, bidest gûharîninê di jîyane mirov de wê bikê. Her tişta ku ew bi teknîkî hat pêşxistin wê, bi xwe re wê hinek gûharînan wê di jîyane mirov de jî wê, werênê. Ji amûrên xwarinê bigira û heta ku wê, bigihijê rewşên weke yên hesinkarîyê wê, di jîyanê de wê rewşek nû a kînetîkî wê xwe bide dîyarkirin. Wê pêşkeve. Mirov wê, di jîyane xwe de wê, bi wan amûrên ku ew pêş dixê re wê, jîyane xwe wê bijî. Amûrên ku ew bi teknîkî û teknolojikî dihên pêşxistin wê, weke encamaka wan wê, jîyane mirov wê ji gelek aliyên ve wê bi hesan bikin. Wê rewşa afirandina berheman bi hindikê kedê wê zêdetir bikê. Di warê hilberînê de jî wê, di vê çerçoveyê de wê teknîk û teknoloji wê weke aliyekî giring wê di temenê wê pêşketina wê ya bi hilberandinê de wê xwe bide dîyarkirin bê. Di rewşa afirandinê û ankû hilberandinê de wê, rewşa ku wê derkeve li holê wê, bi encama wê re wê, were li ser ziman. Mînaq wê, rewşên weke ku wê cizîrî bi têgînên xwe yên mekanîkî re xîz dikê wê çawa wê, rêyên avê wê werina çêkirin û di nava jîyanê de wê, werina bikarhanîn wê, li wan wê werina pêşxistin. Di dewama wê de wê, rewşên weke yên aqilê xwe gihandina çêkirina rewşan wê di vê çerçoveyê de wê, pêşkeve. Aqilê mekanîkî û teknîkî ku ew pêş dikeve wê, weke encama wê, wê di rewşa avakirin û dîzaynkirina malan ûa nkû xaniyan, amûrên ku

wê di wan de wê mirov bi wan wê bijî, li derve wê, amûrên weke yên çandiniyê û cotyarîyê û hwd wê, werina pêşxistin.

Hilberîna ji destê mirov wê zêdetir bibê bi teknîkê. Di dewama wê de wê mirov wê di rewşên teknîkî de wê, hizirkirinên xwe wê pêşbixê. Bi demê re wê, rewşên weke nivîsandin û pêşxistina hizran wê di wê rewşê de wê zêde bibê. Nivîsandin wê, weke karekî teknîkî ê aqilî wê pêşkeve û wê bikeve jîyane mirov de. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, amûrên xwandinê wê werina pêşxistin. Her amûra xwandinê wê bi xwe re wê weke hizreka ku wê mirov wê fêr bibê wê, di wan rewşên nivîsandinê û ankû di encama wê de ku ew hatiya pêşxistin di wan pirtûkan de wê hebê. Mirov jî wê, bi demê re wê, xwandina bixwe re wê pêşbixê. Bi xwandinê re wê, zêdetirî hizrên di serê xwe de wê pêşbixê. Wê derxê li pêş.

Di warê teknîkên nivîsandinê û ya xwandinê de wê, pêşketin wê zêdetir bibin. Wê amûrên xwandinê wê zêdetir bibin. Hizrên ku ew dihên xwandin wê, weke têgîna mekanîkî wê, di mejiyê mirov de wê bicih bibin. Her hizir wê, bi xwe re wê, hişkirineka bi tevgerî a teknîkî û mekanîkî wê bi fîzîkî wê bi xwe re wê werênê. Di vê çerçoveyê de wê, ew hizrên ku ew hatina nivîsandin wê, bi rengêkî wê, çawa wê bi fîzîkê wê bèn wergerandin li encamek fîzîkî wê, li ser wê were hizirkirin. Di nava xosletên aqil de wê, ew têkiliya ku ew dihê danîn û ew dîzayna ku ew bi wê re ew dihê derxistin li holê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi şewayekî fîzîkî wê rengêkî pêşketinê wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Li vir wê, têkiliya aqil a bi rewşa fîzîkê û ankû fahmkirina aqil weke rewşek fîzîkî û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, bi demê re wê, bi mejiyê mirov re wê hişê wê pêşkeve.

Mirov wê, di nava jîyanê de wê, çawa wê, bi aqilê xwe re wê, rewşên ku ew bi wan dijî wê pêşbixê. Li vir em, ku dihizirin bi awayekî xwezayî ku mirov dihizirê wê, ew wê werê dîtin ku wê, çawa wê ew hizra bi têgîna '...bi aqilê xwe re wê, rewşên xwe yên xwe yên jîyanî wê pêşbixê' wê, bi wê re wê bahse aqilekî fîzîkî ê mekanîkî bi xwezayî wê were kirin. Aqil wê, di vê çerçoveyê de wê jî aliyekî ve wê, li ser rewşên xwe yên bi darêjkî û di asta giştî de bi çerçoveyî wê, bi rewşek fîzîkî û ankû darêjkî re wê xwe bide dîyarkirin. Wê di wê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman. Her wusa wê, dema ku mirov li aqil dihizirê mirov bi wê re wê kifş dikê ku wê aqil wê, tiştêkî wê bi xwe re wê bide gotin û hanîn li ser ziman. Ew tişta ku ew got û hanî li ser ziman wê, weke tiştêkî ku em bi têgîna bûjenîkî û ankû fîzîkî wê hildina li dest û wê fahmbikin bê. Di rewşa fahmkirina rewşa fîzîkî de wê, aqil wê, bi çerçoveya xwe ya darêjkî a çerçoveyî re wê, bi wê re wê, bide dîyarkirin. ..

Aqil wê, dema ku mirov wê, bi dûalîteya wê ya bûjenî û têgînî re wê werênê li ser ziman wê, bi awayekî xwezayî wê li ser rewşek têgînî a fîzîkî re wê, xwe bide hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê, bi teybetî wê, werênê li ser ziman. Aqilê fîzîkî wê, bi hezaran salan wê, li ser wê têgîna dûalîteyê re wê, bi aliyê wê yê bûjenîkî re wê were hanîn li ser ziman. Têgîna fîzîkê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi xwe re wê pêvajoyên hişmendiyê ku em dikarin weke hişmendiya fîzîkî û ankû weke hişmendiya mekanîkî wê werênina li ser ziman wê derbas bibê. Piştê jî wê, pêvajoyên pêşketina teknîkî û ankû aqilê teknîkî û di dewama wê de ya aqilê teknolojîkî û teknolojî bixwe wê were pêşxistin. Ev rewşên weke bi dûalîyan aqilê bûjenî û yê têgînî re wê, weke encameka wê wê ya giring û dîrokî wê, di serî de wê, ew xwe bide dîyarkirin ku wê aqilê fîzîkê wê xwe bide dîyarkirin. Mirov wê, bi nîqaşên ku ew li ser

rewşa bûjenîkî wê dimeşênê re wê, bi demê re wê, bi aqil û zanista fizîkê, mekanîkê û teknolojiyê re wê bi encam bikê û pêşketina wê di çerçoveyek aqilî û hemdemî de wê bide domandin. Têkiliya di nava rewşên têtîgînên bûjenîkî û yên fizîkî, mekanîkî, teknîkî û teknolojikî wê bi pêvajoyên pêşketinê re ên fizîkê re wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, ev wê weke aliyekî giring wê, bi rewşa aqilê fizîkê re wê, xwe bide dîyarkirin. Di serdemên kevnera de wê, dema ku mirov wê li rengê hizirkirinên Zerdeşt ku mirov wê li wan binerê wê bi dûalîteya gîyan û laş, fizîk û zêhn, hiş û bûjenê û hwd re wê werê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de ev şewaya dûalîtîkî a ji hevdû cûdakirinê wê, ne tenê wê weke cûdakirineka bi têtîgînî wê bimênê. Ji wê zêdetirî wê, weke cûdakirinaka ku wê bi demê re wê mirov wê aqilê xwe li ser wê biwastênê û wê bihişbikê û wê li ser wê re wê pêvajoyên bi pêşxistina tiştên fizîkî re wê bi encam bikê bê.

Di rewşa têtîgîna fizîkê a di nava felsefeyê (de) de ku mirov li wê dihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê, nîqaşên ku ew li ser wê re ew dihên kirin û meşandin wê, di çerçoveya zelalkirina fahmkirin û derka wê ya bi hişmendî de bê. Her wusa wê, dema ku mirov wê, di dewama wê de wê bi demê re wê bihizirê wê, ew wê were dîtîn û kifşkirin ku wê, bi demê re wê, bi dûalîteya fizîk û zêhn, bûjen û hiş û hwd re wê, her aliyê ji van dûalîteyan wê dîmenê yê xwe yê din ê ji xwe wê biafirênê. Mînaq wê, dema ku mirov wê tenê wê aliyê zêhn wê, were hildan li dest wê, çawa wê, rewşek fizîkî ya wê were kifşkirin bi wê re û wê ji aliyê wê ve wê li wê were nerîn wê, ew were pêşxistin. Bi heman rengê wê dema ku wê ji aliyê fizîkê ve wê were nerîn wê, ew rewşa fizîkê wê çawa wê, were bihişkirin û ankû wê hişmendîya wê, were pêşxistin wê, li ser wê were hizirkirin. Bi rewşa gotinên roja me ên felsefîkî ku ew pîrr zêde ew dihên nasîn ên 'îdealîsmê' û 'metalyalîsmê' wê, di vê çerçoveyê de wê, were li ser ziman. Ji aliyê îdealîsmê ve ku wê were nerîn wê, ew çawa wê rewşa xwe ya fizîkî bi nerîna xwe re wê kifşbikê û vebêjê wê, were li ser ziman. Bi heman rengê rewşa têtîgîna 'metalyalîsmê' wê çawa wê, bi hişmendîya xwe ya fizîkî re wê, pêşkeve wê li wê were hizirkirin. Di rewşa fahmkirina rewşa têtîgîna metalyalîsmê de wê, çawa wê rewşa bûjenîkî wê, bi herêkirina wê ya teqez re wê, ew wê bi fizîkî were dîtîn bê. Li gorî wê, bûjen heya. Mirov nikarê wê red û înkâr bikê. Wê mirov karibê dest li wê bide, rajiyê de û derkbikê. Li vir wê, bûjen wê weke rewşek heyî a dervî me û derka me ku ew heya wê, were herê kirin. Yanî mirov, dema ku mirov bihizirê ku wê bûjen bibê ew nabê. Ber ku ew heya mirov wê derk dikê. Lê aliyê din ê îdealîsmê wê vajî wê bihizirê. Wê bihizirê ku 'ez ber ku wê dihizirim' ew heya.' Wê di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya hizirkirinê de wê li wê bihizirê û wê ew wê werênê li ser ziman. Aqilê me yê ku ew bi pêşketina xwe re ew digihijê kifşkirinan wê bi demê re wê, rewşa xwe ya fahmkirinê wê zêdetir bikê. Ber vê yekê wê, di rewşa hizirkirina bi xosletên bûjenîkî de ku mirov wê bi fizîkî wê biafirênê wê, bidest pêşxistina wê bikê. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, di çerçoveyek realîsmî de wê, ev herdû alî wê hevdû temem bikin. Dema ku mirov li gorî têtîgîna Zerdeşt dihizirê, ber wê yekê ya ku wê ne tenê têtîgîna îdealîsmê û ne jî ya metalyalîsmê wê karibin bi serê xwe xwediyê vegotîneka têtî bin.

Ber ku wê, dema ku mirov li rewşa bûjenê di çerçoveya rêgezên fizîkê de dihizirê wê, xwediyê xosletên dîtbar ên têtîgînî û yên heyîniê ên fizîkî bi hevdû re bê. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov bi têtîgîn û dîtîneka fizîkî wê li wê dihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê, ew wê xwediyê wê rewşa xwe bê. Di rewşa tevger û ankû kirinekê û

danişandina wê de wê, rêgeza dîtarî wê bûhûrîner bê. Lê dema ku mirov li rewşek bûjenîkî hizirî wê rêgeza fizîkî wê bûhûrîner bê. Rêgeza dîtarîyê wê, ew bi xwe jî wê, xwediyê rewşek rewşeka ku mirov wê bi rewşa fizîkê re wê hilde li dest û wê fahmbikê bê. Têgîna fizîkê wê, di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê, li wê dihizirê wê, di rewşa fizîk û nefizîkê de wê, têgîna dîtarîyê wê, di wê de wê xwediyê wateyekê bê. Di rewşa fizîkê de wê, weke encama wê ya pêşketinî wê teknîk, mekanîk û teknoloji û hwd wê bi gelek cûra û pêvajoyên wê re wê pêşkevin û wê bikevina jîyane me de. Wê pêvajoyên felsefeyê ên ku ew me hinekî li jor di çerçoveya wê de hanîn li ser ziman wê, weke pêvajoya wê ya bi aqil a destpêkê a ku ew pêşdikeve bê. Aqil wê bixwezayî wê li ser têgîna bûjenîkî re wê xwediyê xosletê xwe yê fizîkî bê. Di vê çerçoveyê de wê, wê di rewşekê de wê têgîneka fizîkê wê weke têgîneka ku mirov wê, têgîna bûjenîkî wê bikê temenê wê de wê û wê werênê li ser ziman bê. Pêvajoyên pêşketina aqil wê di vê çerçoveyê de wê, çerçoveya wê ya bi aqilî û têgînî wê pêşbixin. Di dewama wê de wê, temenê hizirkirina wê ya bi wê rengê wê pêşbikevin û wê biafirin. Lê di aslê xwe de ku mirov ji aliyê têgîna fizîkî ve binerê wê aqil wê hertimî wê, bi têgînek fizîkî wê xwediyê temenê xwe yê pêşketinî bê. Wê bi wê re wê xwe bide afirandin. Rewşa fizîkê ku mirov wê, dikarê biadilênê û ankû wê bi reng û awa û şekl bikê wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî girîng wê xwe bide diyarkirin. Aliyê bi awa û rengkirina fizîkê û ankû rewşên fizîkê jî mirov li vir di dewama wê de wê, di çerçoveya têgîna fizîka afrîner de wê li wê bihizirê û wê werênê li ser ziman.

Teknolojî wê dema ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê li wê dihizirê wê, weke aliyekî afrîner wê xwe bide diyarkirin. Afrînerîya teknîk û ankû teknolojiyê wê, dema ku mirov li wan pêvajoyên wê yên pêşketinê dihizirê mirov wan kifşdikê. Di serdemên destpêkê ên şariştanîyê de wê mirov w kevçiyekî xwarinê, sênikekê zerikekê, cêrekê, sevîlekê, teşiyekê, tevnekê çêkirina mahfûran û hwd wê çêbikê. Wê weke van wê gelek tiştan wê çêbikê. Piştê wê, di dewama wê de wê, gelek çêkerîyên din wê bèn çêkirin û wê bikevina jîyane mirov de. Mirov wê dema ku ew li wan kifşkirinên destpêkê dihizirê wê, di aslê xwe de wê, ew jî wê bi çerçoveyek darêjkî wê hatibina çêkirin. Wê di temenê çêkerî û çêkirina wan de wê aqilekî teknîkî û teknolojikî wê hebê. Bi demê re wê, tişt wê bo ku mirov wan di jîyane xwe de wan bikarbênê wê li wan werina zêde kirin.

Di vê çerçoveyê de mirov di dewama wê çêkerî û çêkirinê de mirov, dikarê bahse aqilekî afrîner ê teknîkî bikê. Tiştên ku ew dihên çêkirin wê, pêşî bi razberî wê ew di mejî de wê bi hiş wê werina afirandin. Piştê jî wê, werina pîretîze kirin û şenber kirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî di çerçoveya gotina 'şenberî' û 'razberîyê' de di vê çerçoveyê de wê, bibêjê ku wê, têgîna razber wê, xwe di jîyanê de wê, biafirênê. Têgîna razber ku ew bahse wê dihê kirin wê, weke têgîneka ku ew beremberê wê di jîyanê de bi bûjenî û hwd ku ew tûna ya bê. Ew têgîn wê, weke têgîneka ku ew di mejî de ew hatîya pêşxistin bê. Çendî ku wê, di jîyanê de tiştên şenber ku ew hena wê ji azmûna wan wê sûd wê were girtin jî lê wê, bi asta dawî a wê têgîna razber de wê, bi şenberî wê di jîyanê de wê ti tişt wê newê dîtin. Wê nava wê aqilê razber de wê, xosletên ku ew bi wan hatîya afirandin wê, weke xosletna ku ew li ser wateya gotinê re bê û ankû xosletna şenberî ên tiştî û hwd re ên bi azmûnî ku ew berê hatina derkkirin bin û hwd re wê, di nava xwe de wê, temenê şenberîya xwe wê bide çêkirin. Ew têgîna razber ku ew hat pîretîzkirin li jîyanê wê, hingî wê, di encama wê de wê ew tişt ku ew

bi wê re ew hatîya hizirkirin wê, ew derkeve li holê. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyeka têgînî a ji razberîyê bi ber şenberîyê ve wê, xwe bi aqil(hiş)ê bûhûriner wê bide dîyarkirin. Aliyekî tiştê ku ew hat afirandin wê, bi têgîn û gotina teknîkê re wê were li ser ziman. Ew hebûna tiştê ku ew derket li holê ku ew minaq ew kevçiyek bê û ankû weke ku ew di roja me de ew kompîtûrek bê û ankû ew tv'yek bê û hwd wê, weke wê çerçoveyêa darêjkî wê di xwezayê de wê nebin. Ev wê, weke encama wê aqilê razber bê. Ji vê aliyê mirov ku wê, rewşa teknîkî û teknolojikî wê hilde li dest wê, di aslê xwe de wê, di çerçoveyek, rewşek û rengê razber de wê di jîyanê de wê xwe bide dîyarkirin bê. Têgîna razberîyê wê, di vê çerçoveyê de wê, ji aliyekî ve wê, li ser afrînerîya aqil re wê, li ser pêşxistina teknîkê û hwd re wê, xwe bikê ku ew şenber bikê. Di vê çerçoveyê de wê, aliyê ku wê têgîna mengîwerî a îdealîsmî ku wê bi xwe re wê bi me re wê bide kifşkirin wê û ku wê weke kifşkirineka dîrokî bê wê, di vê aliyê û çerçoveyê de wê, bi vê rengê wê xwe bide dîyarkirin bê. Li vir li vê têgîna îdealîsmî ku mirov wê tenê wê weke hizrekê wê dihilde li dest wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe bide dîyarkirin xate pêşketina wê ya bi metafizîkî wê, bi xwe re wê, afrînerîya wê, bi xwe re wê temenê wê jî wê biafirênê. Li vir wê, di temenê afrînerîyên fizîkî ên weke teknolojikî de ku mirov, di çerçoveya wê têgîna razber de wê, li metafizîkê li şûn têgîna gotina teknîkê û ankû teknolojiyê li wê bigerihê û ankû wê bikê ku wê kifşbikê wê, di vê çerçoveyê de wê, ew wê xwe bide dîyarkirin bê. Li vir wê, du lingên wê pêşketina teknîkî û teknolojikî wê hebin. Aliyek wê bii fêr û azmûna wê ya bi afrînerîyên teknîkî êmn ku ew hatina çêkirin bi çêkerî bin. Aliyê din jî wê, di vê çerçoveya hizirkirina razber de bê. Ev ew herdû alî wê, di çerçoveyeka bi afirandina bi aqil re wê, xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê û hizirkirinê de wê têgîna razber wê, xwe bi pêşketina teknîkî re wê bi şenberî wê bide dîyarkirin. Di roja me de wê, li jîyanê wê rewşên ku em bi têgînî û teorîkî li ser têgînên weke estetîkê û dîzaynkirinê ên weke sazûmankariyê ('architect') û hwd ku em dikarin wê werênina li ser ziman wê, pêşkevin. Wê di rewşên weke çêkirina awadanîyan û ankû xaniyan, çêkirina amûrên teknîkî, pêşxistina projeyên teknolojikî û bernemayên weke yên înternetê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Ev rewş hemû wê sazûmankariya xwe di jîyanê de wê bi teknîkî wê pêşbixin. Ev jî wê, weke beşna teknîkî û ankû teknolojikî wê di warê xwe de wê pêşkevin.

Di teknoloji wê, di nava xwe de wê çendî ku wê kûrbûnê wê bijî bi teknîkî û têgînî wê, beşbûnê wê weke bi saqî û ankû weke beşên zanistî û hwd wê bi xwe re wê bijî. Ev jî wê, weke pêvajoyên li pêşîya wê bê. Ev rewş wê, weke baxtê hemû têgînên ku ew di jîyanê de pîretîze dibin û pêşdikevin jî bin. Li vir wê, li ser wan re û ankû di çerçoveya wan de hanîna li ser ziman a bi aqilên cûr bi cûr wê, temenê wê bi xwe re wê biafirênê.

Teknoloji wê, her çendî ku wê weke amûrekî ku em bi fizîkî dikarin destlêbidin, rajinê û wê hildina li dest û wê derkbikin jî bê lê wê, di aslê xwe de wê, weke encama wê bi şenberbûna wê têgîna razber bê. Ber vê yekê wê, wê di xwe de wê teknîk wê hertimî wê bi awayekî du-dîmenî wê hertimî wê dîmenên razberîyê û şenberîyê wê bi hevdû re wê, bi xwe re wê bide dîyarkirin. Di rewşa têgîna razber ku wê dema ku mirov wê li wê dihizirê wê, weke ku mirov wê ji tûnabûnê wê biafirênê wê, rewşek têgînî wê xwe di mejiyê me de wê bide şaqîrin. Lê li vir em wê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di çerçoveya têgîna şenberîyê û razberîyê de wê, weke heka ku ew ji mirişkê derket û piştê jî wê çîçîk derket û ew jî bû mirişk wê, werênê li ser ziman.

Li jor me bi çend gotinan ji aliye tégîna razber ve me pêşxistina teknolojîkî wê hinekî hanî li ser ziman. Bêgûman wê ev mijar bi teorîkî ku em xwe li bayê wê berdîna wê pîr zêde wê kûr biçê û wê bi bergan wê pirtûkan li ser hevdu wê bi me bide nivîsandin. Bi heman rengî wê, ji aliye tégîna şenberîye ve wê di dewama wê de wê hinekî li vir wê werênina li ser ziman. Tiştê ku ew di jîyanê de ew heya, mirov dikarê destlêbide, rajiyê de û wê derkbikê wê ew weke ya şenber bê. Bi gotineka din wê tégîna şenberîye wê temenê xwe wê li ser ya heyî û ankû bi hebûnî heyî wê bide hanî li ser ziman. Minaqe wê, teknîka ku me ku me afirand wê di pêvajoyên jîyane xwe de wê, bi dem bi dem wê fahmbikê ku ew çawa hatîya afirandin û wê hizrê di mejiyê xwe de wê, bi awayekî hizirkirî wê bihizir bikê wê, di vê çerçoveyê de wê, weke ku me çawa li jor ji razberîye bi ber şenberîye ve hanî li ser ziman wê, li vir wê di dewama wê de wê, ji şenberîye wê bi ber hizirkirinê ve wê razberîyek wê xwe bide dîyarkirin. Ev razberîya li ser wê rewşa şenber re ku mirov wê fahmbikê wê, weke razberîyek hesan bê. Wê ew razber wê, minaqe wê li jîyanê wê hebê ku ew ji wê hatibê derkkirin bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ew hizirkirin wê, di wê çerçoveyê de wê, wê weke aliye kî din ê tégîna wê xwe bide dîyarkirin bê. Li vir em di dewama wê de wê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliye kî giring wê, ev wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê razberîya li ser rewşa şenber re ku me ew bidest xist wê weke razberîyek şenber jî wê xwe bide dîyarkirin bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşa fahmkirinê de wê, di wê de wê, dimenê şenberîye wê di wê de wê xwediyê wê rewşa wê bê. Lê li vir mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di minaqe tégîna razberîya şenber de wê, ew rewşên teknîkî ku ew ji wan hatîya fêrkirin wê weke bineterna teknîkî û ankû tégîna ên ku ew hena wê di temenê wê de wê, xwe di destpêka bûyîna wê de wê bide dîyarkirin bin. Pêvajoya pêşketina tégîna teknîkê û di dewama wê de ya pêşketina teknolojîyê de ku me hinekî li jor ji razberîye bi ber şenberîye û di dewama wê de ku me ji şenberîye bi ber razberîye ve wê pêşketina wê kifşkir wê, di çerçoveyê pêşketina jîyanî de wê, xwediyê wê rewşa tégîna pêşketina xwe ya di jîyanê de bê. Li vir mirov wê, dikarê wê werênê li ser ziman ku wê teknolojî wê, gotina wê ya razberîye û ya şenberîye jî wê, di xwe de wê, di çerçoveya xwe de wê xwediyê ponijbûnekê a bi xwe re bin. Teknolojî wê, di rewşa xwe de wê, weke rewşek darêjkî a fizîkî ku ew hatîya afirandin bê. Wê di wê rengê û awayê de wê, xwe bide dîyarkirin bê. Di warê fahmkirinê wê de wê, rewşa teknolojîyê wê, hertimî wê ji aliye kî ve jî wê, di jîyanê de wê, weke rewşek razber wê xwe di wê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin. Dema ku mirov teknîkê dixwênê wê, weke ku mirov bineterekê dixwênê û fêr dibê bê. Teknîk û ankû teknolojî wê, ji aliye rewşa aqil ve wê, weke rewşek dewrûdayimî a li ser darêjkê re wê weke rewşek xwe afirandinê jî wê bide dîyarkirin bê. Vê rewşa tégîna razberî a teknîkî ku me hanî li ser ziman wê, hinekî di derbarê tégîna gotina fizîka afrîner de wê, weke aqilekî ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman jî bê. Aqilê fizîka afrîner wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aqilekî giring ê teknîkî bê. Di nava tégîna aqilê fizîkê û teknolojîyê de wê tégîna aqilê fizîka afrîner û ankû afrînerîya aqilê fizîkê wê hebê. Di warê fahmkirinê tégîna fizîka afrîner de wê tégîna razber û şenber ên ku me li ser gotina teknîkê û ankû teknolojîyê re hanî li ser ziman jî wê ji hinek aliyên ve wê vegotinbar bê. Wê hinek aliye kî wê jî wê bi xwe re wê bi me bide fahmkirin.

Di rewşa teknolojîyê de wê, tégîna fizîkê wê, weke tégîneka afrîner wê xwe bide dîyarkirin bê. Di zane min de ku mirov teknolojîyê wê, di hilde li dest wê, bi wê re wê

weke ku mirov wê têgîna afrîner a fizîkê jî wê weke ku wê dihilde li dest bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di awayekî de wê xwe bide diyarkirin bê.

Têgîna fizîkê wê, di destpêka sedsale 20an de wê, bi kifşkirinên weke li ser kişîna kûtlejê, elektromanyetîkê, qatkirina atomê û bi wê re kifşkirina qatkên wê re wê, gavên giring di qada xwe de wê bide avêtin. Di vê çerçoveyê de wê, ev pêşveçûnên ku wê, bibin wê, ji aliyê teknolojikî ve wê, weke temenekî pêşketî bê. Mînaq wê, kifşkirinên di atomê de wê, temenê kifşkirina rêyên din ên li ser atomê re ên kifşkirin û bidestxistina vejenê jî wê derxê li holê. Rewşa atomê wê, bi qatkên wê yên binî re mirov dikarê wan hertimî bi şewayên nû wan li hevdû bi biyênê û ji wan rêyên nû ên bidestxistina vejenê bidest bixê. Ev wê, weke rastîyeka ku wê, bi kifşkirinên fizîkê a têgîna qatkan re wê, bi demê re wê, xwe bide diyarkirin bê. Piştî kifşkirinên rewşên weke kişîna kûtlejê, elektromanyetîkê û rewşa qatkan di fizîkê de wê, li gorî asta pêşketinê wê gelek fizîkvan wê bikevina pay rêyên pêşxistina teorîyek 'standard' de ku wê, çawa wê karibê ji hemû aliyan ve wê bi giştîya wê re wê ji rewşên ku ew hena û ku wê rûbidin re wê bibê bersiv. Di vê çerçoveyê de wê, têgînên weke simetrîyê û hwd jî wê, di dewama wê de wê werina pêşxistin.

Kifşkirinên fizîkî wê aliyekî wan yê giring wê ew bê ku wê, di rewşeka bi pêşveçûnên teknîkî re wê, di ahengekê de wê, xwe bidina domandin bê. Çendî ku wê bi teknîkî wê kifşkirin wê bibê wê, ew kifşkirin wê bina temenê kûrbûna di rewşa zanista fizîkê, beş, şaq û zanistên din ên weke wê de jî. Di vê çerçoveyê de wê, ji aliyekî ve wê, weke ku wê li hevdû hûnandî bê wê, di awa û rewşekê de wê xwe bide diyarkirin.

Di rewşa fahmkirina têgîna teknîkê de wê, rewşa têgîna qatkan wê, di dewama wê de wê, temenê pêşxistina teknîkî weke nano wê bide diyarkirin. Ev jî wê, weke aliyekî ku wê, teknoloji wê, çendî ku ew mirov dikarê wê hê piçûktir wê bi afirênê. Rewşên weke simetrîkî, kişîna kûtlejê, elektro û manyetîk û hwd wê, di rewşên teknîkê de wê, di ahengekê de wê, werina bikarhanîn bin. Mînaq wê, dema ku em î ro li ser peykekê re wan sînyalan digirin û bi wê re weşanên tv'yekê temaşa dikin wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşa elektro û manyetîkê wê, ji wê were sîdwegirtin. Kifşkirinên li ser elektrîkê wê, di vê warê de wê weke kifşkirina ku wê di teknîkê de wê, şoreşê wê bide çêkirin bin. Têkiliya amûrên teknîkî ên ku ew dihên pêşxistin û elektrîkê wê, di rewşa sîdwegirtina ji vejenê wê, bidina diyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, têkiliya vejenê û teknîkê û ankû teknolojiyê wê bi xwe re wê, bide diyarkirin bê. Ji aliyekî ve wê, ev di çerçoveya têgîna fizîka afrîner de wê, were li ser ziman. Lê mirov dikarê wan pêşveçûnan li ser xoslet û teybetîyên wan ên ku ew li hev dihên hanîn û ankû ku mirov dikarê ji gelek aliyên din ve wan li hevdû werênê hanîn ve wê, bi reng û şewayna din wê temenê fahmkirinên nû ên teknîkî wê bi afirênê. Ev rewş wê, bo hemû rewşên fizîkî û mijarên wê yên ku ew li ser wan dihizirê jî wê wusa bê. Di rewşa atomê de mînaq wê, li ser şewayên modelî ên atomê re bi rê û şewa û ankû rêbazên cûda dúbare kifşkirinên li ser wê ku wê çendî bi derfê wê wê, biheman rengê wê di rewşa pêşxistina wan aliyan di rewşa teknîkî de jî wê ewçendî jî wê temenê pêşveçûnên nû wê bi xwe re wê biafirênê. Di vê çerçoveyê û warê de wê, li ser rewşa têgîna fizîkê de wê, sînorê kifşkirinê wê nebê. Wê kifşkirin wê hertimî wê di dewama wê de wê bibê.

Lê li vir bo ku ew rewşên fizîkî bi kifşkirinên wan re ew werina kirin mirov, divê wê, têkiliya wê ya bi teknolojiya pêşketî re jî wê, baş û rast wê fahmbikê. Wê ev jî wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê karibê werênê li ser ziman bê.

Zanista fizîkê a qatkan ya kûantûmî wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê hinek pêşdîtinên ku wê hê jî ew piştrast nekiribin bin. Ew jî wê, di wê çerçoveyê de wê, hinekî jî wê li rewşa pêşketina teknîkê wê hoyandî bin. Di vê çerçoveyê de wê çendî ku wê, teknîk wê weke encama aqilê me bê lê wê, bi wê re wê bi aqilê me re wê weke regekî hişmendî wê aqilê sehêtkirina wê û ankû zêdebaştir bikarhanîna wê, xwe bide dîyarkirin. Li ser wê re mirov dikarê wê, bi vê rengê wê werênê li ser ziman. Teknîk wê, di rewşa jîyanê de wê, weke rewşek fizîkî a aqilî wê xwe bide dîyarkirin bê. Yan jî mirov, dikarê wê, teknîkê wê weke rewşek aqilê fizîkî wê werênê li ser ziman. Li vir gotina *aqilê fizîkî* wê, di şêwa û regekî de wê weke ku wê di rengê ku wê aqil wê di rewşa xwe de wê weke rewşek fizîkî wê bistênê wê xwe bide dîyarkirin. Têkiliya fizîkê û aqil wê, li ser têgîna bûjenîkî re wê bi aqil re wê, di nava jîyanê de wê li ser ya ku ew heya re wê xwe bide hanî li ser ziman.

Pêvajoyên pêşketina têgîna fizîkê wê, bi demê re wê bi pêşketina aqil re wê, di ahengekê de wê xwe bidina dîyarkirin. Bi teybetî wê li kurdistanê wê, weke ku mirov bi zane û filosofên kurd ên weke **Îsmailê Cizîrî** re wê kifş dikê wê, ew wê rêgezên tevgerên mekanîkî wê, wan bi dîzaynkirinan xwe re wê bi têgînek fizîkî wê, bi aqilekî teknîkî wê werênina li ser ziman. Pirtûkên wî, di vê çerçoveyê de wê, aqilekî baş û giring wê têgîna mekanîkê wê bidina me. Pirtûkên wî, di warê fahmkirin û têgihîştina aqilê tevgerên mekanîkî de wê, temenekî hemdem wê bi aqilê fizîkê re wê bi xwe re wê biafirênin di jîyanê de. Di jîyanê de wê mirov wê, bi wê re wê, tiştên ku ew di jîyanê de wan dibîne wê, çawa wê, bi çav û nerîneka mekanîkî wê li wan bihizirê û wan di mejiyê xwe de wê, bide vejandin û wê werênê li ser ziman wê, di vê çerçoveyê de wê, hin bi hin wê biaqil wê pêşkeve. Dema ku mirov dibîne ku wê çûkek di firê wê, bi wê re wê weke aqilekî mekanîkî wê rewşa firînê wê xwe bi darêjkî wê di mejiyê mirov de wê bicih bikê. Ji bilî wê çûkê û ankû tayrikê çima sawalên din nafirin wê, weke hizreka bi pirsî wê di mejiyê mirov de wê xwe bide dîyarkirin bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê, xwe bide dîyarkirin bê. Aqilê mekanîkî wê, di jîyane mirov de wê, li ser kirin û tevgerên mirov re wê, xwe bi şêwayekî wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov ku wê, wan kirin û tevgerên xwe wan bi dîmen û wêne kir û ew şopand û ankû weke wan karî rewşna afirand wê, ew wê weke aqilekî mekanîkî û ankû teknîkî bê. Têgîna tevgerên mekanîkî wê, weke têgîneka zanîna fizîkê a berê jî bê. Di serdemên kevnera de wê, zaneyên ku ew derdikevin wê, rewş, tevger û kirinan wê bi hijmaran wê bikin ku wê, werênina li ser ziman û hwd wê bibê. Ji rewşa rêmildarên medî û heta wê bigihijê Arşîmed wê, di vê çerçoveyê de wê li ser rewşa hasibandina rewşên mekanîkî re wê hizirkirina wan bibê. Em î ro wê baş dizanin ku wê rêmildarên olî ên demên gûtî, hûrî û mîtannîya wê, di rewşa hasibandina stêran de wê, pîrr zêde wê xwediyê aqilekî wêrzeyî û ankû matamatîkî bin. Di rewşa hasibandina nava deman bi rewş û germehîya wan wê, di wê de wê hosta bin. Di warê wêrzeyê û ankû matamatîkê de wê, gûtîyî-qasîtî wê pîrr zêde wê pêşketî bin. Ji dema wan berhemên ku ew dihên din wê, di vê warê de wê, bi awayekî vekirî wê, vê bidina nişandin. Piştî serdema gûtî-qasîtîyan wê, di dema hûrî û mîtannîyan de wê, têgînên weke yên matamatîkê, geometrîyê û stêrzanîyê wê bi awayekî bi sazûmanî û pergali wê bi aqil û têgihîştin wê were hanî li ser ziman. Di vê warê de wê, stêrzanîya dema hûrî û mîtannîyan wê, bi awayekî zanyarî wê, pêşketina xwe wê bi pêşveçûn şenber wê bide dîyarkirin. Her wusa wê, têgînên ku ew bi mîtolojikî ew dihên li ser ziman wê bi aqilê felsefîkî wê bidest

fahmkirina wan wê were kirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, têgîna stêrzanîya dema hûrî û mîtannîyan wê bi awayekî bi têgînek fîzîkî û mekanîkî wê bidest pêşketina xwe wê werê kirin. Hin bi hin wê stêrzanî û falzanî ku ew di hevdû de hatina hatin li ser ziman wê ji hevdû wê werina vaqatandin. Wê xatek wê di nava wan de wê, were xîzkirin. Gelek têgîhiştinên stêrzanîkî ku wê piştê wê, ji stêrzanên piştê wê bina mijare lêkolînê wê, bi awayekî teorîkî wê çerçoveya wê, di serdemên hûrî û mîtannîyan de wê, were pêşxistin. Aqilê felsefîkî, fîzîkî, mekanîkî, stêrzanîkî, matamatîkî, geometrîkî û hwd wê, di van demên hûrî û mîtannîyan de wê, temenê wan wê bi awayekî hemdem wê were avêtin û pêşxistin. Piştê jî wê, dema ku wê dem wê were li demên piştî zayîna îsa û hwd jî wê, ev têgînan teorîkî ên stêrzanîkî û mekanîkî wê, bi hevdû re û ankû ji hevdû cûda wê bi aqilekî fîzîkî wê were hildan li dest. Li kurdistanê wê, di xatekê de wê, di vê çerçoveyê de wê, ku wê dem wê were serdemên navîn wê, li ser wê xatê re wê werê hanîn li ser ziman. Di serdemên navîn de wê, zaneyên kurd ên weke Îsmâîlê Cizîrî, **Fexredînê Xelatî** û hwd wê, mekanîkvan û stêrzanên kurd wê derkevin û wê lêkolînên giring wê di wê xatê de wê bikin.

Di vê çerçoveyê de wê têgîna mekanîkê a têgînî, serrû, dîtbarî û hwd wê, pêşkeve. Têgîna dîtbarîya mekanîkî wê, ji serdema navîn ve wê, temenê wê zaneyên weke Îsmâîlê Cizîrî, Kopernîkûs, Kapler, gelîleî, Newton û hwd re wê biavêjin. Zanînen îsmâîlê Cizîrî wê hinekî wê di derbarê têgîna dîtbarîya mekanîkî de wê, aqilekî bi dîzaynên wî re wê bide me. Mekanîkîya dîzaynê wê, di vê çerçoveyê de ew wê pêşdixê.

Cihê têgîna mekanîkê wê, hertimî wê di jîyane mirov de wê, giringîya xwe wê biparêzê. Di rewşên mekanîkî de wê ji rewşên herîkîna avê bigira û heta ku wê bigihijê li hemû dîzaynên din ku wê jîyane mirov de wê pêşkevin û wê jîyane mirov wê hesan bikin wê, giringîya mekanîkê wê werênina li ser ziman. Her tiştê ku ew heya wê, xwediye rêgezên mekanîkî bê. Ji gavavêtinên zindiyekî bigira û heta ku wê bigihijê çêkirina û firandina balafîrekê û hwd wê, hemû tişt wê li gorî rêgezên mekanîkî wê bibin. Di rewşên sazûmankarîya awadanîyê û ya çêkirina makînan bigira wê, di çerçoveya zanista mekanîkê de wê bi rêgezên wê re wê xwediye rêveçûyîne bê. Di roja me de wê, zanista mekanîkê wê bi hinek beşên xwe yê weke wê ya mekanîkî ya hişk re ku ew bi bandûra hêzê ku ew dikarê reng û şûretê xwe bide gûharandin û ankû cismên di bin bandûra hêzê de ku wê rengê xwe bi qatkên xwe re wê weke xwe bihêlê û hwd wê, werina kifşkirin. Cismên di bin bandûra hêzê de na û ku ew xwediye rewşek sekinîbar in wê, bi rewşek statîkî a mekanîkî re wê werina li ser ziman. Di dewama wê de wê, rewşên tevger û kîrînen cismî ên bi tevger ku ew wan lêkolîn dikê wê, têgîna mekanîkî a karîger û ankû dînamîsmî bê. Di çerçoveya zanista mekanîkê de wê, ev wê weke rewşna giring ên têgînî jî bin. Li vir wê, di dewama wê de wê, têkiliya elektro û manyetîkê û tevgerên mekanîkî wê bi hevdû re wê were hildan li dest bê. Di vê çerçoveyê de wê zanista mekanîkê wê di van rewşan de wê bi aqilê mekanîkî re wê xwe bide dîyarkirin bê.

Ku mirov bahse rewşên mekanîkî bikê wê, di serî de wê, rewşên pêşveçûnên serdema me ên pêşketî û kifşkirinên bi teknîkî û teknolojikî û hwd wê, werina bîra me. Di vê çerçoveyê de wê, di roja me de wê, jîyaneka ku ew temenê wê bi teknîk û teknolojiyê hertimî dihê pêşxistin wê derkeve li holê. Teknîk wê, di vê warê de wê, xwediye rewşeka ku mirov wê bi teybetî wê, di jîyanê de wê bi pêşketina wê re wê werênê li ser ziman bê. Teknîk û teknoloji wê, bi têgîna mekanîkî wê pêşxistina wê,

weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin bê. Di roja me de wê, zanistên ku wê di temenê wê de wê, werina bikarhanîn ên weke fizîkê wê, zêdetirî wê pêşkevin. Teknîk wê, van zanistan bi pêşketinên wan re wê bikê temenê xwe de. Bi wê re jî wê, beşên din ên zanistî ên weke bîolojiyê û hwd jî wê, xwe bide dîyarkirin. Î ro rewşa teknîkê a di nava têgîna bîolojiyê de wê, rewşeka tekno-bîolojiyê wê biafirênê. Bi heman rengê mirov dikarê bo matamatîkê û geomtrîyê jî wê bibêjê. Tekno-matamatîk, tekno-fîzîk û tekno-geometrî û hwd wê, zêdetirî wê bi mekanîkî wê li gorî rêgezên wê, pêşkevin. Di vê çerçoveyê de wê, teknoloji wê bi teknîkî wê, di dewama wê de wê, bi pêşveçûnên xwe yê bi dîrok û mejûya xwe re ku wê dana çêkîrin re wê temenê zanista teknîkê û teknolojiyê wê bi teorîkî û zanistî wê biafirênê. Zanista teknolojiyê ku ew pêşdikeve wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê bi pêşketina xwe re wê bide dîyarkirin. Zanista teknolojiyê wê bi rêgezên mekanîkî re wê, temenê pêşketina xwe ya felsefîkî, teorîkî û zanistî wê, di roja me de wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê, zanista teknolojiyê wê bi pêşketina xwe re wê, di roja me de wê xwe bide dîyarkirin. Li gorî têgîn, teorî, felsefê û zanista wê, ku mirov li têgîna teknîkê dihizirê wê, weke ku me çerçoveya wê hinekî li jor bi şîroveya xwe ya bi têkiliya teknolojiyê û fizîkê re wê hanî li ser ziman wê têgîna tekno-fîzîkê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi rêgezên mekanî wê pêşketina wê, bi zanista teknîkê re wê, bi awayekî di çerçoveya pêşketina wê de wê bide dîyarkirin.

Tekno-fîzîk wê, di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka teknîkî û teknolojikî a ku ew wê, bi pêşketin û pêşveçûnên qada fizîkê re jî wê pêşbikeve bê. Di vê warê de wê, di çerçoveya têgîna zanistên ku ew teknolojiyê bi teknîkî pêş dixin re wê, pêşveçûnên teknîkî ên weke *teknîka nano* wê, di vê çerçoveyê de wê, werina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, teknîk wê, heta wê ji wê were wê, çendî ku wê zanist wê weke ku wê bi fizîkê wê li ser qatikan re wê kifşîkirin û kûrbûnê wê bi xwe re wê bijî wê ev wê weke modelekê û darêjkeka ku wê bi wê pêşketina teknolojiyê wê bi xwe re wê bide çêkîrin bê. Çendî di qatikan û kifşîkirina wan de kûrbûn bû û kifşîkirin pêşketin wê bi wê piçûkatîyê re wê hê piçûkbûn wê, pêşkeve. Ev jî wê, di teknîkê de jî wê, bi heman rengê wê, bi pêşketina wê re wê xwe bide dîyarkirin. Têgînên weke elektro û manyetîk, kîşîna kûtleyê, hêza atomîkî a lawaz û bihêz û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, çerçoveyna fizîkî n bi modelî wê, di warê pêşketina teknîkê de jî wê, bi xwe re wê biafirênin. Têgîna tekno-fîzîkê wê, hinekî jî wê, di vê çerçoveyê de wê, li ser rêgezên mekanîkî û pêşketina wan re wê, xwe bide dîyarkirin.

Di roja me de wê, bi zanista teknîkê û pêşketina wê re wê qadaka mazin wê hatibê qadîkirin. Ji destpêka serdemên neolotîkê û heta roja me wê, ji mirovê ku ew ji kevîran ji xwe re kêr, mazrabk û hwd çê dikê wê, hin bi hin wê bi teknîkî wê teknolojiyek wê pêşkeve. Bi demê re wê, li gorî rewşa jîyane mirov wê, amûr wê werina pêşxistin. Mirov wê, di jîyane xwe de wê, amûrên ku ew karibê bi wan bijî û jîyane wî hesan bikin wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de wê, bi demê re wê bi ahengîya pêşketina aqilê me re wê, teknîk jî wê pêşkeve. Di aqilê xwe de wê, dema ku mirov bahse tiştan û derkkirina wan bikin em, ji aliyekî ve wê, bi awayekî vekirî ankû sernûxûmandî wê balê bikişênê li ser wê rewşê. Têgîna bûjenîkî ku wê rewşa fizîkî wê, bi me bide têgihîştin wê, di vê warê de wê, xwe bide dîyarkirin. Wê temenê pêşketina aqilê teknîkî wê bi xwe re wê biafirênê. Mirov wê, di nava aqilê xwe de wê, bi têgîna bûjenê re wê bigihijê têgihîştina fizîkî. Li

ser wê re jî wê, hin bi hin wê bigihijê têgînekê û afrînerîyeka teknîkî û teknolojikî a mekanîkî. Di roja me de ew têgîna teknîkî û teknolojikî a mekanîkî wê, bi gelek pêşveçûnên sofîstîka ên teknîkî re wê xwe bide nîşandin. Teknolojiya roja me wê, civake teknolojiyê wê bi xwe re wê biafirênê. Di rewşa vê rengê pêşketina civakî de wê, çendî ku wê mirov weke endamê civakê wê xwediyê têgîn û têgîhiştina bikarhanîna têknîk û teknolojiyê bê wê, ew di nava rewşa civakî de wê, xwediyê karîgerî û ankû dînamîsmeka bi têgîhiştinî û zanînî a bi keseyetîya xwe re bê. Aqilê teknolojikî wê, berî hertîştî wê weke aqilekî ku wê di jîyane mirov de wê, xwe bi serwerî wê bide dîyarkirin. Her tiştên ku ew di jîyanê de wê, hena wê li gorî wê, dîzaynek mekanîkî û teknîkî wê bistênê. Zimanê mirov wê weke zimanekî teknîkî wê reng û awa wê bistênê. Zimanê nîşanakan wê bi teknîkê re wê, bi zêdeyî wê bi mantiqê wê re wê, derkeve li pêş. Di nava têgînên gotinên û rewşên teknîkî de ew têkiliya ahengî ku mirov wê bi mejiyê xwe re wê didênê wê, di vê çerçoveyê de wê pêşkeve. Di roja me de wê, zimanê teknîkê wê, weke zimanekî hemdem wê xwe bide dîyarkirin. Li vir wê, di rewşa bikarhanîna wê de û ji wê sîdîgirtinê de jî wê, weke aliyekî giring ê mirovî û civakî bê. Ziman, aqil û teknîk wê, li hevdu wê bi awayekî pîrr dîmenî wê, were hoyandin. Di rewşa bi gotina weke 'teknolojiya bîaqil' de wê, têkiliyeka aqil û teknîkê a sê-dîmenî wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, ev sê-dîmenîya wê, bi hebûna teknîkê û pêşketina wê, rewş û wûcana wê ya ku ew di wê de dihê bikarhanîn û bi aqilbûna wê û hwd wê, bi vê têgîna sêdîmenîya wê re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa wê, bi demê re jî wê werênê li ser ziman wê, weke ku Einstein wê bi têgîna teorîya dîtbarîyê re wê dihênê li ser ziman wê çar-dîmenîya wê, xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin. Lê ku em bi têgîneka simetrîkî wê li wê bihizirê wê, di awayekî pîrr zêde bi dîmenî de wê karibê xwe bide dîyarkirin.

Teknîk û teknoloji wê, bi zanista wê û zanistên ku ew di temenê wê de ên weke ya fizîkê, matamatîkê, gaometrîyê û hwd re wê, pêşketina xwe wê bi demê re wê zêdetir wê pêşbixê û wê bi aqil û sofîstîka wê bikê. Di vê çerçoveyê de wê, civakeka ku wê, ji her aliyê ve ku ew hatî bi teknolojikîkirin wê bi wê derkeve li holê. Ya ku wê, weke di çerçoveya xate pêşketina teknîkê û teknolojiyê de wê, xwe dide dîyarkirin jî ev a. Lê teknîk wê, weke têgîneka ku wê rûyekê wê weke şenber a û rûyê wê yê din ku wê weke razber bê wê, bi aqilê me û pêşxistina ji wê ku ew wê xwe bide pêşxistin bê. Di rewşa têgîna teknolojiyê û zanista wê de wê, aqil û bi hişmendî bi awayekî pîrrdîmenî xwandin û fahmkirina wê re wê, ji aliyên din ve wê, temenê pêşketina wê jî wê xwe bide dîyarkirin. Aqil û teknoloji(*) wê, hevdu wê biafirênin. Wê di vê çerçoveyê de wê, teknoloji wê weke rewşa fizîkî a bûjenîkî a aqil wê, bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî wê aqilê mekanîkî bê. Ji aliyê têgîna bûjenîya aqil ve ku mirov wê li wê bihizirê wê, bi wê re wê bi awayekî teknîkî û hwd wê, rewşa aqil wê bi awayekî vekirî wê xwe bide dîyarkirin bê.

(*)Aqil û teknoloji wê hevdu bi afirênin. Di roja me de wê, bi aqil wê gotina 'felsefeya teknîkê' û di dewama wê de ya 'felsefeya teknolojiyê' wê pêşkeve. Ev gotin wê bi serê xwe wê xwediyê hinek wateyna bin. Gotina 'felsefeya teknîkê' wê, di wê çerçoveyê de wê, bi wê re wê tefkîrkirin, fahmkirin, pêşxistin û bi wê re jîyankirin û fahmkirina wan biwê re wê, werênê li ser ziman. BI felsefeyê û teknîkê û teknolojiyê bi hevdu re wê, temenê fahmkirina wê ya bi ber peşarajê ve jî bê. Felsefeye wê, wê ji aliyekê din ve jî wê, çawa û bi çi armancê wê ew wê were bikarhanîn wê ji aliyê rewistî û hwd ve jî wê ji xwe re wê bikê mijar.

.....

Li ser dîroka pêşketina stêrzanîyê

Li kurdistanê û ankû mesopotamîya wê, dîroka stêrzanîyê wê pirr kevn biçê. Li ser stêrzanîyê wê, di serdemên sariştanîyê de wê, hizirkirinên kûr û dirêj wê werina kirin. Dûnya ku mirov wê di wê de dijî wê çawa bê û wê temenê wê li ser çî bê wê bikin ku wê fahmbikin. Pirr-zêde wê, bi zêdeyî wê, ji dema sûmer-gûtî-qasîtîyan de wê, di çerçoveyek mîtolojikî de wê, bi aqilê xwe re wê, çerçoveyek gerdûnî wê biafirênin û wê, werênina li ser ziman. Têgîna stêrzanîyê a dema gûtîyan wê, weke têgîneka ku wê, hin bi hin wê bi çerçova bûbê û wê di çerçoveyek hemdem de wê, pêşketina wê, were hanîn li ser ziman bê. Piştî wê, di dema hûrîyan de wê, pêvajoyên pêşketina têgîna stêrzanîyê wê, zêdetirî wê, bi awayekî pêşketitir wê xwe bidina diyarkirin. Di dewama wê de ku mirov wê were serdema mîtannîyan wê, li ser temenê pêşketî ê hûrîyan wê, çerçoveyek stêrzanîyê a hemdem wê werê hanîn li ser ziman. Di nava hizrên stêrzanîyê de wê, bi awayekî pirr zêde pêşketin wê were dîtin. Di serdema Mîtannîyan de wê, weke ku mirov bi stêrzanîya wan re wê kifşbikê wê, di awayekî hemdem de wê li ser stêr, heyv û dûnyeyên li azmana wê bisekin in.

Azman wê hertimî wê bale mirov wê bikişênê li ser xwe. Mirov wê, li ser wê bihizirê. Mirov wê dûnya ku ew li wê dijî wê, weke navendeka ku ew ji wê dihizirê û dinerê wê, bihizirê û wê hizrên xwe wê werênê li ser ziman. Stêrzanî wê, weke gotineka ku wê, mirov dikarê bi têgîna 'zanîna stêran' re jî wê, werênina li ser ziman. Gotina 'stêrzanîyê' wê di kurdî de wê, beremberî 'zanîna stêran' wê were. Her wusa di dewama wê de gotina 'stêrnasî' jî wê karibê weke têgîna astronomîkî di wê çerçoveyê de wê, werênina li ser ziman. Emê gotina 'stêrzanîyê' bijêrên û bi wê werênina li ser ziman. Ber ku emê li ser zanîna wê re wê, bikin ku wê werênina li ser ziman. Di nava wê zanînê de wê, naskirin wê taqabûlî gotina stêrnasîyê bikê. Di vê çerçoveyê de bi morfolojikî wê, gotina wê di çî wateyê de wê were bikarhanîn ew, li gorî wê wateya wê hanîna li ser ziman û gotin afirandin wê, di rastîya wê de wê giring bê. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna fahmkirina stêran wê bi wê re wê were hanîn li ser ziman.

Di roja me de wê, têgîna stêrzanîyê wê pirr zêde wê, di awayekî wê pêşketî wê xwediyê astekê bê. Wê li ser wê re wê, gelek lêkolîn wê werina kirin. Beşên wê, bi zêdeyî ku wê rewşên li azmana wê lêkolîn bikin wê derkevina li pêş. Stêrzanî wê, weke zanîneka ku ew stêran lêkolîn dikê wê pêşkeve. Lê wê di rewşa astzanî de wê têgîna 'astronomîyê' wê, xwe bide diyarkirin. Astronomî wê, dema ku mirov li ser hebûna gotinê dihizirê wê, 'asta' ku ew di kurdî de dihê wateya ya 'herî bilind' û hwd re wê, werênê bîra me. Ber vê yekê, weke gotineka giştî emê di çerçoveya wê de bi gotina *astnasîyê* û ankû *astzanîyê* re ku wê weke beremberê gotina astronomîyê wê bikarbênin. Di aslê xwe de wê, di kurdî de wê azmannasî û ankû azmanzanî jî wê karibê wê, têgînê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, bi wê re wê karibê wê werê li ser ziman. Di serdemên berê de wê, dema ku wê bahse azman wê were kirin wê, gelek caran wê gotina 'gerdûnê' jî wê, di wateya wê de wê were bikarhanîn. Lê gotina 'gerdûnê' wê, di wateya fezeyê û hwd de wê were bikarhanîn. Lê li vir bi zêdeyî di wateya gotina 'astronomîyê' de bi zêdeyê gotina 'stêrzanîyê' wê bikarbênin.

Di serdemên mîtannîyan de wê li kurdistanê wê, weke ku mirov wê kifş dikê wê, pîr zêde wê, di şewayekê hemdem de wê li ser stêrzanîyê wê were sekin in û wê ew wê were hanîn li ser ziman. Sazûmana têtîni a astronomîkî û ankû stêrzanîyê a mîtannîyan wê, di nava xwe de wê pêşketî bê. Em î ro wê kifş dikin ku wê, di rewşa stêrzanîya xwe de wê li azmana wê pîr zêde wê bihizirin. Lê em vê yekê jî wê kifş dikin ku wê hebûna rojê wê, weke stêra herî mazin wê, li wê were hizirkirin û wê ew wê were hanîn li ser ziman.

Çerçoveya stêrzanîya dema gûtiyan û sazûmana stêrzanîkî a dema hûrî û mîtannîyan.

Di stêrzanîya dema mîtannîyan de wê, di derbarê têtîna stêrzanîya hemdem de wê, gelek rengên pêşketinê wê di xwe de wê bihawênê. Di çerçoveya têtîna wan ya stêrzanîkî de wê, rewşên fahmkirina bi têtîna fîzîkê ku wê di roja me de wê bi gotina 'astrofîzîkê' jî wê were li ser ziman û wê di wateya lêkolînên li fezeyê ên li ser hebûna cisman, ji çî pêktên, navbera wan çendî ji hevdû dûr a û hwd ku wê, van aliyan wê lêkolîn bikê wê, di wê demê de jî wê, li ser rewşên stêrzanîyê ên demê re wê bi kifşkirinên wan wê were dîtin. Di rewşa hebûna rojê û ya rojê de wê, li ser navbera wan wê, pîr zêde wê serî wê li wê were hizirkirin. Mînaq wê, di wê demê de wê, di nava stêrzanîya mîtannîyan de wê, were li ser ziman ku wê, gerwêrkên weke **Tîr(merkûr, Gelawêj(Venûs), Keywan(satûrn)** û hwd wê li wan wê were hizirkirin û wê ev wê weke gerwêrkna ku ew nêzî rojê wê werina hasibandin. Wê li ser wan wê werê hizirkirin. Heta ku wê, gerwêrka keywanê wê, weke gerwêrka ku ew herî nêzî ya rojê ya û Wê mîtra wê li wê bicih bibê wê werê li ser ziman. Ber ku wê, Mîtannî wê rojê wê weke devera herî mazin û dijwar a yazdanê mazin wê şîrovebikin û wê werênina li ser ziman. **Di** rewşa komgomîya Mîtrayî a stêrzanîya wan de wê, ev stêr wê hebin û wê werina şîrovekirin û Wê wate wê li wan wê werina kirin. Mînaq wê, bo **Mîtra** wê were tefsîrkirin û hanîn li ser ziman ku ew piştî ji dînyê goç dikê wê, li ser taxtê xwe ku wê dû ga wê bi berjor wê hilkişênin û bibina azmana û li **gerwêrka keywanê** (*) wê wî bicih bikin wê, werê hanîn li ser ziman. Di nava bawerîya êzdayî a mîtrayî de wê, were hanîn li ser ziman ku Mîtra, li wir li rex yazdanê mazin dijî û wê carek din wê were dînyê û wê dadwerîyê wê serwerbîkê. Di vê çerçoveyê de wê, ev wê bi navê wî re wê, were hanîn li ser ziman. Di têtîna Mîtravanîyê de wê bi bawermendî wê, weke hemû bawerîyên berê û piştê ên xate êzdayîyê wê roj wê hertimî wê, di navenda hemû têtînen stêrzanîyê de wê were hanîn li ser ziman. Lê dema ku wan ev dihanî li ser ziman ku ew dibê ku ew ne dihişê wê de bûn ku wê, hemû gerwêrk û stêr wê li dora wê, xwediye rewşek gerînê bin. Wan bi awayekî bawerîyê ew dihanî li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, bawerîyek wan wê hebê. Ev têtîna ku wê roj weke navend wê were bijartin wê, piştê jî wê, di nava civake kurd de wê, bi bawerîyê wê di xate ezdayî de wê were hanîn li ser ziman.

Rewşa gerwêrkên weke **Tîr(merkûr, Gelawêj(Venûs), Keywan(satûrn)** û hwd wê, piştî serdemên mîtannîyan wê, stêzanên weke Kopernîkûs wê, li ser wê bisekin in. Wê

 (*)Wê bê bawerîkirin ku Mitra piştî ku em mir wê li wê dunya bi navê keywanê wê bicih bibê. Mîtrayî wê, di dema xwe de wê xwediye pergalek sterzaniyê a tekuz bin. Wê her rewşê wê bi wê re wê biikin ku ew bigihênina li bersivêkê.

hewê bikin ku ew wan fahmbikin. Di rêgeha rojê de wê, ev her sê gerwêrk wê weke gerwêrkna herî zêde ku wê ji yên din wê zêdetirî wê nêzî rojê bin.

Kopernîkûs wê, bixwe wê re wê li ser rewşa **Tîr(merkûr)**, Gelawêj(Venûs), Keywan(satûrn) û hwd wê bisekinê. Ev gerwêrk wê ne dûrî rojê jî bin. Di bawerîya Mîtravanîyê de wê, were li ser ziman ku ew 'devera ku ew herî nêzî cihê yazdanê mazin a û Mîtra wê li wir wê bicih bibê." Ew der jî wê, bi Keywan(satûrn)ê re wê were tefsîrkirin. Di vê çerçoveyê de ev gerwêrk wê, weke gerwêrkek ku ew nêzî rojê bê. Wê cihê yazdanê mazin jî wê, ku ew weke gerwêrkek li wê dihê hizirkirin wê li rojê wê were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê, li hebûna rojê jî wê, were hizirkirin. Bandûra rojê wê bi rohnîya wê re wê, li hemû deverên din ên li dora wê, û ankû wê weke ku wê were li ser ziman wê li hemû fezeyê' wê were hizirkirin. Di rewşa astrofizîkê de wê, rewşên nava stêrên, ji çi diafrin, germehî û sarbûna wan jî wê bi wê re wê werina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşek fîzîkî û ankû bi têgîna fîzîkî re wê li ser rewşa stêran û gerwêrkan wê were hizirkirin. Di nava wan de wê, ew rewşa elektromanyetîkê, kişîna kûtle'yê û hwd wê, ew wê werina kifşkirin û fahmkirin. Têgîna stêranîyê a roja me de wê, di vê çerçoveyê de wê, di astek pêşketî de wê xwediyê rewşekê bê. Lê bi wê re jî wê, rewşên weke çûyîna li fezeyê, wê werina pêşxistin. Bi wê re wê jî wê, her wusa rewşên weke çêkirina keştîyên ku mirov bi wan diçîna li fezeyê, çêkirina roketan û hwd wê, werina pêşxistin. Em dema rewşa stêranîyê wê hildina li dest em weke ku me di destpêkê de hanî li ser ziman em divê ku stêranîyê wê, weke du beşan wê werênina li ser ziman. Beşa pêşî wê bi stêranîya demên bûhûrî re wê were li ser ziman. Beşa duyem jî wê, bi rewşên ên bi pêşxistina têgîna stêranîyê û hwd a roja me re wê were li ser ziman. Di stêranîya demên berê a kevn de wê, li ser rewşa heyvê, Behramê(mars), Berçîsê(jûpîter), Keywan(satûrn), Ûranûsê û hwd re wê bi kifşkirina wan re wê li ser wê were sekin in. Em kifş dikin ku wê, weke ku wê di rewşa mîtrawanîyê de wê, di dema mîtanîyan de wê li ser stêr, heyv û gerwêrkên din wê hizirkirin û kifşkirin wê bibê. Di rewşa kifşkirin û bi wate kirina wan de wê, weke ku mirov dîsa wê, di mîtolojiya demê de wê kifşbîkê ku wê, werê li ser ziman. Î ro jî ku em li peykelên li dora semsûrê ên ji dema komagene û ankû ji dema mîtanîyan ku ew mana wê li ser wan, xîzkirinên stêr, heyv û gerwêrkên din wê werina dîtin. Mirov ku wan xîzkirinan jî wan dikê ku wan fahmbîkê wê, bi wan re wê, were kifşkirin ku wê, li ser stêranîyê wê, were sekinin. Di olzanîyê wê demê de wê, têgîna gerdûnî wê, weke têgîneka bingihînî wê li ser wê were sekin in. Her wusa bi wê re têgîna mirov û ankû gîyane ku ew dikarê her tiştê bikê û herê û xwe bigihênê her tiştê û deverê wê, li ser wê re wê bi têgîneka yazdanî wê were pêşxistin. Di stêranîya demên berê de wê, mirov bi wê re kifş dikê ku wê, stêranî, falzanî û ankû wê weke bi navê wê yê roja me ku wê were nasîn "astrolojî (*)" û xewnzani wê di nava hevdû de wê derbas bibin. Wê di gelek aliyan de wê, hevdû bi hevdû re wê werênina hanîn li ser ziman. Di pergala û ankû sazûmana falwanîyê a dema mîtanîyan ku wê bi awayekê rêkûpêk wê were li ser ziman wê, ev yek wê bi awayekî vekirî wê werê dîtin. Di rewşa falwanîyê de mirov dikarê wê jî bi wê re wê, werênê li

(*Astrolojî wê weke têgîneka ku ew bawer dikê ku wê bandûra rewşên fezeyî wê li ser mirov, rewş, jîyan û qarakterê mirov wê bibê. Wê bi wê rengê wê hewl bê dayin ku ew were tefsîrkirin ji wan bê gihiştin li rewşan û fahmbikin. Di wê çerçoveyê de wê, di rengêkê falvekirinî de wê ew wê weke ji 'pêşarojê xaber dayin' wê ew wê were hanîn li ser ziman. Çendî ku wê ti termenê wê bi fîzîkî wê nebê jî lê wê bi derûnî û civaknasî wê li ser aqilê mirov û jîyane mirov wê xwediyê bandûrek mazin bê. Em stêranîya demên berê ên dema gûf, qasît, hûrî, mîtannî, medî û hwd di xate kurdistanî de wê, di wê rengê de jî wê kifş diikin.

ser ziman wê weke kevnepîyeka herêmi bê û heta roja me jî wê di nava civake kurd de wê xwediyê rewşeka xwe domankar bê wê, her tişt ku ew zindî bê û ankû ne zindî bê wê were bi wate kirin. Minaq wê, di rewşên falwanîyê de ku wê, di roja me de wê derkevina li pêş weke şêr, tîrûkavan, ga, nêrî û hwd wê, çend jî wan pêjnên ku wê di olzanîya kurdistanî a dema mîtannîyan de ên pîroz bin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa astrolojîkî wê were kifşkirin.

Têkiliya nava rewşa stêrzanîyê û falzanîyê û ankû astronomîyê û astrolojîyê wê, di rewşekê gerdûnî û têngîna wê de wê xwe bidina dîyarkirin û wê werênina li ser ziman. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, têngîna falzanîyê wê di rewşekê de wê xwe bi awayekî astronomîkî wê bide dîyarkirin.

Di rewşa têkiliya nava falzanîyê û stêrzanîyê de wê, bi hevdu salixkirinê re wê xwe bide dîyarkirin. Minaq wê, dema ku wê gerwêrkên li azmana wê di wê çerçoveyê de wê, werina salixkirin wê roj wê weke xosletên keseyetîyê ên serkevî û bilind û zane wê werênê li ser ziman. Heyv wê, bi hêst û hîskirinê re wê, were salixkirin. Wê bi wê rengê wê gelek tefsîr jî wê werina pêşxistin. Gerwêrka **Tîr**(merkûr) wê, bi aqil û aqilbûnê wê werê salixkirin û tefsîr wê bi vê rengê wê li ser wê re wê werina pêşxistin. Gerwêrka Behram(mars)ê jî wê, rewşa axiftin, tevger, kirin, levkirina axiftin û tevgeran di kirinê de wê, werênê li ser ziman. Bi heman rengê wê, di dewama wê de wê, gerwêrka Gelawêj(Venûs) jî wê, xweşikbûnê, sipahîyê, hêstiyariyê, afrineriyê û keseyetîyên xwedewend wê, werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewş wê weke rewşna ku wê têkiliya stêrzanîyê û falzanîyê wê, bi hevdu re wê, werênina li ser ziman. Di rewşa fahmkirina rewşa rengan de jî mirov dikarê di dewama wê de wê, werênê li ser ziman. Minaq wê, di olên kurdistanî de wê, weke ku em jî demên hûrî û mîtannîyan jî wê, bi awayekî vekirî dibînin wê rengên kesk, sor û zer wê pîroz wê werina dîtin. Rengên ku ew jî rojê dihên li dinyê wê, bi wê rengê wê werina dîtin. Di vê çerçoveyê de wê kombînasyoneka ku wê di nava reng û gerwêrk û her wusa di nava rengan bi xwe bixwe de wê werê danîn wê di vê rengê de wê werê hanîn li ser ziman. Wê li ser wan xosletên ku ew bi wan re wê werênina li ser ziman wê bi wan wê, bê xwestin ku wê keseyet wê xwediyê çi xosletan bê. Wê jî tûndûtûjîyê re wê bi mêyl bê, wê dûrûst û ankû ne dûrûst bê, bi tîrsa û ankû wêrek a û hwd wê were hanîn li ser ziman. Minaq wê, di nava kurdan de wê, were bawerkirin ku wê bandûra rohiya heyvê wê li ser keseyetîya mirov wê hebê. Li gorî wan wê, bi rewşa falzanîyê re wê, her tişt wê were kifşkirin û derxistin li holê. Bi têngîna falzanîyê û ankû astrolojîyê wê, rewşên demî ên rojê û şevê, tevgerên stêr, heyv û rojê û gerwêrkên din wê, ew jî wê werina hasabkirin û wê li ser wan re wê têngîna wê di dewama wê de wê werina pêşxistin. Minaq weke ku wê were bawerkirin ku wê gerwêrka tîrê wê ya aqil bê û hwd. Wê rewşên di tevgerên dinyê de jî wê, bi wê re wê, werina salixkirin. Tevgerên dinyê wê weke rewşna tevgerî ku mirov wan dikarê bi têngîna stêrzanîyê wan werênê li ser ziman bê. Lê wê, di rewşa falzanîyê û ankû astrolojîyê de jî wê, werina bi watekirin. Tabî ku mirov têngînen falzanîyê wan li wan bihizirê wê, ev pîrs wê were berhişê me. Ew jî wê ew bê ku ew çendî rast in bê. Di serî de wê, gotinên falzanîyê û ankû astrolojîyê wê, weke gotinna ku ew jî berxwe hatina gotin bin. Yan jî wê, di rewşna çavdêrî de wê, hatina girtin û gotin bin. Di vê dema me ya ku wê di wê de wê zanistê wê li ser rastîtiya dîyardeyî û bi birhan û nîşanakan wê pêşbikeve de wê, bêgûman wê têngînen astrolojîkî û ankû falzanîyê wê, di jîyanê de ku mirov li berçav bigirê wê ti qiyametê wan nemênê. Di roja

me de wê, weke ku wê di tv'yan de wê werina li ser ziman wê, bo xapandinê jî wê werina bikarhanîn. Ew hêsta mirov a bi xwesteka xwe gihandina zanîne di derbarê pêşaroj û ankû rewşên li pêşiyê ku wê bijî ku wê çawa bi encam bibê û ankû wê çawa bibê de wê, mirov wê bê wê astê ku ew ji aliyekî ve wê çavên xwe li gotinên bi vî rengê vebikê bê. Li vir mirov nikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê başî û ankû nebaşî, qanc û ankû neqanc, dûrûst û ankû ne dûrûstîtîya mirovî bi falan re nayê kifşkirin. Ew bi fahmkirin û têngîna mirov a têngihîştî ve girêdayî ya. Mirov wê, di vê çerçoveyê de wê, dema ku van rewşan li wan dihizirê wê, bi wan re wê kifşbikê ku wê, aliyekî wan ê bi mejiyê me yê mîtolojikî ve girêdayî jî wê hebê bê.

1. Têgîna stêrzaniyê

Têgîna stêrzaniyê wê, di serdemên nû ên hemdem de wê ji ya falzaniyê û ankû astrolojiyê wê bi vaqatihê. Wê têngîna stêrzaniyê wê, şaqên xwe yên zanîni û zanistî ên weke kosmogonîkî, astrofizîkê, astromatamatîk, astrokîmya, astrobioloji, astrojeolojî û hwd re wê hebûna xwe wê bi pêşketina xwe re wê bide domandin. Ev têngîna wê bi kortasî wê, têngîna kosmogonîkî wê bi zanîna fezeyî a nepenî ku ew nayê zanîn ku ew hewl dide ku wê kifşbikê û bi zanebikê re wê aladar bibê. Astrofizîk wê, bi hebûna cismên li fezeyê, tevgerên wan, ji çi elementan pêktên û hwd wê, bi wan re wê alaqaqar bibê. **Astromatamatîk** wê, bi hêz kişîne kûtleyê û cismên li fezeyê û rêgeha wan wê bi hasabkirina wan re wê aladaqar bibê. Bi çavdêriya xwe re wê, bi hijmarî wê fahmkirin û têngihîştina wan wê ji xwe re wê bikê mijar. Astrokîmya wê, di rewşa cismên li fezeyê, bandûra wan ya li hevdu û rewşa kimyewî û hwd wê, hilde li dest. Mînaq wê, rewşên weke yên stêr û hwd ku ew ji kîjan elementên weke hîdrojenê, notronê û hwd pêktên wê, wan bi rewşên wan re wê wan bikê ku wan fahmbikê. Astrobioloji jî wê, li rewşên jîyanî û ankû ne jîyanî ên li fezeyê ku ew hena û ankû nîn in wê, bikê ku ew wan kifşbikê. Wê lêgerîna li nîşanakên jîyanê li gerwêrk û galaksiyên din wê, di vê çerçoveyê de wê, weke mijareka wê ya wê ya teybet a bingihîni bê. Astrojeolojî jî wê, bi rewşa hebûna gerwêrkan, astroîdan û hwd ku ew ji çi û çawa pêktên û diafirin wê li ser wan wê bisekinê. Kevirên li azmana ew ji çi pêktên û çawa pêktên wê, bi jeolojikî wê bikê ku wan fahmbikê. Mînaq wê, dema ku mirov wê rewîtiyê wê li behramê, heyvê û hwd wê bikê wê, pêşî wê ardnîgarîya wê, ji çi elementan pêktê wê ew wê bikê ku wê pêşî wê fahmbikê. Bi wan zanînen ku ew ji wê bidest bixê wê, temenê fahmkirina wê, bûyîna wê, pêvajoyên ku wê derbaskirina û hwd wê, bikê ku wan fahmbikê. Mînaq wê di rewşa fahmkirina şev û rojê de wê, dema ku wê ro çû ava wê, bi tememî wê roj wê wînda bibê û ankû wînda nabê, dema ku bû rohnî û ankû roj derket wê, ew levkirina wê rohnîyê û bi derketina rojê û hwd re wê bikê ku wê fahmbikê.

Di derbarê temenê agahiyên me yên stêrzaniyê de wê, di roja me de wê, di derbarê wê de wê rewşên weke çuyîna fezeyê û hwd wê, bi kifşkirinên wê re wê temen bê. Mîkroskopên mazin ên bi peykan û sînyalên wan dîtîne pêktênin wê, di temenê bidest xistina zanîne de bê. Her wusa mikroskopên ku wê li gorî rewşan ku wê werina pêşxistin wê, hebin. Mînaq mikroskopê rohnîya X'ê û hwd mirov dikarê bahse wê bikê. Di destpêka wê de wê, mînaq wê di serdemên navîn de wê, temenê agahiyên wê, zanyarên ku wan lêkolînen xwe li ser rewşên stêrzaniyê kirina bin. Mînaq wê, di serdemêna navîn de wê kesên weke Kopernîkûs, Kapler, gelîleî û hwd wê, derkevin. Li kurdistanê kes û zaneyên weke Fexredîne xelatî û hwd wê derkevin. Bi lêkolînen xwe yên li ser

stêrzaniyê ku wan kirina re wê, temenekî zanebûnê a di derbarê stêrzaniyê û ankû astronomiyê de wê bidina çêkirin. **Fexredînê Xelatî, stêrzanê kurd** bû û gelekî xebat wî li ser stêrzaniyê kirîya. Wî wê, tava ku ji kullekan dertê li gorî wan seat tespît kirîye. Bi wê re jî wê, hewl bide ku rewşa heyvê fahmbikê. Hebûna hinek gerwêrkên din wî, kifşkirîya. Li gorî rohnîya wê, hizirîya ku heyv, rohnîya wê dide dûnyê ew jî dûnyê nedûr a. Dûrahî û nêzîhiyê wê, bi rohnîya wê re wê, li wê bihizirê û ew wê bi wê re di mejiyê xwe de kifş dikê û dihênê li ser ziman. Di sala 1260'an de rasatxaneyekê jî bo lêkolînên stêrzaniyê ava dike bi Nesîredînê Tûsî re û bi wî re bi salan li wir di wê **rasatxaneyê** de wê xabatê dimeşênin. Ji wir, rewş û tevgerên li azmana ên stêr, roj, heyv û demên şev û rojê wan dike ku ew fahm bikin. Weke van zaneyên kurd ên stêrzan wê gelek kes û zaneyên din jî wê derkevin û wê li ser stêrzaniyê wê bihizirin û wê hizrên xwe wê werênina li ser ziman. Di warê têngîna stêrzani û ankû **astronomîya hemdem a kurd** de wê, temenekî giring wê biavêjin. Di vê demê de wê kesên weke Fexredînê Xelatî ku ew stêrzan in, wê kesên weke Îsmailê Cîzîrî jî ku ew li ser tevgerên mekanîkê û rêgezên fîzîkê dihizirin ên mekanîkvan wê derkevin. Di dewama wan de wê, zaneyên kurd ên stêrzan ên ku wê piştî wan re wê werina wê wan bişopênin. Alaqaya li fezeyê û ankû wê li azmana û cismên li azmana wê di van deman de wê, pîr zêde bibê. Wê hey û bale her kesekê ku ew dihizirê wê bikişênê li ser xwe. Di vê çerçoveyê de wê, li ser wê were hizirkirin. Hizrên Stêrzaniyê ên ku ew di xate wê de wê li kurdistanê wê bi zane û filosofên kurd re wê were li ser ziman wê, temenekî hemdem wê di serdemên navîn de wê biafirênê. Lê piştê wê, di wê de wê kûrbûna wê, zêde pêşnekeve ji ber hin sedemên metingerîya li ser ziman, rewşenberî û çanda zêhnî a civake kurd. Di serî de wê, metingerîya zêhnî wê weke astek giring a li pêşîya pêşketina wê bê.

Ku me bahse têngîna stêrzaniyê li kurdistanê û ankû mesopotamîya bikin em divê ku wê têngîna pêşketina stêrzaniyê li duyan beş bikin. Beşa pêşî wê bi têngîna stêrzaniya kevn a demên berê re wê werênina li ser ziman. Ya piştê jî wê, bi têngîna stêrzaniya hemdem ku wê destpêka wê bibê wê, bi wê re wê di dewama pêşveçûnên hemdem de wê werênina li ser ziman. Di rewşa têngîna stêrzaniya kevn a demên berê de wê, dîrokek wê ya pîr zêde wê demdirêj wê hebê. Em î ro jî ku wê têngîna mîtolojîkî a demên berê wan lêkolîn dikin em rastîgelek nîşanakên bi vegotinên stêrzani û şîroveyan wê re dihên. Di dewama wê de wê, têngîneka stêrzani ku wê, di demên zû de wê pêşkeve û wê hertimî wê di xwe de wê bi ponijê û wê kûrbûnê wê di nava xwe de wê bi hizrên xwe re wê, bide çêkirin wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, têngîna *gerdûnê* wê, weke têngîneka gelemper a ku em dikarin di temenê fahmkirina têngîna stêrzaniyê de wê hildina li dest bê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî bi wê re wê, werênê li ser ziman ku wê têngîna stêrzaniyê wê, di demên berê de wê, weke têngîneka ku wê dûnya ku mirov di wê de dijîn wê weke navend ku ew jî wê dinerin wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de em wê, kifşdikin ku wê bi demê re wê, ew rewşa navendîtiya ku ew bi dûnyê re ew dihê li ser ziman wê, cih bigûharênê. Her wusa wê, piştê wê, weke ku em di dema hûrîyan de wê kifş dikin wê, rewşa rojê wê, weke rewşek û têngînek navend a stêrzaniyê wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê, gerwêrkên din jî wê, li dora wê êdî wê, werina hizirkirin. Di bawerîya kurdistanî a êzdayî de wê roj wê weke gerwêrka yazdanê mazin jî wê, werê nasîn. Di vê çerçoveyê de wê, tişt weke rojê wê bi dijarî û rohnîya wê re wê, werina

salixkirin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê gerwêrkên weke Tîr(merkûr), Keywan(satûrn) û hwd wê, li dora rojê û gerwêrkên ku ew herî zêde ên nêzî rojê na wê, li wan wê were hizirkirin. Minaq wê, di xate bawerîya êzdayî de wê, were bawerkirin ku wê Mîtra wê dema ku ew ji dûnyê goç dikê wê, li ser taxtê xwe ku ew rûniştî wê, du ga wê hikêşênina bi ber azmana ve û wê wî bibina li gerwêrka Keywanê û wî li wir bicih bikin. Bawer dikin ku ew wê cihê ku ew herî zêde ê nêzî rojê bê.

Piştê jî wê, bi lêkolînên ku wê, li ser gerwêrkan re wê werina kirin wê, werina kifşkirin ku wê ev gerwêrk wê weke gerwêrkna ku ew herî zêde wê, nêzî rojê bin. Di aslê xwe de wê, di serdemên navîn de wê, lêkolînên ku wê li ser stêrzaniyê ku wê li ser dîtînen ji azmanan ku wê werina kirin wê, di temenê wan de wê, ew hizrên stêrzaniyî ên ku ew di nava bawerîyan de ku ew hatina li ser ziman bin. Mîrov wê, bi wan bawer bikin bin. Wê bixwezî ku wê, rewşa ku ew bi wan bawer dikin wan piştrast bikin. Û yan jî rêyên ku ew xwe bigihênina wan kifşbikin. Ber ku ew baawer dikin ku ew dikarin rêyên wê kifş dikin. Ew bawerîya ku ew bi wê dihê hanîn li ser ziman ku wê, bi rengê 'hilkişîna li azmanan (*)' ku wê, bi Mîtra re wê werê li ser ziman wê, piştê wê, di nava bawerîyên semewî de wê piştê wê bi şewayna wê werina hanîn li ser ziman. Di nava mesihîyê de wê bi hilkişîna Îsa mesih li azmana re wê werê bawerkirin. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewşa bi têgîna 'hilkişîna li azmana ve' wê, hertimî wê di aqilê mirov de wê weke nepenîyeka ku wê ponijîna mirov wê bide li ser xwe bê. Mîrov wê, di wan deman wê, nexwediyê têgîna kişîna kûtleyê û ankû 'kişînaardê' bê. Wê di derbarê wê de wê, ne xwediyê zanî û agahiyê bê. Lê wê, bi bawerî wê, di şewayekî ku ew weke ku ew li wê dihizirê de wê, ew werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ev rengê ku wê, weke ku ew têgîna 'kişînaardê' dervî aqilê xwe dihêlê û dihizirê wê, di nava çîrok û çîvanokên civakî de wê li kurdistanê wê weke ku mirov bi 'çîrokên li ser acîniyan' ên ku ew her şev di nava xwe de wan dihênina li ser ziman û divebêjin re wê, bi şewayekê wê dervî wê were hizirkirin. Wê di regekî hizirkirinê ku wê kişînaardê wê bêwate wê were kirin û wê, weke ku ew neyî wê li wê were hizirkirin. Bi demê re wê, ev rewş wê, bi aqilekî wê werina li ser ziman. Lê wê di nava têgîna stêrzaniya demên berê de wê, ev wê werê li ser ziman.

Ji azmana dîtîna stêran wê, bi xweşikatiyekê bi rohnî wê, werina li ser ziman. Wê gelek vegotin û gotin wê li ser wan dîtînen bi stêran re wê, werina li ser ziman wê hebin. Minaq wê, demekê wê, werê bawerkirin ku wê, 'her stêrek wê gîyane mirovekî ku ew miriya bê.' Wê di vê rengê de wê werê hanîn li ser ziman. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, bi têgîneka gîyanî wê stêr wê werina hanîn li ser ziman. Hinek ji wan stêran bi rohnî na û hinek ji wan bi kêrn rohnî na ku ew dihên dîtîna ji dûnyê wê, ew jî wê, bi

(*Hilkeşîna li azmanan wê, weke têgîneka ku ew wê ji destpêka pêşketina aqil ve wê kifş dikin. Wê mirov wê kifşbikê ku wê li azmana wê dunyayên din wê hebin. Wê bi aqilê xwe de wê, xwe hilkeşênê li wan. Minaq wê mitra wê piştî mirina wê, bawermendên wê bi navê 'metran' wê, tefsîrbikin ku ew li ser araboka xwe ku ew ji aliyê du gayan ve dihê hilkişandin li azmanan wê tefsîrbikin. Wê bi wê re wê hebûna xwûdê wê li azmana wê were hizirkirin. Wê bi wê re wê, pêxemberên ku ew hatina weke Musa, Mihemed, Isa û hwd wê, tefsîrên wan ên ku ew hilkişîna li azmana wê werina kirin û pêşxistin. Ev wê tiştêkê din wê bi xwe re wê, werênê li holê. Mîrov, nizanê ku ew çî li azmana hê bi tememî heya. Lê ew bihûştêkê li wir bi aqilê xwe li dunyayên li wê hizir dikê. Ew dikê û dixwezê ku ew xwe bigihênê li wan. Di wê çerçoveyê de wê xwesteka dilê xwe a bi aramî û aşîtiya xwe wê dide li der. Ji wê rengê ve wê ji baweriyekê zêdetir wê weke têgîneka derûnî wê xwe bi mirov re wê ew bide diyarkirin.

şîroveya ku ew 'yên ku ew li dînyê baş in wê stêra wan geş bê' re wê, were hanîn li ser ziman bê. Di dewama wê de wê, bi yên ku ew ewne baş in wê stêra wan wê, ne zêde geş bê wê werina hanîn li ser ziman. Piştî jî wê, di dewama wê de wê, têgîna 'mirina stêran' wê were hanîn li ser ziman. Ew jî wê di dewama wê bawerîya gîyanî a li stêran re wê were hanîn li ser ziman. Wê bi bawerîya ku wê, 'gîyanên ku ew nebaş in wê, stêran wê zêde ne jî û wê bi vemirê û wê bimirê û wê ew bi tememî jî jîyanê wê wînda bibin. Wê ew ne li vê dînyê û ne jî li wê dînya din wê hebin.' Bi vê rengê vegotinê wê ew wê rûşa têgîna bi 'mirina stêran' re wê werê hanîn li ser ziman.

Têgîna mirina stêran wê, di aslê xwe de wê, weke têgîneka ku ew dihê li ser ziman ku ew ne di serdemên hemdem de ku ew hatîya kifşkirin bê. Wê di nava têgînên stêranîyên hemdem de wê, kifşkirinên weke mirina stêrê wê, werina kirin. Di dewama wê de wê, werina kirin. Lê li vir mirov divê ku wê, werênê li ser ziman ku van kifşkirinên bi vî rengî ên weke kifşkirina mirina stêrê, li gorî têgînên mirina stêran ên di stêranîya demên berê de ku ew dihê hanîn li ser ziman wê, ne weke kifşkirinekê lê wê weke piştrastkirinekê wê werê li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Mirina stêran wê, li ser wê, bi rewşa qûlkên reş re wê pîr zêde wê, lêkolîn wê werina pêşxistin. Stêrên mazin ku ew dimirin wê were kifşkirin ku wê qûlkên reş wê biafirênin. Wê bi wê re wê, weke ku wê têgîna astrokîmyayê wê werênê li ser ziman wê stêrên notronê û bi hîdrojenê wê werina kifşkirin. Wê di derbarê elementên wan de wê, sedema mirina stêran wê li ser wê were hizirkirin. Her wusa di dewama wê de mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, di roja me de wê, were kifşkirin ku wê, jî ber ku wê 'vejena wê bi dawî bibê' wê stêr wê bimirê. Di vê çerçoveyê de ew elementa wê ya ku ew weke vejene wê ku ew wê li ser lingan digirê ku ew bidawî dibê wê, stêrê vegûharênê li qûlkek reş. Ev wê bo stêrên mazin wê bibê. Lê hêza kişîna kûtleya a elektromanyetîka wê qûlka reş a ku ew piştî stêrê ku ew afirî wê, stêrên din ên piçûk jî wê daqûrtênê li hundûrê xwe. Di vê çerçoveyê de wê, çendî ku wê stêrên ku ew mirîn ku ew ketina çerçoveya qada elektromanyetîkî a wê de wê, werina qûrtandin jî aliyê wê ve. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa wê jî wê, bi wê re wê, pêşve.

Di rewşa stêranîya roja me de wê, têgîna bi lêkolîn li ser qûlkên reş re wê, biqasî ya stêran wê bi giringîyekê wê, xwe bide diyarkirin û wê derkeve li pêş. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe diyarkirin. Lêkolînên ku ew li ser qûlkên reş dihên kirin wê, bi kifşkirina germîhîyek pîr zêde mazin û qadaka elektromanyetîkî a ku ew bi wê germehîyê re ew afirîya re wê xwe bide diyarkirin bê.

Têgîna stêranîyê a demên berê wê, di wê de wê di çerçoveya têgînek gerdûnî de wê li fezeyê wê bihizirê û wê hebûna gelek gerwêrk û ankû dînyayên din wê bi jîyanî wê herê bikê. Di vê çerçoveyê de ew têgîna ku em î ro bi têgîna astrobîolojîkî re ku em li jîyanên din ên dervî dînya, gerwêrk û ankû galaksîya xwe li wê digerihin wê, weke têgîneka stêranîya demên kevn bê. Ev têgîn wê, hertimî wê, di mejiyê mirov de wê, ew wê hîssîyetê wê bide çêkirin ku mirov di vê gerdûna ku mirov di wê de dijî de wê, ne bi tenê bê. Wê ev wê di mejiyê mirov de wê weke hîseka ku wê, hertimî wê, xwe bide hîskirin bê. Dema ku mirov wê li azmana binerê wê, bi wê nerîna xwe re wê, bihizirê ku ew li qadaka bêsînor dinerê û dihizirê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ew qada fezeyî a gerdûnî a pîr fireh wê, di wê de wê jîyanên din jî wê hebin. Wê ev wê weke bawerîyekê jî wê, di bawerîyên olzanîkî ên ku ew pêş dikevin de wê xwe bide pêşxistin, bicihkirin û

dîyarkirin. Bawerîya gerdûnî wê, di nava têgîna êzdayî û bi teybetî jî di nava têgîna Zerdeştî de wê, di vê çerçoveyê de wê were li ser ziman. Em hinekî di çerçoveya têgîna gerdûnî a Zerdeştî de wê, werênina li ser ziman.

Rêmildarên medî wê, di şewayekî de wê stêrzan bikin ku ew li ser wan hizrên xwe dihênina li ser ziman. Wê şewayê rênîşandinê a bi stêran re wê bi awayekî pêşketî wê bi hijmartinên xwe û hasibandinên xwe wê bikarbênin. Ji aliyekî din ve jî wê falvan û ankû astrolog bin ku ew falên mirovan divekin û dikin ku ew li ser rewşên ku ew wê biqawimin û ankû pêşarojê ji wê bibina xwedî agahî. Ji aliyekî din ve jî wê xewnzan bin ku wê, xewnên ku mirov dibîne wê bi têgîneka stêrzanî û falzanî wê şîrovebikin. Wê bikin ku ew wan 'peyamên ji xewnê' wan kifşbikin û derxina li holê. Di vê çerçoveyê de wê, di şewayekî ku wê stêrzanî, falzanî û xewnzanî wê di nava hevdû de wê bijî wê, bi têgînî wê xwediyê rengêkî pêşketinê bê. Têkiliya di nava stêrzanî û falzanîyê de wê, bi awayekî xort wê bi hevdû re wê karibin dênin. Têgîna stêrzanîyê wê weke têgîneka ku wê, hin bi hin wê bi zanîna xwe re wê pêşbikeve bê. Wê hizirkirina li azmanan, stêr, heyy, roj, gerwêrkên din û hwd re wê, zêdetirî wê pêşkeve. Lê wê di dewama wê de jî wê, ew jî wê pêşkeve ku wê her têgînên stêrzanîkî ku ew dihên pêşxistin wê, di çerçoveya bandûra wan ya li ser keseyet, jîyanê û hwd re wê, şîroveyna falzanî û ankû astrolojîkî jî wê li ser wan re wê, werina pêşxistin. Wê di vê çerçoveyê de wê, şîroveyên stêrzanîyê wê bèn xistin li temenê şîroveyê falzanîyê û ankû astrolojîyê ku ew dihên pêşxistin. Em dema ku wan rewş û têgînên mîtolojîkî ên li kurdistanê û ankû mesopotamiya ku em li wan dihizirin em bi vê rengê wê, kifş dikin ku wê şîroveyna stêrzanî û falzanî wê bi hevdû re wê bi keseyetîyê re ku wê werina pêşxistin wê, hebin. Bi pêşketina aqil û bi teybetî aqilê felsefeyê re wê hilkişîna xwûdê li azmanan û ankû hizirkirina xwûdê li azmanan wê, di temenê hizirkirinên li azmanan de jî bê.

Bi temenê re wê, şîroveyên stêrzanîkî ên mekanîkî wê bi dîtbarî û hwd wê werina pêşxistin. Şîroveyên stêrzanîkî ên mekanîkî wê, bi têgîneka astromekanîkî wê werina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, tevgerên azmanî, gerînên gerwêrkan, hatina roj û şev û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, li wê were hizirkirin. Di stêrzanîya demên berê de wê, ev rewş wê, bi awayekî kînetîkî wê, pîr zêde wê, li wan wê were hizirkirin. Heta ku wê, mîtran û ankû bawermendên mîtrayî, rêmildarên medî (*) û hwd wê, di şewayên hasibandîna dîrahîya stêran a ji hevdû de wê, têgînên hijmarî ên wêrzeyî û ankû ên matamatîkî wê bikarbênin. Di serdema gûfî û qasîfîyan de wê, pîr zêde wê, di warê stêrzanîyê nivîsandinên wê yên mekanîkî ên bi têgînî bi vî rengê de wê nîşanakên wê hebin. Lê piştî wan re wê, heta ku wê dem wê were dema hûrî û mîtannîyan wê, li ser pêşveçûnên bi stêrzanîyê ên di demên gûfî û qasîfîyan de re wê pêşveçûnên stêrzanîkî ên bi sazûman û bi pergal wê werina hanîn li ser ziman. Têgînên stêrzanîyê ên mîtannîyan ku ew di nava şîroveyên bawerîyên xwe de ew dihênina li ser ziman wê, di vê warê de wê, weke şîroveyna ku mirov ji xwe re hayran dihêlin bin. Piştî wan re wê, di dema

(*)Rêmildarên medî û ankû mecûsî wê, weke kesna ku ew di warê têgîhiştina azmana a stêrzanîkî de pîr li pêşbûna. Wan ji wan dikir ku ew baxtê mirov nbixwênin. Wê bi wê rengê wê, bikin ku ew tişta ku wê di pêşarojê de wê bibî xaberê bi wê ji wê bidin. Weke tê vegotin ku wê ji kurdistanê ku wê berî Isa wê were dunyê ku wê bê gotin ku wê sê kesên weke rêmildar wê, bi hevdû re wê werina cihê ku ew wê li wê were dunyê û wê, agahiya hatina mesîh wê bidin. Wê bêjin ku me ji stêran ew kifşkiriya. Ew rêmildarên demê wê zerdeştî û ankû êzdayî bin. Ev minaq wê bide nîşandin ku wê bandûra stêrzanîyê wê li jîyanê û aqil mirov wê hebê.

Medîya de jî û piştî dema medîya de wê di serdemên navîn de jî wê, pêşveçûnên stêrzanîyî wê, van têgînên stêrzanîyî ên dema mîtannîyan ên bi sazûman û bi pergal wê ji xwe re wê, bikina pêpelok û wê li ser wan re wê hanîna li ser ziman wê bi kifşkirinî wê bibê. Di dema medîya de wê, weke ku wê Zerdeşt wê di 'avêsta' xwe de wê werênê li ser ziman wê bahse du hêz û ankû vejenên baş û nebaş wê bikê ku e bi hevdu re li dijî hevdu di tekoşînê de na. Di dewama wê de wê, têgîna Ahûra-mazda û ya Ahrîman wê werênê li ser ziman. Ev wê, weke du aliyên gerdûnî ên bi başî û nebaşî ku ew hena bin. Di dewama wê de wê, ev herdû têgîn jî wê weke hatina şibandina li du mirovan û wê weke *'kûrên Zerwan'* wê werênina hanîn li ser ziman. Zerwan jî wê, were wateya *dema di gerdûnê de*. Em vê jî di dewama wê de wê, werênina li ser ziman ku wê di vê demê de wê, Zerdeşt wê, têgîneka stêrzanîyî a hemdem wê di nava hizrên xwe de wê werênê li ser ziman. Di wê stêrzanîyî de wê, piştî jî wê, li ser navaroka wê, bi vejena baş û ya nebaş re wê li wê bihizirê û wê bikê ku wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ew wê, weke aliyekî giring wê, ev jî wê, bi têgînên ahrîman û ahûra-mazda re wê werê hanîn li ser ziman. Ku em kozmogonî û kosmolojiya Zerdeştîyê wê baş fahm nekin emê, di vê çerçoveyê de wê têgîna stêrzanîyî a ku wî bi awayekî pêşketî di nava hizrên xwe de wî hanîya li ser ziman jî wê, fahm nekin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Lê em li vir wê, jî kifş dikin ku wê têgîna kozmogonîkî a Zerdeşt ku wî di avêsta de wê werênê li ser ziman wê, temenê wê têgîna kozmogonîkî a êzdayî ku ew bi melekê tawis re wê, bi têgîna afirîna dînyê û gerdûnê re wê, werênê li ser ziman wê biafirênê. Di nava têgîna zanîna kozmogonîya melekê tawis de wê, têgîna 'destpêkî' a gerdûnî wê di wê de wê bi jîyanê re wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê, têgîna 'destpêkê' wê hebê. Di vê warê de wê, têgîna stêrzanîya êzdayîyê wê, di xwe de wê, dema ku mirov bi wê li fezeyê bihizirê wê, bi awayekî xweza wê bihizirê ku wê, destpêkek wê hebê. Li vir em divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê têgîna stêrzanîya êzdayîyê wê, weke têgîneka kevn a bi hezaran salan a pirrkevn bê. Her wusa wê, bandûra wê, li hemû têgînên felsefîkî û olî û ankû olzanîyî ku wê piştî wê pêşkevin wê li wan bibê. Di rewşa hizirkirina li stêrzanîyê de wê, di vê çerçoveyê de wê, hebûna dînyê wê, hertimî wê weke rewşeka ku wê çawa wê hatibê afirandin wê li wê were hizirkirin bê. Di hizra têgîna afirandina dînyê de wê, êzdayî wê bi awayekî sergirtî wê werênina li ser ziman ku wê bi stêrzanîyî wê dînya wê ji rojê wê çêbibê. Temenê vê têgînê jî wê ew bê ku wê, were hizirkirin ku wê, roj wê weke dagera yazdanê mazin wê were hanîn li ser ziman bê. Wê hemû tişt wê ji wê biafirê. 'Dînya ji wî afirandîya.' Di vê çerçoveyê de wê, bi awayekî xwezayî wê, bi têgînî wê girêdaneka afirandina dînyê wê bi rojê re wê, were çêkirin û hanîn li ser ziman.

Em vê yekê jî wê dibînin û kifş dikin ku wê, piştî wê li ser rewşa navbera nava roj û dînyê, û ankû navbera gerwêrkan wê bi geometrîkî wê li wê were hizirkirin. Her wusa wê, li ser têgîna rohnîyê a ji rojê li dînyê re wê li wê were navberê wê were hizirkirin. Bi heman rengî wê li stêran û navbera wan jî wê were hizirkirin. Lê wê hasibandinên li navbera stêran wê weke rewşna rênîşanê wê di demên pêşî de wê li wê were hizirkirin. Her wusa, wê dema ku bi rêwîtyekê çuyinê de wê, mirov wê rojê li kîjan aliyê xwe wê bihêlê, li pişt xwe bihêlê, li tihêla xwe ya rastê bihêlê, li tihêla xwe ya çapê bihêlê û ankû wê li pêşiya xwe wê dênê û wê bi ber wê ve wê herê wê, ew jî wê, weke şewayna rê nîşanê û di rêwîtyê de çuyinê de ku wê werina bikarhanîn bin. Li vir wê, hasibandina rohnîya rojê bi dayîna wê re wê, bi wê re wê ew biheta bikarhanîn.

Li vir dema ku mijar ji rojê hatibê û vebûnê wê demê em wê jî wê werênina li ser ziman ku wê *demhijmara rojê* ku wê were kifşkirin wê ew wê pîr zêde wê navdar bê. Wê heta roja me de jî wê, di nava civake kurd de wê, ew wê were bikarhanîn. Demhijmar(seat)a rojê wê, ji hêt û ankû darekê ku ew hatî çikandin wê li gorî wê siha wê ya ku ew bi gerîna rojê re ku ew cih hin bi hin bi wê gerîna rojê re digûharênê wê, were kifşkirin. Di vê çerçoveya wê de wê demhijmara rojê wê, were pêşxistin. Di nava rewşa rohnîya rojê de wê, demhijmara rojê wê, weke aliyekî giring ku wê mirovan wê bi zanîba ku wê di nava rojê de wê ew dem wê çî dem ba. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, ew biheta kifşkirin. Di rewşa wê zanîna demên rojê de wê, ji aliyekî din ve jî wê, li gorî têhna rojê a germ wê ew biheta kifşkirin. Rengên têhna rojê bi germehîya wê re wê heba. Mirovan ew kifş dikirin û li ser wê re ew bikarhanîn. Di serê sibehê de wê, çendî ku wê germehîyek geş û bitêhn wê heba jî lê wê, ne xwediye germkirineka bi dijwar ba. Lê ku dem heta nava rojê wê germbûna nava rojê wê bi têhna wê re wê, pîr zêde wê germ û dijwar bûba. Dema piştî nava rojê wê, weke demeka ji nava rojê derbasbûyî bê û wê ev dem wê hin bi hin wê ast bi ast û ankû pîvan û bi pîvan wê rêjeya têhna germê wê kêmbûba. Wê bi demê re wê, ev jî wê, bi gerîna rojê re wê, bi heta hanîn li ser ziman. Di derbarê wê têhna rojê de wê, du hizir wê bihetan li ser ziman. Yek wê dema ku wê têhna rohnîya rojê a germ ku ew zêdebû wê bi 'nêzîkbûna rojê' re wê bihanîyan li ser ziman. Ji aliyekî din ve wê, dema ku ew têhna wê, kêmbû wê bi 'dûrketina wê' re wê bi hanîyan li ser ziman. Têgîna bi germbûna rojê re wê, li dînyê wê li ser têgîna bawerîyê wê weke ku em di nava bawerîya kurdistanî a êzdayî de wê kifş dikin wê bi êgir re wê bi hanîyan li ser ziman. Wê agir wê, weke ji wê ya rojê ku ew 'yazdanê mazin ew li dînyê bicihkirîya' wê, bihanîyan li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, weke têgîneka giring wê roj wê, bi têhna wê ya germ re wê ew biheta li ser ziman. Di derbarê rojê wê hê gelek hizrên ku wan, di çerçoveya têgîna stêrzanîyê de ku wan ew dihanîn li ser ziman wê hebin. Em divê ku wan jî hinekî din li ser wan bisekin in. Wê ev jî wê di derbarê fahmkirina rojê a di nava têgîna stêrzanîyê a demên berê de wê, fahmkirina wê bide me. Di rewşa fahmkirina rojê de wê, hertimî wê dijwarîya wê ya bi têhnê wê li pêş bûba. Wê bi wê re wê li wê biheta hizirkirin. Roj wê, rohnîya xwe wê bide li dînyê. Di vê çerçoveyê de wê, dînya wê rohnî bikira. Fotonên rohnîyê wê, di şîbûna nebatan û şîniyan de wê, weke aliyekî giring ê temenî bê. Wê bê wê rohnîya rojê û qatkên wê yê navê wê, li dînyê wê weke ku wê jîyane şînahîyî wê nebûba. Wê di dewama wê de jî wê, zindiyên ku ew, mirov jî di nav de ku ew ji wê dixwûn û dijî wê, ew jî wê, nejîya ban. Di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku mirov wê, bi teybetî wê, di temenê jîyanê de wê, werênê li ser ziman bê. Roj wê temenê jîyanê bê. Bi têgîneka bi bawerî jî wê, roj wê weke têgîneka temenê jîyanê û ankû ku ew jîyanê dide mirov û hemû tiştên ku ew dijîn wê ew heba. Bawerîya li rojê a di nava êzdayîyan û demên berê de wê, li ser wê rewşa wê re ba. Mirovan wê, li wê bihizirîyan. Roj wê, weke cihê ku wê yazdanê mazin li wê bicih jî wê biheta li ser ziman. Di rewşa xwe gihandina wê, wê bi bawerî wê dû rê wê bi hatan li ser ziman. Yek wê, weke ku wê bi şîrovekirina bi piştî goça Mîtra a ji jîyanê ku ew li ser taxtê xwe rûniştîya û du ga wê, wê bi taxtê wî re wê hilkişênin li azmana û wê wî bibin li gerwêrka li rex ya yazdanê mazin bicihbikin re wê, werê hanîn li ser ziman. Yanî wê mirov wê karibê wê di hewayê wê bimeşê û hilkişê weke ku ew li ardê dimeşê wê bihanîyan li ser ziman. Rêya din jî wê, bi têgîni wê bi rengê vekirîna 'derîyê dîmenî' wê biheta kirin. Ev jî wê, bi wê şewayê ba ku wê derîyek

wê vebûba ku mirov wê, di wê re ku ew derbas bû wê, herê dîmeneka din. Yan jî wê, herê dûnyeyek din. Di vê çerçoveyê de wê, di nava çîrok û çîvanokên civakî ên kurdan de wê, têgîna vekirina derîyê dîmenî wê pîrr zêde wê, bahse wê, were kirin. Minaq wê, di hinek çîrokên weke ya 'şahmaran' 'çîrokên keçelok (*)' û hwd de wê, bihê li ser ziman ku 'ew derî li ber wî vekirî û ew di wê re derbas bû û wî xwe li dûnyek û demek din dît.' Di vê çerçoveyê de wê, vekirina derîyê dîmenî wê weke têgîneka ku wê mirov karibê bi wê di demê re derbas bibê û ankû ji deverekê herê deverek din ya pîrr zêde dûr û ankû jî ku ew di wî derîyî de derbas bû ew herê dûnyeyek din. Di vê çerçoveyê de wê, ew wê were hanîn li ser ziman.

Bawerkirina li dîmenên din wê, di vê çerçoveyê de wê, bi şêwayekê wê di nava kurdan de wê, bi têgînî wê pîrr zêde wê, di demên berê de wê li pêş bûba. Wê bi wê re wê, di wê çerçoveyê de wê, ew bawerîya li ew bi wê bawer dikin ku mirov dikarê ji dîmenekê herê li dîmenek din wê, bi wan re wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya çîrokên acinîyan ku ew di nava wan de dihê gotin de wê bawer kirin ku ew li dîmenekê dijîn. Lê ew di nava me mirovan de jî ew dijîn. Lê em wan nabînin. Ew rewşa bi 'perdeya dîmenî' di nava wê dîtîna me de ew heya.' Wê bi vê rengê wê bi wê were bawerkirin. Di vê çerçoveyê de wê, bawerkirina bûhûrîna ji dîmenekê li dîmenekê wê tenê û tenê bi wê kifşkirina wê re wê bibê bê. Di vê çerçoveyê de wê, bi gotinên afsûnî re wê, werênina li ser ziman ku wê, tenê wê hinek gotinên ku weke 'mifte' na ku em wan kifşbikin wê, hingî wê, bi wan wê mirov wê karibê ji wan derîyê dîmenî wê derbas bibê. Di rewşa xwe gihandîna li rojê de jî wê, di vê çerçoveyê de wê li wê bihata hizirkirin. Wekî din wan di mejiyê xwe de ew hizir dikir ku wê, 'roj ku mirov, bi hezaran salan ku mirov rêwîtyê bikê wê mirov wê nikaribê xwe bigihênîyê de.' Lê 'rêyên yazdanî' hena ku mirov bi wan karibê bi wan herê û bigihîyê de. 'Wê bi rêyên yazdanî wê, ew ne dûr bû.' 'Wê biqasî ji pêpeloka derîyekê derbasbûnê wê, nêzî mirov bê.' Di vê çerçoveyê de wê, rewşa gerwêrkê din jî wê biheta hanîn li ser ziman. Têkiliya bi têgîna falzaniyê û ankû astrolojiyê û ya bi stêrzaniyê re wê, bi wê re wê were danîn. Minaq wê, ga wê weke zindiyekî ku wê were pîrozkirin jî bê. Lê wê, çendî ku wê, bi falzanî wê were biwatekirin wê ew jî wê, di gerwêkekê de wê were bicihkirin. 'Gerwêrka ga' wê, were hanîn li ser ziman. Wê, di vê çerçoveyê de wê, bahse wê werê kirin û wê were hanîn li ser ziman. Minaq wê navê **gerwêrka gelawêjê, bi navê ga (*)** re ew dihênê li ser

(*)Çîrokên keçelok wê, navê gelek çîrokên civakî ên ku ew şev bi şev wê yek bi yek wê li dîv hevdû wê werina vegotin bin di nava civake kurd de li kurdistanê. Wê çîrokên keçelok wê weke rêza çîrokên civakî ên kurdan bin. Wê ji wan wê gelek rengên vegotinê wê werina derhanîn û ser ziman. Di çîrokên keçelok de wê her çîrok weke serborîya kesekê bi navê 'keçelok' wê bîn û bin. Wê, di her demê û deverê de wê tiştekê cûda wê bi jîyane xwe ree wê bijî. Wê ji keçelok re wê sînorê demê û bûhûrîna demê wê nebê. Hertimî wê kesek weke key û ankû jineka weke bi afsûnî ku ew dikarê wî ji demê bide bûhûrandin li demê wê derkeve hemberî wî û wê tiştan bide pêşîya ku ew bikê û bi wê bijî.

(*)Gûrandina ga wê weke têgîneka pîroz a mitrayîyan û ku heta roja me wê bi êzdayîyan re wê, were pîrozkirin bê. Berê di nava wan de dihat bawerkirin ku ga pîroz bû. Wê hemû hêwîyên xwe ji wê bikin. Lê rojekê deriyê male Mitra vekirîya û gayê wî bazdide û ew ji wê digihê wê têgînê ku 'wê afrînerêkê ku min jî û teji afrandî wê hebê. Piştî ew li ser wê hizra li gayê xwe digerihê û wê dibînê û piştî kêrê dide sûkrê di gûrêne û ji yazdanê xwe re wê dikê boraq. Rewşa gûrandina ga wê, bi vê rengê wê pêşkeve û bê domandin. Ev rewş wê weke rewşek pîroz wê di her demsale wê de wê were dîbarekirin bo bîrhanîna wê, Ber ku ew weke peymanê di nava yazdan û mitra de dihê dîtîn û ser ziman. Wê sofa wê were avakirin û wê jê bixwûn. Kesê jê xwar jî wê weke ji sofrêya yazdanê maziin xwarî û bi wê re peyman çêkirî wê were dîtîn.

ziman. Heta ku wê li cihna navê gerwêrka gelawêjê, tefsîra ga' dide tefsîr kirin. **Gerwêrka gelawêjê**, weke gerwêrkeka giring a.

Piştire, ku Mîtra ji dunyê goç dike, êdî oldar û pîrên olî tefsîra wî bi gerwêrka keywanê bicih dikin. Di regnekî de weke ku wê di 'mîtolojiya yewnanîyan' de dihê ser ziman rewşa "tîtanê" pêşî bi Mîtra re şîroveya wê hatîya pêşxistin. Bi navê Mîtra re "rewşa tîtan" hatîya şîrove kirin û ew li gerwêrka keywanê hatîya bicih kirin. Bi vî rengî, Mîtra, hatîya xwestin ku hê zêdetirî mazinatî û pîrozîya wî hê zêdetir were dîtin û ser ziman. Bi vî rengî, oldarên Mîtrayî, Mîtra, li keywanê bicih kirina û keywan jî di rex rojê de bi şîrovekirinê hanîna ser ziman. Nêzî wê hanîna ser ziman. Ev rewşa bi rengê şîrovekirina rojê re wê, di nava rengê bawerîya êzdayî û bi giştî ya herême de wê, were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di şewayekî de wê, ew were hanîn li ser ziman. Hebûna rojê wê, weke rewşa herî mazin a gerdûnê wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, were hanîn li ser ziman. Li gorî ku mirov fahm dikê wê, were bawer kirin ku wê di galaksî û gerwêrkên din ên di fezeyê de wê, jîyan wê hebê. Wê gerwêrkên ku wê di wan de wê jîyan wê hebê wê, bibin. Lê li gorî ku ew dihênina li ser ziman wê, bi wê bawer kirin ku wê, dema wê hat wê yan emê bi wan re wê têkiliya pêwîst wê dênin û yan jî wê ew wê têkiliyê wê bi me û dînya me re wê dênin. Ev wê weke rewşa ku wê di demên pêşarojê de wê bibê wê werênina li ser ziman.

Di rewşa fahmkirina têgîna hebûna dînya û ankû gerwêrkên din de wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têgîneka gelemper ku wê bi wê teqez wê biheta bawer kirin bû. Gelek lêkolînên stêrzanîyî ên ku wê di demên berê ên kevn de wê bi stêrzanîya kevn re wê werina kirin wê, bi armanca kifşkirin û gihiştina wan rêyên têkiliyê ên bi dînyayên din re jî bê. Heta ku wê, dema ku wê di dema gûtîyan wê wê 'qûle'ya ku wê di roja me de wê weke 'qûleya babil' jî wê were bi navkirin wê, were bawer kirin ku 'ew bilindahîya wê, bi armanca xwe gihandina li azmanan wê were çêkirin bê.' Piştire wê, di dewama wê de wê were li ser ziman ku wê, 'dema ku wê qûle hat çêkirin û gihişt ber azmanan wê xwûdê wê fermana xirakirina wê bide. Ber ku ew gihiştin û çûyîna li azmana ku ew hê dema wê na hatîya' bû. Di rewşa xwe gihandina azmanan de wê, hertimî wê di mejiyê mirov de wê, weke nepenîyekê bê. Wê azman wê weke taqabayekê bê ku mirov gihişt wê ku mirov li ser wê taqabayê re weke ku mirov li ardê dimeşê wê bimeşê bê? Wê bi vê rengê wê, li wê were hizirkirin. Gûtî û qasîfîyan wê, bawer bikiran ku wê **dînya wê weke 'tepsîyekê' rast** bê û mirov wê li ser wê bijî bê. Ev têgîn wê, bi bawerî wê di nava olan de jî wê bicih bibê. Di gelek kêvilbar û ankû bineterên nivîskî ên bi nivîsa bizmarî ku ew ji dema sîmerîyan û hwd mana wê, di wan de jî wê, bi vê rengê wê ji dînyê wê were bahskirin.

2. Têgîna azmana û pêşketina wê

Di rewşa gihiştina azmana de wê, di mejiyê mirov de wê, ew têgîn wê biafirê ku mirov wê bigihijê rewşek sermedî. Mirov jî wê, hertimî wê li wê sermediyê wê bigerihê. Xwe gihandina jîyanek sermedî wê, weke ku mirov wê bi 'lêgerîna gilgamêş a li jîyane nemir' re wê kifşbikê wê, hebê û wê were li ser ziman. Di rewşa bûhûrîna gilgamêş a li ser avê re (ku ew deverî wê çemê xabûr ê roja me bê) wê weke ku ew rewşek û ankû derîyek dîmanî re derbas bibê wê bi awayekî wê werê hanîn li ser ziman. Her wusa wê têkiliyeka 'jîyane sermed' wê bi rewşa hebûna gerdûnê û gihiştina wê re wê were li ser ziman. Minaq wê, di tefsîra ku wê li ser 'şahmaran' re wê were kirin wê, were

bawerkirin ku ew gihiştîya 'jîyanek sermed' wê 'ew xwediye hemû nepenî û ankû sirrên gerdûnê ên demên bûhûrî û yên demên ku wê werin jî bê.' Di vê çerçoveyê de wê, were li ser ziman ku wê, ti tişt wê bo wê ne bi nepenî bê. Wê her tişt wê dizanî. Ew xwediye zanîna hemû deman bû. Di çerçoveya vegotina şahmaran de wê, key wê dema ku ew dikê ku ew xwe bigihênê wê, wê bi armanca xwe ji mirinê xilasbikê wê, bikeve nava wê armanca de. Ji aliyekî din ve wê, dema ku wî xwe gihandiba şahmaran wê, xwe gihandiba hemû zanîna hemû deman. Wê bûba weke mirovekî hekîm û lokman. Gotina 'hekîm û lokman' wê gotineka ku wê ya vê gotina şahmaran bê. Wê di çerçoveya wê de wê, di çerçovaya bi têngîna mirovê ku wî xwe gihandî hemû zanîna deman û ew dikarê ji her derd û dewa hemû mirovan çareyan bibîne ba. Wê di vê çerçoveyê de wê biheta li ser ziman bê. Vegotina şahmaran wê, di xwe de wê, bi têngîna wê xwediye kosmolojiyê gerdûnî bê. Wê bi wê re wê, were li ser ziman. Mejiyê mirov ku ew li gerdûnê û "jîyane gerdûnî" dihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi wê kosmolojiya gerdûnî wê, vegotinê jî wê naqş bikê û wê werênê li ser ziman. Di rewşa hizirkirina li gerdûnê de wê, bi wê hebûna li jîyanên li wê re jî wê li wê were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov xwe gihand wê, wê weke ku wî xwe gihandiba jîyane yazdanî a binirx jî. Di vê çerçoveyê de wê li azmanan wê bihizirîya.

Hizirkirina li azmanan û 'gerwêrkên din ên bi jîyan' wê, weke hizirkirineka stêrzanîkî a ku wê, bi hezaran salan wê li wê were hizirkirin bê. Bawerîya ku wê, yazdan karibin werina dunyê û herina dînyayên din wê, di nava mîtolojiyên demên bûhûrî de jî wê, ev têngîna wê werina hanîna li ser ziman. Dema ku mirov mîtolojiyên demên bûhûrî li wan dihizirê mirov wê, bi wê re wê gelek têngîna û nîşanakên bi têngîna stêrzanîkî wê bi vê rengê ku ew hatina hanîna li ser ziman wê kifşbikê.

Li vir em vê yekê jî wê, divê ku wê bi awayekî ji hevdû derxin û wê fahmbikin. Wê gelek rewşên stêrzanîkî wê, bi têngîna afsûnî û falzanîyî û ankû astrolojîkî wê werê hanîna li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê, dihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman. Temenê tevgern afsûnî û ankû têngînen wê, wê bi hevdû re ku ew hatî tevlihevkerin wê hinekî stêrzanî, hinekî falzanî, hinekî xewnzana û hwd wê, bi afirênê. Di vê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman. Minaq em dema ku wê li rewşên stêrzanîkî ên dema gûftîyan wê li wê bihizirin wê, bi wê re wê werê dîtina ku wê, di şewayekî de wê stêrzanîtî û falzanîtî wê di nava hevdû de wê were dîtina. Wê bi awayekî tevlihevkerî wê were dîtina. Gûftîyan û qasîtîyan em î ro zînanin ku wan rewşa pozîsyona stêran wan ew kifşkirina. Li ser wê re hin hasibandin jî pêşxistin. Her wusa ew çavdêrîyên xwe yên li ser stêran ku wan kirina wê wan qayd jî bikin. Ber ku wan bi têngînekê wê tîkîliya stêran bi gîyan û baxtê mirov re wê dênin û wê di vê çerçoveyê de wê, stêr wê bi dûrahiya nava wan, pozîsyona wan û rohiya wan re wê hasibandinekê wê bi astrolojîkî wê bikin. Di rewşa stêran de wan gelek stêr di rewş û pozîsyona wan de kifşkirina û navê sawalên ku ew bo wan pîroz in didina li wan. Ber vê yekê wê, gelek stêr û ankû gerwêrk ku ew kifş dikin wê, navê sawalan wê bidina wan. Minaq gûftîyan wê gerwêrka tîrê û ya gelawêjê wê bi rewş û pozîsyona wan re wê kifşbikin. Wê kifşbikin ku wê, gerwêrka gelawêjê wê di rêgeha xwe de wê gûharîne wê bikê. Ev rewşa ku wê gûftîyan bi çavên xwe yên rût wê kifşbikin wê, piştî wan bi hezaran salan wê di dema Gelîleî de wê ji aliyekî Gelîleî ve wê bi teleskopê wê were kifşkirin û wê piştî wê bi navê wî wê were li ser ziman. Gûftîyan kifşkirina wê rewşa pêvajoya gelawêjê wê bi biriqîna tîrêjen rohiya wê bibê bê. Bi wê re jî wê, gûftîyan wê, rewşa

gelawêjê a li dora rojê ku ew di rêgeha wê de tevgerê dide nîşandin wê kifşbikin. Di nava stêrzanîya gûtîyan de wê, rewşa pozisyona gerwêrkên weke heyvê, rojê, behramê, bercîsê û keywanê jî wê, pozisyona wan wê di rêgeha wan de wê bi tevgerên wan re wê werina hasibandin. Di rewşa girtina rojê de wê, bigihijina wê zanîne ku wê her serê îjdeh salan wê ew bibê. Minaq wê, rêmildarên medî wê rojgirtina di sale 585'an a 25 gûlanê de ku wê di dema şerê artîşa med û ya lîdayîyan de wê bibê wê pêşî wê kifşbikin û wê, vê bikina sedema aşîtîyeka nava de.

Di rewşa hebûna salnema û rojneyayê de wê, di dema gûtîyan de wê rastî wan wê werê. Salnemaya gûtîyan wê li gorî rojê û heyvê bê. Wê salnema gûtîyan wê bi awayekî pêşketî wê hebê. Li dora diclê û firatê wê wan wê hertimî wê bi çandinî û cotyariyê re wê alaquadar bin. Wê demên xwe wê li gorî wê kifşbikin. Ev rewşa jîyane wan wê, ji wan re wê bê temenê têgîn û têgihîstineka di derbarê naskirina demê û demên demê de. Di vê çerçoveyê de wê, têgîneka stêrzanîkî wê, bi gûtîyan re wê, bi rewşa stêran re wê hebûba. Minaq rewşên heyvê ên weke 'nîvheyvê', 'heyvgirtinê', 'tahnheyvê' û hwd re wê, di çerçoveyeka bi têgîna demsalî de wê bi karbênin. Demsal wê, li kurdistanê li ber diclê û firatê wê pêşkevin. Ber vê yekê wê ji hevdu cûdakirina demsalan wê bibê. Wê li gorî rewşa wan ew werina salixkirin û naskirin. Di rewşa heyvê de wê, gotina 'tavaheyvê' wê pîrr zêde wê, di nava civake kurd de wê hem di wan demên berê de û hem jî di wan demên piştre de wê li pêş di mejîyan de wê, zindî wê hebê. Wateya gotina tavaheyvê wê ew ba ku wê, di şevê de wê bi rohnîya bi tamî derketina heyvê re ku wê di heyvên hevînê de wê, rohnîya wê di şevê de wê rohnîbikira. Ev wê, ev jî wê bûba sedema geşbûna jîyane sawalgeriyê di van heyvan de û bi teybetî jî di şevê de. Wê li gorî wê, çandek wê pêşxistiban.

Gûtîyan ev jî wê bi hasibandinên wê bi demê re wê kifşbikin ku wê heyv wê di rêgeh xwe de wê li dora rêgeha dûnyê wê bigerihê û ev weke demeka li gorî 27 rojan hasibandina. Yanî wan kifşkirina ku heyv wê gerîna wê ya bi rêgehî wê di 27 rojan de wê temem bikê. Di vê çerçoveyê de wê, mirov kifş dikê ku wê li ser rewşên heyvê ên weke girtinê, nîvheyvê û hwd wê, hasibandineka wan ya tekûz wê hebê. Her wûsa wê, di nava zanîna stêrzanîya gûtîyan de wê ew jî wê were kifşkirin ku wê heyv wê hem li dora xwe wê bizîvirê û hem jî wê li dora dûnyê wê xwediyê gerînîyeka bi rêgehî bê. Gûtîyan wê, hasibandinên xwe yên li ser heyvê wê qayd bikin. Wê kîjan roj wê di kîjan destpêka rewşa heyvê de wê bibê ew kifşkirina. Minaq wê destpêka tamheyvê wê kîjan roj bê ew kifşkirina û qaydkirina.

Î ro wê ji nivîsên bizmarî ên dema gûtîyan ku mana heta roja me de wê, di wan de wê li ser pozisyonên heyvê û gerwêrkên din wê were sekin in. Û wê li ser wan re wê pêşdîtinên xwe wê bi wê ve girêdayî wê weke 'behî' an wê werênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di demên pêş de wê çê bibê û bi qawimê wê bi wê rengê wê li ser wê re wê hizrên xwe wê werênina li ser ziman. Di mîtolojiya gûtîyan, qasîtiya û ku ew di dema wan de jîyane a babilîyan de derketina li pêş a têgînên stêrzanîkî wê hinekî jî wê bi vir ve girêdayî bê. Minaq wê di vê çerçoveyê de wê, şîroyên astrolojîkî ku ew li ser têgînên stêrzanîkî re ew dihên kirin wê, werina dîtin. Di demên hûrîyan de wê, hinek nivîsên bizmarî wê di wan de wê werina kifşkirin ku wê, werênina li ser ziman ku wê kevîya rastê a heyvê ku ew bi jor ve bê wê genim û ankû zad wê bi bereket wê bibê. Wê zêde wê mahsûl wê ji ardê wê were hildan. Lê ku ew kevîya heyvê a rast bi ardê ve bê wê, zûwabûn wê li ardê wê pêşkeve. Minaq wê, bi heman rengê wê were li ser ziman ku

wê, di roja pêşî a derketina heyvê de ku ew heyv bi tememî were dîtîn wê dilşahî û xweşîya mirovan wê zêde bibê. Minaq zaroka ku ew di gelawêjê hat dînyê wê jîyane wî di aramiyê de û bi bereket wê derbas bibê.

Li vir li ser navê heyvan jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, ev rewşên li azmana wê bi stêrzanîkî wê werina kifşkirin û wê li gorî wê nav li heyvan wê werê kirin. Heyva sibatê ber çî 27 roj hatîya hasibandin wê, têkiliya wê, bi hasibandina dema gûtfîyan a bi gerîna wê ya ku ew di 27 rojan de ku ew wê temam dikê re wê girêdayî wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev rewş wê, werina kifşkirin. Stêra gelawêjê û ankû gerwêrka gelawêjê wê ji dînyê wê weke stêra herî bi rohnî wê were dîtîn. Di nava civake kurd de wê, bi hezaran salan wê weke *'stêra gelawêjê'*, *'rohnîya gelawêjê'* û hwd wê were bi navkirin. Wê di vê çerçoveyê de wê, gelek navên din jî wê li wê werina kirin. *Zaroyên ku wê, di wê dema ku ew rohnîya wê stêrê geşa de ku ew zarok di hatina dînyê wê ew zarok wê weke 'zarokên bi xêr' jî wê bihetan dîtîn û bi navkirin.* Em î ro wê jî di zanin ku wê gûtfîyî wê di warê têgîna hasibandinê a matamatîkê û ankû wêzeyê de wê pirr zêde wê li pêş û pêşketî bin. Ber vê yekê wê, di rewşa hasibandinê stêrzanîni de wê, aqilekî pirr zêde li pêşî wê werênina li ser ziman. Hasibandinê gûtfîyan wê, di dema wan de wê bi qasî û babilîyan re jî wê bê temenê pêşketineka mazin. Her wusa wê piştî wan re wê di demên hûrîyan de wê, ew wê bê temenê pêşketinên nû. Di vê çerçoveyê de wê, hasibandinê gûtfîyan ên stêrzanîkî wê, bi aqilekî stêrzanîkî wê, li pêş bê. Ber çî wê gûtfî, qasî û hûrîyî wê di stêrzanîyê de wê xort û li pêş bin? Ber ku wan wê bi navê oldar û rêmildaran wê, weke ku em heta di dema medyaya de wê bi mecûsîyan re wê kifşbikin wê girseyeka zaneyan ku ew hemû bi rewşên stêrzanîyê ve alaquadar dibin wê, derxina li holê. Ji aliyekî din ve jî wê têkiliyeka rewşên stêrzanîkî ên weke stêran, heyvê û rewşên wê yên bi pozisyonî û hwd wê, bi baxtê mirov ve girêdayî wê dênin. Wê bandûra wê li ser pêşaroja mirov wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê bi aqilekî stêrzanîkî wê falzanî û ankû astrolojî wê werê hanîn li ser ziman. Falzanî û ankû astroloji wê, nava têgîna stêrzanîyê û hebûna mirov û keseyetîya mirov de wê weke rewşek têkilîdanîne a bi nirx bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ew wê li wê bihizirin. Ber vê yekê jî wê, weke temenê wê, wê giraniyê bidina kifşkirinê xwe yên li azmana.

Di rewşa kifşkirina heyva û rojan de wê, di dema gûtfîyan de wê, li dûv hevdû wê weke rewşa 12 heyvan wê, were kifşkirin. Rojek wê bi derketina rojê û windabûna wê û ankû *'çûyîna ava'* a wê re wê bi sînor bê. Ber ku wê roj wê weke dager û sembola yazdanê mazin û ankû xwûdayê wan bê wê, roj bi hebûna wê re wê, bi sînor bê. Her roj wê, weke hebûna rojekê wê bi rewşa hebûna rojê re wê, were li ser ziman. Dema ku wê roj çûbê ava û wê şev bê wê, ew weke dema dervî rojê wê werênina li ser ziman. Em î ro ku em nivîsên bizmarî ên ji dema sûmerîyan wan lêkolîn dikin em bi wê re wê kifş dikin ku wê her bajar-welatên sûmerî ên wê demê wê xwediyê salnemeya xwe stêrzanîkî ku ew hatî pêşxistin bê. Di dema gûtfîyan de wê, qûleyên bilind wê yan di bawergehan û yan jî li rex wan wê pirr bilind wê çêbikaran û wê ji wan wê rewşên li azmana wê bişopandan. Di dema gûtfîyan de wê, biqasî ku mirov ji nivîsên bizmarî fahm dikê wê, *'destpêka biharê'* wê, bi navê *'reş şatti'* were li ser ziman. Nêvî salê wê bi navê *'mişil şatti'* were li ser ziman. *Û dawîya salê jî wê bi navê 'kît şatti'* were li ser ziman. Wê navê heyvê jî wê taqabûlî navê *'arhu'* were hanîn li ser ziman. Minaq wê navê heyva *'adarê'* ku ew

heta roja me jî wê, di kurdîya roja me de jî wê were bikarhanîn wê, di ya dema gûtfîyan de jî wê bi heman navê wê were bikarhanîn û wê hebê.

Di rewşa kifşkirina rojên heyvan de wê, li gorî rohnîya stêran wê ew kifşkirin wê were pêşxistin. Minaq wê, di heyva gelawêjê de wê, li dema rohnîya gerwêrka gelawêjê a herî geş wê li wê were hizirkirin û wê li gorî wê were kifşkirin. Di rewşa heyva sibatê de wê li gorî gerîna wê ya 27 rojan ku ew temam dikê û wê ew were kifşkirin wê, rojên wê werina kifşkirin. Di heyvên din de jî wê, bi heman rengê wê rewşên stêrzanîkî ên ku ew bi stêran re ew dihên kifşkirin wê kifşkar bin di kifşkirina rojên wan de. Li vir wê, bi wê re wê ev jî wê were dîtîn ku wê salnema wê li gorî rêgeha heyvê, dûnya û rojê wê bi pozisyonên wan re wê werina kifşkirin. Gûtfîyan wê, bi qasî ku mirov wê kifş dikê wê di her roja ku wê roj derket û tava wê da dûnyê de wê, di wê de bergên xwe wê bikin. Wê bi wê re wê, minaq wê ji lîpît îstar re wê heft roj wê, bergkirin wê were pêşxistin. Ev jî wê, di çerçoveya hijmara heftan de wê were kirin. Hijmara *heftan* wê di dema gûtfîyan de jî û piştî wê, di demên hûrî û mîtannîyan de jî wê weke hijmarek pîroz bê. Li ser temenê ku wê gûtfîyan bi stêrzanîkî wê, pêşbixin wê hûrîyî wê di dema xwe wê bi wê êdî bi êmin wê bawerkirin ku wê, bawerîya xwe bi sazûmanaka geometrîkî wê li azmana wê werênin. Di rewşên stêrzanîkî de wê, rewşên gerwêrkên weke tîrê, gelawêjê, behramê, bercîsê û heywanê û hwd wê, di rêgeha geometrîkî de wê li dora gerwêrka herî mazin a rojê wê werênina li ser ziman. Di derbarê bawerîya wê dûnya navend bê ji gerdûnê re û ankû roj bê wê, di vê çerçoveyê de wê, dû hizrên ji hevdû wê hebin. Her wusa wê, di hizrên pêşî ên dema gûtfîyan û qasî û babîliyan de wê were bawerkirin ku wê dûnya wê navend bê. Wê weke tepsîyekê wê rast bê. Lê wê ji serdemên dawî ên gûtfîyan û ên hûrî û mîtannîyan û pê de wê, hin bi hin wê, ev têgîna navendîtyê wê bi herêkirina rojê weke dagera yazdanê mazin re wê, ew wê weke navend wê were herê kirin. Di vê çerçoveyê de wê, li rengê hizirkirinên stêrzanîkî ên dema mîtannîyan de em dibînin ku wê bi awayekî vekirî wê rewşa rojê wê weke rewşek navend wê were kifşkirin û wê gerwêrkên weke gelawêjê, tîrê û keywanê û hwd wê, weke 'gerwêrkên herî zêde ên nêzî rojê' û ankû 'dûnyayên herî zêde ên nêzî rojê' wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ew gerwêrk wê hebûna wan wê werina herê kirin û wê li wan wê were hizirkirin. Wê di rewşa wan de wê, bi navendîtya rojê wê werê hizirkirin. Weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê, ev gerwêrkên ku ew herî zêde nêzî rojê ku ew dihên kifşkirin û zanîn wê, yek ji wan wê Mîtra wê li wan were bicihkirin û ya din wê ga wê li wê were bicihkirin. Di vê çerçoveyê de wê, werênina li ser ziman. Di rewşa kifşkirina rewşa gerwêrkan de wê, mîtannîyî wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê sazûmanaka stêrzanîkî a pêşketî bin. Di aslê xwe de wê, têgînên weke yên stêrzanîkî ku wê li ser wan wê lêkolîn wê werina kirin ên weke li ser rewşa pergala rojê û kifşkirina wê, rewşa nêzîkatîya gerwêrkên weke tîrê, gelawêjê, behramê, bercîsê û heywanê û hwd, kifşkirina rewşa wan di rêgeha rojê de wê, temenê wê di stêrzanîya hûrî û mîtannîyan de wê bi awayekî pêşketî wê were avêtin bê.

Têgîna êzdayî a ku wê hin bi hin wê rojê wê weke têgîneka 'navend' wê, derxê li pêş wê, temenê lêkolînên li ser rojê û kifşkirinên bi wê re wê biafirênê. Her wusa wê, rewşa rojê wê, weke rewşek giştî a ku mirov wê, hilde li dest bê. Roj wê, di hebûna xwe de wê, xwediyê rastîyeka ku ew wê di têgîneka mirov de wê bi navendî wê bide kifşkirin bê. Di serdemên berê de wê, roj wê, bi dijwarîya wê re wê û bi rohnîya wê re wê were hildan li dest. Têgînên ji dema sûmer-gûtfîyan ên weke ku ew di destpêkê de wê dûnyê

wê weke navend ji gerdûna me re wê bibînin wê, di vê çerçoveyê de wê di wan de wê hin bi hin wê têgîna rojê wê, weke têgîneka ku wê gûharîner wê xwe bide dîyarkirin bê. Rewşên bi rojê re wê, di jîyane me de wê çawa wê hebin mirov wê li ser wan re wê bihizirê. Di stêrzanîya hûrîyan de wê, were li ser ziman ku wê, gerwêrka tîrê û ya gelawêjê wê di rêgeha xwe de wê li dora rojê wê bigerihê. Wê dûnya jî wê xwediyê rêgeha xwe bê. Wê hebûna fezeyê wê weke hebûneka şenber wê herê bikê û wê li ser wê bihizirê. Li wê re wê di dema mîtannîyan de wê, giranî wê were dayîn li fahmkirina 'gerdûneka ku wê roj navenda wê ya' bê. Wê hewl were dayîn ku wê were fahmkirin. Li herêma semsûrê wê li ser peykelên mazin ên şêr, mirov û sawalan ên mazin ku ew mana li roja me wê, xîzkirinên ji wan deman ên li ser stêran wê werina dîtî û wê di wan de wê roj wê weke navendek gerdûnî wê were dîtî û hanî li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de wê ev serdema mîtannîyan wê serdemeka ku wê di wê de wê, aqilê felsefîkî wê zêde pêşbikeve bê. Ber vê yekê wê, dana berhevdû a modelên stêrzanîkî wê hin bi hin wê pêşbikeve. Wê di vê çerçoveyê de wê, hizirkirinên li ser pozisyonên gerwêrk, stêr û rojê û hwd wê, zêdetirî wê, were hizirkirin. Minaq ketina rastarasta hevdu a roj, heyv û dînyê de ku wê weke 'gertinarojê (*)' jî wê were bi navkirin wê, weke rêyeka rêgehî a li gerdûnên din jî wê were dîtî û hanî li ser ziman. Ya ku wê di temenê zêde serêşandina li ser wê rewşê a di nava stêrzanîya hûrî û mîtannîyan de jî bê wê, ev rewş bê. Mîtannîyan wê weke hûrîyan wê, serî li ser dema ku wê herî zêde wê roj derketî bê û wê germ bê wê biwastênin. Wê di wê çerçoveyê de wê, di kîjan roja kîjan heyvê de wê ew bibê wê, dikin ku wê kifşbikin. Wê, ew wê weke dem û rewşa ku wê roj û dînya ku ew herî zêde nêzî hevdu na jî wê herêbikin û wê li ser wê re wê bihizirin. Di hinek şîroveyan de wê, heyv wê, weke rewşek teybet a azmanî wê were li ser ziman. Heyv rohnîyê dide dînyê. Dema 'tavaheyvê (*)' wê dema ku wê heyv rohnîyê dide li dînyeyê bê. Mîtannîyan bawer dikir ku wê heyv wê demekê jî dînyê dîrkeve û demekê nêzîk bibê. Ev hizir wê di dema gûtîyan û piştî wan di dema hûrîyan de jî wê werê li ser ziman. Rewşên weke rewşên heyvê ên weke 'tamheyvê', 'nîvheyvê' û hwd wê, di wê çerçoveyê de wê li gorî wan wê biafirin. Mîtannîyan wê werênina li ser ziman ku wê heyv wê di xelekekê de wê li dora dînyê wê bigerihê. Lê devereke wê xelekê jî dînyê wê dîr bê.

Di rewşa heyvîgirtinê de wê, di nava nerîna me ya jî dînyê û koordînata wê û dîtina rojê de wê, heyv wê, tam wê bikeve pozisyonêka li nava wê de ku wê roj jî wê were girtin bê. Di vê pozisyonê de wê, tevgerên bi bûhûrîna heyvê û gerîna dînyê re wê, zêde dirêj nedomê. Di rewşa rohnîya rojê de wê, dîrahîya wê, wê bi rohnîya wê re wê, li wê were hizirkirin. Minaq wê, were li ser ziman ku wê di dem û kêlîka ku wê roj wê herî zêde wê nêzî dînyê û germ bê wê, sih wê nebê. Nebûna sihê wê weke rewşa nêzîktirbûna rojê jî wê were li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, dîrahî û nêzîkatîya stêran wê hertimî wê bi gûharê. Ev jî wê bi xwe re wê dîrahî û nêzîkatîya nava ard, gerwêrkan û gûharînen wê bi xwe re wê werênê. Stêr wê rohnîya wan wê li gorî dîrahîya wan wê xwe li berçav me wê li ser rûyê ardê wê bide nîşandin. Di rewşa têgîna stêrzanîyê de wê bi hasibandina demê a rojê a bi rewşên wê re wê, di dema mîtannîyan û piştî wan di dema medîya de wê zêdetirî wê

(*)Girtina rojê, dema ku heyv ket naqabîmna dunya rojê û pêşîya rohnîya wê girt bê.

(*)Tavaheyv wê, dema ku wê rohnîya heyvê wê bide dînyê wê dînyê wê bi wê rohnî bibê.

pêşbikeve. Zerdeştîyan wê, demên rojê wê li gorî pîvana demê wê bikin. Minaq wê, piştî Zerdeşt wê di dema Manî de wê, li gorî pîvanên demî ên di rojê de wê, demên bergkirinê wê werina kifşkirin. Li gorî rewşa wûcana stêrzanîkî de wê, dema derketin û ankû dîtina rojê, heyvê, stêran û hwd re wê û tevgerên wan ên di rojê de wê, ew hasibandin wê were kirin û wê li gorî wê, demên xwe yên bergkirinê wê kifşbikin.

Em vê jî wê, di dewama wê de wê bibêjin ku wê heta ku wê, dem wê were dema Manî wê, di pêşveçûnên stêrzanîkî de wê, kifşkirin û pêşketinên giring û dîrokî wê pêşkevin. Wê, qûleyên çavdêriyê wê werina avakirin. Wê di nava stêrzanî û astrolojiyê û hwd de wê, hin bi hin wê, xatek wê were kişandin. Wê têgîna stêrzanîkî a dahûrî wê bi diyardeyî wê pêşkeve. Wê ew jî wê weke du têgînekan wê her yekê wê bi serê xwe wê bidest pêşketina xwe wê bikê. Wê weke Zerdeştîyan wê bawermendên Manî jî wê, giringîyek zêde mazin wê bidina fahmkirina stêrzanîyê. Ber ku ew di çerçoveyeka bi têgîna gerdûnî de ew dihizirin û ew wê, dikin û dixwezin ku wê fahmbikin. Hizirkirinên Manî ên li ser têgîna başî û nebaşîyê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi têgîneka gerdûnî wê bên xwestin ku ew werina fahmkirin. Di vê demê de wê, bi awayekî wê, pêşveçûnên stêrzanî wê, weke pêşveçûnna bi ber pêşveçûnên kînetîkî ên hemdem ve ku wê herin bin.

Li ser têgîna stêrzanîyê wê, hizrên ku wê werina hanîn li ser ziman wê, bi demê re wê zêde bibin û felsefîkî bibin. Her wusa wê, bi wê re wê, di rewşa têgînên stêrzanîkî de wê, ya ku wê, pêşî wê xwe bide dîyarkirin wê, bi naskirin mirov û aqilê mirov a dînya mirov bê. Mirov wê, di dînyeyekê de wê bijî. Ew dixwezê ku wê dînya xwe fahmbikê. Wê serî wê li ser wê bi wastênê. Di rewşa fahmkirina têgîna stêrzanîyê de wê, di demên destpêkê ên şaariştanîyê de ku wê zêde wê derkeve li pêş wê bi aqilê mirov ê ku ew di destpêkê de wê, zêde bi hewirdorê ve girêdayî wê bikeve bê. Mirov wê, di wê demê de wê rêwîtiyan wê bikin. Lê wê nizanibin ku ew di kûve diçin û çawa diçin. Wê rêwîtiyê dirêj wê bikin. Wê herina kûderê û wê di kûve wê herin wê di wê çerçoveyê de wê, serî li ser wê bi wastênin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe bide dîyarkirin.

Têgînên bi naskirina ardnîgarîyê wê, bi vê rengê wê weke têgîneka stêrzanîyî û ankû astronomîyî a ardnîgarî wê bi demê re wê pêşkeve. Stêrzanîya ardnîgarîkî wê, bi naskirina hewirdorê û li wê bi têgîn û têgihîştina aqilê xwe re li wê serdestbûnê re wê xwe bide dîyarkirin. Di vê rewşê de wê, têgîna stêrzanîkî a ardnîgarî wê bi demê re wê, zêdetirî wê pêşkeve. Wê bi awayekî pîr-dîmenî û herf hindîk du-dîmenî û ankû sê-dîmenî wê di serdemên berî zayinê ên gût û hûriyan de wê pêşkeve. Mirov wê, di nava rewşa aqilê xwe de wê, bi têgîn û têgihîştina nasînî a serwest wê bixwezê ku ew nasbikê û bi wê re pêde herê. Minaq ku mirov rêyekê nas dikê û di wê re diçê wê, ew weke nerîneka serwest a bi nasîna mirov re bê. Mirov ku wê, deverên ku wê di wê rêwîtiya xwe xwe de wê di wê re wê bide wê, naqşa wê ya wê bi têgînî wê di mejiyê xwe de wê, naqş bikê. Ev rewş wê, bi demê re wê bi mirov re wê pêşkeve. Mirov wê, hin bi hin wê di rêyên ku ew di wê re diçê de wê, naskirinê wê bi xwe re wê pêşbixê. Carekê û ankû du caran ku ew di wê rêyê ve çû wê, piştê wê di mejiyê xwe de wê, nasbikê. Wê di wê çerçoveyê de wê, xwediyê nasîna wê rêyê bê. Ev wê, di mejiyê mirov de wê weke naqşaya wan deverên ku ew di wê rêwîtiyê de ew di wê de diçê de ku mirov ew di mejiyê xwe de naqşkirina wê, were dîtin bê. Wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Ev wê, weke rewşek stêrzanîkî a ardnîgarî bê. Lê mirov wê, bi demê re wê li wê rewşa stêrzanîya ardnîgarî wê rewşên din wê zêde bikê. Ew jî wê, ew bin ku wê, hin bi hin wê

bi stêran wê bikê ku ew rêya xwe bibînê bê. Wê bi stêrên li azmana wê rêyên xwe yên ku ew di wan re diçê de wê, kifşbikê. Wê zanibê ku ew di kûve diçê. Di vê çerçoveyê de di nava wê rêwîtiya li ardê û rewşa stêran wê, bi vê rengê wê bi awayekî geometrikî wê rewşekê wê di mejiyê xwe de wê biafirênê. Mejiyê mirov wê li wê bihonê. Wê nasbikê. Wê bi wê re wê, li hewirdorê wê bi wê re wê xwe serdest bikê.

Di serdemên berê de wê, di vê çerçoveyê de wê, stêr, roj û bi şevê wê heyv wê bi vê rengê wê weke rewşna rênîşan wê werina bikarhanîn. Wê di şevê de wê heyv û stêr wê werina bikarhanîn. Bi wê re jî wê, rewşa rêza çiyayan, tefsîrkirina ardnîgar û bi xosletên wê re wê, were bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna stêrzanîya ardnîgarîkî wê, heta roja me jî wê, bi awayekî wê, ku mirov di farqê de bê û ne di farqê de bê wê bikarbênê. Her wusa wê, di vê rewşa naskirina ardnîgarîyê de wê, çendî ku wê weke têgîn û naskirina ardnîgarîyê bê wê, bi heman rengê weke têgîneka stêrzanîkî jî bê bi naskirinê û rewşa naskirinê.

Mirov wê, di jiyane xwe de wê pêşî wê li stêrzanîya ardnîgarî wê serdest bibê. Piştê wê, ji wê bi pêde herê û wê xwe bigihênê têgînên stêrzanîya li azmên. Her wusa rêyên stêran ên li azmên û rewşa mazinahiya wê û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşek teybet a ku mirov wê, dikarê wê werênê li ser ziman bê. Têgîna stêrzanîkî ku em dikarin bi gotina 'astrojeolojîkî' wê pêşî wê li ser ardê li dînyê wê xwe bi aqilê me re wê bi vê rengê wê bide danîşandin. Di destpêkên pêvajoya pêşketina aqil û şariştaniyê de wê, di vê çerçoveyê de wê aqilê mirov wê, bi hewnasîna bi hewirdorê re wê, di vê çerçoveyê de wê, bi rewşên stêrzanîkî û ankû astronomîkî re wê hevnasînê bikê. Mirov wê, di rewşa fahmkirina xwe de wê pêşî wê li ser wan re wê pêşketina xwe biaqilê xwe wê bide nişandin. Minaq wê, di destpêkê de wê awr wê li azmana wê bibê û wê dînyê wê tarî bikê. Wê baran bibarê. Wê berf wê were û bibarê. Ev rewş wê mirov wê, di derbarê wan û çawa bûyîna wan de wê, di mejiyê xwe de wê, ne xwediyê zanîn û agahiyê bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, pêşî wê, di aqilê xwe de wê, li ser van rewşan wê bi ponijê. Rewşên ku weke van rewşan ku ew dibin wê, têkiliyeka meji û aqilê mirov wê bi ardê û azmana wê bi hevdû re wê dênin. Minaq wê, çendî ku wê berf û baran û hwd wê bi barin li ardê jî lê wê, ew ji azmana wê werina û bi barin. Wê barq û ankû beledî wê li azmana wê bivedê. Lê sedema wê bûyîna wê û vedana wê çû ya wê û ankû ew çawa dibê mirov wê nizanê. Wê li ser wê aqilê xwe wê bi wastênê. Bi wê re wê, rewşên wê weke vê wê di jiyane mirov de wê, zêde bibin. Roj li azmana ya, ku ew winda dibê wê li dînyê wê bibê reş. Wê ev wê weke rewşeka ku wê mereqa aqilê mirov wê bi jor ve bi rojê ve wê bi azmana ve wê bidiyê de.

3. Şîroveyên falzanîkî(astrolojîkî) û pêşketina wan ya li ser rewş û têgînên stêrzanîkî re

Tabî rewşên weke van rewşan wê, rewşna teybet û xwezayî bin. Wê mirov wê, di wê rewş de wê, ev rewş bû bûyîna wan û bi vegotina wan bi hêzek xwûdeyî re wê, di vê çerçoveyê de wê, pêşkeve. Kî baranê di barênê? Kî berfê di berfênê? Kî belediyê di vedênê? Kî rojê ji dînyê dibê û dikê reş? Weke van wê gelek pirr wê, di serê mirov de wê xwe bidina dîyarkirin. Aqilê mirov wê bi kifşkirina xwûde re wê, demekê wê weke ku wê, 'xwe bigihênê li bersivên van pirsan' û pirsên weke wan ku ew di mejiyê mirov de dibin. Wê di vê rewşê de wê, têkiliyek stêrzanîkî wê bi gotina xwûde re wê were danîn. Rewşa stêrzanîyê û hebûna xwûde wê di vê çerçoveyê de wê bigihina li hevdû.

Piştire wê, li ser wê re wê tégînên weke yên falzanî û ankû astrolojîkî wê pêşkevin. Ev tégîn wê, weke şîroveyna ku wê li ser bi watekirina rewşên stêrzanîkî bi tégîneka bi ber bawerîyê û hwd ve bê. Di vê çerçoveyê de wê, weke rewşek di nava dû rewşan de ku ew têkiliyê dide danîn û ankû çêkirin w astrolojîkî wê pêşbikeve. Wê xwe bide dîyarkirin. Em li vir di dewama wê de wê, jî wê werênina li ser ziman ku wê, tégînên stêrzanîkî wê, weke tégîna ku wê bina ardnîgarî ji tégînên astrolojîkî re. Bi wê re jî wê bi şîroveyên nirxî re wê bina ardnîgarî û malgeh ji tégînên bawerî û ên xwûdawendî re jî. Di serdemên felsefeyê de ku wê bahse 'bilindbûna xwûdê li azmana' wê were kirin de wê, di vê çerçoveyê de wê, di temenê wê tégîna bilindbûnê de wê tégîna stêrzanîkî û ankû ya astronomîyê wê hebê. Şîroveyên ku wê li ser xwûdê û navê xwûdê re wê bi azman û gerwêrk û stêran re wê werina kirin wê, ji aliyekî ve wê, temenê kifşkirinên stêrzanîya rast a dahûrî jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev tégîn wê weke ku wê hevdû wê di hanîna li ser ziman de wê, weke temen bin ji hevdû re. Di rewşa tégîna xwûdê û ya stêrzanîyê de wê, di vê çerçoveyê de wê, têkiliyek wê di destpêkê de wê di çerçoveya pêşketina wan ya bi hevdû re de wê, di temenê hevdû de wê bi wan re wê hebê. Me hinekî li jor bahse Mîtra kir. Wê dema ku ku ew ji dînyê goç dikê wê çihê wî wê li gerwêrka **Keywanê** wê were hanîn li ser ziman. Bi vê rengê wê tégînên ardnîgarî wê, ji aliyekî ve wê, dema ku wê xwûdê bilindî azmana bibê wê, ji aliyekî ve wê bi aqilê mirov re wê weke 'pêwîstiyekê' jî bê ku ew rewşên azmanî ew zanibê û wan fahmbikê bê. Bi wê re jî ku ew têkiliya wan bi rewşên jîyanî ên li dînyê re wan dênê bê.

Di vê çerçoveyê de wê, di dewama wê de wê wre dîtin ku wê ew xwûdêyê ku ew li azmana hilkişîya wê li kû û li kîjan stêrê û gerwêrkê wê bicih bikê û ankû wê kîjan ji wan cihê ku ew li wê bicih dibê bê wê, ew wê werina kifşkirin. Di rewşên mîtolojîkî ên demên berê de wê, were dîtin ku wê her gerwêrk wê bi navê yazdanekî wê hem wê were kifşkirin û hem jî wê weke mala ku ew di wê de dijî wê were hanîn li ser ziman. Minaq di dema gûtî, qasît û babilîyan de wê, gerwêrka berçîsê wê bi navê 'mêrdûk' re wê were li ser ziman. Gerwêrka gelawêjê wê bi navê lipît îştar re wê were li ser ziman. Keywan wê, bi navê **Nînûrta û ankû 'Nînîb'** re wê werê li ser ziman. Gerwêrka tîrê wê bi navê **'Nabo'** re wê were li ser ziman. Gerwêrka Behramê wê, bi navê 'Nergal' re wê were li ser ziman. Roj wê wê bi navê 'şamaş' re wê were li ser ziman. Heyv wê bi navê 'sîn' re wê were li ser ziman. Bi vê rengê wê, werina hanîn li ser ziman. Di rewşa vegotinên stêrzanîkî ên van deman de wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşa gerwêrkan wê, bi navê yazdanan re wê werina li ser ziman. Gûharînen ku wê, di rewşa stêrzanîya dema hûrî û mîtannîyan de wê bibin wê, ne gûharîna ji kokê bin. Wê weke pêşketinna ku wê li van pêşketinan wê hatina zêdekirin bin. Minaq wê, dema ku wê mîtannî wê piştî goça Mîtra wê wî li keywanê wê bicih bikin wê ew bizanibin ku ew berê bi navê Nînîb re hatîya li ser ziman. Ankû wê dema ku wê ga hilkişênina li gerwêrka gelawêjê wê, ew zanibin ku wê Lipît îştar wê li wir bijî bê. Ji xwe wê, dema ku mirov destênên dema ûrûkîyan ên weke destanên gilgamêş û hwd dixwênin wê di wan de ku wê, were li ser ziman em, dibînin ku wê, bi mîtolojîkî wê weke bavê Îştar wê Anû wê werê hanîn li ser ziman û ga wê pêşî li wir wê bijî û Lipît îştar wê ji wir daxê li ardê ku ew bi gilgamêş re şer bikê. Hin şîroveyên mîtolojîkî ên bi vê rengê jî wê li ser wê re wê, werina pêşxistin û hanîn li ser ziman. Kosmolojîya gûtîyan wê, di vê çerçoveyê de wê weke kosmolojîyeka bingihînî bê ji pêşveçûnên demên piştire ên hemdem re. Herwusa wê, di vê rewşê de wê, kosmolojîya gûtîyan wê, bi vegotin û şîroveyên xwe yên jeodezîkî û kosmogonîkî re

wê, temenê pêşveçûnên vegotinî ên bi aqilê felsefîkî û hwd re wê biafirênê. Di rewşa pêşxistina zanîna stêrzanîkî û fahmkirin û hasibandina navbera gerwêrk, stêr û tevgerên wan û hwd wê, li pêş bê. Wê xwediyê ast û pîvanaka pêşketî bê. Gûtîyî wê di rewşên weke yên wêrzeyê û ankû matamatîkê û hwd de jî wê, bi awayekî giring wê li pêş bin. Wê di hasibandinên xwe de wê, têgînên matamatîkî ku wan pêşxistin û yên geometrîkî ku ew hin bi hin wan pêş dixin wê, di vegotinên xwe yên stêrzanîkî û hanîna wan ya li ser ziman de wê bikarbênin. Hasibandinên wan ên stêrzanîkî wê, di vê çerçoveyê de wê, weke hasibandinna temen û bingihîni bin. Wê di demên piştre de jî wê, weke di demên hûrî û mîtannîyan de wê, ew pêşî wê werina fahmkirin. Gûtîyan wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê zanîneka li berçav a pêşketî a stêrzanîkî û ankû a astronomîkî bê. Stêrzanîya demkî wê, di vê çerçoveyê de wê, çendî ku wê bi şewayekî vegotinî ê xwûdawendî û mîtolojîkî wê tevlihev wê xwediyê rengêkî pêşketinê jî bê lê wê, bi wê re wê, ew navaroka wê, wê bi aqilekî dahûrî ê pêşxistina têgînên kosmogonîkî û jeodezîkî re wê, were li ser ziman. Hasibandinên wan ên jeodezîkî wê, di vê çerçoveyê de wê, di dema hûrî û mîtannîyan de wê werina hanîn li ser ziman û pêşxistin. Di dewama wê de jî wê, di nava felsefeyên demê ên ku ew pêş dikevin û di wan de bahse hasibandinên li ser heyvê, stêran, rojê, dûnyê û rêgehên wan û fahmkirinên wan kosmogonîkî de wê, ew zanîn û hasibandinên wan ên jeodezîkî wê hebin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bibêjê ku wê têgîna jeodezîkî a gûtîyan wê, weke têgîneka ku wê temenê pêşveçûnên stêrzanîkî ên piştre jî wê bi xwe re wê bihasibênê bê. Jeodezîk gûtîyan wê di vegotinên xwe yên stêrzanîkî û ankû astronomîkî ên ardnîgarî, azmanî û tevgerî de wê, xwediyê hasibandinên giring bê. Hê di wê demê de wê bi stêrzanîkî û ankû astronomîkî wê rêgeha ardê, fezeyê, wûcan û awayê wê de wê, hizir wê pêşkevin. Wê li ser dema dûnyê û ya fezeyê wê, farq wê were kifşkirin. Lê wê, di rewşa di derbarê giloverîya dunyê de wê, were bawerkirin ku wê, 'dunya wê rast weke tepsîyekê bê' û mirov li ser wê dijîn. Ev bawerî wê, piştre wê, bi hezaran salan ji serdemên sûmer-gûtîyan wê heta serdemên navîn wê, di nava bawerîyan de wê, xwe bide dîyarkirin û domandin. Jeodezîk wê weke têgîneka stêrzanîkî a ardnîgarî wê, di serdemên nû de wê, bi şewayna nû wê ew wê were kifşkirin. Weke zanîna pîvana rûyê ardê jî wê, xwe bide dîyarkirin.

Rewşên heyvê kifşkirin û hasibandina wan bi demkî, rewşa rojê kifşkirina wê bi rêgeha wê ya bi gerwêrkên weke Tîr(merkûr), Gelawêj(Venûs), Dunya(ard), Behram(mars), Bercîs (jûpîter), Keywan(satûrn), Uranûs û Neptûn û hwd re wê, bi rewşên wan re wê hasibandinên wan ên jeodezîkî wê bi kifşkirinên wan stêrzanîkî re wê werê hanîn li ser ziman. Ku em têgînên stêrzanîkî ên gûtîyan bê têgînên wan jeodezîkî ku wan bi wan re hanîna li ser ziman û hildina li dest wê, newina fahmkirin. Wê bi çerçoveya xwe ya jeodezîkî û stêrzanîkî re wê were hanîn li ser ziman. Hasibandinên wan ên bi tîrêjên rojê û navbera stêran û tevgerên gerwêrkan û hwd re wê, di temenê pêşxistina têgînên demî ku wê di jîyanê de wê werina esasgirtin jî bin. Di dewama wê de wê, pîvanên ser rûyê ardê wê werina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşa pîvanê de wê, têkiliyeka pîvanîya li ser rûyê ardê wê bi stêran re wê dênin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, di pîvanên xwe de wê, roj, heyv û stêran wê bi awayekî pîr zêde wê bikarbênin.

Di stêrzanîya gûtîyan de rewşa hasibandin û pîvandina bi geometrîkî, matamatîkî û demkî.

Hasibandin û pîvandînên gûtiyan wê, di derbarê wê de wê, mirov karibê gelek tiştê vebêjê. Li vir di aslê xwe de ku mirov rewşa astrolojiyê a dema gûtiyan wê, hilde li dest wê, têkiliyeka wê ya xort wê li ser rewşên baweriyên wan re wê, bi hevdu re wê hebê. Minaq wê, di vê çerçoveyê de wê, gelek behîtan wê bi rêya stêr, rewşên roj û heyvê û xatên nav û navbera stêran û hwd wê, bi wê re wê bikin ku ew kifşbikin. Di rewşa vê rewşê de wê, bi wê re wê, di mejiyê wan de wê baweriyek wê hebê ku 'yazdanan, baxt kifşkirîya.' Ku mirov bi awayekî baş karibê rewşên jîyanî û azmanî bixwênê mirov wê di derbarê wan de bê xwediyê zanîne. Wê di vê çerçoveyê de wê, werênina li ser ziman. Minaq wê, di bawerîya êzdayî de wê, rewşa weke hatina 'sê pêxemberan' ku her yekê wê di navbera sê hezar salan de wê were wê, di vê çerçoveyê de wê, hewl bê dayîn ku ew were kifşkirin. 'Wê nîşanakên wê hatinê wê bi stêrzanîkî wê, xwe bidina dîyarkirin.' Ji pêşde kifşkirina hatina 'şaoşyantê sêyem' wê, di vê çerçoveyê de wê, werê hanîn li ser ziman. Di bawerîya mesihiyê de jî wê, were hanîn li ser ziman ku wê, dema ku wê ew hat dinyê wê zaneyên êzdayî û ankû zerdeştî wê, kurdistanê û ankû mesopotamiya wê herina devera ku ew li wê hatîya dinyê. Wê ji mirovên wir re wê werênina li ser ziman ku 'me, bi hasibandin û pîvanên xwe yên ku kirina wê, di vê demê de wê mesih wê were dînyê û ew mesih a ku ew hatîya dinyê.' Ev her sê zaneyên ku ew diçin jî wê, weke rêmidar û ankû stêrzanvan bin. Wê bi zanînen xwe yên stêrzanîkî û ankû atronomîkî wê, ew wê werênina li ser ziman. Bêgûman î ro, di derbarê rê û rêbaz û ast û pîvana zane stêrzanên wê demê de em î ro ne zêde xwediyê rewşek pîr kûr in. Çendî ku wê, di roja me de wê, zanîn wê bi gelek cûre û awayên wê re wê pêşbikeve jî lê wê, asta pîvan û hasibandina stêrzanvanên wê demê wê, hê jî wê weke npeniyekê bê. Minaq wê, i roja me de wê, ancax wê bi mikroskopan wê bê karin ku ew rewşên rêgeha rojê û gerwêrkên li dora wê werina kifşkirin. Lê ew di wê demê de ew hatina kifşkirin. Lê li vir em vê yekê wê, werênina li ser ziman ku wan stêrzanan wê, bi zanîna xwe ya stêrzanîkî re wê, çawa wê di derbarê pêşarojê wê bikin ku ew bidina xwediyê zanîne û hwd wê, bi kûrbûna zanîna xwe ya stêrzanîkî de wê bikin. Di vê çerçoveyê de em, vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, zanîna stêrzanîkî a wê demê wê di wê de wê di derbarê stêr, gerwêrk, hasibandin û pîvanên wan û rewşên wan û hwd de wê, xwediyê zanîneka pîr kûr bin. Zanîna serdemên bûhûrî wê, ji aliyekî ve wê temenê wê li ser rewşên fahmkirina stêrzanîkî bin. Felsefe wê, dema ku ew pêş dikeve wê, bikeve lêpîrsîna fahmkirina rewşên weke 'dûnya ji çi afirîya', 'çawa afirîya' û 'ji kengî ve afirîya?' û hwd. Di wê rewşê de jî wê, di dewama wê de wê hizirkirinên li ser azmana cismên ku ew dihên dîtin wê were meşandin. Minaq heyv, roj, stêr û gerwêrkên ku ew bi çav dihên dîtin wê bidest kifşkirina wan bikin. Wê êdî wê dem wê, dema kifşkirina rewşên teybet ên stêran, gerwêrk, roj û heyvê bin. Di tégînên stêrzanîkî ên demên berê de wê, li ser rewşa dinyê wê, pîr zêde wê, hizir wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, li ser elementên weke av, agir, hewa û axê wê, weke temenê afirîne wê bi tégînên ji hevdu cuda wê werênina li ser ziman.

Di rewşa şirovekirina van elementan de wê, hewl bê dayin ku ew bi rastîya wan re ew werina fahmkirin. Wê çawa wê, ev element wê temenê afirandinê bin wê li ser wan re wê were hizirkirin. Hizirkirinên felsefîkî wê, di vê çerçoveyê de ku wê li ser 'kokê' wê, bîn kirin wê, di vê rewşê de wê, xwediyê rewşek teybet bin. Her tişt wê xwediyê 'destpêkekê' bê. Her tişt wê xwediyê 'kokê' bê. Her tişt wê bi rastîya xwe ya teybet re

wê hebê. Ev her sê rewş wê, weke rewşna ku wê, di temenê lêpîrsînên felsefîkî de jî bin. Wê li ser wan re wê, were hizirkirin û wê werina hanîn li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de em dema ku wê rewşa mîtolojîya dema gûtfîyan wê lêkolîn dikin wê, di aslê xwe de di wê de wê gelek nîşanakên ku em di vê warê de wan kifşbikin û wan werênina li ser ziman w bibin. Minaq wê, di wê demê de wê, hebûna dûnyayan wê, were kifşkirin. Di dewama wê de wê, gelek rewşên gerwêrkî ku wê, hê di rewşa asta pêşketina zanîna roja me de wê, ew ne hatibin kifşkirin wê, werina kifşkirin. Minaq wê, weke rewşa gelek galaksî û gerdûnên din. Wê hebûna gerdûnên din wê, bi awayekî şenber wê werê herê kîrin. Bi wê re wê, hebûna gerdûnên din ên ku ew cûda hena û dîmenên din ku em ne di farqê de na û wê nabînin wê bahse wan bikin. Minaq wê, bi çîrok û çîvanokên xwe yê ku ew weke bi 'acînfîyan' re dihênina li ser ziman wê, di awa û rengê dîmenekî din ê duyem ê jîyanê ê ku ew dijîn û em wê nabînin re wê, ew werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ew dîmenê din ê jîyanî wê, dema ku mirov wê, bigihîjê tégîhiştina wê, wê hingê mirov wê karibê wê kifşbikê. Di vê çerçoveyê de lê wê, bawer bikin ku wê, dîmenê duyem wê bi jîyane di wê de re wê her hebê. Wê bi bi jîyanê re wê ew jî wê hebê. Lê em wê nabînin. Di vê çerçoveyê de wê, bawerbikin ku mirov gihişt wê, tégîna dîmenê duyem ê jîyanî wê hingê jî wê, mirov wê mirov wê gelek nepenîyên jîyanî wê wan kifşbikê. Ev rewşa bi tégîni û bi bawerî jî ku wê werê li ser ziman wê heta roja me jî wê, di mejiyê kurdan de wê, xwe biparêzê û wê werênê hanîn li ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, heta roja me jî wê kurd wê, di nava xwe de wê, bi dîmenê duyem ê jîyanî wê bawer bikin. Wê bawer bikin ku ew heya. Wê di vê çerçoveyê de wê, di jîyane xwe de ku ew gotina xwe dibêjin wê bi wê bawerîyê wê bibêjin. Vegotin, çîrok û çîvanokên wan ên civakî wê, bi sadan wê di derbarê vê rewşa dîmenê duyem ê jîyanî de bê. Wê bi wê re wê, werê hanîn li ser ziman.

Di nava jîyanê de wê, di vê çerçoveyê de wê, li ser rewşa fizîkê wê, di dewama wê de wê hinek gotin wê, werina hanîn li ser ziman. Minaq wê were gotin ku "mîrov nikarê rewşa fizîkê wê weke şîrove bikê." Ev wê were çi wateyê? Mîrov dikarê vê tégînê tenê li se tégîni û wateyekî gûharîne de wê werênê li ser ziman? Ji wê zêdetir wê di wê de wê, were li ser ziman. Wê di serî de wê di wê de wê were hanîn li ser ziman ku wê, rewşa fizîkê wê, weke ku wê 'piçk(qatk)an wê pêk werê.' Tégîna rewşa fizîkî ji 'piçkan pêk tê' wê, di vê çerçoveyê de wê, di nava vê mejiyê de wê, bi awayekî şenber wê werê hanîn li ser ziman. Wê bi wê re wê, hewl bê dayîn ku ew were fahmkirin. 'piçkên tiştan' wê, çi bin û çawa bin wê, li ser wê re wê, hizir wê werina meşandin. Her timî wê, bi tégîna piçkan wê li wê bihizirin. Tégîna piçkan wê, weke ku wê heta roja me jî wê, di nava kurdan de wê, ji wê û heta vê demê wê were gotin wê, di du awa û rengan de wê were hanîn li ser ziman. Aliyekî wê, li ser beş, qatagorî û rewşên weke yê çînikirinê û hwd re wê werina hanîn li ser ziman bê. Piçk wê bi wateya wê ya duyem re jî wê, weke dema ku ew tiştê hat 'şikandin' û ji wê qatkên piçûk ên din yê hûr û hûr ku ew derketin li holê wê ji wan rewşên qatkên hûr û hûr re wê were gotin. Wê di vê rewşê de wê rewşa qatkan û ankû piçkan wê were hanîn li ser ziman. Di rewşa qatkan de wê, bi vê rengê wê bi du awayî wê werê hizirkirin. Di serdemên piştre ên felsefîkî û ankû di demên ku wê di wan de wê aqilê felsefîkî ên ku wê hewl bide ku ew dahûrkirinê di nava xwe de pêşbixê wê, di vê çerçoveyê de wê li ser tégîna qatk û ankû piçkan wê bihizirê. Di vê çerçoveyê de wê, pêşî wê, bi tégîna 'gelek tişt' ku ew di jîyanê de dijîn wê werina

hanîn li ser ziman. Piştê wê, li ser rewşa beşkirina ji hevdû re wê, were hanîn li ser ziman. Di dewama wê de jî wê, ew tiştên ku ew hatina beşkirin ew jî wê, yek bi yek ku ew werina şikandin wê, di wan de wê qatk wê hebin. Wê ji wê şikandin wê, qatk wê derkevina li holê. Têgîna qatkê wê, di vê çerçoveyê de wê, ji têgîna zerrecîkê wê were hanîn li ser ziman. Zerre wê, di dewama têgîna qatkê de wê, di kurdî de wê di wateya ya qatk û ankû piçka herî piçûk de wê were li ser ziman.

Di rewşên hanîn li ser ziman de wê, dema ku wê qatk ew bi serê xwe ew piçûk hebin wê, weke tovîk, tozîk û hwd wê werina hanîn li ser ziman. Dema ku bapîsok rabû wê, bi wê bapîsokê wê libên tozê wê ji axê wê rabin li hewayê û wê di hewayê de wê heta ku ew bapîsok hebê wê li hewayê wê bisekin in bin. Di kurdî de wê, ji axa zûwa re wê 'xwêlî' wê were gotin. Ya ku wê, libên tozê û ankû libên tozîkê wê çêbikê jî wê ev xwêlî bê. Yanî xwêliya zûwa bê. Di vê çerçoveyê de wê, werê hanîn li ser ziman. Têgîna qatkê, piçkê û ankû libên tozê û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşna ku ew ji rewşa hebûna rewşa ya fîzîkî a mazin ku ew diafirin wê hebê. Bi vê rengê jî wê, were hanîn li ser ziman. Di dewama wê de wê, wê, têtîliya her qatkê û libên tozê wê bi rewşa giştî a fîzîkî re wê hebê. Temenê wê, ku ew tenê bi serê xwe bê wê ne dirêj bê. Wê pirr zêde kin bê. Di vê awayê de wê, xwe bide dîyarkirin.

Dema ku mirov rewşa têgîna qatkê wê, fahm dikê wê, di vê çerçoveyê de wê, mirov wê jî kifşîbîkê ku wê were bawerkirin ku wê, tişt wê xwediyê bandûrê a li ser mirov û rewşên din bê. Her tişta ku ew heya wê xwediyê wê bandûrê bê. Ev rewşa bandûrê wê, çawa wê weke rewşek fîzîkî wê were dîtîn û fahmkirin wê, li ser wê, serî were wastandin. Di vê çerçoveyê de lê wê, rewşa têgîna bandûr û ankû têsîrê wê weke rewşeka fîzîkî a ku mirov wê, di wê çerçoveyê de wê, hilde li dest bê. Tişt wê, bi hebûna wê re wê, ew rewşa bandûrê wê ji wê biafirê li hewirdora wê. Mînaq wê, çîçekek binavşê û ankû nêrgîzê wê, wê xwediyê bêhnêka pirr xweş a ji xwe ku ew dide li hewirdora xwe bê. Bêhn wê, weke rewşeka fîzîkî û ankû rewşek şenber a ku ew heya bê. Wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Wê bêhn wê, ne xwediyê wê rengê xwe bê. Wê hebûna bêhnkirinê ku mirov wê dikê wê, weke rengê wê xwe bide dîyarkirin. Ji hevdû cûdakirina bêhnê wê di vê çerçoveyê de wê, weke nîşanak û birhana wê bê.

Di rewşa fahmkirina qatkan de wê, bêhn wê, weke qatkekê ku mirov wê bi çav nabinê wê hebê. Mînaq wê, dema ku wê mirov nexweşîyek ji tiştêkê bigirê wê di demên berê de wê biheta bawerkirin ku wê li wî mirov 'bandûr' bûya. Wê ji çî bandûr bûba û ankû wê çî bandûr li lê bikira wê, ew biheta kifşîkirin. Di vê çerçoveyê de wê li gorî wê, derman wê biheta amedekirin. Wê bi wê dermanê wê biheta xwestin ku ew mirov biheta başkirin û bi şîfakirin. Têgîna bandûrê wê, di vê çerçoveyê de wê, ev wê weke aliyekî wê bê. Lê ji aliyekî din ve jî wê, bahse bandûra ji azmana ji stêr, heyy, roj û hwd wê biheta kirin. Di vê çerçoveyê de wê, bahse wê biheta kirin. Di rewşa wê rewşa bandûrê de wê, stêr, roj û heyy wê bi rohniya xwe re wê xwediyê rewşek heyîmî bin. Wê ew rewşa wan wê, weke rewşeka ku mirov wê dikarê weke rewşa bandûrî wê werênê li ser ziman bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman bê. Di rewşa bandûra ji rojê, heyyê û stêran û hwd wê, weke bandûra ku wê bi wê rohniyê re ku ew heya bê. Mirov di vê çerçoveyê de wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa bandûrê a ji azmana li dînyê wê, di vê çerçoveyê de wê mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê rewşên azmanî û dînyeyî û ankû gerwêrkî wê bi hevdû ve girêdayî bin. Mînaq wê, dunya wê, xwediyê bireh(atmosfer)jeka xwe ya ku wê dema ku wê tîrêjên rojê wê di wê

re derbas bikin wê werina lawazkirin û ankû wê hinek elementên di wê de wê ji wê werina vaqatandin û ew elementên ku ew hatina vaqatandin wê bi wê rohnîyê re wê, negihîjê li ardê li dunyê. Ji aliyekî din ve wê bireh wê, weke çerçoveyek qatî a gazî ya li dora dînyê ku ew, rewşa bireha jîyanê a li dunyê diparêzê bê. Awr, baran, berf, tayrok û hwd wê, ji wê biafirin. Rewşa birehê wê, ji rewşa jîyanê re wê weke rewşek rêgehî bê. Wê kar û erka rêgehê ji jîyanê re wê bibînê.

Rewşa adilandina hewayaya me ya li dunyê ku mirov dikarê bi wê bijî, rewşa çêbûna temenê şînbûn û çêbûna zindîyan û hwd wê, bi wê re wê bi afirê. Em di vê çerçoveyê de wê, dikarin bibêjin ku wê ji aliyê jîyanî ve wê jîyane hemû tiştên zindî û ne zindî wê xwediyê girêdanaka heyînî a bi birehê ve girêdayî bê. Qata wê birehê a ji ardê û heta wê, ku mirov dikarê wê weke qata birehê a binî wê werênê li ser ziman jî wê, ew germehîya ku em dikarin di nava wê de bijîn a li dora 60 rêjeyê û hwd a.

Jîyan wê weke ku ew bi wê birehê û rewşa wê û qat û tabaqayên re wê xwediyê temenê xwediyê jîyanî ê heyînî bê. Mirov wê, di serî de wê werênê li ser ziman. Rewşên xwe di jîyanê de weke bi dewrûdayimkirin jî wê, bi birehê re wê di çerçoveya pêşketina rewşa demsalan re wê, weke di havê de zêde germbûnê, di birahê de bi zêde baran û şînahîyê, di çile û ankû zivistanê de wê, bi sermayê, barîna baranê, berfê, tayrokê û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Ev rewşên xwediyê wê, weke rewşna ku wê, di nava axê de wê, bi tîkiliya wê ya bi avê re wê, di wê de wê bi wê 'waxm'a ku ew di afirênê re wê, temenê şînbûnê wê biafirênê. Wê elementên nava axê wê, bikevina nava tevgerê de. Wê bi wê re wê, pêşkeve.

Her wusa li vir wê tîkiliya avê û axê, wê, hewayê jî wê, di axê de wê pêşxê. Di dewama wê de wê, ax wê, axê hilde. Wê bi wê hildana avê re wê, di nava wê de wê temenê şînbûnê wê biafirênê. Rewşa mînarelan û ankû şaneyên axê ku mirov wan fahmbikê wê, bi wê re wê, di rewşa xwe de wê, bi avê re wê, bi afirîna bireha wan ya bi waxmî re wê temenê wê yê jîyanê wê biafirê. Vala pêşiyên me kurdan bi hezaran salan berê hê di demên gûtî û qasîtyan de ne gotina 'av, jîyanê diafirênê.' Lê li vir wê bi wê kombîstasyona ku ew bi axê re diafirênê wê, rewşa pêşxistina şînahîyan û hwd wê, pêşbixê. Di rewşa fahmkirina rewşa temenê jîyanê weke avê de wê, di vê çerçoveyê de wê, were dîtin ku wê, ti tiştê ku ew av newê û ne gihîjê de wê zûwa bibê û wê neji.

Di rewşa axê û elementên wê yên bingihîni de mirov dikarê wê ji dû alîyan ve wê werênê li ser ziman. Aliyê pêşî wê, bi rewşa demkî re bê. Ev jî wê, dema ku wê, tîkliya ax û avê a bi hevdû re ku ew çawa bi hevdû re dihê danîn wê, bi tevgerbûna di wê de wê, xwe li ser elementan re wê bide dîyarkirin û wê şînahî û hwd wê pêşkevin. Ev jî wê, weke şînbûn û pêşketina jîyanê bê. Lê em vê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, bi demê re wê, bi bandûra wê rewşa dewrûdayimî re wê, pêvaoyek bi dirêjehî a peresendinê jî wê, xwe li ser rewşa birehê, tîkiliya wê ya bi bi avê û axê a bi hevdû re û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Minaq zindîyên piştî halîna kaş û çîyayên qaşayê ku wê bibin wê, pîrr mazin weke 'dînasoran' bin. Lê bi demê re wê, bi bandûra wê peresendinê û rewşên nû ên ku ew bi awayên motasyonî û hwd bin ku ew di şaneyên temenê jîyanê de ku ew didina jîyankirin re wê, hin bi hin wê, di wan rewşan de wê gûharîn wê bibê. Ev rewşên xwezayî ku wê bi gûharînê wê xwe bidina dîyarkirin wê, rewşna nû ên teybet wê di dewama xwe de wê, li ser rewşên pêşketina zindîyan û hwd re wê bidina dîyarkirin. Wê, werênina li ser ziman.

Di roja me de wê, gûharînên mazin wê di jîyanê de wê ji wê demê û heta roja me wê bibin. Lê li vir divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, wê her tişt bi gûharînî û hwd wê, bi kombînasyonêka jîyanî a bi têkiliya nava elementan û her wusa gûharîna di elementan a di demê de re wê, xwe bidê dîyarkirin. Rewşên peresendinê ên ku ew di jîyanê de dibin wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe bidina dîyarkirin. Wê xwe bidina domandin heta roja me. Di roja me de jî wê, bi bandûra wan heman elementan û tîrîtiya wan a di birehê de wê gûharînê wê bi xwe re wê, bide çêkirin. Wê ji du aliyan ve wê, temenê gûharînê wê hertimî wê hebê. Yek wê ji aliyê têkiliya elementan a bi hevdû re bê. Di vê çerçoveyê de bi mudahaleyên gûharandina ahenga nava wan bê. Minaq wê, dema ku em li dinyê di roja me de wê bi gaza fabrîqayan ku wê berdê birehê wê, ahenga nava elementên avê û yên din wê bide gûharandin. Wê di vê çerçoveyê de wê, gûharînan wê, di wê de wê çêbikê. Çendî ku wê, elementên avê wê bi wê bandûrê wê kêmbibin wê, bireh wê tenik bibê û wê bi ber tûnabûnê ve wê herê. Di rewşên roja me ên weke rabûna şape, bahoz, firtoneyên avê û yên bayê û hwd wê, di temenê rewşên bi vî rengî ku ew dibin de bê. Bêgûman ew cihane me ya ku wê ahenge xwe ya bi qaşayê û hwd re wê, xira dikê wê, di demên wê yên pêşarojê de wê, zêdetirî wê, rewşên bi vî rengî wê, bijî. Ew kaş û çîyayên qaşayê wê, ahengeka xwezayî wê, di xwezayê de wê bigirin. Ev jî wê, di aslê xwe de wê weke rewşeka mayîn û nemayîna jîyanê jî wê, mirov karibê wê werênê li ser ziman bê.

Di rewşa fahmkirina elementên birehê de wê, li vir wê, kombînasyonên wan wê ji aliyekî ve wê, ew rewşa weke 'dûmanê û ankû rewşek gazî ku ew di rengê de ew xwe ji hebûna qaşayê di demên sermayê de dide nîşandin jî wê, di rewşa parastina wê de wê, giring bê. Em vê yekê wê, bi giringî wê dikarin wê werina li ser ziman. Di çerçoveya wê kombînasyonê de wê ne tenê ji avê ku ew dîkelîya ku ew ji avê çêdibê wê, ew û barana wê hebê. Her wusa wê, berf û tayrok û hwd jî wê, di wê çerçoveyê de wê, hebin. Ber vê yekê wê, weke aliyekî giring wê parastina wê ahengê wê bo rewşa jîyanê jî wê giring û jîyanî bê. Rewşên weke yên bi dîkelîyê û elementên ve re ku ew dibê wê, bi wê re wê baran wê biafirê. Lê bi wê re wê biheman rengê ew kombînasyonên ku wê berfê wê bidina barandin wê, bi heman rengî wê, ew jî wê, kombînasyonên wê yên bi elementên wê re wê hebin. Li **herêmên ku wê qaşa wê zêde hebê û ankû wê dayimî wê qaşa wê li wê hebê wê, baran nebarê.** Wê yan wê tenê serma wê hebê û yan jî wê li kevîyên wê yên nizm wê berf wê zêde bibarê. Ev jî wê, bi rewşek ahengî re wê, xwe di vê çerçoveyê de wê, bide nîşandin bê.

Em î ro wê, rewşa birehê ji ya demên berê weke ku em zêdetirî xwediyê zanînê na. Lê di demên berê de jî wê, ne hindik wê xwediyê zanînê bin. Wê di derbarê rewşên barînên weke baranê, berfê, teyrokê û hwd de wê, xwediyê hizrên xwe yên demî bin. Wê ew jî wê, li gorî têgîn û têgihîştina wan wê, vegotîneka wan wê hebê.

Rewşa birehê wê weke rewşek stêrzanîkî û ankû astronomîkî wê, xwe di vê çerçoveyê de wê, bi giringîya xwe ya bi girêdanîya jîyanê a bi wê ve re wê mirov karibê wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov wê, di vê rewşê de wê, weke rewşek teybet wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşên weke yên azmanî ku ew bandûra wan li ser jîyanê heya wê, gûtiyî wê xwediyê têgîneka pêşketî bin. Wê di vê çerçoveyê de wê, bi şîroveyên xwe yên teybet û cûda re wê, teqez wê bawer bikin ku wê bandûrek li jîyanê jî rewşên azmanî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, di nava stêrzanîya xwe de wê, hertimî wê bikin ku ew xort herin û wan rewşan wan fahmbikin. Rewşên weke çêkirina

qûleyên bilind ên bo lêkolinên stêrzanîkî û hwd wê, di dema wan de û di demên piştî wan ên weke demên hûrî, mîtannî û medîya de wê, bi awayekî zêde pêşketî wê hebin.

Di rewşa stêrzanîya gûtfyan de wê, gelek rewşên ku wê bi rewşên fahmkirina jîyanê re wê, werina li ser ziman wê, bi vegotinên jîyanî re wê, werênina li ser ziman. Em di vê çerçoveyê de dikarin bêjin ku wê, têgîna astrolojîya gûtfyan wê belesebep wê zêde pêşketî bi rewşên stêrzanîkî re wê nebê. Wan rewşên bi vegotinên astrolojîkî wê bi têgînên stêrzanîkî wê rewşên jîyanê wê werênina li ser ziman. Wê weke têkiliyeka stêrzanîyê û ankû astronomiyê wê astrolojîyê wê ew bikarbênin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rewşa wê, bi teybetî wê werênê li ser ziman. Mirov wê çawa wê bijî, wê li gorî çi rêgezê wê bijî û hwd wê, di vê rewşê de wê, di temenê wê de wê rewşek stêrzanîkî a bi têgînî ku ew hatî bi watekirin di bingihê wê de wê hebê. Li gorî wê, bihizirin. Hizirkirina li azmana wê, di vê çerçoveyê de wê, weke hizirkirina li lêgerfina li sedemên rengên jîyanê jî bê. Bi vê rengê wê, ew wê têkiliyeka stêrzanîyê wê bi jîyanê re wê dênin. Wê li ser wê têkiliyê re wê jîyanê wê werênina li ser ziman. Her rewşên stêrzanîkî ku ew dihên pêşxistin wê, bi wan re wê, têgîneka jîyanî wê were hanîn li ser ziman. Fahmkirina jîyanê bi têgînê stêrzanîkî wê ji aliyekî ve wê bi têgînên astrolojîkî bê. Lê ev têgîna astrolojîkî ku em bahse wê dikin wê, ne ew têgîna astrolojîkî a roja me bê. Em nikarin wê, di vê çerçoveyê û mantiqê de wê werênina li ser ziman. Wê temenekî wê astrolojîya demên bûhûrî a li ser têgînên felsefîkî, mantiqê û hwd wê, hebê. Wê bi wê re wê, were hanîn li ser ziman. Wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring mirov, dikarê wê, werênê li ser ziman. Têgîna astrolojîkî a demên bûhûrî wê ji aqil, felsefe û têgîna mantiqê û hwd re wê vekirî bê. Wê hewl bide ku ew temenekî dîyardeyî di jîyanê de ew ji xwe re wê, werênê li ser ziman. Li ser wê re wê bikê wê gotinên xwe wê ava bikê. Wê têgînên xwe wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de mirov nikarê bi wê derkeve dervî têgîna stêrzanîkî a rast.

Di çerçoveya têgîna stêrzanîkî a rast de wê, têgîna rastteqînîyê wê were lêpîrsîn û hanîn li ser ziman. Di têgîna stêrzanîkî a rast de wê, têgîna rastteqînîyê wê, were lêgerîn. Wê li gorî wê, were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê, gîyanê, laş û têgihîştinê wê, bi wê re wê, di çerçoveyê de wê werênê li ser ziman. Gîyan, laş û têgihîştin wê, di rewşên stêrzanîkî ên roja me de û ankû têgîna stêrzanîyê a hemdem wê bi têgîna fîzîk, zêhn û hiş re wê were li ser ziman. Di rewşa ku mirov li 'gîyanê û aqil' bihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê regekî hizirkirinê wê, bi têgîna stêrzanîkî a gerdûnî re wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin. Li vir wê, gîyan û aqil wê, di rewşa têgîna stêrzanîkî de wê, li wê were hizirkirin. Di aslê xwe de wê, di têgîna stêrzanîya demên berê de wê, gîyaneka ku ew dervî fîzîka laş ku ew 'heya' wê li wê were hizirkirin. Ev jî wê, di temenê têgînên li dora wê ku wê werina pêşxistin ên weke bi têgînên hilkişîna li azmana û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Li vir em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, gîyan dervî laş û bi aqil wê, weke rewşeka ku wê di valahiya fezeyî de wê, xwediyê rewşên bi tevger ên zêdetir ku ew dikarê bikê bê. Li vir wê, mirov wê çima wê bi laşê xwe re wê, di jîyanê de ku ew dijî wê nikaribê hilkişê li azmana. Wê li dijî rewşa kişîna kütleyê wê xwe bide dîyarkirin? Di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê, têgînên stêrzanîkî ên serdemên berê wê hinekî jî wê, bi awayekî ku wê weke nepenîyekê wê bibînin wê, li vê rewşê wê bihizirin. Wê gelek hizrên xwe wê li dora vê têgînê wê werênina li ser ziman.

Di serdemên berê de wê, di destpêka pêşketina aqil de wê, mirov wê, li hemberî rewşên ku ew dibin wê bi aqilê xwe re wê di hişkirin û fahmkirina xwe de wê kêmbê.

Wê ber vê yekê wê xwe kêr hîs bikê. Minaq wê roj wê, bi rohnîya wê ya dijwar re wê nikaribin wê fahmbikin. Wê rewşa barîna baranê, berfê, tayrokê û hwd wê, nikaribin wê, werênina li ser ziman. Ber vê yekê jî wê, zêdeyî wê, ev rewş wê bina sedema ku wê li pişt wan kirin û ankû bûyînan ku wê weke 'hêzeka ku ew dikarê wê bikê' wê hebê wê, di mejiyê mirov de wê bide afirandin. Ev jî wê, hin bi hin wê, bi gotina 'xwûdê' re wê, şenberiyê wê bi xwe re wê bistênê. Bi demê re wê, ev rewş wê, zêdetir bibin. Dema ku aqilê mirov zêdetir pêşket û pêde wê, derkeve dervî sînorê xwe û wê li dervî sînorên dunyê wê di gerdûneka ku ew dunya jî di wê de wê bijî wê bikin ku ew wê kifşbikin. Di vê çerçoveyê de wê, hewldanên roja me ên kifşkirina gerdûna me bi rewşên wê yên fezeyî re wê, weke hewldanna ku wê di çerçoveya wê hebûna gerdûnê de bin. Mirov wê, di aqilê xwe de wê, derkeve dervî sînorên xwe. Wê hebûna gerwêrkên din kifşbikê. Wê rewşa stêran wê bi elementên ku wê, di afirênin re wê kifşbikin. Wê rewşa qûlkên rewş wê kifşbikin. Wê têgîna galaksiyên din ku ew hena wê bidest bixin. Î ro mirov, li fezeyê, bi derketina wî ya li fezeyê re wê, bikeve lêgerîna gerwêrk, galaksi û di wan de hebûna zindiyên din ên mihtemel ku ew hena û ankû ku ew dijîn. Di serdemên berê de wê, weke ku mirov wê di stêrzanîya gûtiyan de wê kifşbikê wê, bawer bikin ku wê li azmana li deverna din wê jîyan û ankû temenê jîyanê wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ew wê werênina li ser ziman. Feze wê, di wê çerçoveyê de wê bê qadaka lêgerînê jî mirovan re. Mirov wê di roja me de wê, ne zêde jî bê wê karibê hinekî pêde herê. Lê wê, di rewşa fezeyê de wê, heta deverêkê wê karibê pêde herê. Hin bi hin wê, bi pêşketina teknîk û teknolojiyê bi rewşên têgîna fizîkê û hwd di ahengekê de wê, temenê pêşketinên di wê warê de jî wê biafirênê. Teknoloji wê, ji aliyekî wê aliyê wê yê ku mirov wê di çerçoveya têgîna stêrzanîyê de wê werênê li ser ziman wê, li ser rewşên kifşkirin, dahûrkirin û naskirina wê re bê. Di roja me de wê, bi pêşketina teknîkê û teknolojiyê re wê kifşkirinên mazin wê d warê stêrzanîyê û ankû astronomiyê de jî wê werina kirin. Di sedsale 2an kifşkirinên di warê fizîkê de ku wê werina kirin wê, di rewşa stêrzanîyê de wê, weke kirina şoreşekê jî bin. Wê rewşên weke bi kifşkirina gerwêrkan û pergale rojê û hwd wê, di destpêkên serdemên navîn de wê hin bi hin wê werina kifşkirin. Li kurdistanê zane û filosofên kurd ên weke **Fexredîne Xelatî**, wê bi lêkolînên xwe yên stêrzanîyê re wê, di warê têgîna stêrzanîkî a hemdem de wê weke gavek girîng bê. Di dewama wî de wê li gelemperîya cihanê di demê de wê zane û filosofên weke Kopernîkûs, Kapler, Gelfleî, Newton û hwd wê, derkevin. Ev zane û filosof û hinek zane û filosofên din wê, têgîn û teorîyên fizîkê ên weke yên Arîsto û hwd wê, di ceribandîne de wê cerbas bikin. Wê li ser wê re wê, di serdema navîn de wê, têgînên xwe yên stêrzanîkî û fizîkî wê biafirênin.

Çendî ku wê têgîna stêrzanîyê û ya fizîkê ya serdemên navîn wê li ser rexnegirtina li ya serdemên kevnera (antîk) re wê pêşkeve wê, bi heman rengê wê ya serdemên piştêrê ên sedsale 19 û 20an jî wê bi rexnegirtina li teorî û têgînên serdemên navîn ên ku ew bi vê rengê hatina pêşxistin re wê pêşkeve. Di vê çerçoveyê de wê, di xatekê de wê, pêşketin û pêşveçûn wê bibê. Piştî dema jinûvebûnê û ankû ronensansê wê, felsefeya ku wê were kirin wê, pêşî wê weke felsefeyek rexnegir a di vê çerçoveyê de bê. Zaneyên weke Einstein wê di vê demê de wê derkevin û wê li ser rexnegirtina li hizrên Newton re wê, teorîya xwe ya fizîkê a weke 'teorîya dîtbariyê' wê bi 'teybetî' û 'gîştî' ya wê re wê pêşbixê.

(*)Zerwan wê weke hebûna demê û gerdûnê û bavê ahriman û ahûra mazda jî bê.

çerçoveyê de mirov, dikarê di dewama wê de wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, li fezeyê wê, valahî wê were çi wateyê? Mirov dikarê wê valahiyê çawa û bi çi têgînê wê fahmbikê? Li vir di aslê xwe de wê, ev wê, weke aliyekî pîrsî ê ku em wê, bi demê re wê hildina li dest û wê fahmbikin bê.

Di rewşa fahmkirina hebûna valahiyê de wê, weke rewşeka fezeyî a bi wûcanî ku mirov dikarê wê bi têgîna demê re wê werênê li ser ziman. Lê ev jî wê demê wê, ji me bixwezê ku sînorekî wê hebê mirov wê jî zanibê û ankû xwe gihandibê wê. Di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî wê, xwe bide diyarkirin. Di rewşa têgîna demê de wê, wûcan û ankû mekan wê, weke heyîna fezeyî wê hebê. Li vir, hebûna fezeyê wê, weke 'hebûnêka cismî' wê hertimî wê di mejiyê mirov de wê, xwediyê şaqqirinekê bê. Ber vê yekê mirov li vir mirov, dikarê vê yekê jî wê bi bîrbikê ku wê, di nava civake kurd de wê, di hinek rengên hizirkirinê ên li ser gerdûnê de wê, feze wê, weke têgîneka navaroka wê jî wê, li wê were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê, mejiyekî kevn jî wê hebê. Mirov dema ku wê mejiyê dikê ku wê fahmbikê û li ser wê re bimeşê wê, bi wê re wê, ew wê were dîtin ku wê, weke rastîyeka kirdeyî wê têgîna gerdûnê wê di xwe de wê hebûna fezeyê wê, weke rastîyeka bûjenîyî wê, bikê ku ew bi me bide têgihîştin û fahmkirin.

Hebûna fezeyê wê, di serdemên hemdem de wê, li ser wê, pîrr zêde wê, hizirkirin wê pêşbikeve. Piştî ku di salên 1916'an ku wê, têgîna *teoriya dîtbarî a giştîyê* a Elbert Einstein ku ew hat pêşxistin û pê de wê, zêdetirî wê li ser wê, were sekin in. Teoriya dîtbar a giştî wê hebûna fezeyê, kişnaardê û tevgerên ku ew din wê, ji xwe re wê bikê mijar. Rewşa têgîna teoriya dîtbar a giştî wê, ji hinek aliyan ve wê, bi rewşa fizîkê û tevgerên wê re wê, li ser têgînên Newton re jî wê, werê li ser ziman. Lê di vê teoriya Newton de wê, têgîna kûtleya cîsman ku ew bi hevdu ve girêdayî ku ew hevdu dikişênê wê, nebê. Di sale 1859'an de ku wê gerwêrka tîrê ku wê ji rêgeha wê xîşiqîn ku wê di wê de wê bibê ku ew dihê kifşkirin wê, bi wê re wê dema ku ew bi teoriya dîtbarîyê re hat hanîn li ser ziman wê, weke aliyekî giring ê vegotina wê teoriyê jî wê, werênê li ser ziman. Li vir bi gotinekê jî bê ku mirov destûra teoriya dîtbar wê, werênê li ser ziman wê, bo fahmkirina mijarê û dewamkirina mijarê wê giring bê. Li vir bi vê minaqê mirov dikarê wê bi zimanekî hesanî wê werênê li ser ziman. Mirov farz û hizir bikê ku mirov, di hundûrê qûtîyêkê de ya. Ev ew bêî ku rastî ti kişîna cisimna bibê di valahîya fezeyê de disekinê. Di hundûrê vê qûtîyê de devereka ku wê derfetê bide we ku win derve bibînin wê nebê. Mirov hasab bikê ku giranîya qûtîyê bi ya mirovê di wê de wê, weke 100 kîloyê bê. Ku ew mirov qûtîyê bi hêzeka li dora 1000 bi tahfênê wê, leze li dora 10 wê bistênê. Ew tevgera ku ew bi li dora 10'an ku ew bi qûtîyê re çêbû wê, yê hundûr jî wê, bi dewîsînê bi xwerê û ankû binê wê ve. Wê ew mirovê di hundûrê wê de wê, wê hêze tahfandinê a li dora 10an ku ew bi wê hat û li ardê danî wê, bihizirê ku wê, kişîna ardê wê li dora 10an bê. Wê bi wê hêza tahfanê a ku ew bi wê hatîya dewîsîn wê, li dorî wê li kişînardê jî wê bihizirê. Ankû wê weke wê, bihizirê. Ew qada ku ew di wê de dihê dewîsîn wê weke 'qada kişînê' bê. Bo ku mirov wê baş fahmbikê ku ew, yekî ku dervî wê rewşê ku ew li wê dînerê wê, rewşa wê ji yê di hundûrê qûtîyê de wê, baştir wê fahmbikê. Li gorî têgîna teoriya dîtbar a giştî bo ku ew kişînê cismê ew baş were fahmkirin mirov, divê ku hebûn û rewşa qada fezeyê wê, baş zanibê. Ev jî wê, weke aliyekî giring ê wê bê. Ber vê yekê, di rewşa vegotina têgîna teoriya dîtbar a giştî de wê Einstein wê serî li geometrîyê wê bixê. Di sale 1916'an de wê Einstein wê, teoriya

dîtbar a giştî de wê, werênê li ser ziman ku wê cism wê, rewşa geometrîya fezeyê xira dikê û rastîya wê bi tawênê re wê temenê kişîna kûtleyê wê pêşbixê. Wê vê jî wê, bi darêjk bikê wê geometrîya Riemann wê bikarbênê.

Di rastîyê de wê, bi xirabûna awayê fezeyê re wê, gelek rastîyên ku ew werina ceribandin wê derxê li holê. Şîroveya têgîna teorîya dîtbar a giştî jî wê, xwe bi şîpêrê encamên wan rastîyên ku ew derdikevina li holê. Mîrov dikarê vê rewşa weke bi gotina 'xirabûna fezeyê' re wê, li ser rêwîş rohnîyê re wê hilde li dest. Ji rojê hatina rohnîyan li dînyê wê, bi pêlên wê û hêza tahfandiina wan pêlan ku ew weke hevdûya bê. Rewşa pêlan wê weke xelekên li dûv hevdû wê çêbikê. Ev jî wê, ne qadaka rastarast lê wê qadaka weke ne rast wê, derxê li holê. Di vê çerçoveyê de wê, rohnî wê bi wan pêlan re wê weke qûrîfênê wê bi her pêlê re wê bi xwe re wê bixê û wê were. Her pêl wê, çendî ku wê weke gavek li pêş bê wê, weke hinekî kêmbûna rewşa hêza tahfandna kûtleyê a pêlên rohnîyê ku ew ji destpêkê bûna bin. Ji rewşa destpêkê û heya ya dawî wê, di hêza wê de wê, ji pêlê heta pêlê wê, gûharînen piçûk û ankû mazin wê li ser wan qûrîffinan re wê bibin. Li ser rewşa rohnîyê jî mirov dikarê vê wê, werênê li ser ziman ku wê, roj wê, weke devere herî rohnî bê. Elementên ku ew wê pêdixin weke bi rohnî wê, ew element wê, stêran de jî wê hebin. Minaq dema ku girtina rojê bû û têkiliya wê bi stêran re qûtbû wê, rohnîya wan wê kêmbibê. Wê werina wê astê ku ew newina dîtin. Li vir ya ku wê, were dîtin û fahmkirin wê ew bê ku ew elementên ku ew bi têkiliyekê li ser wan pêlên ji rojê ên rohnîyê ku ew dibin re wê, di vê rewşê de wê digihijina stêrê wê, heman elementên di wê de wê bitevger bikin. Wê, ber vê yekê wê weke temenekî wê yê rohnîbûnê wê, di wê de wê hebê. Mîrov dikarê wê, bi şîbihênê wê rohnîya ku mirov berê aynikê dide rojê û wê rohnîya wê, ji aynikê dide devereke ku mirov dixwezê. Li wir wê qûrîffina rohnîyê wê, ji aynikê wê destpêbikê. Lê di aslê xwe de wê weke dîmenekî dîyem wê di aynikê de wê, weke xateka herî dirêj a di wê de wê, bi ya ji aynikê û pê de wê, di têkiliyê de bê. Aliyê hundûrê aynikê wê, weke dîmen bê û dervî aynikê wê, ne ew bê.

Di rewşa hebûna biriqîna rohnîyê de wê pêlên hatina wê, wê bi wê re wê xwe bidina dîyarkirin. Li ser wan re wê, ew were dîtin. Pêl wê, di rewşa ragihandinê de wê, li dûv hevdû wê bi hevdû re wê, di têkiliyek ahengî de bin. Li vir wê, rewşa kişîna kûtleyê wê bi rewşa kişîna ardê re wê wê, were dîtin. Di rewşa kişîna ardê de wê, çendî ku wê weke bi zêdeyî wê li gorî leze rohnîyê wê were dîtin jî lê wê di nava wê de wê hebûna pêlkên ku ew hena jî wê bibê. Lê wê ya serdest wê, leze rohnîyê bê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê li rewşa li dora rojê bi rêgehî gerîna gerwêrkan jî wê werênê li ser ziman. Minaq wê, rewşa gerîna dînyê li dora rojê û di xwe de li dora xwe bixwe gerîna wê, wê bi hevdû re di ahengekê de bê. Wê dema wê gerîna dîdîmenî wê wekehevdû bê. Di vê rewşê de wê, her gerwêrk wê di rêgeha xwe de wê bigerihê.

Di rewşa têgîna teorîya dîtbar a giştî de wê, aliyekî din ê bi têgînî ku ew dihênê li ser ziman jî wê bi têgîna 'firehbûna fezeyê(*)' re wê, were li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê, di rengekî bêsinor lê ku wê wê xwediyê dawîyekê bê wê li wê were hizirkirin. Di rewşa hebûna stêran de wê, di roja me de wê ew were kifşkirin ku ew xwediyê temenekî

(*)'Firehbûna fezeyê' wê weke têgîn û teoriyeka ku wê cewherê teorîya einstein a roletiviteyê a giştî û teybet wê biafirênê. Lê aliyekê din jî wê bi şewayê weke 'kişîna ji hevdû' bi giraniya cismê' re jî wê, weke li ser rojê û ankû gerwêrkên bi wê rengê wê bînen ser ziman.

na. Di rewşa firehbûnê de wê, wê dema ku mirov wê bikê wê fahmbikê mirov, divê ku wê, giştîya fezeyê wê li berçav bigirê û wê têbigihê. Ji nûqtetek destpê bikê û were nûqteya din. Li vir wê, ev ji nûqtetekê destpêkirin û hatîna nûqteyan wê, weke ku mirov li dûnyê bihizirê ku ew rast weke tepsîyekê ya. Lê ji nûqteya ku me destpêkir ku mirov were dîsa heman nûqteyê. Dûnya gilover a. Wê, dema ku mirov wê hebûna wê bi şibihênê gokekê wê, bi wê re wê, were dîtin ku mirov ji kîjan nûqteyê destpêbikê û rastarast herê wê bi zîvîrê û wê were û bigihijê heman nûqteyê. Di sale 1927 de wê, Georges Lemaitre wê ji hev kêşeyên teorîya dîtbar a giştî wê encamên ku ew derdixê wê bi matamatîkê wê dênê li holê. Piştî wê, ne bi gelekî re wê Edwin Hubble lêkolînên ku ew li ser stêran dikê re wê, kifşbikê ku ew rohnîya ji wan tê wê bi qûlibê li rengêkî sor. Ev rewş jî wê, piştî wê bi têgîna "bandûra doppler(*)" re wê têkilîya wê were danîn. Têgîna bi bandûra doppler jî wê, ew bê ku wê, bi wê re wê werê hanîn li ser ziman ku wê cismekî ku ew di tevgerê de bê û dema ku ew ji me dûrdikeve wê pêlên ku ew dişênê wê bi wê dûrketina wê re wê zêde bibin bê. Ev jî ku ew di lêhanîna rohnîyê de ku ew dihat kirin wê, bihanîya li ser ziman ku wê, wê bi rengê cismekê ku ew di tevgerê de ku ew dûrdikeve wê rohnîya ku ew bişanda wê bi qûlibîyana li rengê sorê bê. Ev têgîna Hubble wê, bi reng û şîroveya ku ew her cismên li fezeyê ku ew ji hevdû dûrdikevin ku ew dihênê li ser ziman wê, weke têgînek û birhaneka ku wê ji teorîya firehbûna fezeyê re jî bê. Ev rengê hizirkirina bi teorîkî wê bi xwe re wê hinek şîroveyên din jî wê werênê. Ew jî wê, ew bê ku wê, were hizirkirin ku wê, dema ku wê her cism ku ew ji hevdû dûrdikeve wê, demê ew divê ku ew di demekê de ew bi hevdû ve bin. Ji hevdû dûrketina wan wê, di vê çerçoveyê de wê, çendî ku wê weke nişanayeka firehbûnê wê were hanîn li ser ziman wê, bi wê re wê weke têgîna û teorîyeka ku wê bi xwe re wê temenê teorîya 'taqîna mazin' û 'destpêka' wê re jî wê, bi xwe re wê werênê li holê. Li gorî wê teorîya 'taqîna mazin' jî wê, were li ser ziman ku wê, destpêkek wê bi wê re wê bibê. Bi wê re wê, were li ser ziman ku wê, piştî wê re wê feze wê li dora 15 milyar salan wê xwediyê dîrokeka bi demî û fezeyî bê. Di vê çerçoveyê de wê, ku wê di temenê wê de wê hebê têgîna teorîya dîtbar a giştî wê, were li ser ziman ku mirov wê bi her aliyê fezeyê ve rêwîtiyê bikê. Lez, dema ku ew çendî zêde dibê wê dem wê kin bibê. Di vê çerçoveyê de wê, weke di hundûrê demek kin de rêwîtiyek pîr zêde kirin wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşek bi derfet a di fezeyê de wê, di mejiyê mirov de wê biafirê. Ev jî wê, dema ku mirov, minaq di mejiyê xwe de tefkîr bikê ku mirov keştiyek fezeyê çêdikê û ew keştî ku ew di rêwîtiya xwe de ku ew bi lez herê wê û ku ew karibê sad qatî zêde li leze rohnîyê ew zû herê wê, şînorê fezeyê ku ew mirov bi têgîna wê ya destpêkê û 'taqîne' re wê, li wê dihizirê wê, nêzî wê bibê. Di wê şînorê û wîrdetir wê çi hebê? Yanî wê, taqîne wê çi hebê? Ev wê, weke pîrseka ku mirov ew di mejiyê xwe de ne xwediyê wê ya.

Li vir mirov dikarê vê jî bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, bi awayekê rêwîtiya bi qada fezeyê re wê, di reng û şêwayekî de wê weke rêwîtiya di demê de jî bê. Li vir wê, asta leze firehbûnê û ya demê wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê dengî hevdû bê.

Ya ku mirov wê li vir wê fahmbikê wê, di serî de wê, hebûna salixkirina demê bê.

 (*) Bandûra doppler wê li gorî her rewşên ku wê xosletê pêlbûnê wê bide nişandin wê, kesê ku ew li wê dînerin wê di dema cuda de ku wê derkbikê bê. Li gorî wê, yekê çavdêr wê, heta ku ew pêla dîtîne bigihîyê de wê, dem wê bi ser ve wê derbas bibê. Wê di demekê cuda wê ew wê bibîne. Li gorî destûra bandûrê a doppler wê, dema ku ew dihê hasabkirin wê koka pêlê, rewş çavdêr, wûcan, alî û lez wê werina hasabkirin.

Salixkirina demê wê, li gorî ku mirov kîjan nûqteyê referans digirê û dipîve wê, li gorî wê bê. Mînaq em, bi vê rengê li rewşê bihizirin. Em li rewşa trenekê bihizirin. Ku yek di hundûrê trenê de bê û yek li ardê bê wê, herdû wê ji aliyê xwe ve wê xwedîyê nerîna xwe bin. Em tefkîr bikin ku wê, tren di leza xwe de ew diçê. navbera herdû çavdêran jî ku ew weke hevdû dîr bê. Dema ku wê, yê di trenê de ku ew rohnîyê bibînê wê, yê di trenê de wê li gorî wê bibînê û wê bêjê ku ew rohnî bi carekê da herdû aliyan. Lê yê li ardê wê, ku ew jî heman nûqteyê wê nebînê. Wê ew ji aliyê xwe ve wê bibînê.

Di rewşa hebûna demê de mirov dikarê vê yekê wê werênê li ser ziman ku wê, di hundûrê demê de tevgerên ku ew dibin wê leze ku ew bi wan dibê wê, di rewşa kinbûn û ankû dirêjbûna demê de wê, weyn bileyizê. Di vê çerçoveyê de em, mirovekî ku ew, bi gavên xwe yên hêdfîka ên esasî wê meşekê bikê û wê kîlometreyekê wê seatekê de wê. Lê yekî din ku ew bi bazê diçê wê, ew wê navbera ku ew mirov di seatekê de meşî wê ew wê di 10 daqêqayan de wê qadbikê. Di vê çerçoveyê de wê, di navberê de wê, 50 daqêqa wê weke dema ku ew hatîkirin a demê wê xwe bide nîşandin.

Têgîna 'dîtbar' a klasîk û 'teorîya dîtbarîyê'

Li vir wê hebûna demê wê, di dîtbarîya wê de wê, weke ku ew bo herkesekî weke hevdû bûhûrîner bê. Lê li vir wê çîwar û wûcane wê, wê bandûra wê, li ser hebûna rewşên mekanîkî wê hebê. Mînaq em dû mirovên ku ew herdû bi hevdû re hatina dînyê wan bîna li berçav. Yek li dînyê wê, bijî. Yê din jî em tefkîrbikin û wê bikîna keştîyek fezeyê û wî bişênina fezeyê. Piştre bi ser ve 50 sal bila derbas bibê. Mirovê ku me ew rêkirî li fezeyê bi keştîyê ew wê, vegehihê û were cem yê din. Wê di nava wan herdûyan de wê, rewşa wan de wê bi demê re wê yek weke ji yê din kaltir wê xwe bide dîyarkirin. Yê li dînyê wê bandûra kişîna kûtleyê wê li dema ku wî bûhûrandî wê hebê. Ew rewşa kişîna wê, aliyekî wê yê giring wê, di vê çerçoveyê de wê weke di rewşa mirovê li dînyê de wê, bandûra xwe wê bide dîyarkirin.

Heta roja me jî wê, weke gotineka ku mirov wê di jîyane xwe de wê, dihênê li ser ziman ku wê dema ku 'mîrov wê, di demek kin de pîrr zêde karbikê. 'Di hundûrê demek kin a kifşkirî de kirina karekî zêde wê, di vê çerçoveyê de wê, bi zêde tevgerînê re wê kinkirina demê wê, werê kirin. Mînaq î ro, em dema ku li ser ast û pîvana pêşketinê de dîrokê bi pêşketinên wê yên şariştanî re wê, dihênina li ser ziman em wê, dibêjin ku "wê, demên roja me wê, ji yên berê wê kintir bin." Ev jî wê, di vê rewşê de wê, di vê çerçoveyê de wê were li ser ziman bê. Li gorî têgîna *teorîya dîtbar a teybet* jî wê, bi tevgerê wê cism wê dirêjehîya wan wê kin bibê û wê dem jî wê kort bibê. Li vir wê ya kifşkar wê tenê tevger nebê, wê bi pergala referansên ku me bijartina re tevger bê. Aliyekî têgînî ê têgîna teorîya dîtbar a teybet wê ew bê ku wê, ew bê ku wê hevyeke(wekhevî)ya kûtleyê û vejenê bê. **Kûtlê û vejen** wê, weke dîmenê hevdû ên jî hevdû cûda bin. Li gorî wê cismekî ku ew bisekna wê, kûtleya vejene wê, wê bi leze rohnîyê re wê weke hevdû bê. Bi dîtbarî ku cism leze wê di tevgerê de zêde bû, wê hebûna wê piçûk bibê û wê dem jî wê kort bibê. Bi mînaqe avê re mirov dikarê wê, ji vê aliye ve jî wê werênê li ser ziman. Ku av dikelê wê kûtleya wê zêde bibê? Bersiv wê, ji vê re wê herê bê. Cism ku çendî lez wê zêde dibê wê, vejene wê jî wê, zêde bibê. Di wê asta ku ew leze wê gihişt ya rohnîyê de wê, demê wê bo ku piçekî jî bê ku ew leze xwe zêde bikê wê pêwîstî bi vejenek pîrr zêde wê hebê. Di rewşa hizirkirina li fezeyê de wê, ev rewşên ku ew bi teorîya dîtbat a teybet re ku wê werina pêşxistin wê, bi xwe re wê

weke tégînekê wê bide hanîn li ser ziman ku wê feze wê di awayekî çar-dîmenî de wê were li wê hizirkirin. Bi tégîna teorîya dîtbarê re wê, Einstein wê, bo ku wê rewşê were fahmkirin jî wê, matamatîka heman Minkowskî ku wî pêşxist û di kongreya fizîkî a sale 1908'an de wî hanî li ser ziman wê, di vegotina xwe ya wê çar-dîmenî a fezeyê de wê bikarbênê. Filosofê ingilîstanî Bertrand Russell wê, minaq pêpelokên ku ew dimeşin wê bo fahmkirina lezê û ankû lezê li gorî leze rohnîyê wê, bide û wê bênê li ser ziman ku "wê dema ku pêpeloka dimeşê ku ew meşî, wê bi li jor sekna wê re wê herkesek dizanê ku wê zû derkeve li jor. Ku ew pêpeloka bi meş ku ew bi leze rohnîyê herê û an jî ku ew sekinî jî bê wê, di heman demê de wê bigihîjê li jor. Bi wê re jî fizîkvanan bi xwestek bê û ne bi xwestek jî bê wan, mecbûr mana ku ew leze rohnîyê weke leze herî bi lez wê herê bikin." Di rewşa fahmkirina tégîna 'tevgerê' û ankû 'bêtevgeriyê' de wê, li vir wê, were dîtin ku wê, destpêka derketina li holê a tégîna teorîya dîtbar bê. Berî wî wê **Newton** jî wê, li ser wê 'destûra bêtevgeriyê' wê bihizirê û wê werênê li ser ziman ku "wê cismekî ku ew di tevgera xwe ya rastarast de ku ew diçê wê, heta ku hêzek li wê bandûrê nekê wê, ahenge xwe de wê tevgera xwe wê bidomênê." Minaqe di trenekê de ku wê makenîst wê, dema ku ew lingê xwe didênê li ser firenê ku ew bide sekinandin wê, tren wê bixwezê ku ew herê. Bi heman rengê ku mirov li ser trenê hizirkiirna xwe bidomenê ku wê gelek wagonên trenê wê li dûv hevdu wê bikişênê de wê ya ku wê, trenê dide sekinandin jî wê destûreka bêtevgeriyê bê. Li gorî destûra bêtevgeriyê wê, di dewama wê de wê were hanîn li ser ziman ku wê hêze tahfanê wê bi hêzê re rast, lê wê bi kûleyê re wê birêja û ankû hevyekek bê.

Bi wê re ku mirov, li wê rewşê dihizirê wê, ya ku wê were dîtin li berçav wê, ew bê wê, weke ku wê di nava cismê û zûkahîya û ankû tahfanîyê de wê, ti têkilî wê nebê. Li vir mirov di dewama wê de wê kifş dikê ku mirov fişalîya hewayê ji holê rabikê ku ew cism ku ew xwediyê çî giraniyê de wê, di heman demê de wê bikeve ardê de. Lê li vir mirov wê bihizirê wê, ew jî wê bi wê re wê were dîtin ku ew bi rewşa kişîna ardê re wê, kûtleya cismê wê zêde bibê. Bi wê re mirov divê ku wê jî werênê li ser ziman ku wê dema ku wê, çendî ku kûtleya cismê wê zêde bibê wê, bandûra kişînaardê wê ew jî wê li wê zêde bibê.

Di rewşa hebûna tégîna bêtevgeriyê de wê, ya ku wê, weke kûtleyê wê, li wê bê wê, bi wê re wê, bi tahfdaniyê re wê, pêşkeve. Minaq ku wê, miqnatîsek ku ew qatek hesin ew dikişênê wê, divê ku mirov bi wê qada manyatîkê ku ew diafirê re wê, bi wê re mirov wê werênê li ser ziman. Wê miqnatîs wê bandûrekê li hesin bikê ku ew bi ber wê ve û yan jî ji wê dûr herê. Rewşên kişînê jî wê bi wê rengê wê xwe biawayekî wê bidina dîyarkirin. Li vir wê, bi wê re mirov divê ku wê jî wê werênê li ser ziman ku wê di nava qada kişînê û ya tahfanîyê re wê têkiliyek xort wê hebê. Minaq wê, dema ku mirov herê serê avahîyeka 100 qatî û ji serê wê bi asansorê berdê xwerê wê, ew hatina xwerê wê ne tevgerêk rastarast bê. Wê yeka bi hêza tahfdanê bê. Minaq bi wê re em, li wê bihizirin ku mirov, di asansorê de ew ji berîka xwe hesinekî weke mifte û hwd derdixê û wê berdê li ardê. Ew wê, weke ku ew li hewayê sekinî bê wê, di rewşekê de wê di asansorê de wê bibê. Cismekî ku ew dikeve wê hêze tahfana wê, ji kûtleya wê cûda bê. Ev wê sedema wê, kûtleya kişînê û ya bêtevgeriyê wê ew rewş wê hebê. Di vê rewşê de wê, mirovê ku ew di asansorê de wê, ji rewşa xwe û tiştê ku wî dayî ardê wê fahmbikê û wê werênê li ser ziman ku 'wê, her cism xwediyê di sekneka sabît bê.' Di vê çerçoveyê de wê, di dewama wê de wê were dîtin ku wê, heta ku hêzek derve mudahaleyê li wê cismê

nekê wê, tevgerên xwe yên di ahengekê de wê bidomênê. Di rewşê de wê, destûrên fizîkî wê di rewşê de wê, bi rewşa asansorê re wê di rewşek teybet de wê bûhûriner bin. Asansor wê, bi hêza tahfanê wê, hêze kişîne li dervî rewşê wê bide hiştin. Yê di hundûrê asansorê de wê, rewşa tahfanê wê, beremberî ya hêze kişîne û kûtleya wê, wê bi hebûna xwe re wê hîs nekê. Rewşa hundûrê asansorê wê, di rewşek teybet de bê. Destûrên kişîne ên derve wê, di rewşa hundûrê asansorê de wê, wê bandûra wê hebê. Em hizirbikin ku ew asansor di rewşeka ku ew hêza kişîne de wê, ne kişîne. Di rewşek bi hêze kişîne a li ser kûtleyê re de wê, mirovekî li ardê ew tiştta ku ew di destê xwe de ew berdê wê, bi hewayê ve wê, bilind bibê. Heman mirovê di asansorê de ku ew, di hizirê ku ew berdê wê bikeve ardê de wê, ew dema ku ew tiştên ku wî berdan ku ew bilindbûn wê, ew weke hêzeke ne tahfanê wê di asansorê de wê bi xwe re wê, rakê. Di rewşa kişîne de wê, di nava rewşa kişînaardê û hêza tahfanê de wê, weke zêde ti farq tûneyî wê rewş wê xwe bide dîyarkirin. Wê rewşa yê ku ew ji hundûr ve ew li wê dihizirê wê bihizirê û wê bêjê ku 'mirov, nikarê bahse tahfanê bi asansorê re bikê. Tenê hêze kişîne lê serdest a. Li vir wê, mirovê di hundûrê asansorê de wê, tenê li rewşa xwe ya ku ew di wê de weke ku ew bi bêtevgerî sekinîya wê, li wê dihizirê. Lê di rastiyê de wê, hêzek tahfanê ku ew asansorê li dijî hêze kişîne wê digirê wê, ew hebê. Ya ku wî dibê ku ew kifşnekiribê wê, ev rastî bê.

Qada kişîne wê hertimî wê, kûtleya bêtevger wê bikişîne. Ber ku wê kûtleya bêtevgeriyê û ya kişîne wê, di hevîyekê de bê.

Li vir mirov dikarê di çerçoveya têgîna kişînaardê de serî li têgîna kişîna ardê a Einstein bixê. Einstein dihizirê ku wê di rewşa kişînaardê de wê *hêz* wê nebê. Bi vê rengê ku Einstein wê dihêne li ser ziman wê, têgîna kişînaardê wê, di çerçoveya qada kişîne de wê, cismên weke gerwêrkan ku wê ne pîvandina xûyên wan lê wê bo rêya ku ew cism dişopênin ku ew werina salixkirin re wê werênê li ser ziman. Dîsa li gorî wî wê, kişînaardê wê beşa ji rewşa bêtevgeriyê bê. Bi wê re wê, kişîna kûtleyê wê rewşeka tahfanê bê.

Einstein li wê hizirê ku wê kişîna kûtleyê wê, ne weke hêzên din bê. Di rewşa feze-demê de wê, feze-dem wê ne rastarast bê. Ew kişîna kûtleyê ya di hundûrê de ku ew ji hevdû belav dikê wê, temenê tawîna wê bê. Cismên weke dûnyê û hwd wê, li şûna ku wê di bin bandûra kişîne de wê rêgiha xwe wê xîzbikin wê, di tawîna fezeyê de wê, rêyeka rêgihî a jeodîzîkî wê bişopênin. Ev rewş wê, bo demê jî wê bûhûriner bê. Dema ku wê, di çerçoveya hebûna kişînaardê û ne di çerçoveya wê de wê, rewşên cûda wê bi hevdû demê re jî wê bidina dîyarkirin. Mînaq ku mirov wê, hejhejinên atomê ku wan bipîvê wê, dema ku wê di nava şert û mercên wê kişîne de wê, dem herikîna wê ji ya ne di nava şert û mercên wê de wê cûda xwe bide dîyarkirin. Kişîn wê, karibê demê hêdîka bide herikandin. Wateya gotina jeodîzîkî jî wê di nava dû nûqtayan de wê rêya herî kort û ankû dirêj bê. Li gorî wê, rewşa dûnyê wê di awayekî dîdîmenî de wê, fezeyaya tawîn bê. Di rêgeha xwe de gerîna dûnyê wê, çerçoveya wê ya jeodîzîkî jî bê.

Di rewşa fahmkirina têgîna jeodîzîkî de mirov dikarê vê mînaqe jî wê bide. Mirov tefkîr bikê ku wê mirov bi çireyên di destê xwe de wê, bi hevdû re wê di çolemergekê de ew wê digerihin. Di kaşekî de wê jî wê, weke cihekî herî bilind ku ew malek ku ew pîr bi rohnî ew heya. Di çolemergê de ku weke nûqtayan hatiya belavkirin wê gelek mal û xanî wê hebin. Ev mirovên bi çire jî wê, bo ku ew ji malan herina malan wê rêyên ku ew kifşin wê di wan re wê herin û derbas bibin. Di nava wan kaşên ku ew çolemerg

dorpêçkirina de wê mirov wê werê ber kaşên bilind û wê ku ew hê wê derbasnekirî wê, bigihijê malna. Ev rêyên ku ew ji kaş li kaş ku ew çendî tawandî û xwehr ew diçin ku mirov diçê serê kaş û li wê dinerê wê, weke ku ew çendî zîvronek, tawîn û xwehbûn di wan de hena, wê werina li berçav. Em li ser mînaqe xwe re wê jî li wê bihizirin ku mirov tefkîrbikê ku ew li ser pišta tayrekî mazin mirov sûwar a û bi wê re li ser wê qadê re difirê. Wê dema ku mirov ji jor li jêr dinerê wê, di herêmê de wê, ew xwehbûn, korçal, tawînekên rêyê, zîvronek û hwd wê newina dîtin. Tišta ku mirov wê bibînê ku wê, mirovên bi destçire bin û malên ku ew rohnîya wa pêketî weke nûqteyan bin.

Mirov dikarê vê rewşê di rewşa fezeyê de jî wê li wê bihizirê. Di nava rewşa fezeyê de ku mirov rojê weke kaş û ankû çiyayekî herî bilind w tefkîrbikê û herê ser wê û ji ser wê li binxwe binerê wê, hingî wê hemû tiştên li dora wê, wê, weke nûqteyna wê bi wê re wê werina dîtin. Ji rojê nerîn wê, heta devera ku ew rohnîya rojê pêlên diçin wê, werê dîtin. Di wê dema ku mirov wê mirov di rewşa nerîna li ser rojê re ku mirov li gerwêrkên din dinerê jî wê, ew wê were dîtin ku ew çawa rêyên xwe bo xwe dibijêrên. Wê bi wê re wê, ew jî wê were dîtin.

Di vê rewşê de mirov dikarê bihizirê ku wê, di fezeyê de wê kişîn wê nebê? Wê di rewşa heyîna wê de mirov dikarê wê bihizirê ku wê, kişîn wê weke rewşekê wê xwediyê wê heyîniya xwe ya heyî bê. Di rewşa hizirkirina li fezeyê de wê çar-dîmenîya Einstein a li fezeyê ku ew bi wê li wê dihizirê wê bê şibandin li lastîkeka ku ew ji hevdû di vezilêhê. Ev rewşa fezeyê ku mirov li wê dihizirê wê, bi wê re wê were dîtin ku wê, ti hundûrê fezeyê de wê, gelek tişt û gerwêrkên giran ku ew hena wê, hinekî jî wê, temenê wê ahenge wê ya nerm û hişk, giran û sivik û hwd bê. Di rewşa fezeyê de mirov dikarê wê şibandinê bi wê re wê bikê. Di rewşa tampolînekê de ku mirov wê li ser wê xwe di ziplênê wê mirov wê weke ku ew bi bilindbûn û ketina xwe re wê, rêyek xwehr wê bi şopênê. Heman rewşê ku mirov wê tišta ku ew di ziplênê ku wê kûtleya wê û giraniya wê zêde bibê wê, ew zêdetir wê xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin. Mînaq wê, hebûna rojê wê di hundûrê fezeyê de wê, weke cismeka pîrr mazin bê. Mirov nikaribê bêjê 'ew cisma herî mazin a.' Ber ku wê, fezeyê ku ew bi milyar salên fezeyê ku ew di mazinbûnekê de wê, gerwêrkên din ên ji wê mazintir dibê ku ew hebin. Lê di çerçoveya geleksîya me de wê, di nava wê de wê roj wê weke ya herî mazin bê.

Li ser rewşa fezeyê wê, di rewşa hanîna li ser ziman de wê, were li ser ziman ku wê fezeyê me wê bi awayekî ku ew dayimî mazin(fireh) dibê ya. Einstein dema ku ew hewldide ku ew wê werênê li ser ziman ku wê bi demê re wê bi awayekî çar-dîmenî wê bikê ku ew werênê li ser ziman. Di rewşa vegotin û hanîna li ser ziman de wê Einstein wê ji matamatîka Marcel Grossman wê sîdwergirê. Em î ro dema ku ew li dînya xwe dinerin wê, her zindiyên ku ew li wê dijîn wê bi awayekî jîyankirinê û tevgerên xwe re wê bi dîdîmenî wê bijîn. Lê aqil wê, weke awayekî dîn ê bi dîmenî wê derkeve li holê û wê li wê zêde bibê. Mirov bi aqil rewşa ku ew dijî wê, di çerçoveya wê de wê, bi qapasîteya xwe re wê, werênê li ser ziman. Wê sînorê fahmkirina wî xwe bide dîyarkirin. Mînaq mirovekî ku ew li fezeyê bijî wê, çawa fahmbikê ku ew feze fireh dibê û pêşdikeve? Di vê rewşê de wê, ya ku wê were li holê û wê xwe bide dîyarkirin wê, ew bê ku wê, mirov wê ji gavavêtinên xwe wê gavê wê biavêjê. Têgîna bi gotina qapasîteyê ku me hinekî li jor hanî li ser ziman jî me, di vê çerçoveya têgîna qada ku mirov wê dijî ku ew li ser wê serwaxt bê me, bi wê wateyê hanî li ser ziman.

Mirov wê weke zindiyekî ku ew di dînyê de ew diji wê, di destpêkê de wê, ne di hişê wê de jî bê ku wê dînya wê gilover bê. Wê dema ku em dîrokê li wê dinerin em wê bi wê re wê, di serdemên destpêkê ên şariştanîyê de wê fahm dikin. Wê di vê çerçoveyê de wê, ji vê rewşa têgîna me wê çî weke encamê wê derkeve li holê? Wê ya ku wê derkeve li holê wê ew bê ku wê ya ku em dibînin wê, hinekî wê encama ezmûnên me bê. Lê li vir wê weke aqilekî kifşkirina giloverîya dînyê wê, pêşî wê weke rastîyeka kirdeyî wê xwe bide dîyarkirin. Piştê li ser wê re wê, weke rastîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Her rastîya bi têgîna fizîkê re wê di vê çerçoveyê de wê, bi destpêka xwe re wê xwediyê têgîneka destpêkê a şûbjeyî bê. Pêvajoya ji têgîna şûbjeyê bi ber ya li ya objeyê wê, piştê wê bi kifşkirina objeyîya wê re wê bi ber şûbjeyîya wê ve wê temenê fahmkirinê wê bi xwe re wê biafirênê. Rewşa ahenge rêgehî a di nava rojê û gerwêrkên li dora wê, wê di çerçoveyeka ku wê bi kûtleyê û kişîna wê re wê, xwediyê rewşeka heyînî bê. Li vir wê, dema ku mirov di fezeyê de wê rojê wê weke kûtleyek mazin wê hizirbikê û wê weke ku ew di rêgeha xwe de ew di sekinê wê, kûtleya wê, wê bandûra wê ya kişînê wê bide çêkirin. Ji kûderê mirov dikarê vê fahmbikê? Dema ku wê, di rojê de wê, taqîn wê bibê û bapîsokên ji rojê ku ew dibînin wê ew bi pêlan ku wê xwe bi hewirdora wê re wê bidina dîyarkirin re mirov wê, dikarê wê fahmbikê. Bandûra wê kûtleya taqînê a li hewirdorê wê, li gorî hêza kûtleya kişînê wê xwe bide dîyarkirin. Mînaq wê, dema ku wê, bandûra wê taqîna ji rojê wê li hewirdorê wê bibê wê ew hatina bayê wê bapîsokê wê pêlan wê derbas bikê. Wê di vê çerçoveyê de wê, dema ku ew bayê wê bapîsokê hat dahma gerwêrkekê mînaq weke keywanê wê, qûrîfîna wê ji wê bibê. Ev jî wê, weke rewşeka teybet bê. Bayê wê bapîsokê wê karibê gerwêrkên weke keywanê, tîrê û hwd ji rojê bide dîrkin? Wê ahengeka wê kûtleya dîrkinê wê bi hebûna rojê û bi taqîneka mihtemel a bi giştîya rojê re ku ew di wê rewşa wê ya giştî de ew bû wê, hingî wê ew wê bikê. Mînaq wê, dema ku mirov li dînyê dibînin ku ew taqînek û ankû astroîdek ku ew ji azmana dikê ardê de wê, di cihê ku ew lê ketî wê korçalaka mazin wê vekê. Wê hewirdora wê korçalê wê vekê. Di vê çerçoveyê de wê, ew tiştên ku ew berê bi hevdû ve bin wê, cihê ku ew li wê ketin bûya wê, bi bandûra kûtleya wê ketinê re wê, ji hevdû wê belav bibê. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşekê de wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşa firehbûna fezeyê de wê, bi heman rengê firehbûnê wê bandûra wê li gerwêrkên weke rojê, dînyayên din û hwd wê bibê. Wê ne tenê wê, bi ji hevdû dîrketina wan re wê, ew bandûr wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa wê, bi renegekî weke modeleka fezeyê a piçûk a pro-tîp wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa bandûra rojê a li ser gerwêrkên li dora wê de wê, zêdetir bibê. Mînaq gerwêrkek piçûk ku ew li rex ya rojê bê wê bandûra wê din ya rojê de bê. Wê, ya rojê wê li wê zêdetir bê. Dînya me wê, di vê çerçoveyê de ew qada ku ew di wê de ya ew, çendî ku ew dûra ji rojê wê, vejene ku ew dihê li wê û firekansên wê ên tîkiliya wan ya bi hevdû re bê. Çendî ku wê vejen zêde bibê wê firekans jî wê zêde bibê. Wê di qada xwe wê xwediyê rêgeha xwe bê. Hêza kişîna cisman a li hevdû wê, wê beremberî zêdebûna hêzê wê vejene wan kêmbikê. Dema ku mirov di çerçoveya têgîna teorîya dîtbar a giştî de wê, li wê dihizirê wê mirov dikarê bêjê ku wê, qadên ku ew kişîna wan zêdeya wê, ew dever wê pêlên rohnîyê û hwd ku ew di wan re derbas dibin wê karibin fireqansên wan bigûharênin. Rohnî wê, bê ku ew koka xwe bide gûharandin wê karibê fireqansa xwe bide gûharandin. Bo vê yekê jî ew ku ew di qadaka ku wê kişîna wê zêde bê ku ew derbas bibê wê bes bê.

Minaq wê, her stêr ku ew ji wê dihên wê pêl wê hebin. Hinek element wê di wê de wê, li dirêjehîya pêlê wê germbûnê jî wê çêbikin. Di rewşa stêrek mazin de wê, ew pêlên ku ew ji wê dihên wê ev zêdetir bibê. Di çerçoveya wê pêlê û qişiqîna di dirêjehîya wê de wê ew wê ew kûtleya wê were kifşkirin. Di roja me de wê, di mijara fizîka azmana de wê stêrên notronê, kûasaran, sûpernovayan û qûlkên reş wê bi çerçoveya têgîna teoriya dîtbar wê werina kifşkirin.

Li vir mirov dikarê mijare hinekî li vir bi rewşa fahmkirina rewşa qûlkên reş re wê bide domandin. Ev jî wê, di vê çerçoveyê de wê, di rewşa fahmkirina rewşa mijarê de wê weke aliyekî ku mirov wê, bi teybetî wê hilde li dest bê. Mijara qûlkên reş wê, weke mijareka giring a di rewşa fahmkirina rewşên fezeyê de bê. Qûlkên reş wê, di encama ku wê stêrek peresendina xwe ya dawî de ku wê biqûlibê li cismekî din a di fezeyê de bê. Hûrgilên pêvajoya peresendinê wê, dema ku wê stêr wê bi qûlibê wê bi rêjeya kûtleya wê ve wê girêdayî bê. Bi teybetî wê stêrên mazin wê dema ku ew vê pêvajoyê dijîn wê wergerihina qûlkên reş. Qûlka reş ew piştî ku ew pêşket û pê de wê, li ser wê qada ku ew afirîya wê, di cihê xwe de wê xwediyê qadaka manyatîkî a kişînê bê. Ev kûtleya kişîna wê manyatîkî wê wilqasî bihêz bê ku ew karibê pêlên rohnîyê jî bi xwe ve bikişênê û wan zantbikê. Di çerçoveya fahmkirina stêreka ku ew dimirê de ku mirov wê lêkolînê wê kûtleya kişîna wê bikê wê, di encama wê de wê, rewşa qûlka reş wê weke ku ew kifşbikê. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê rewşa qûlka reş piştî ku ew pêşket û pê de mirov, dikarê bi stêrên li dora wê jî wê fahmbikê. Ew kûtleya kişîna wê, ber ku ew pîrr bi hêz a wê, gaza stêrên li dora wê jî wê bi ber xwe ve wê bikişênê ku ew wê biqûrpênê. Gazên stêran wê bi awayekî helesonîkî wê rê bigirin û wê bi ber qûlka reş ve wê herin û wê 'dîska' wê biafirênin. Gaz ew dema ku bi hevdû ve dixişişin wê germ bibin û ankû wê germbûnê çêbikin. Lê wê dîska qûlka reş ku ew diafirê wê ew pîrr zêde wê germ bê. Wê ast û rêjeya germehîya wê heta 100.000.000 jî wê derkeve. Qûlkên reş wê, hêza kûtleya kişînê wê bikarbênin û her tiştên ku ew di ber wan re û ankû li nêzî wan re diçin wê bikişênina li nava xwe. Wê di rewşa rohnîyê de jî wê, bandûra wê li ser wê hebê ku ew, ew bandûra wê kişîna kûtleya wê, pêşîya wê bigirê. Wê nehêlê ku ew bi awayekî rast jî were kifşkirin. Çendî ku ew mazin dibin wê, hêza kûtleya kişîna wê, pîrr zêde wê bibê. Her wusa wê, dema ku em bahse wê 'ji rê derketina' di rewşa fezeyê de ku ew li ser têgîna teoriya dîtbar a giştî re ku ew dihê hanîn li ser ziman mirov, dikarê wê bi awayekî van rewşên qûlkên reş di wê de wê li berçav bigirê û wê fahmbikê. Bandûra rewşa qûlkên reş wê, di rewşa ji rê derketina rewşên fezeyê û ankû kişîna wê ya li hevdû de wê, zêde hebê. Qûlkên reş wê di dora xwe de wê xwediyê qadaka manyatîkî a bi kişîna kûtleyê a pîrr zêde mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Minaq di rewşa stêrên notronê de wê, kûtleya wê derket li ser ya rojê re wê, bi kişîna kûtleya xwe re wê di cihê xwe de wê hewirdor û stêrên li dora xwe wê bi hemû cismên wê re wê bi ber xwe ve wê bide kişandin. Ev weke 'ketinekê' jî wê were û bibê bê. Hêza vejene qûlka reş wê weke hêzeka pîrr zêde mazin bê. Ku mirov wê, weke çavkanîyeka ku ew mirov wê, bi wê lambayekê pêxê wê, bi wê pêxistina wê lambayê re wê hebûna wê qada fezeyê wê hema bêja wê nêzî rohnîya rojê wê rohnîkirina wê pêşbikêve. Di rewşa qûlka reş de ku wê, weke 'asoya bûyarê' jî wê were li ser ziman wê, weke rewşa ku wê ti bûjen û rohnî ku wê, kûtleya kişîna wê nerevê wê werênê li ser ziman.

Qûlkên reş wê, weke wê navê li ser wê a 'reş' wê heta roja me jî wê ji gelek aliyên ve wê weke qadna ku ew reş di mejiyê me de ku ew mana bin. Li vir wê, di derbarê hebûn, rewş, navarok û qûrbûna wan de wê, hizrên ji hev cûda wê werina li ser ziman. Li vir mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku mirov, tefkîrbikê ku mirov rêwîtiyekê di nava wê qûlka reş de wê bikê wê mirov wê rastî çi werê? Qûlkên reş wê, bi awayekî mirov dikarê wê, ji du aliyên ve wan, weke qûlekna wê hilde li dest. Ew qûlik wê, yan li dever û demek din ya fezeyê wê vebin bin û yan jî wê, li rewşek din a binfezeyê re wê vebin bin. Î ro lêkolînên ku wê bi kûtleyê, bar û çerçoveya wê manyatîkî ve wê bi sinor bê. Li gorî Stefan Hewking wê, qûlkên reş wê germbûnê li hewirdora xwe wê belavbikin. Ku ev rast bê wê demê mirov dikarê wê, di navaroka hundûrê qûlka reş de wê, kûtleyeka ehengî a kişîni wê di çerçoveya hundûrê de wê kifşbikê. Ev jî wê, weke rewşek dîmenî wê xwediyê rengna ku mirov wê fahmbikê bê. Bi vê têngîna Hewking re wê dema ku mirov wê, li hebûna qûlka reş dihizirê ku ew hertiştî dikişênê hundûrê xwe wê bi wê re wê, bi şewayekî wê di navkokiyê de bê. Lê ku mirov wê, di rewşek ahengî a bi hevdû re wê bikê ku wê fahmbikê wê demê mirov, divê ku mirov wê qûlka reş wê bi rewşek kûtleya kişîne a aliyê wê manyatîkî derve ve wê bi zêdeyî wê hilde li dest. Dema ku mirov wê, bikeve hundûrê wê de wê, heman rewş wê, weke aliyê derve wê xwe bide diyarkirin? Di vê rewşê de wê, weke qûlka reş wê, mirov dikarê di vê rewşê de wê, dema ku mirov bi çotkirina elektron, netron û protonên hundûrê atomê de ku ew çawa bi awayekî 'hîper-aktîv' dibin mirov dikarê wê, rewşa rengê aktîviyê bi wê weke dîmenekî li nava hundûrê qûlka reş bihizirê. Di vê çerçoveyê de wê, gotina 'qûlkê' ku wê karibê têngîneka 'valahiyê' wê weke kirdeyek vêşarî wê bi xwe re wê, bide me wê, ew vajî wê, xwediyê rewşek tiştî a di xwe de bê. Di nava xwe de wê, bi germehîya xwe ya teybet re wê xwediyê rewşek teybet a di xwe de bê.

Di rewşa têkilîya qûlkên reş û bi têngîna 'taqîna mazin' re ku mirov wê dênê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi wê re wê mirov wê bigihijê wê encamê wê ji aliyekî ve wê weke rewşek kişîne a li hevdû ya bi kûtleya re xwe ya bê û ji aliyê din ve jî wê, weke aliyekî ku ew rewşa fezeyê ew bi xwe re wê di ahengekê de digirê bê. Têngîna qûantûmê a qatikan wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têngîneka ku wê hertiştê wê ji qatkên binî ên bingihîn ku ew di afirin wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, weke têngîneka ku wê, hertiştî wê, atoman ku ew nayên beşkirin wê werênê li ser ziman. Destpêka bi teorîkirina wê, wê heta demokritos wê herê. Lê berî wî wê, li mesopotamiya wê di nava têngîna ezdayî de wê, weke çar bûjenên bingihîn weke av, agir, ax û hewa wê werê li ser ziman. Piştî Thales wê, vê barî wê herêmê xwe bikê. Li ser wê re wê, weke elementna hizirkirin û tefkîrkirina li tiştê wê, di vê çerçoveyê de wê hizirkirina wan wê, di dewama wê de wê were pêşxistin. Têngîna 'toz'ê wê, di vê çerçoveyê wê, di reng û wateya atomê de wê werê li ser ziman. Wê di vê çerçoveyê de wê ew wê were hanîn li ser ziman. Qûlkên reş wê, bi wê re wê werê dîtin ku wê ew di nava xwe de wê gelek elementan wê bi hawênê. Dema ku ew ahenga elementan ew xiradibê wê û ankû yek ji wan elementan bi demê re kêmbê û an jî bi dawî dibê wê temenê wê rewşa qûlka reş wê biafirênê. Bi wê re wê, ew jî wê were dîtin ku wê stêr û bi teybetî jî wê stêrên mazin wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek teybet a ku mirov wan hilde li dest bin. Ya ku wê wê rewşa qûlkên reş ku ew di afirênin wê ew stêrên mazin bin. Qûlkên reş ku ew ne xwediyê hêtna ya û xwediyê rewşek manyatîkî ya ku ew weke 'asoya bûyarî' jî dihê bi navkirin wê, di çerçoveya ahenge kûtleya kişîna manyatîkî wê bi wê re wê pêşbixê bê.

Tîrbûna di wê de a bi gazê re wê, di vê çerçoveyê de wê weke hêtna manyatîkî a ji wê gazê wê biafirênin. Qûlka reş wê, mirov dikarê wê, bi du awayan wê werênê li ser ziman. Bi awayekî mirov dikarê wê piştî afirîn û pêşketina wê re wê, weke rewşek dayimî a mayînda wê werênê li ser ziman. Li aliyê din jî wê, weke rewşek demkî weke ku ew ji stêrê û wergerîna wê afirî wê, ew ji wê wergerihê û bi qûlibê li rewşek din. Bi teybetî wê, afirîna qûlka reş wê, weke kişîna li hevdû û tîrbûna bi wê re mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Li gorî **teorîya klasîk a fîzîkê** wê, bê(were) ser ziman ku wê dema ku ew vejene wê ya jîyane bi dawî bû wê stêr wergerihê li qûlka li reş. Lê di demên dawî de ku wê, bi têgîna kûantûmê wê werê li ser ziman ku wê, qûlkek reş ku ew rohnîyê û bûjenê nadê wê, ev têgîn wê bigûharê. Li gorî wê jî wê, ew germehîya wê(qûlka reş) wê garibê germ bikê. Wê di dewama wê de wê jî mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê her cismê ku ew xwediyê germehîyê ya wê pêlên elektromanyatêkê wê bide.

Qûlkên reş wê, weke rewşna fezeyî ên ku mirov wan di çerçoveya hebûna fezeyê de wan hilde li dest bê. Hebûna wan wê, ji gaz û gelek elementên din wê biafirê. Li vir mirov, dikarê vê yekê jî wê, di dewama wê de wê li ser wê bibêjê ku wê qûlkên reş wê, weke rewşna ku ew çewsînê bi xwe re diafirênin bin. Çewsîna ku ew bi rewşa stêrên mazin re ku ew diafirê wê, piştî wê, temen û çerçoveya wê ya qûlka reş jî wê bi xwe re wê biafirê. Di rewşa çerçoveya têgîna astrofîzîkê de ku mirov wê lêkolîn dikê wê, bi wê re wê were dîtîn ku ew hinek radyasyonê li dora xwe belav dîkin. Li vir wê ev jî wê bi wê re wê were li ser ziman ku Wê qûlkên reş ên ne mazin wê dervî rohnîyê wê hin bûjenên din jî wê biavêjina li der li fezeyê. Lê li vir mirov, dikarê vê jî bi wê re wê kifşbikê ku ew qûlkên reş ku ew karibin radyasyonê ku ew bidina li derve wê demê mirov dikarê vê jî wê, di dewama wê de wê werênê li ser ziman ku ew bi demê re wê, ku ew kin bikişênê û ankû dirêj bikişênê wê piçûk bibin û heta ku wê, di dewama wê piçûkbûnê de wê, bi demê re wê wînda bibin. Ev jî wê, di rewşa firehîya fezeyê de wê, weke rewşek teybet a hîmî ku mirov dikarê wê werênê li ser ziman bê. Qûlkên reş wê, bi xwe re wê, weke rewşek fezeyî a fîzyolojîkî bin. Î ro, bi asta pêşketina aqilê me re em, dikarê wê hîsbikin û wê fahmbikin. Kifşkirin ku ew heta roja me ew di wê de bûna wê, di vê çerçoveyê de wê, temenekî têgînî wê bidina me. Li vir mirov di dewama wê de wê, werênê li ser ziman ku wê, qûlkên reş wê, weke rewşek kûantûmîyî a ku ew bi rêve diçê jî bê. Di dewama wê de em, mijarê bi çend gotinên di çerçoveya vê nûqteyê ên bi têgîna kûantûmê re de wê werênina li ser ziman wê, ji aliyekî ve wê, bi mijarê re wê vegotinbar bê. Têgîna kûantûmê emê li jêr wê hinekî li ser wê bisekin in. Lê li vir di çerçoveya vê xalê û nûqteya mijarê de wê salixkirina wê, di çerçoveya têgîna teorîkî û mekanîkî a kûantûmê de ku ew bi temenkirina wê bibê, bûjenên wê werina dîyardekirin, li gorî têgîna wê ya felsefîkî û teorîkî ku ew rewşa wê ya bi têgîna sedem û encamê re ku ew darêjka wê were hanîn li ser ziman, weke bûjenên mekanîkî ên kûantûmî ku ew rewşên ku ew sedemê wê bi xwe re ku ew diafirêne ku ew werê kifşkirin û hanîn li ser ziman, di vê çerçoveyê de ew têkilîya wê ya bi bandûr, gûharîn û vegûharin(qûlûbîna ji rewşekê li rewşekê)bi temen û hîmên wê ên fîzîkî re ku ew werina li ser ziman. Di roja me de wê, têgîna mekanîkî a kûantûmê wê li ser qatkên rohnîyê û ankû qada elektromanyetîkê wê bi rewşî û cerbî wê bisekinê. Di vê çerçoveya têgîna qatk-pêlê de wê xwediyê vegotîneka hîmî bê. Di vê çerçoveyê de wê, minaq weke ku wê werê li ser ziman ku wê, rewşa rohnîyê û qûrîfîna wê ku ew bi xwezaya pêlê re ew dihê vegotin

wê, bi wê re wê, germbûna cismên reş (li ser rewşa germbûna cismên reş wê Max blanck wê werênê li ser ziman) jî wê weke rewşa 'fotoelektirikê' wê were hanîn li ser ziman bin. Yê wê têngîn û rewşa fotoelektirikê wê werênê li ser ziman wê pêşî Heinrich Hertz û piştê wê Einstein bê. Di rewşa fahmkirina rewşa rohnîyê de wê, rohnî carna weke qatk û carna bi wan qatkên weke elektronan re wê weke bi pêlan wê xwe bide dîyarkirin wê, temenê hizirkirina têngîna qatk-pêlê bê. Di vê çerçoveyê de ew bûjenên binatomî wê çawa wê ew werina salixkirin wê, ketina li pey wan wê bibê. Li vir wê, rewşa vegotinê de wê, hem dîyarbûyîti û ne dîyarbûyîti wê bi hevdû re wê, xwe bidine dîyarkirin. Minaq ku em fotonê bi pêlna rastarast wê bikin ku wê werênina li ser ziman wê demê wê, mirov wê karibê hijmara pêlan wê zanibê. Lê ji ber ku wê, hebûna wê pêlê wê li giştîya fezeyê wê belav bibê wê, cihê wê nekifş bê.

Bi wê re wê, bi têngîna ji hev belavbûna wê re wê, bê tefkîrkirina ku wê rohnî wê weke bi qatkan wê di rewşekê de xwe dide dîyarkirin wê biheta hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, germehîya elektromanyetîkî wê bi dûîtîya pêl-qatkê' wê biheta hanîn li ser ziman. Li vir wê bi wê re di dewama wê de ku me bi rewşa dayîna (hanîna li ser ziman) li dora a germehîyê a rewşa qûlka reş wê, di vê çerçoveyê de wê, bi wê re wê vegotinek nû wê bistênê.

Fahmkirina wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê wê rewşê bê. Li vir wê dema ku mirov reş li stêran dihizirê ku ew piştî ku ew vejene wan bi dawî bû ku ew dibina qûlkên reş wê, demê rewşa rojê, dûnya û hwd jî ku mirov li wê bihizirê wê, di vê rewşê de wê çawa bê? Ev jî wê, weke rewşna ku mirov dikarê wê, hilde li dest. Lê li vir mirov dikarê vê jî wê, werênê li ser ziman ku wê rewşa qûlkên reş wê, weke rewşeka bi hebûna giştîya fezeyê re wê, xwediyê têtikiliyek temenî bê. Qûlkên reş wê, weke rewşna ku wê pirsên pîr zêde giring ên di derbarê feze û gerdûna me de wê, di xwe de wê bi hawênin bin. Di vê çerçoveyê de wê, di derbarê têngîna firehbûn, destpêk û dawîya gerwêrkên fezeyî û hwd de jî wê, hinek bersivên giring wê di xwe de wê bi hawênin. Em wê bihizirin ku wê dema ku qûlkên reş ku ew di encama wergerîna stêran de ku ew dibin ku em bihizirin wê, bi wê re ku em bihizirin ku wê gelek galaksîyên din ên dervî galaksîya me wê hebin. Qûlkên reş wê, di çerçoveya kûtleya kişîna xwe û mazinahîya xwe de wê, karibê galaksîyan jî ew bi qûrpênê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşek jî wê, di mejiyê me de wê xwe bide şaqqirin. Rastîya qûlkên reş wê, weke rastîyeka ku wê, di dewama fahmkirina xwe de wê me bigihênina gelek rastiyên galaksîyên din û rewşa xwe dewrûdayim kirina hebûna fezeyê jî.

Î ro mirov wê ji dûnyê wê, xwediyê destpêka rêwîtîyên li fezeyê bê. Lê ev rêwîtî wê hê di destpêka xwe de bin. Li vir mirov hê, ew amûrên ku wê bigihijina asta leze rohnîyê jî ew bi xwe re ew kifşnekirina û ankû bidest bikarhanîna wan nekirina. Bêgûman wê, pêvajoyeka dervî dûnyê a jîyanî wê, pêwîstîya gelek rewşên weke wê, wê bi xwe re wê bêtê li holê û bide dîyarkirin. Di dewama wê de em dikarin vê jî wê werênina li ser ziman ku wê, bi têngîna teorîya dîtbar re ku wê dem jî wê weke dîmenekî fezeyê wê were dîtin û hanîn li ser ziman wê, weke ku çawa ku rêwîtîya li fezeyê bi derfeta wê, bi wê rengê li bi derfeta bûna rêwîtîyê a di demê de jî wê hizirkirina wê, were hizirkirin. Li ser wê re ku ew dihê hizirkirin ku wê, çewsîna fezeyê re ku ew qûlkek reş dikarê were û vebê. Ku em li ser têngîna demê re wê hizirkirinê wê bikin ew vebûna qûlka reş wê, ew di demê de wê li şûn wê weke qûlkek reş a di demê de jî bê. Li gorî wê ku cismek ku ew minaq qûlkek reş ku ew vebê û bi lez pîr zêde ku ew bizîvirê wê, bi

wê re wê bi derfet bê ku ew temenê rêwîtiyeka li demê a li şûn vekê. Li ser ya pêşketî û bûyî re mirov, dikarê wê rêwîtiyê bahse wê bikê.

Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku wê hizirkirinê li ser têgîna rêwîtiya di demê de wê dikê wê, mirov bixwezê û nexwezê jî wê, di keviyeka mejiyê mirov de wê, rewşa qûlkên reş wê, bi awayekî wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, nepenîya qûlkên reş wê, bi xwe re wê, dibêt ku ew wê nepenîyê jî ew bi xwe re diveşêrên bin. Li vir di serî de wê dema ku mirov wê, li ser têgîna rêwîtiya demê dihizirê wê, weke bendekê ku me ji hev vekirî û bi pêşde dayî û ku mirov wê bi şûn ve li hevdû bipêçê wê dîmenekî wê bi şûn ve wê, li berçavên mirov wê bide çêkirin.

Mirov ew hê di roja me de ew di derbarê rewşa fezeyê û gerdûnê bigiştî de ew ne bi tememî xwediyê zaninekê ya bê. Her wusa em tenê di çerçoveya têgîneka fezeyî ku ew dînya ku em di wê de dijîn û li dora rojê di rêgehekê de wê, ji wê re navend digirin û dihizirin. Lê li vir mirov divê ku vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, dema ku mirov di têgîna xwe de û ankû di aqilê xwe de derkeve dervî dînyê wê demê wê, di mejiyê mirov de wê, di çerçoveya gerdûniya fezeyê de wê, ew jî wê ji mirov re wê bi hişkirinî wê bi derfet were ku mirov li wê bihizirê ku wê, dervî gerdûn û ankû di wê de galaksiya me wê gerdûnên din û ankû galaksiyên din wê hebin. Di vê çerçoveyê de em dema ku wê li qada fezeyê bihizirin em divê ku wê, bi pîvana bi demê a bi firehbûna wê ya li dora 14 û ankû 15 milyar salên fezeyî re li wê bihizirê û wê ev dem wê bi wê têgîn û çerçoveya têgîna firehbûna fezeyî de wê, rastiyeka qadî wê bide me. Yanî wê, ew dem wê, weke têgîneka qadî a ku pêşketî bê. Mirov di vê çerçoveyê de wê, dema dirêj wê, di çerçoveya hebûna fezeyê û firehbûna wê de wê, bi têgîna qadê wê hilde li dest û fahmbikê. Di vê çerçoveyê de wê qadeka ku ew 14 û ankû 15 milyar sal fireh wê xwe di vê çerçoveyê de wê bi têgînî wê di mejiyê me de wê bide dîyarkirin. Dibêt ku ev çerçoveya demî a weke ku em dihizirin a 14 û ankû 15 milyar salên fezeyê ew, di çerçoveya hebûna fezeyê de ew ne zêde temenekî dirêj jî bê. Di vê rewşê de mirov ku wê têgîna demê wê weke dîmenekî fezeyê wê li wê dihizirê wê, di vê çerçoveyê de wê, weke ew bi têgîneka qade fezeyê a bi firehbûna wê re wê xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin. Li vir têgîna qadê û ya demê wê, li hevdû hûnandî û hoyandî wê bi hevdû re wê, mirov dikarê li wê bihizirê. Hebûna demê ew di vê rewşê de ku ew weke dîmenekî fezeyê bi qada wê re ya firehbûyî re ku mirov li wê dihizirê wê, di dîmenekî de wê, rewşa qûlkên reş jî wê, di wê hundûrê wê dîmenê de wê, weke rêyna li demê, li dever û demna din ên fezeyê, derfîna li galaksi û ankû gerdûnên din ku ew divebin bin wê xwe bidina dîyarkirin jî. Ev jî wê, weke têgînekê wê, xwe di mejiyê mirov de wê bide dîyarkirin bê. Li vir mirov, ku wê rewşa têgîna qûlkên reş wê, di vê çerçoveyê de wê, bi fahmkirina xwe re wê me di hizirkirina me ya li fezeyê û dihizirkirina li fezeyê de ku mirov di mejiyê xwe de wê sînorê xwe yê hizirkirinê derbas bikê de wê, weke rewşekê jî wê, xwe bide dîyarkirin bê. Hizirkirina li dema fezeyê wê, di vê çerçoveyê de wê weke rengêkî hizirkirinê a li têgîna wê ya bi qada wê re bê. Her cism ku ew ket tevgerê û ankû ku wê bidest nîşandina hêza da wê, li gorî wê tawîna dem û fezeyê wê gûharinê wê di xwe de wê bide dîyarkirin. Ji aliyekî din ve jî wê, dem û feze wê, tevger û hêza cisman jî wê ji aliyê xwe ve wê bi bandûr bikê.

Têgîna 'qatkê' û kûantûm

